

SAL 1  
HEJMAR 1-9

15 GULAN 1932-  
30 ILON 1932

# HAWAR

ANNÉ 1  
NUMÉROS 1-9

15 MAI 1932-  
30 SEPT. 1932

Kovara Kurdî \* Revue Kurde

---

*Mîr Celadet Alî Bedir-Xan*

Xwedî û berpirsiyarê kovarê

Çapxana Tereqî  
Şam 1932

---

Ji elfabeya erebî-farîsî wergerandin û ji nuh ve nivîsandin

Mihemed Bekir

---

Cild 1

\*

Volume 1

SAL 1  
HEJMAR 1-9

15 GULAN 1932-  
30 ILON 1932

# HAWAR

ANNÉ 1  
NUMÉROS 1-9

15 MAI 1932-  
30 SEPT. 1932

Kovara Kurdî \* Revue Kurde

*Mîr Celadet Alî Bedir-Xan*

Xwedî û berpirsiyarê kovarê

Çapxana Tereqî  
Şam 1932

---

Ji elfabeya erebî-farisî wergerandin û ji nuh ve nivîsandin

Mihemed Bekir

---

Cild 1

\*

Volume 1

Nisxeya eslî:

Hawar, Kovara Kurdî  
Hejmar 1-9  
Şam 1932

© Mîr Celadet A. Bedir-Xan

The original:

Hawar, Revue Kurde  
No. 1-9  
Damascus 1932

© Mîr Celadet A. Bedir-Xan

Wergerandin(ji elfabeya erebî-farisî) û  
ji nuh ve nivîsandin:

© Mihemed Bekir  
Weşanxana Hawar

Transcription and reedition:

© Mohamed Bekir Agha  
Hawar Förlaget  
Stavbygränd 29  
163 70 Spånga  
Sweden

Printed in Stockholm (Sweden)  
by Författares Bokmaskin  
June 1987

ISBN 91-970863-0-4



*Mîr Celadet A. Bedir-Xan*



# NAVEROK

Rûpel

.....

|                                |               |
|--------------------------------|---------------|
| <b>Pêşgotin</b>                | <b>VII</b>    |
| <b>Not</b>                     | <b>XXVIII</b> |
| <b>Kitêbxana Hawarê</b>        | <b>XXX</b>    |
| <b>Hawar</b>                   |               |
| <b>Hejmar 1</b>                | <b>1</b>      |
| <b>Hejmar 2</b>                | <b>11</b>     |
| <b>Hejmar 3</b>                | <b>23</b>     |
| <b>Hejmar 4</b>                | <b>33</b>     |
| <b>Hejmar 5</b>                | <b>43</b>     |
| <b>Hejmar 6</b>                | <b>55</b>     |
| <b>Hejmar 7</b>                | <b>67</b>     |
| <b>Hejmar 8</b>                | <b>79</b>     |
| <b>Hejmar 9</b>                | <b>93</b>     |
| <b>Ferhengok</b>               | <b>111</b>    |
| <b>Navên nivîskar û şairan</b> | <b>120</b>    |
| <b>Hawar, nixseya eslî</b>     | <b>127</b>    |



## H A W A R

### Dengê zanîn û xwenasînê

Hawar kovara ziman û çanda kurdî bû. Xwedî û berpirsiyarê wê, rewşenbîr û zimanzanê bi nav û deng, mîr Celadet Alî Bedir-Xan bû. Hawar li Şamê derdiket, lê li gelek deverên Kurdistanê dihate belavkirin û ronakbîrên kurd ji gelek aliyên Kurdistanê nivîsar jê ra dişandin.

Jimara pêşîn di 15-yê Gulana 1932-an da derket. Jimara dawîn, a 57-an di 15-yê Tebaxa 1943-yan da hate belavkirin. Lê umrê Hawarê yê rastîn, ne 11 sal, belku kêmtirî 5 salan bû. Jimarên Hawarê bi vî awayî derketine:

|          |           |          |           |
|----------|-----------|----------|-----------|
| Jimar 1  | 15.5.1932 | Jimar 23 | 25.7.1933 |
| Jimar 24 | 1.4.1934  | Jimar 26 | 18.8.1935 |
| Jimar 27 | 15.4.1941 | Jimar 57 | 15.8.1943 |

Tevî ku heta jimara 27-an, xebata Hawarê du caran hatiye rawestandî, lê mixabin, piştî ku Hawarê, ji nû ve dest bi xebatê dikir, tenê behsa rawestandî-nê dikir, bi tu awayî sebebên wê nedidane xuyakirin. (1)

Hawar bi du zimanan derdiket, bi kurdî û firensizî. Bi gelemperî her jimarek 20 rûpel bû. Birê firensizî tenê ji 2 heta 4 rûpelan bû. Birê kurdî, di destpêkê da (jimar 1-23), bi du elfabeyan dihate belavkirin (bi elfabeya latînî-kurdî û bi ya erebî-farisî). Piştî jimara 23-yan, tenê elfabeya latînî-kurdî hatiye bikananîn.

Gelek rewşenbîr û nivîskarên me yên bi nav û deng, naveroka Hawarê bi zanîn, tecrîbe û hunermendiya xwe dewlementir û tekûztir dikirin. Va ne çend ji wan:

— *Celadet Bedir-Xan, Rewşen Bedir-Xan, Dr. Kamiran Bedir-Xan, Osman Sebrî, Qedrican, Cegerxwîn, Mistefa E. Botî, Qedri Cemil Paşa, Dr. Nuredîn Zaza (Yusif), Lawê Fendî, Ehmed Namî, Hesên Hîşyar, Bişarê Segman, Nêrevan, Reşîd Kurd .....*

— *Goran, Tewfîq Wehbî, Evdîl Xaliq Esîrî, Şakir Fetah, Hevîndê Sorî, Pîrot, Lawêkî Kurd....*



Hawar demeke dirêj nedikete destan. Tenê çend nisxeyên wê, li cem hin camêran û li nik hin kitêbxaneyên cîhanê, parastî mabûn. Di sala 1976 an da, Hemreş Reşo, birekî wê (jimarên 24-57) ji nû ve da çapkirin(2).

Ez bi xwe jî, li ser birê pêşîn (jimarên 1-23) dixebitim. Ew jimar di sê cildan da, bi vî awayî dê bêne çapkirin:

- Cild 1: Jimar (1-9)
- Cild 2: Jimar (10-16)
- Cild 3: Jimar (17-23)

Gelek sipas ji xanima hêja Rewşen Bedir-Xan ra, ku destûra çapkirina vî birê Hawarê da min. Hêvî û daxwaza Xanima me ya delal, ji xortên kurd ew e ku, ew jî bidin ser şopa Hawarê û ji bo pêşvebirina ziman û çanda kurdî bixebitin.

Qedir û rûmeta Hawarê di dilê her kurdekî da, gelekî bilind e. Gelo sebeb çî ye? Gelo armanca Hawarê çî bû?

*“Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.*

*Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin. Lewma ko zman şerta heyîne a pêşîn e.*

*Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê.”(3)*

Bi wan gotinên giring, Hawar dest pê dike û doz, daxwaz û armanca xwe, bi xwendevanan dide nas kirin: Belê zanîn û mêranî bê xwenasîn kêma û bêkêr in. Dîroka Kurdan vê yeka han, bi xweşikî, ji me ra dide xuyakirin.

Berî 300 salî Ehmedê Xanî dîtiye ku Kurdistan ketiye sergêjiyeke ecêb. Hin mîr û karbidestên Kurd bûne “hevalbendên” Eceman, birekî din yê Tirkan. Di nav xwe da jî bûne sed perçe û her yekî şerê yê din dikir. Di şerê Tirk û Ecaeman da jî dîsa ew di pêşiyê da bûn. Bi vî karê kambax, wan fedakarî û mêraniya miletê xwe, ne ji bo pêkanîna Kurdistaneke serbixwe, belku ji bo xurtkirina biyaniyan û qelskirina xwe û miletê kurd bi kar anîne.

Ev mêraniya bê xwenasîn bû.

Zana, şair, dîroknivîs, zimanzan û hozanên Kurdan hîngê ji yê miletên din ne kêmtir bûn. Ev in çend nimûne: Ibni-l-Esîr, Ibin Xelkan, Şeref-Xanê Bidlîsî, Idrîsê Bidlîsî, Ebû-l-Fidayê Eyûbî, Fizûlî.(4)

Lê wan her tiştên xwe bi zimanê biyaniyan, bi erebî, farisî û tirkî dinivîsîn. Ew ziman, zimanên dîn, hikim û dewletê bûn. Zimanê kurdî her jibîrkirî mabû.

holê van kurdên ha, zanîna wan miletan di her warekî da dewlementir û geş-tir dikirin. Lê, rewşa miletê kurd di wan waran da, roj bi roj, qelstir û xerabtir dibû. Van kesên jîr, lê ne dûrbîn, bi vî awayî, heyîna miletê xwe, bi destên xwe, berbi wendabûnê têve didan.

Ev zanîna bê xwenasîn bû.

Ehmedê Xanî, yê dûrbîn, çiqas kire hawar, çiqas bi hunermendî û hozanî, derdê Kurdan dane rave kirin, lê dîsa jî kesî nedibihîst, nedidît. Kurdan, ne xwe û ne jî dost û dijmimnê xwe nas dikirin.

Hawara Hawarê jî, ji hawara Xanî bû. Rewşa kurdan, di sala 1932-an da, ji rewşa wan a ku di zemanê Xanî da gelekî xerabtir bû. Şoreşên Kurdan yek bi yek bi hovîti hatibûn pelçiqandin. Kurdistan hati bû parvekirin. Milet şerpeze û bê hêvî bûbû.

Hawarê dît ku xebateke dûr û dirêj gerek e. Xebateke ku bingehê wê zanîn û xwenasîn be. Kurdan bêtîrî hezar salî, dîrok, huner, ziman û edebiyata xwe bê xwedî hiştine. Serê wan bi çanda ereb, tirk û eceman hatiye dagirtin. Bi vî awayî şexsiyeta kurdî hatiye guhartin.

Celadet Bedir-Xan, bi çavê bijîşkekî jîr, mirovê kurd ji me re holê dide nasîn:

*”Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye. Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e. Armanca te li ber te sekiniye. Di şiklê mirovekî de ye. Tu lê dinihêrî, ecêbmayî dimînî. Herê tu dibînî, dest, ling, mil, pol, parsû, parhan, her tiştên wî hene. Lingê wî yê rastê berepêş, yê çepê berepaş diçit. Laş di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêş, ne jî paş. Ji ber ku ji alîkî ve pêş ve, ji aliyê din paş ve tête kişandin. Tu zanî çira xorto? Lewma ko her du ling ne yek in. Navbera wan de yekîti nîne. Divêt, tu bixebitî van her du lîngan bi alîkî ve bilivînî.”(5)*

Hawar, gelek nexweşiyên vî mirovê kurd, rave xortan dike. Hêviya miletê me ya geş, xortê kurd e. Lewra Hawar dixwaze derdên miletê me bi wan bide naskirin da ku ew bikarin xwe ji wan derdên dijwar û cankuj vegirin. Hin ji wan derdan ev in:

*”Xorto! Bi ser kela me de girtine. Ji der ve dijmin dirêjî me kiriye. Ji her mêlê êriş. Di hundirê kelê de şerekî din, bê eman û ji yê pêşîn*

*mezîn û diwartir heye. Şerê me bi hevûdû re. Di mal de jî dijmin. Herê xorto! Birîna me a mezîn û xedar dexts e (hesûdî), berberî ye, jana dextsê ye. Em sîngjar in. Ji der ve serma li me dixê. Li hundir em bi janê dikevin.....”(6)*

Hêviya Hawarê ji xortên kurd ev e:

*”Xorto! Holê bixebite: An bi xwe çêke, an arîkariya ewan bike ko çê dikin, ava dikin....*

*Di dinyayê de tûştî nîne ku tekûz bêt. Di her tûştî de, nemaze di karên nû destpêkirî de, pirîcar, kêmanî hene. Heke te kêmanî dîtîn, hema drêjî wan meke. Lê bixebite ko tu bikevî nav wan, arîkariya daniyan bikî û wan kêmaniyan biedilînî. Hilweşandina stûnekê hêsanî ye. Huner di rastkirina stûna xwêl de ye.”(7)*

Armanca Hawarê ew bûye, ku vê şexsiyeta nexweş û şaş hilweşîne, şexsiyeteke rast û bikêr pêk bîne. Bingehên ayîneke nuh ”Ayîna kurdaniyê” ava bike.

Gelo xebata Hawarê ji bo pêkanîna vê armanca giring çî bû û bi çî awayî bû?

Hawarê di destpêkê de pronivîseke (program, birnamic) gelekî fereh û hêja daniye. Em dikarin wê pronivîsê bi van çend niqteyan rave bikin:

— Sehîfî ser zman û zarên kurdî.

— Edebiyat û folklorê kurdî.

— dîrok û erdnigariya Kurdistanê.

— Jîna kurda ya rojîn (rojane).

Xebata Hawarê ya giringtirîn di warê ziman û edebiyata kurdî da bûye. Ezê jî, hinekî bêtir, li ser wê xebatê binivîsim.

## ZIMAN Û MILET

.....  
Dîtina Hawarê li ser zimên ev bû : ”zman şerta heyînê a pêşîn e”.

Belê tiştê ku heyînaKurdan heta îro parastiye, ne mêranî û zanîna wan, belku zimanê wan bûye.

Gelo çima wezîfeya zimên di jîna miletan da evqas bingehîn û giring e? Bersiv ev e:

*”Herwekî nas e, fikr û his di dora zmanî de digehînin hev, û her zman fikr û hisên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin, û pey zmanên xwe dikevin. Bi vî awayî digel zmanî fikr û hisên biyaniyan jî tên dikevin nav me, di dil û hişê me de cih digirin, û rû û gonê me ên manewî diguhêrînin, diheşîfînin.”(8)*

Lê ne tenê ji bo heyîna miletê kurd, belku ji bo yekîtiya wî jî, rola zimên bê hempa ye.

*'' Yekbûna Kurdistan jî bi yekîtiya zmanê kurdî çê dibe. Yekîtiya zmanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike. ''(9)*

Di warê yekîtiya elfabeyên kurdî da hin xebat hati bû kirin. Lê sed mixabin ku wê xebatê jî, ji ber hin sebebên tu havil nedaye. Xebata pêşîn, li Şamê berî derketina Hawarê dest pê kiriye. C. Bedir-Xan û Zimanzanê bi nav û deng, Tewfîq Wehbî, hîngê xwestine elfabeyên xwe yên ku li ser bingehên elfabea latînî, durist kiri bûn, bikine yek. Lê berî qedandina vî karê hêja, T. W. vege-riye Îraqê û ew karê hêja neçûye serî. (10, 11)

Heyf e ku zmanzanên Kurdistan ew kêsa zêrîn, ji destê xwe berdane. Hîngê di destpêka salên 1930 da, pejirandina elfabekeke latînî-kurdî, ji bo Kurdên Kurdistanê Îraqê jî, gelekî hesantir bû. Nîrên wê wextê jî, ji yên îro gelekî baştir bûn. Lê Kurdistan ne tenê ew kêsa, belku pir kêsên holê, ji destê xwe berdane.

Hawarê ji bo yekîtiya zaravayên kurdî jî xebateke hêja kiriye. Rewşenbîrê kurd, Hevîndê Sorî, di pênc jimarên Hawarê da(12) ev pîrsa giring, bi awakî pir hêja tehlîl kiriye. Li dawiyê, ew van pîrsên jêrîn ji xortên kurd dike:

*''1- Zmanê kurdî çawan xwerû û pak dibit?*

*2- Bi çî awayî zarên Kurdistanê ên cihê dikevin nîzingî hev û zarekî welê tete pê ko kurd hemî di zarên hev digehin (zarên hev fehîm dikin).*

*3- Zmanê kurdî çawan pêş ve diçit û bi çî awayî biser dikevit? ''(13)*

Dîtinên ronakbîrên kurd ên wek: Osman Sebrî, cegerxwîn, Elî Seydo Gewrî (Goranî), Lacê Henî(Mihemed Elî Ewnî), Pîrot û yên hin camerên din, li ser vî pîrsa giring di çend jimarên Hawarê da hatine belavkirin.

Belê, Hawarê dîtiye ku, çeka miletê kurd ya tevî xurt, zimanê wî ye:

*''Miletên bindest heyîna xwe ji serdestên xwe bi du tiştan, bi qeweta du çekan diparêzin. Ol yek. Zman dudo. Lê heke ola miletê serdest û bindest yek bibe, hingî çek yek bi tenê ye û bend tenê zman e. ''(14)*

Lê ev çeka han jî ne çekeke temam, belku nîvçek e. Zimanê kurdî, wek zimanên miletên din, pêş ve neçûye. Ew bê xwedî û bê avdan maye. Gelo xebata Hawarê ji bo pêşvebirina zimanê kurdî çî bû?

Bi dîtina Hawarê, hîmê zimanan ji sê hêmanan(unsir, element) pêk tê:

- Elfabê
- Rêzman (gramêr)
- Ferheng

Xebata Hawarê di wan waran da, bi kurtî, ev bû:

## ELFABÊ

.....  
Hawar kovara pêşîn bû ku ji bo nivîsandina zimanê kurdî, hîmê elfabeyeke latînî-kurdî danî. Dema rewşenbîrên kurd dest bi weşandina rojname û kovaran kirine, hîngê dîtine ku elfabeya erebî-farisî bi kêrî nivîsîna zimanê kurdî nayê. Ev yeka han di kovara "Jîn"-ê da baş xuya dike(15). Di zimanên samî da, hin dengdar û dengdêrên ku di kurdî da hene, nîn in. Dengdêrên kurt, bi gelemperî, nayine nivîsîn. Vê yekê, nivîsîna zimanê kurdî bi elfabeya erebî-farisî xistiye belayeke mezin.

Heta berî pêncih salî jî ev komên gotinên kurdî, bi elfabeya erebî-farisî wekhev dihatine nivîsîn:

Ker, kir, kur

Şêr, şîr

Şor, şûr

Tevî ku zmanzanên kurd, di van çend dehsalên dawîn da ser û binê gelek tîpên erebî bi îşaretên rengareng xemilandine, disa jî xwendin û nivîsîn bi elfabeya erebî-farisî dijwar e. Denganiya (fonêtik) erebî û kurdî di gelek dangan da dûrî hev in. Ji vê yekê pê ve jî, piraniya tîpên elfabeya erebî li gor cihên wan di bêjeyê (di destpêk, nav an paşîya gotinê) da bi awayên têvel têne nivîsîn. Gelek caran mirov dikare gotinekê bi çend awayên têvel binivîse. Ev sebeb hemî, nivîsîn û xwendinê bi elfabeya erebî-farisî, gelekî dijwar dikin(16). Hînbûna vê elfabê, bi hemî endazeyên wê ve, ne karekî hesan e.

Hawarê bi xebitandina elfabeya latînî-kurdî, xwendin û nivîsîna zimanê kurdî gelekî hesan û zelal kir. Sed carî mala Celadet Bedir-Xan ava be.

Mîr Celadet, di panzdeh jimarên Hawarê da, li ser elfabeya xwe dinivîse:

- C. Bedir-Xan tîpên elfabê yek bi yek bi xwendevanan dide naskirin. Bi ferehî li ser dengên hember wan tîpan disekine û xweserîtiya her dengêkî dide zanîn. C. B. wan û yên hin zimanên din jî dide berhev û her carê seba hilbijartina tîpekê ji xwendevanan ra zelal dike. Di vê helbijartinê da, C. B. elfabeyeke fonêtîkî pêk aniyê. Yanê hember her dengêkî tîpeke tenha û hember her tîpekê dengêk

daniye. Vê yekê xwendin û nivîsîn bi elfabeya Hawarê gelekî hesan kiriye. Celadet di helbijartina tîpan da, qasî ku mimkin bûye, xwe nizîkî elfabeya tirkî kiriye. Daxwaza wî ew bûye, ku Kurdên Kurdistanê Bakur, bi hesanî, hînî elfabeya Hawarê bibin.

- Dengên kurdî yên bingehîn, li gor dîtina C. B. 31 in. Ew vê dîtina xwe holê dide zanîn:

*''Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ko di zmanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek in. Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. . ''(17)*

Celadet dengên ''h, x'' dengine biyanî hesab kirine(18). Lê ew di Hawarê da, hatine bikaranîn.

Li ser, jimara fonêmên kurdî, heta îro jî micadeleyeke tûj heye(19). Gelo (ç, k, l, p, r, t) rengên (ç, k, l, p, r, t) ne, an jî ew fonêmine serxwe ne? Gelo divê dengên (x, h) têkevine elfabeya kurdî, an na?

Ev pirseke bingehîn û dirêj e. Em nikarin di vê pêşgotinê da bi ferehî li ser bisekinin.

Rehmetî C. Bedir-Xan du guhartin xistine elfabeya Hawarê:

1- Di jimara 24-an da tîpên ''q'' û ''k'' bi hev guhartin. Ji jimara (1-23) ''Kurd û Kurdistan'' holê dihate nivîsîn: ''Qurd û Qurdistan''.

2- Ji jimara 27-an û heta dawiyê, ''ê'' û ''î'', dema di pê wan ra ''y'' tê, kurt hatine nivîsîn:

*Dê dêya min (Jimar 1-26) diya min, deya min (jimar 27-57)*  
*Birazî birazîyê min (Jimar 1-26) birazîyê min (Jimar 27-57)*

Bi vî awayî elfabeya Hawarê ji 31 tîpan pêk hatiye û kemiliye

## RÊZMAN

Zimanê kurdî bê xwedî ma bû û gelek caran jî, bi awakî şaş dihate bikaranîn. Rastnivîsîn bê rêzmanê zimên naçe serî. Ji jimara 27-an da, Hawarê dest bi belavkirina rêzmanê zimanê kurdî jî kiriye.

Di bîst û du jimarên da, ''Bingehên gramêra kurdmançî'' hatine danîn. Lê hef e, ku umrê Hawarê yê kurt, rê nedaye, ku ev gramêra ha temam bibe. Benda dawîn di jimara 54 an da hatiye belavkirin. Celadet bi wezîfeya gramêrê, dengên û elafabê, dest pê kiriye. Bi dirêjî li ser van hêmanên gramêrê nivîsiye:

*Navdêr û tewanga wan, pronav, rendgdêr û jmarnav*

Heta îro jî, ev nivîsarên Celadet li ser gramêra kurdî, bê hempa ne. Zanîna wî gelekî kûr û fereh bû. Celadet di tehlîla xwe da, ne tenê li ser devokekî, belku li ser piraniya devokên kurmançî sekiniye.

## FERHENG

.....  
Hêviya Celadet ew bû, ku ferhengekî jî ji zimanê kurdî ra saz bike. Ew hêviya şêrîn bi cih nehat. Lê Hawarê xebateke hêja di vî warî da kiriye. Hawarê girin-giya ferheng ji bo pêşveçûna zimên xweş nas kiri bû. Wek bijîşkekî jîr, Hawarê, qelsî û nexweşiyên zimanê kurdî di warê ferhengî da nas kiri bûn.

*''Îrû di zmanê me de du texlît kêmanî hene: Wendabûna pirsinen kurdî û ketina pirsinen biyanî nav zmên.''(20)*

Hawarê ew pirsên ku ji zarekî ketine, ew ji zarên kurdî yên têvel, ji stran, mamik, medhelok û çîrokên kurdî kom kirine û ew di ferhengoka Hawarê da, hin bi hin belav kirine. Li cihê pirsên biyanî, Hawarê, herçend jê hatiye ewçend, pirsine nuh çêkirine û xebitandine. Pirsra ''çand'' yek ji wan pirsan e.

Belê, ji bo danîna ferhengeke kurdî, ferhengoka Hawarê, bingehekî gelek hêja û bikêr e.

## EDEBIYAT Û FOLKLOR

.....  
Edebiyata miletekî, jiyana wî bi temamî ye. Hêvî, serpehatî, fikir, his, bawerî, diltengî, kêfxweşî, xebat, adet, rabûn û rûniştina wî, her tiştên ku ew pê mijûl dibe, ji edebiyata wî miletî têne naskirin. Edebiyat jî, devkî û nivîskî ye. Edebiyata kurdî ya devkî ewqas bilind, dewlemend û rengîn e, ku hempayê wê di nav edebiyatên cihanê da gelekî kêr in.

Lê Kurdan dewlemendiya vê gencîneyê nas nekiri bûn. Kurdnasên biyanî, berî kurdan, ev dewlemendiya ha nas kirine û li li hember vê edebiyata devkî ecêbmayî mane. Wan hê tiştêkî wisa spehî û rengîn nedîti bûn. Hema dest bi komkirina folklorê kurdî kirine û ew wergerandine zimanên ewripayî: Rusî, elmanî, firensîzî, ingilîzî, îtalî..... hd. Bi xebata wan camerên biyanî, birekî hêja ji folklorê miletê me hate parastin. Destana Memê Alan, yek ji wan e.

Xebata A. Jaba, H. Makas, O. Mann, Hadank, B. Nîkitîn(Nikitine), R. Lêsko(Lescot), D. N. Makênzî(Mackenzie) û gelek camerên din, di vî warî da, qet nayê jibîrkirin. Di van salên dawîn da, zanayên kurd jî, nemaze H. Cindî, C. Celîl û E. Evdal, xebateke hêja di vî warî da kirine.

Hawar di ferhengoka xwe da (hejmar 30), folklorê holê bi me dide zanîn:

*''Tevayîya adet, çîrok û stranên miletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ko ji nav xelkê derketine û di dora nişan de bi ser ve ketine û gihastine nişên nû (zanîn — zanistiya xelkê ye)''*

Xebata Hawarê di vî warî da pir giring bû. Hawarê folklorê kurdî tesnîf kiriye. Ji her renekî, qasî mimkin bûye, ewqas nimûne berhev kirine û di Hawarê da belav kirine. Rûpelên Hawarê bi medhelokên têvel, bi çîrok, çîrçîrok û stranên rengareng hatine xemilandin. Hawar stranên kurdî bi vî awayê jêrîn tesnîf dîke:(21)

Li gor demdariya stranan:

- 1- Stranên ku demeke dirêj dijîn û li gelek aliyên Kurdistanê têne strandin.
- 2- Stranên ku demeke kurt, pirçaran, tenê salekê dijîn.

Li gor meqamê stranan:

- 1- Lawik: Stranên lîrik û evînê
- 2- Şer :Stranên li ser şer û cengê (Delal)
- 3- Dîlok: stranên govend û dîlanê
- 4- Lavij, lavijok, laje: Stranên dînî.
- 5- Bêrîte, bêlîte: Stranên şagirtên dibistanên dînî.
- 6- Beste: Stranên tevî giran.

Belê, dema mirov bixwaze miletê kurd baş nas bike, hîngê baştirîn rêber ev edebiyata devkî ye.

Dema mirov edebiyata kurdî ya nivîskî dide ber ya devkî, dibîne ku ferqeke pir mezin di nav wan da heye. Ew ne kêmtirî ferqa ku di navbera mirovekî gihîştî û zarokê da ye. Meqsed ne ew e ku ev edebiyata nivîskî pûç û bêkêr e, belku bê xwedî û bê avdan maye. Ji roja ku ola îslamî cihê xwe di Kurdistanê da xurt kiriye û heta zemanê Hawarê, tenê çend camêrên kurd bi zimanê xwe nivîsîne. Jimara hemî rûpelên ku heta zemanê Hawarê hati bûn nivîsîn, ji çend hezaran ne bêtir bû. Ew jî -bi gelemperî- tenê şîir bûn. Lê tevî vê yekê jî, eserên hin şairên kurd, ji eserên cîhanî yên tevî hêja têne jimartin. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, yek ji wan e. Ji xwe, yek ji sebebên ku Xanî Mem û Zîn, bi kurdî nivîsîye, ev bûye: Bikêrhatina zimanê kurdî di warê edebiyat û zanîna da, bi miletê xwe û bi cîhanê, bide naskirin.

Hevindê Sorî, di ''Edebiyatî Kurdî'' da(J. 5, 7, 8), li ser gelek pirsên edebiyatê sekiniye. Yek ji wan, pirsê dîroka edebiyatê ye, koçên (merhele) ku edebiyata miletên Hîndo-Ewripayî tê ra derbas bûye. Ew sê koçan bi nav dîke:



- 1- Edebiyata goranî (stranvanî)
- 2- Edebiyata çîrokî
- 3- Edebiyata komêdî (temsîlî, temaşayî, tiyatro)

Dîtina Hevind ew bûye, ku edebiyata kurdî, ketiye koça dudiyar lê hê negi-hîştîye ya sisiyan. Ji bo pêkhatina edebiyata temaşayî, divê nîrên civakî li Kur-distanê, bêtir pêş ve herin. Li dawiyê, Hevind bawer e ku edebiyata kurdî, bilind e, qabiliyeta wê ya pêşveçûnê mezin e. Herçend medeniyet li Kurdistanê pêş ve here, ewçend ew edebiyat jî dê bilintir û tekûztir bibe.

Xebata Hawarê, di warê geşkirin û pêşvebirina hêmanên edebiyata kurdî ya nivîskî da, xebateke hêja û bi zanîn bûye:

*''Bi bîst hejmarên kovara me ko heta niho belav bûne, me dil dikir, em her awayê nivîsandinê biceribînin û bêxin zmanê xwe. Herwekî awayên bingehî, nezm û nesir û çend şiklên nesrê kêr û zêde di Hawarê de belav bûne. Tenê awayê temaşayê hebû ko hêj neketi bû zmanê me. Mîna ko xwendevanên me di vê hejmarê de dê bixwînin, me ew şikl û awa jî ceriband û xiste zmanê xwe. Temaşake biçik bi navê (Hevind).''(22)*

Xebata Hawarê di vî warî da li ser du stûnan bûye. Ferehkirin û tekûzkirina warê edebiyata kurdî, ku ew jî wek edebiyata miletên din, hunerên edebî yên tével wek çîrok, roman, temaşa û rengên din jî bi kar bîne, yanê ne tenê li ser lingekî -şîir- raweste.

## KLASÎKÊN KURD

Ji çend mele û rewşenbîran pê va, kêr keserê klasîkên kurd nas dikirin. Hawarê ew jî nû ve vejandine. Bîrekî hêja ji dîwana Melê Cizerî û Memozîna Ehmedê Xanî jî belav kirine. Lê berî ku ev eserên giranbiha bi temamî bîne çapkirin, Hawar nema derketiye.

- Dîwana Melê, Qedrî Cemîl paşa (J. 35-57)
- Memozîna Xanî, Herekol Azîzan (J. 45-57)

Hawarê li ser klasîkên din jî, wek Elî Herîrî, Feqehê Teyran, Melayê Bate, Smaîlê Beyazîdî, Şeref-Xan, Mirad-Xan, Siyehpûş, Aşayok, Mewlana Xalid, mela Yehyayê Mizûrî, mela Xelîlê Sêrtî, Şêx Evdîlqadirê Gêlanî, Nalî, Şêx Riza, Hacî Qadirê Koyî û û gelekên din, bi kurtî, nivîsiye.(23)

Hawar dide zanîn ku xebateke dûr û dirêj, li ser klasîkên kurd gerek e. Ew hêvî dike ku hin camêrên kurd bi vî karê giring rabin. Hawarê zanîna xwe li ser klasîkên kurd, holê peyda kiriye:

*''Di vê babetê de di destên me de tu.wesîqe nînin. Tiştên ko ez pê dizanim, min pirê wan ji şêxê rehmetî, Evdirehamanê Garisî bihîstine. Ji milê din, di kitêba kurdîzanê ûris Eleksandr Jaba de der heqê edebiyata kurdî hin not hene. Jaba ji melakî kurdmanc re di heqê edebiyata me de bendek da bû nivîsandin. Melayê kurdmanc, ji xêra Xwedê re, benda xwe ne bi erebî, ne bi farisî û ne jî bi tirkî, lê bi kurdmancî nivîsandiye.''*(23)

## WARÊ WERGERANDINÊ

.....  
Hawarê gelek nivîsarên hêja ji zimanên biyanî wergerandine kurdî:

- Hin perçe ji seyahetname Ewliya Çelebî, wergêr: Dr. K.Bedir-Xan (J. 16)
- Kardûx û welatê wan, Ksênofonê Yûnanî, wergêr: C. Bedir-Xan (J. 32)
- Bawerî bêganeyêk, Mêcer Hey, wergêr: Hevindê Sorî(J. 17)
- Kurd û Kurdistan bi çavê biyaniyan, M. Hartman, Moltke, wergêr: Celadet Bedir-Xan (J. 19, 23, 24)
- Tefsîra Quranê û hedisên pêxember, wergêr: Dr. K. Bedir-Xan (ji jimara 27-an da dest pê dike)
- Çarînen Xeyam, wergêr. Dr. K. Bedir-Xan (J. 17-24)

Nûredin Yûsif(Dr. N. Zaza) jî hin nivîsarên hêja wergerandine kurmancî.  
Ev çend ji wan in:

- Derketî, Lamenneais, (J. 29)
- Ji xortan re, Rudyard Kipling, (J. 29)
- Stêrk, Alphonse Daudet, (J. 33, r. 4-6)
- Xatûn an piling, Frank Stockten, (J. 44)

Di birê firensizî da, Hawarê nivîsarên gelekî giring li ser ziman, edebiyat, dîrok û jîna Kurdan a civakî belav dikirin. Ev in çend nimûne:

- Zimanê kurdî, C. Bedir-Xan (J. 1, 2, 3)
- Elfabeya kurdî, C. Bedir-Xan (ji jimara pêşîn da dest pê dike)
- Folklorê kurdî, C. Bedir-Xan (J. 3, 4)
- Memê Alan: Celadet Bedir-Xan ev destana kurdî, bi ferehî, di gelek jimaran da belav kiriye (ji jimara 4-an da dest pê dike)

- Mêvandariya Kurdan, Dr. K. Bedir-Xan (J. 6)
- Çend têbînî li ser Mishefa Reş, Dr. K. Bedir-Xan (J. 14-16)
- Rêzmana kurdî, C. Bedir-Xan (ji jimara 16-an da, dest pê dike)
- Jina kurd, Dr. K. Bedir-Xan (J. 19)
- Gelek çîrok û stranên kurdî.

## HAWAR Û XWENDEVANAN

.....  
 Rûpelên Hawarê ne tenê ji nivîskarên bi nav û deng ra, belku ji nûgehiştîyan ra jî vekirî bûn. Gotina Hawarê di heqê wan camêran da, ev bûye:

*”Lê di wê çendê de hin nivîsarên nûgehiştîyan dihatin û digihane me. Bivê nevē, heqê nûgehiştîyan jî di Hawarê de hebû. Ji xwe Hawar, ji me bêtir, ya wan e.”(24)*

Hîngê, kurdên ku xwendin û nivîsîn dizanîn kêma bûn. Feqeh ji wan kesan bûn. Rehmetî Celadet Bedir-Xan, peywendî digel wan daniye û quncikek di Hawarê da ”Stûna feqehan” ji wan ra vekiriye. Hawarê, bersiva pirsên wan jî, dida. Dr. Ehmed Nafiz bi kurmanciyê pir zelal, di du jimarên Hawarê da(J. 2, 3) li ser ta, tawî û tabir ji wan ra nivîsiye.

Para zaroyên kurd jî di Hawarê da hebû. Stûneke xweser ”Stûna zarowan” ji wan ra hati bû danîn. Di vê stûnê da, C. Bedir-Xan û Osman Sebrî, bêtirî herkesî din, ji zaroyên kurd ra nivîsîne.

Rewşen Bedir-Xan, ji jinên kurd ra, çend nivîsarên hêja nivîsîne.

— Kebanî û mamoste, Rewşen Bedir-Xan (J. 27)

— Jin û bextiyarî, Rewşen Bedir-Xan (J. 28)

Di stûna ”Rewşa dinyayê” da, Hawarê, xwendevanên xwe serwestî nûçeyên dinyayê dikirin.

Çi dema rojnameyek, kitêbek an kovarek li aliyekî Kurdistanê derdiket, Hawarê, zûka ew nûçeya şêrîn belav dikir. Çi dema komeleyeke(civat) civakî an rewşenbîrî dihate sazîkirin, Hawarê ew mizgîna delal pêşkeşî Kurdan dikir û piştgîriya karên wisa ji wan dixwest:

— Civata arîkarîyê ji bo kurdên Belengaz (J. 3)

— Zarê(Zarî) Kurdmancî (J. 7)

— Rêya Teze (J. 8)

— Şehir û edebiyata kurdî, Refîq Hilmî (J. 34)

— Di radyowê de Weşînekên Kurdî (J. 27)

— Roja Nû (J. 53)

## TARÎX, ERDNIGARÎ Û JÎNA KURDAN A CIVAKÎ

---

Di wan waran da jî, Hawarê gelek nivîsarên hêja belav kirine:

- Siltan Selahedînê Eyûbî, Celadet Bedir-Xan (J. 13)
- Kardox û welatê Kardoxan, Hrekol Azîzan (J. 23)
- Kurd û Kurdistan bi çavê biyaniyan, Herekol Azîzan (J. 19, 23, 24)
- Kurdên Ecemistanê û halê wan, Herekol Azîzan (J. 35)
- Tarîxa Kurdistanê, Osman Sebrî (J. 28-30)
- Zerdeşt û rêya Zerdeşt, Dr. K. Bedir-Xan (J. 26)
- Navên Kurdmanc û cihên Kurdistanê, Hişyar (J. 28)
- Kurdistanê Bakur — bajarên wê, Hişyar (J. 37)
  
- Newrûz, Herekol Azîzan (J. 42)
- Jêliyan ji eşîrên Botan, Herekol Azîzan J. 32)
- Agirî, Osman Sebrî (J. 36)
- Mirdêsan û gawestiyên wan, Osman Sebrî (J. 52)
- Çiyayên Silîvan, Mihemed Cemîl paşa (J. 39)

## KITÊBXANA HAWARÊ

---

Hawarê gelek kitêbên hêja jî didane çapkirin û belavkirin. Di sala 1943-an da Jimara wan kitêban gihiştîye 17-an. Ez kopîya(resim, sûret) wê rûpelê, ku behsa wan kitêban dike, dixim dawîya pêşgotinê.

Hawarê roj bi roj cihê xwe di dilê milletê kurd da ferehtir dîkir. Hîmê zimanê kurdî xurtir dîkir. Gelek kes hînî elfabeya Hawarê bûbûn, pê dinivîsîn. Zimanê kurdî yê nivîskî, roj bi roj geştir dibû, bawerîya millet bi zimanê xwe û bikêrhatina wî kûrtir dibû. Gelek rewşenbîr û xortên kurd, ji her hêleke welêt, nivîsarên giranbiha ji Hawarê ra dişandin. Hawarê bingehe xwenasîn û zanînê her ferhetir û xurtir dîkir. Hawar bûbû nîveka(merkez) tevgerê rewşenbîrî û welatparêzî.

Ez hez dikim vê bendê, bi çend gotinên Hawarê yê giring biqedînim:

*''Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê têne daqurtandin. Ko gihane hev dibin lehî, lehîke boş. Tu kes, tu tişt li ber wan nîkare bisekine. Felata welatê me di rabûna vê lehiyê de ye''(25).*

## CELADET ALÎ BEDIR-XAN

.....

Celadet Bedir-Xan nevyê mîr Bedir-Xan paşa û kurê Emîn Alî bû. Bedir-Xan paşa bi xwe, ji malbata Ezîzan bû. Piştî hilweşîna dewleta Zengî, hikimdariya Cizîra Botan kete destê Ezîzan. Bedir-Xan paşa di 18 saliya xwe da (sala 1821) bû mîrê Cizîra Botan. Di sala 1842-an da wî piraniya Kurdistanê ji zordariya karbidestên osmanî rizgar kiri bû. Di sala 1848-an da, leşkerê osmanî zora hêzên Bedir-Xan paşa birin. Bi vî awayî Tirkan emareta kurdî ya dawîn, emareta Botan jî hilweşandin.(26)

Gelek kurên Bedir-Xan paşa di warê rewşenbîrî û welatparêziyê da, xebateke giring kirine. Ev in çend nimûne:

— Serhildana Kurên Bedir-Xan paşa Osman û Husên Kenan (1879) û di pêra, Serhildana Medhet û Emîn Alî Bedir-Xan di sala 1889-an da.(26)

— Derxistina rojnama kurdî ya pêşîn: Di 22 yê Nîsana 1898 an da, Medhet Bedir-Xan rojnameya kurdî ya pêşîn "Kurdistan" bi kurdî û tirkî, li Qahîrê derxist. Sala 1900, birayê Medhet, Evdirehman, Kurdistan li Cinêv û Folkston derxist. Sureya Bedir-Xan jî, ew li Stenbolê (piştî îlankirina meşrûtiyetê) û di pêra, li Qahîrê- di zamanê Şerê Cîhanê yê Yekemîn da.(27)

— Komelên welatparêzî: Emîn Alî Bedir-Xan yek ji sazkerên "Komela Hevkarî û Pêşketina Kurdistan", 19.9.1908, "Komela Pêşketina Kurdistan", 1918 û "Komela Vêkxistina Civakî", bû. Gelek Bedir-Xaniyên din jî endamên wan komelan bûn(28). Celadet Bedir-Xan bi xwe jî endamê vê komela dawî bû.

Gelek çavkaniyên ku behsa Bedir-Xaniyan dikin, didin xuyakirin ku, Celadet li Stenbolê, di (26.4.1893) da hatiye dinê(29). Karbidestên osmanî rê nedidana Bedir-Xaniyan ku biçine Kurdistanê. Lewra Emîn Alî, mamoste, mitrib, çîrokbêj ... hd. ji Cezîra Botan tanîn Stenbolê, da ku danûstandina wan digel welêt, ziman û adetên kurdî her geş bimîne. Rast e, Celadet, ne li Kurdistanê mezin bûye, lê ew di heyameke kurdistanî da xwedî bûye.(30)

Emîn Alî beg Hakimê ceza bû. Ew her heyamekê li bajarekî ji bajarên dewleta osmanî yên wek Ekka, Nablus, Salonîk û Edirne, dima. Lewra Celadet jî li dibistanên gelek welatan xwendiyê. Ji dibistanê pê ve, bavê wî mamosteyên xisûsî yên zimanên yûnanî, farişî, firensî û rûsî, jê ra tanîn malê. Zimanên erebî û tirkî wî di dibistanan da, hîn kirine.(31)

Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn da, herdu bira, Celadet û Kamiran, bûne serbaz (zabit). Celadet digel ordiya osmanî ya Qefqasê û Kamiran digel a Belqanê, çûne şer.(31)

Di sala 1919-an da berî ku peymanê "Sèvre" di navbera împatoriya osmanî û Hevalbendan da bête morkirin, Celadet û Kamiran Bedir-Xan, Ekrem Cemîl paşa û mêcerê inglîzî Nowel, ji bo naskirina daxwaz û dîtinên miletê kurd, çûne Kurdistanê. Vê serdana welêt, fikra danîna elfabeyêke latînî-kurdî xistiye serê Celadet Bedir-Xan:

*"Di sala 1919 de, me da bû çiyayên Meletyê. Em keti bûn nav eşîra Reşîwan. Mêcer Nowel(ingilîzek) jî digel me bû. Mêcer zarê nîvro dizanî bû, dixebitî ko hînî zarê bakur bibe, û ji xwe re her tişt dini-vîsandin. Min jî hin medhelok, stran û çîrok berhev dikirin. Carinan me li nivîsarên xwe çavên xwe digerandin, dixwendin û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi biêvkirineke biyanî, lê bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend. Lê belê ez, heta ko min (û, 9) ji (o, 9) û (î, 5) ji (ê, 5) h.p. derdixistin, diketim ber hezar dişwarî. Ma çiman? . . . Ji ber ko mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê, di cih de min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên latînî elfabêyek lêkanî. Êdin min bikariya destnivîsa xwe paş hezar salî jî bê dişwarî û weke xwe bixwînim, ji ber ko her deng cihê cihê li ser kaxezê dihat sekinandin."*(32)

Ji ber vê yekê, Celadet dest bi danîna elfabeyêke latînî-kurdî kiriye. Ji ber ku tîpên elfabeya latînî tenê 26 in, wî hin tîpên hevedudanî wek (ou, ch, ai. . . hp). bi kar anîne. Lê paşê, Celadet ew tîpên hevedudanî bi tîpine serxwe ji elfabeya yûnanî û rûsî guhartine. Bi vî awayî, tîpên wê elfabê bûne 36.

Sala 1922-an, dema Kemalîstan fermana kuştina gelek welatparêzên kurd deranî bûn, navê Emîn Alî Bedir-Xan tevî hersê kurên wî: Sureya, Celadet û Kamuran jî, di wê fermanê da hebû. Lewra wan bi lez, Tirkiyê bi cih hiştin. Emîn Alî tevî Sureya çûn Misirê, Celadet û Kamiran jî çûn Elmanya(33). Li Elmanya jî, elfabeya kurdî ji bîra Celadet neçû bû:

*"Sala 1924 a de, li Elmanyayê min careke din çavê xwe li elfabeya xwe gerand, hûr lê mêze kir û mideke xweş li ser xebitîm. Min bala xwe dida û didît ko ev sê texlît herf qenc li hev ne dihatin, herfên yûnanî û rûsî yekrengîya elfabêyê xirab dikirin. Jû pê ve tê de du herf hebûn ko ji me re ne gerek bûn. Ji lewra min elfabeya xwe ji nû ve senifand: Herfên zêde jê avêtin, hin herfên latînî bilindek li*

*wan bar kirin û di şûna herfên yûnanî û rûsî de êxistin. Bi vî awayî elfabêke bi sih û çar herfan û yekreng hate pê.*"(32)

Celadet lîsansa huqûqê qedand û di sala 1925-an da, vegeriya Misirê. Hîngê Suraya gelekî nexweş keti bû. Kamuran li Elmanya ma û doktora temam kir. Celedet pir li Misirê nama, ew hat nik apê xwe Xelîl Ramî yê ku hîngê li Libnanê bû.(34)

Şoreşa Şêx Seîd di sala 1925-an da, ji bo daxwaza mafên gelê kurd, dest pê kir. Lê ji kêmhaziriyê û ji ber hin sebebên din, ew şoreş serdest nebû.

Di sala 1927-an da, gelek hêz, komele û welatparêzên kurd, Komela "Xwêbûn" saz kirin. Celadet jî, yek ji sazkerên wê komelê bû(35). Xwêbûnê xwe ji şoreşeke mezin ra amade dikir. Bi vî awayî, şoreşa Agrî, bi serokatiya Ihsan Nûrî paşa, di sala 1930 da, dest pê kir. Tirkan ew şoreş jî, bi hovîtî pelçiqandin.

Kurdistan bi vî awayî, di nav pênc salan da, du caran hate wêran kirin û sewitandin, bi sed hezaran Kurd hatine kuştin û ji welêt bidûrxistin, bi hezaran welatparêzên kurd welat bi cih hêştin û derbasî perçeyên Kurdistanê ên din bûn.

Dr. Ehmed Nafiz û birayê xwe Nûredîn Zaza jî, hîngê ji wan kesên ku neçar bûbûn welêt berdin û derbasî Sûriyê bin bûn. Dr. Nûredîn Zaza li ser nîrên wê demê holê dinivîse:

*"Piştî ku, bi arîkariya Kurdên Şamê, Firensizan bext da me û rê ji me re vekir ku em li Sûriyê bimînin, em jî ji Helebê çûn Şamê.....*

*Gava em hatin Şamê, mevanên Elî Axa, li ba xwe ji me re cî peyda kirin û bi dilxweşiyeke mezin em hewandin.....*

*Heçî mêvanên derve, ji min û brayê min pêve, ji van peyan pêkhatibûn: Mîr Celadet Bedir-Xan, Qedrî, Ekrem û Mihemed Cemîl paşa û Hemzeyê Miksî. Ev hemî, bi Haco û zaroyên wî ve, endamên Civata Xwêbûnê bûn. Berî hatina me Sûriyê bi çend mehan, gava Ihsan Nûrî paşa li Axrî şerê Tirkan dikir, evan jî hilgirtibû ser xwe ku ji aliyê Sûriyê êrişî Tirkîyê bikin û bavêjine ser bajarên Mêrdîn, Mîdyat, Diyarbekir, Urfa û hin din. Lê ji ber kêmhaziriyê, nedikarîn karê xwe bibine serî û bi şûnde vegeriya bûn. Firensizan jî, bo xatirê Tirkan, ew girtibûn, ji sînora bi dûr xistibûn û ew anîbûn Şamê.*

*Herwekî armanca wan bi cî nehatibû û rê li ber tevgera wan a siyasî hatibû girtin, peyva van camêran, hîngê, ji her tiştî bêtir, li*

*ser pirsên çandî û nemaze li ser xwendin û nivîsandina zimanê kurmancî bû. Her êvar gava mezela rûniştinê dihate dagirtin, bi kêfxweşîyeke mezin, min guhdariya dan û standin û temaşeya pevçûnawan dikir. Celadet Bedir-Xan, elfabeke kurdî, bi tîpên latînî, pêk tanî û dil dikir ku bi van kovarekê derêxe. Ekrem Cemîl paşa, Hemzeyê Miksî û hinekên din tê de pir kêmasî didîtin û bi hişkî lê radi-bûn. Lê herwekî rehetî Celadet bi gelek zimana dizanî, pir li Ewriya mabû, bi ser de jî zor zîrek, bi hiş û huner bû, bala xwe dida rexne û gotinên xelkê û dixebitî ku şaşiyên xwe binase, elfabeya xwe li gora dengên zimên pêk bîne û li gor şîwe û zaravayên têvel rêz û dûzanên bingehîn derêxe. Ew ji zû da li vî tiştî hûr dibû, lê li Şamê ev karê ha, bûbû mijûlahiya wî ya hergavî.”(36)*

Belê, Hawar zaroka wê rewşa dijwar bû, stêrka wê ezmanê reş û tarî bû. Hîngê gelek rewşenbîrên kurd xweş bîrbiri bûn ku, rizgarkirina welêt û millet bi hevgihan û xebata çend malmezin, şêx, axa û rewşenbîran naçe serî. Bê hişyarbûna gel, bê zanîn û xwenasîn, ev karê giring û pîroz, tu havilên hêja nade. Tevî nîrên wê demê yên dijwar û tehil, tevî perîşanî û destengiyê, tevî ku çoyê Firensizan di ser serê Kurdan ra, her diçû û dihat, Hawar ji bo belavkirina hişyarî û zanîne di nav gelê kurd da, bê west xebitiye.

Celadet pir ziman dizanîn, gelekî geriya bû, çanda gelek miletan baş nas dikir. Wî ew zanîna xwe bi temamî, tenê ji bo xizmeta ziman û çanda kurdî bi kar anîye. Ji roja ku hatiye Sûriyê û heta roja ku çûye rehma Xwedê, ji bo vê armanca bilind, xebateke bê west kiriye. Celadet çîrok, çîrçîrok, destan, methelok û stranên kurdî kom dikirin. Ew bi danîna bingehên rêzmana kurdî mijûl dibû. Wî nivîsar, folklor, qeydeyên elfabê û rêzmana kurdî werdigerandin firensizî. Celadet nivîsarên rengareng ji zimanên biyanî werdigerandin kurmancî û nivîsarên ku dihatin ji Hawarê ra, rast dikirin û ji çapê ra amade dikirin.

Ji navê xwe pê ve, Celadet bi çend navên din jî nivîsarên xwe belav dikirin:

*Herekol Azîzan, Xweyîyê Hawarê, Hawar, Stranvan, Stranvanê Hawarê, Bavê Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînem-Xan(37).*

Di herdu jimarên Hawarê yên pêşîn da, nivîsarên Celadet bê nav in.

Di ber karê Hawarê ra, Celadet gelek kitêbên hêja jî nivîsîne. Hinek ji wan di nav kitêbên (Kitêbxana Hawarê) da hatine belavkirin. Eserên Celadet yên wekî din ev in:

— Doza Kurdî: Ev kitêb di sala 1930 da, bi firensizî hatiye belavkirin. Nivîskar navekekî nehîni(Dr. Bileç Şêrkoh) ji xwe ra daniye. Paşê ew kitêb bi erebî



jî, bi navê "El-Qediyye-l-Kurdiyye" li Qahîrê hatiye çapkirin. Dîroknivîsê kurd Dr. Kemal Mezher dibêje ku nivîskarê wê Celadet Bedir-Xan bû.(38)

Doza Kurdî bi navê "Belavoka Komela Xwêbûn a pêncan" hatiye belavkirin. Çapa kitêbê ya erebî ji 113 rûpelan pêk hatiye.

— Dema rojhilatnasê firensî Roger Lescot, di salên 1941-1944 an da li Şamê bû, ew û Celadet bi hev ra xebitîne ku rêzmana kurdî ya ku berê C. B. di Hawarê da belav kiri bû, firehtir bikin û di şiklê kitêbekê da -bi firensîzî- bidin çapkirin. Lê berî qedandina vê xebata hêja, R. L. vegeriye Firensa. Di sala 1970 da wî ew kitêba giranbiha daye çapê. Birê kitêbê yê dawî(syntax, hevoksazî, ristesazî) xebata R. Lescot ye.(39)

— Celadet destnivîsa ferhengekî Kurdî-Firensî jî amade kiri bû, lê hê ew neda bû çapê. Rewşen xanimê ew destnivîs, sala 1971-an, pêşkeşî "Ekadêmiya Kurdî" ya Bexdadê kiriye.(40)

## KOVARA RONAHÎ

Di yekê Nîsana 1942-an da, Celadet Bedir-Xan dest bi derxistina kovara "Ronahî" kiriye. Ronahî birek ji Hawarê -birê wênekirî- bû. Jimarên wê yên pêşîn bi wêne û nûçeyên Şerê Cîhanê yê Diwemîn hatine dagirtin. Lê piştî çend jîmaran, para edebiyat û folklorê kurdî jî, her ferehtir dibû. Ronahî piştî girtina Hawarê jî her derdiket. Jimara Hawarê ya paşîn di 15-yê tebaxa 1943-an da derketiye. Jimara Ronahiyê ya dawî (28) di Adara 1945-an da, derketiye. Lê mixabîn, bi tu awayî, sebebên rawestandîna an girtina wan kovaran nehatiye ravekirin.

Di dawiya jimara 24-an da, Hawarê nameyeke vekirî, "Name bo lawanî kurd le Îraqa" ji xortên Kurdîstana Îraqê ra, belav kiriye. Di wê nivîsarê da, Hawar dide xuyakirin ku, karbidestên Îngilîz nema rê dane Hawarê, ku li Îraqê bête belavkirin. Di wê nivîsarê bi xwe da, Hawar dide zanîn ku nivîsar û şîirên xortên Kurdîstana Îraqê, wek berê(heta jimarên 15-16) nagehine kovarê û ew ji wan hêvî dike, ku ew Hawarê ji nivîsar û şîirên xwe bêpar nehêlin û dest bi dest digel Hawarê ji bo xizmeta ziman û çanda kurdî bixebitin.

Baweriya Dr. N. Zaza ev e:

*"Di sala 1941 an da, Îngilîz ketibûn Sûriyê û dixwestin Kurdan bi aliyê xwe da bikişînin û ji bo tirsandina Tirkan, navbera xwe bi wan re xweş bikin. Ji lewre rê dan ku ji Bêrût û ji Ammanê kurmançî û soranî bêne weşandin û ku Hawar jî, ji nû ve bête derêxistin."*(41)

Lê vê dostaniya Îngilîz û Kurdan pir dirêj nekiriye. Dr. Zaza her dibêje:

*''Elman li Rûsiya her dihatin şikênandin û Tirkiya jî, hêdî, hêdî xwe ji wan bi dûr dixist. Li ber vê guhartina ha, Kurd ji qiymet diketin û Îngilîz jî vedigeriyan dijminîtiya xwe ya berê hember Kurdan. Jê bi şûn da pir derbas nebû ku balafirên Îngilîz Kurdîstana Îraqê dida ber bomban.....''(41)*

Weşanxana ''Jîna Nû'' kovara Ronahî ji nû ve da çapkirin (42)

Kebaniya Celadet, Rewşen Bedir-Xan, dotmama wî ye. Rewşen xanim ji wê demê da, yek ji rewşenbîrên zemanê xwe bû. Ew mamosteya zimanê erebî û midûra dibistanê bû. Hin nivîsarên wê, di Hawarê da dihatine belavkirin. Lê Rewşen xanimê, bi zimanê erebî bêtir nivîsiye. Yek ji xebatên wê yên tevî hêja kitêba Sefehat mîn el-Edeb el-Kurdî ''Hin Rûpel ji Edebiyata Kurdî'' ye.(43)

Di salên (1936-1939) da, Celadet gelekî desteng bûye, Hîngê wî digel xebata xwe ya bingehîn ya li ser ziman û çanda kurdî, karekî din jî kiriye. Di sala 1936-an da, di dibistana sen'etan da li Şamê, bûye mamosteyê zimanê firensîzî û di sala 1939-an da, abokatî kiriye.(44)

Piştî Şerê Cîhanê yê Diwemîn, destengiya Celadet roj bi roj her xurtir dibû. Tevî ku hevalên wî yên halxweş gelek bûn jî, lê wî alîkariya kesî qebûl nedikir. Di sala 1951-an da, Celadet razî bû ku, zeviyên Husên Îbiş (hevalekî wî — ji Kurdên Şamê), bi nêvî, biçîne. Ew zevî li gundê Hecanê (35 kilometran dûrî Şamê) bûn. Celadet didît ku, eger ew zevî bêne avdan, hatina wan dê gelekî bêtir bibe. Lewra, wî dest bi kolana bîrekê kir. Tevî ku av li wê herîmê zû tê der, lê wê bîra, ku Celadet navê ''bîra qederê'' lê kiri bû ava xwe dernedixist. Roja 15-yê Tîrmeha 1951-an, piştî qezakê di wê bîrê da, Celadet çû rehma Xwedê.(45)

Lê navê Celadet Bedir-Xan, xebata wî û eserên ku ji me re hiştine, qet ji bîr nabin.

## KARÊ MIN LI SER HAWARÊ

.....

Di destpêkê da min bawer dikir, ku wergerandina nivîsaran ji elfabeya erebî-farisî, karekî ne ewqas dijwar e. Lê paşê xuya kir, ku dîtina min şaş bû. Ji karekî holê giring ra, ne mirovek an du mirov, belku komîteyeke ku zanîna wê di warê ziman, devok, edebiyat û folklorê kurdî da kûr û bilind gerek bû. Ji ber ku pêkanîna komîteyeke waha, li derveyî welêt, ne hesan e, lewra min ji çend camêran tika kir, ku alîkariya min ji bo xebata li ser Hawarê bikin. Ji bo wergerandina nivîsarên Hawarê yên ku bi Kurmanciya Bakur hatine nivîsîn, Mele Behrî, ji herkesî din bêtir xwe bendewarî wê xebatê kir. Mehmet Uzun, Reşîd Simo Reşo Zîlan, Rojen Barnas, Malmisaniy û Hanefî Celeplî jî bi awayên têvel alîkarî kirin. Ji bo Kurmanciya Başûr(Xwarû, Jêrîn) Dr. Cemşîd Heyderî û mamoste Ferhad Şakelî alîkariyeke hêja pêşkêş kirin. Zirav Cilo jî gelek alîkarî di warê nivîsîna nivîsaran da pêşkêş kir. Ez van hemû camêran û gelek camêrên din jî, yên ku xwe bendewarî vê xebatê kirin, spas dikim. Bi alîkariya wan, xebata li ser Hawarê gelekî baştir û hesantir bû.

Gelek spas ji Meclîsa Çanda Swêdî "Statens Kulturråd" ra ku alîkariyeke hêja ji bo çapkirina Hawarê pêşkeş kir.

Di vê wergerandinê da, gelek tişt hene ku mirov li hember wan şaş dimîne. Sebeba mezin, elfabeya erebî ye. Weke ku min di destpêkê da jî gotî bû, dengdêrên kurt (e, i, u) bi vê elfabê nayine nivîsîn. Dengdêrên (o, û), (ê, î) jî, wekhev têne nivîsîn. Em gotinekê(nimûneyekê) bînin: Gotina "îro". Ev di gelek cihan da, di Hawarê da, "îrû" hatiye nivîsîn. Bi tîpên erebî, ev ferq xuya nake. Ji bo rastnivîsîna gotinên holê, ez vedigerîm nivîsarên wî nivîskarî, yên ku bi elfabeya Hawarê hatine nivîsîn û min ew ji xwe ra, dikirin nimûne. Lê mixabin, ne hercar ev yeka ha dikete destan. Hîngê mirov şaş dima. Tiştên holê gelek in:

Bihar, buhar hingî, hingê, hîngê biha, buha roj, rûj ...

Dema mirov bixwaze gotinekê bi awakî rast û durist wergerîne, divê wergerandina wê jî, bi temamî, wek bilêvkirina wê gotinê, di devokê wî nivîskarî da be, an na, ew wergerandin wezîfeya xwe ya bingehîn -parastina devokên kurdî- wenda dike.

Elfabeya Hawarê, mirov dixê hember hin dijawariyan, nemaze, ji bo wergerandina nivîsarên ku bi Kurmanciya Başûr hatine nivîsîn. Di elfabeya Hawarê da, hemî dengên wî zarî nayine dîtin.

Hincaran, şaşiyên çapnivîskî jî, karê mirov hîn diwartir dikin. Di Hawarê da, kêman, behsa wan şaşiyên hatiye kirin. Ev şaşî di hin nivîsarên ku bi Kurmanciya Başûr û bi elfabeya Hawarê hatine belavkirin da, ecêb pir in. "Ede-

biyatî kurdî” ya Hevindê Sorî yek ji wan e. Eger mirov, ji bo her şaşiyekê têbîniyek (not) binivîsanda, nivîsar bi temamî, ji têbîniyan, dê bihatana dagirtin. Ji ber ku nixweya Hawarê ya eslî jî di vê çapê da heye, lewra min hebûna têbîniyan ewqas giring nedît. Min ew gotin, yekser rast nivîsîne.

Min çend nivîsar wernegerandine:

— Jimar 1: Celadet bi kurtî, li ser elfabeya Hawarê, bi erebî, farisî û tirkî nivîsiye.

— Jimar 6: ”Cewabname, Helîm Rifqî”.

— Jimar 6 û 9: ”Ferhengok”. Ferhengok di van herdu jimaran da, ne kurmancî-kurmancî, belku kurmancî-erebî ye. Ew ji bo hin kurmancên Şamê yê ku baş bi kurmancî nizanin hatiye danîn.

Ji ber hin sebebên teknîkî, min cihê çend nivîsaran guhartiye. Di dawiya gelek jimaran da, min rûpelek an çend rûpelên yekstûnî nivîsîne -ew nivîsar, di rûpelên dustûnî hilnedihatî. Nivîsarên wergerandî jî, qasî mimkin bûye, min ew xistine dawiya her jimarekê. Wekî din xebata min ew bûye ku hertiştên nixweya eslî weke xwe bimînin. Ji bo vê yekê jî, min hin navên ku diviya bûn bi tîpeke girs dest pê bikin, lê ji ber ku ew di nixweya eslî da, bi tîpeke hûr hatine nivîsîn, min ew neguhartine. Ev in çend nimûne: Xwedê, Yezdan.....

Di ferhengoka Hawarê da, tenê gotinên Kurmanciya Bakur hene. Ji ber vê yekê, min ferhengokeke biçûk, ji gotinên Kurmanciya Başûr ra jî, durist kir. Di wê ferhengokê da hin gotinên din jî têne dîtin.

Ji bo hesankirina karê xwendevanan, min nivîsar û şîrên ku di Hawarê da hatine belavkirin(jimar 1-9), tevî navên nivîsakar û şairan, di dawiya vê çapê da belav kirine.

Ji ber çend sebebên, nemaze ji ber van du sebebên jêrîn, ez neçar bûm ku birê Hawarê yê ku bi elfabeya Hawarê hati bû nivîsîn, careke din jî, binivîsim.

1- Min ”q” û ”k” bi hev guhartin. Bi vî awayî, xwendina Hawarê hesantir dibe. Hawar bi temamî, yekrengî dibe.

2- rewşa nixweya eslî ku di destê min da ye, ne ewqasî baş e. Hin tîp bi zorê xuya dikin û bi dijwarî tên xwendin.

Ez hêvîdar im ku cildê diwemîn jî, di demeke kurt da, bigehe xwendevanên hêja.

**Mihemed Bekir**

## NOT

.....

- (1) Xweyîyê Hawarê, Hawar, j. 27, r. 4, Sê tarîxên Hawarê.
- (2) Hawar, Belîna Rojava, çapxana Durshlag, Ilona 1976 an.
- (3) Hawar, j. 1, r. 1, Armanc, awayê xebat û nivîsandina Hawarê.
- (4) Ensîklopêdiya Îslam (Kurd, Kurdistan, B. Learned and written literature) r. 481
- (5) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 17, r. 1-6 (bi tîpên erebî), Xwe binas.
- (6) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 17, r. 1-6 (bi tîpên erebî), Xwe binas.
- (7) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 17, r. 1-6 (bi tîpên erebî), Xwe binas.
- (8) Dr. K. Bedir-Xan, Hawar, j. 1, r. 5, Edebiyata welatî.
- (9) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 3, r. 4, (bi tîpên erebî), Bi hinceta pîroznamekê.
- (10) Pîrot, Hawar, j.10, r. 1, Eksî seday Hawar.
- (11) Xweyîyê Hawarê, Hawar, j. 10, r. 5, Li ser yekîtiya. . .
- (12) H. Sorî, Hawar, j. 11-15, Yekyetîman.
- (13) H. Sorî, Hawar, j. 16, r. 1, Ey lawanî kurd.
- (14) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 20, r. 1, Heyîneke yeksalî.
- (15) M. E. Bozarşan, kovara Jîn(pêşgotin), Cild 1, r. 6, çapa Swêd 1985.
- (16) Dr. Cemal Nebez, Zimanî Yekgirtûy kurdî, r. 83.
- (17) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 2, r. 5, Elfabêya kurdî.
- (18) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 1, r. 2, Elfabêya kurdî.
- (19) Instîtuya Kurdî, Kovara Hêvî, j. 1, r. 8, Pirsên elfabeya kurdî, Parîs 1983.
- (20) Hawar, j. 1, r. 2, Armanc, awayê xebat û nivîsandina Hawarê.
- (21) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 3, 4(birê firensîzî), Le folklore Kurde
- (22) C. Bedir-Xan, Hawar, j. 20, r. 2, Heyîneke yeksalî.
- (23) H. Azîzan, Hawar, j, 33, r. 6, Klasîkên me.
- (24) Hawar, Hawar, j. 17, r. 3, Dersxane.
- (25) Hawar, j, 2, r. 2, Lehî.

- (26) El-Qediyye-l-Kurdiyye, r. 40-51  
Dr. Bletch Şhîrguh, La Question Kurde, ses origines et ses cause
- (27) Dr. Celîlê Celîl, Jiyana rewşenbîrî û siyasî ya Kurdan, r.32, 41, çapa Swêd 1985, weşanxana Jîna Nû.
- (28) Çavkanî 15 r. 20
- (29) Dr. Kemal Mezher, Mêjûy Mêjû, r. 187, çapa Bexdadê 1983
- (30) Mehmed Uzun, Celadet Bedir-Xan, kovara Svenk-Kurdisk Journal, nr. 1-2/1986
- (31) Sadiq Behaidîn, Celadet Bedir-Xan, kovara Korî Zanyarî Îraq, Destey Kurd, cild 7, Bexdad 1980, r. 257
- (32) Hawar, jimar 13, Pêşgotinek, r. 1-2
- (33) Çavkanî 29
- (34) M. Uzun, Arşîva Celadet Bedir-Xan
- (35) Çavkanî 26
- (36) Çavkanî 2
- (37) Çavkanî 31, r. 282
- (38) Çavkanî 29
- (39) Emir Djeladet Bedir Khan et Roger Lescot, Grammaire Kurde(dialecte kurmandji), Paris 1970
- (40) Çavkanî 31, r. 283
- (41) Dr. N. Zaza, pêşgotina çapa Hawarê Li Elmanya, 1976
- (42) Tîrmeh 1985, Swêd
- (43) Çavkanî 31, r. 272-273
- (44) Çavkanî 31, r. 261
- (45) Çavkanî 31, r. 285

# Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyişa Pêxember. Bi Kurdiya dumill, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re  
C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10— Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11— Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12— Dersên Şerietê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13— Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14— Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-  
Xan Paris - 1937
- 15— Le roi du Kurdistan. Qralê Kurdistanê.  
Emir K. F. Bedir-Xan û Adolphe de  
Falgerolle. Paris - 1937
- 6— Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdis-  
tanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlin - 1937
- 17— Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê.  
Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

---

Kiriya Hawarê 500 Qirûşên Sûri

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar: Mir Celadet  
Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

# HAWAR





SAL 1

# HAWAR

HEJMAR 1

YEKŞEMB

15 GULAN 1932

Komela Kurdî \* Revue Kurde

## TÊDEXISTÎYÊN KOMELÊ

Armanç, awayê xebat  
û nivîsandina Hawarê  
Ji xwendevanan re  
Elfabêya kurdî  
Stûna feqehan  
Stûna zarowan: buhar  
Edebiyata welatî  
Hawar hebe gazî li dû ye  
Di dora dinyayê de  
Xatirxwazîya Memî  
Hêvî ji xwendevanan  
Ferhengok

Hawar

Hawar

Celadet A. Bedir-Xan

Celadet A. Bedir-Xan

.....

Dr. K. A. Bedir-Xan

Qedrican

Hawar

Dr. K. A. Bedir-Xan

Hawar

C. A. Bedir-Xan

Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932

## ARMANC, AWAYÊ XEBATÊ Û NIVÎSANDINA HAWARÊ

Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e.

Xwe nasîn ji me re rêya felat û xwe-şiyê vedike.

Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin.

Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin.

Lewma ko zman şerta heyînê a pêşîn e.

Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîti pê bendewar e, dê mijûl bibe. Tinê siyaset jê dûr e, xwe naêxe siyasetê.

Hawarê siyaset ji civatên welatî re hiştiye. Bi siyasetê bila ew mijûl bibin. Em jî di warê zman, hiner û sinhetê de dê bixebitin.

**Awayê xebatê:** Karekî ko bikare biçerî, divêt jê re pronivîsek ango programek bête çêkirin. Me pronivîsa xwe ser bingehên jêrîn lêkiriye.

**1-** Belavkirina Elfabêya kurdî di nav kurdan û hînkirina wê. Senifandina zmanazîna kurdî û hin bi hin di komele de belav kirin û pêşdetir di şiklê kitêbê de derêxistin.

**2-** Sehîtiya zarên kurdî û berhevda-nîna wan. Sehîti ser mirovatîya zmanê kurdî digel zmanên din ên arî. Sehîti ser bingehên zmanê kurdî, ser dîrok û awayê rabûn û pêşveketina wî.

**3-** Berhevkirina çîrok, çîrcîrok û her texlît laje û stranên kurdî û birêve belavkirina wan.

**4-** Senifandin û belavkirina dîwanên kurdî. Bi van ve jînenîgarîyên şair û mirovên bijarte jî dê bîen belav kirin.

**5-** Sehîti ser reqs û qeydeyên stranên kurdî.

**6-** Sehîti ser her texlît rêzikên kurdî û Kurdistanê, yê zemanê borî û yê îro û senifandina wan. Sehîti ser hatinên Kurdistanê û pîş û sinhetên kurdî.

**7-** Dîrok û erdnîgarî:

Sehîti ser tevayîya dîrok û erdnîgarîya welatê Kurdistanê û ser dîroka eşîran, berî, paşî û di wextê Mîr-Şeref de.

**Awayê nivîsandinê:** Di heqê zmanê me de heta niho gelek tişt hatine gotin. Di nav van gotinan de tiştînen rast û nerast jî hene.

Ez ko kurd û kurdmanczman im û zmanê xwe rind dizanim û min ew bi heft heşt zmanên din daniye ber hev, kitkitên wî hûrhûnandine; qeydeyên wî ji hev derêxistine, dikarim ji biyanîyan bêtir û qencitir dehkerê wî bidim xuya kirin û zanîn.

Zmanê me îro hem freh hem teng e.

**Freh e:** Bi her tiştê ko kurd pê mijûl bûne, dest dane wan, di wî warî de zmanê kurdî hing zmanên din û ji hinan bêtir pêş ve çûye û kemiliye, û ji tu zmanên kemilî bi şûnde ne maye.

**Teng e:** Herçî ko ji kurdan nenas mane û kurd pê mijûl ne bûne, di wî warî de zmanê me rawestiyaye, pêş ve ne çûye, di cihê xwe de maye. Lê zmanê me ji wan zmanan e ko ber her tiştê nuh, pirsên nuh dizên û birêve pirsên

nuh ji wan çar dibin.

Herwekî xelkê Geliyê-Goyan, berf çardeh salan, gava tiyare dîtin, tavil bi zarê xwe balafir nav lê kirin. Ji lewre ko ji banî, ji bala difire. Dîsa kurdmançinen ko telêfon dîtin, ji mesmeha wê re bihîstok gotin. Ji ber ko deng pê têt bihîstin.

Niho em vegerin ser gotina xwe, ser awayê nivîsandina zmanê xwe.

Îro di zmanê me de du texlît kêmanî hene: Winda bûna pirsinen kurdî û ketina pirsinen biyanî nav zmên.

Em çî bikin ko zmanê me bikare vege-re ser xurîtiya xwe û di nav zar û zawayên xwe de bikemile û bibe zmanekî tekûz:

Di windabûna pirsan de, pirsin hene yekcar winda bûne, hin hene ji zarekî ketine lê di zarekî din de dijîn û çendek hene di axaftinê de kêm têne gotin lê di mamik, medhelok, çîrok û stranên de têne bihîstin.

Em li pey wan in, hîn bi hîn em wan diêxînin dest û disenîfînin û gora meh-cetê jî ji nuh ve ser awayê hevedudanî-na pirsên kurdî pirsinen nuh çêdikin.

Ji bona pêşveçûna zmên, divêt em bendên xwe bi tevayîya van pirsan binivîsînin û li paşîya her hejmarê ferhengokê danin û tê de mana pirsên ko di zaran de kêm bûne û yên ko ji nuh ve hatine hevedudanîn ji xwendevanên xwe re bidin zanîn. Ji xwendevanên xwe hêvî dikim ferhengoka me qenc bixwînin û di heqê pîsekê de ko fikreke wan hebe ji me re binivîsînin; heke ciyoka pîsekê bizanin, ewa ha jî tev mana û ferqên

wê digel ciyoka xwe ji me re bidin zanîn.

Weko: Rêkirin, şandin, hinartin ci-yokên hev in. Lê di mana rêkirinê de jî mana hinartin û şandinê de ferqek heye. Rêkirin, herhal, bi rê êxistin û şandin e.

Dîsan, xeberdan, axaftin, peyivîn ci-yokên hev in. Gelo di neqeba wan de çî ferq hene ?

Hawar zarokeke nûza ye. Zarowa me ye; zarowa kurdan e. Wek her zaro bi xweyîtiya dê û bav, bra û pismamên xwe dikare bijî. Herkes, her kurd dikare arî-kariya Hawarê bike.

Tukes mebêje ko, ez mirovekî reben û nekêrhatî me. Ji min ji diayê pêve tiş-tek nayê.

Belê tukes vê heberê mebêje, herkes bi tiştêkî, bi awakî dikare bê hawara Hawarê. Tinê dibe ko awayê hawarê nizane. jê re çend awa hene:

1- Kiriya Hawarê bûyîn û jê re kiri-yaran peyda kirin.

2- Navên mirovên xwendewar lê nemaldar, ko nikarin kiriya bibin, û navên medresan ji me re dan zanîn. Da ko Hawar ji wan re herwe bête şandin.

3- Paş xwendina Hawarê ji heval û nasên xwe re dan xwendin û ji mirovên nexwenda re bi xwe xwendin û ew ser têdexistiyên komelê serwest kirin.

4- Ji Hawarê re her texlît şîr û bendan nivîsandin.

5- Çîrok, medhelok û mamikan berhev kirin û ji Hawarê re şandin.

6- Di heqê welat, eşîr, bajar û gun-dên xwe de tiştên kevn û nuh ji Hawarê re rêkirin.

7- Her texlît bergehên Kurdistanê

peyda kirin û digel wesfên wan ji me re hinartin.

Ji gotinên jorîn qenc dixuye ko ji Hawarê re arîkirin gelek hêsanî ye. Kesê ko dil bike dê bikaribe jî.

Di destpêkê de komela me di panz-deh rûjan de carekê dê derkeve. Piştî çend hejmaran komela me dê bibe heftekî û li serê her hefteyê dê belav bibe.

### JI XWENDEVANAN RE

Hawar hawara we ye ,  
Deng û gazîya we ye .  
Jîn û zanîna we ye ,  
Werin, hawara xwe bin .

### HAWAR

### ELFABÊYA KURDÎ

### BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHRIVAN

Elfabêya kurdî ji sîh û yek herfan hevedudanîye:

a b c e ç d i g h x ê j î q k u  
l m n o p r s ş t û f v w y z .

Herf di dengdayîyê de du texlît in: Dengdêr û dengdar. Dengdêr ew herf e ko dixwedeng e, û dengê wê bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne.

Dengdar ew herf e ko dixwedeng e, lê belê dengê wê bi serê xwe û bê arîkarîya dengdêrê dernakeve.

Di zmanê kurdî de heşt dengdêr hene:

a e ê i î u o û

Lewre ko di danganîya kurdî de dengdêrek geh kin û geh drêj nabe, dengdêrên kurdî di drêjahîya dengên xwe de sersekinî ne: kin û drêj in.

Degdêrên kin : e ..... i ..... u

|          |     |     |
|----------|-----|-----|
| e - der  | şer | ser |
| i - kin  | din | bin |
| u - kurd | kur | kul |

Dengdêrên drêj : a ê î o û

|         |     |     |
|---------|-----|-----|
| a - av  | sar | bar |
| ê - dêr | şêr | mêr |
| î - tîr | zîv | şîv |
| o - dor | sor | kor |
| û - kûr | şûr | dûr |

Di zmanê kurdî de bîst û sê dengdar hene:

|          |       |        |
|----------|-------|--------|
| b - bar  | bav   | ban    |
| c - car  | can   | cûn    |
| ç - çar  | çûn   | çem    |
| d - dar  | dan   | dîn    |
| g - gav  | giş   | garan  |
| h - hîm  | hêja  | halan  |
| x - xanî | xêr   | xwarin |
| j - jin  | jor   | jajî   |
| q - qîr  | qenc  | qelî   |
| k - ka   | ker   | kom    |
| l - lo   | law   | lez    |
| m - mar  | mêj   | mak    |
| n - nan  | nerm  | nas    |
| p - par  | por   | pehn   |
| r - rê   | rû    | reş    |
| s - sar  | sebat | sofî   |
| ş - şor  | şev   | şa     |
| t - têr  | taqet | tûj    |

|          |       |       |
|----------|-------|-------|
| f - find | filan | fanos |
| v - vajî | vala  | virnî |
| w - war  | wek   | werîs |
| y - yar  | yek   | yarî  |
| z - zor  | zabit | nafiz |

Ji van pêve du herfên biyanî hene ko birek ji kurdan wan dibêjin. Lewre ko ew herfên ha di eslên xwe de ne kurdî ne. Me ew ne êxistine nav elfabêya xwe. Ew jî (Z) û (Ĝ) ne, me ew du herf bi danîna du deqan ser " h " û " x " nişan kirine.

h̄ - h̄al ..... x̄ - x̄ar

Ko ev du deq ketin ev herfên ha vedigerin ser herfên kurdî û dibin " h " û " x ".

Ji xwe piranîya kurdan şûna (Ĝ) (Z) dibêjin;

xeyîdîn " غيدى " , xeyîdîn " خيدى " .

Hawar dengê zanîne ye. Zanîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike; dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyîna zmanê me dê bide nas kirin. Lewma ko zman şerta heyîne a pêşîn e. Hawar jû pêve bi her tiştê ko kurdanî û kurdîfî pê bendewar e, dê mijûl bibe.

Bi xêzên jorîn ve me rêberî û rêzanîya elfabêya kurdî kuta kir. Ji niho pêde bi hûrhûnandina hevedudanîna wî dê mijûl bibin.

**Dûmahik heye**

## STÛNA FEQEHAN

Pêrar, digel çend hevalan derketi bûm gerê. Çendekê di nav feqehan de mam. Me sê çar medrese dîtîn. Di hin medresan de derketî ji xelkê cih bêtir bûn. Di nav wan de xortên her welatî. her eşîrî peyda dibûn. Serhedî, Heza romî, Botî, Diyarbekrî, Bidlîsî, Mûşî, h. p.

Bi dîtina min gelek kêfxweş dibûn. Ji min ser kurdanî gelek tiştan dipirsîn. Pîranîya wan bi herfên latînî jî dizanî bûn.

Pêkve digotin ko kurdmançî bi herfên latînî gelek qenc tete nivîsandin. Ji bin paşilên xwe pelin derdixistin û ji min re dixwendin. Te digot, hemî jî şair bûn. Şîhrên wan tev ser welêt û millet bûn.

Weko: Bêriya Botan, Zozana Şerevdînê. Girên beriyê, Çiyayên Dêrsimê, Bidlîsa kevnar...

Girêdana wan jî kurdmançî bûn. Ji xelkê cih re jî cilên kurdmançî dabûn wergirtin. Kolosên xwe bi xwe çêdikirin.

Di nav axaftinê da min ji wan re da zanîn ko dilê min heye rûjnameke kurdî derêxînim.

Ji min daxwaz kirin ko ji wan re di rûjnamê de stûnekê vekim. Di vê stûnê de herçî ko di medresan de nayin xwendin, ji wan re bidim zanîn.

Em welê lêkhati bûn ko wan ji min bipirsîn, ez jî gora pirsîyarîya wan behsên ser îlm û hiner ji wan re bêjim.

Feqehino! Ev e stûna we. Hon hema bipirsîn. Herçî ez bi xwe dizanim ji we re bêjim, heke di nav pirsîyarîyên we de

tişteke hebe ko ez pê nizamim, ji wan bipirsim ko pê dizanin û ji we re bidim zanîn.

## STÛNA ZAROWAN

### B U H A R

Buhar e, nuh buhar e  
Tebîet giş li kar e  
Çi heyadedan çi hal e  
Her tişt zendî rewal e  
Buhar e , ev buhar e  
Tebîet giş li kar e

Berf dihele li zozan  
Stirî şin in li deştan  
Kulîlk hêj nuh şepal in  
Gul û bilbil heval in  
Buhar e , nuh buhar e  
Tebîet giş li kar e

Mij ketiye li doran  
Hure-hur e tum baran  
Mih û berxin dikalin  
Kew li marî dinalin  
Buhar e , ev buhar e  
Tebîet giş li kar e

Roj vedide mîna bûk  
Şun ve mane ba û pûk  
Şehar , zinar , lat û ber  
Diçirisin der bi der  
Buhar e , nuh buhar e  
Tebîet giş li kar e

## EDEBIYATA WELATÎ

Edebiyata welatî , ew edebiyat e ko ji jîna miletî, ji hiş û dilê wî, ji dîrok û çîrçîrokên wî, ji stran û laje yên wî hiltêt.

Kaniya wî, dilê milet, hiş û heyata wî ye.

Tinê ev edebiyat e, ko germ, rengîn, bibihn û xwedan ruhnahî ye.

Ji vê edebiyatê, dengê blûr û dîlanê, stranên çiyê, zîzîya hêvîn û hejkirinê bi teptepa dilan ve tîn bihîstin.

Piraniya miletan pirçîcar vê rastîyê seh ne dikirin, ber ne diketin.

Li Ewropayê, miletin hebûn ko hej zmanên xwe ne dikirin. Zmanên xwe biçûk, teng, nespehî û nehêja didîtin.

Ev hal di welatên Rohelatî de jî dihat dîtin.

Herwekî di nav kurdan de, heçî mirovên zana radibûn kitêbên xwe ne bi zmanê kurdî lê bi zmanê biyanîyan dini-vîsandin.

Piştî xebata sedan salan, di Welatên Ewropa û Rohelat de hate seh kirin ko ev rê dernakeve û ev awa naçe serî.

Çiko milet ji wan kitêban re guh ne dida û xebata wan mirovan berxudar ne dibûn. Ber vê yekê ev mirovên ha vege-riyan ser zmanên xwe. Vêca xebata wan zûka berên xwe dan û milet pey edebiyata wan çû.

Bi vî awayî di nav wan miletan de edebiyateke geş û zendî çar bû.

Êdin her kes zana, nezana, bajarî,

gundî ko xwendinê zanî be, zmanê wan seh dikirin û kitêbên wan dixwendin.

Ji xwe welê jî diviya bû.

Ji ber ko ji nivîsandin û belavkirina kitêban qesd ew e ko hiş û fikrên qenc bikevin nav xelkî, di dil û serên wan de cih bigirin.

Ji mesela zmanî pêve meseleke din jî heye.

Herwekî nas e, fikr û his di dora zmanî de digehînin hev, û her zman fikr û hisên xwe û awayê gotina xwe bi xwe re hildigire û ew pê re diguhêzin, û pey zmanên xwe dikevin.

Bi vî awayî digel zmanî fikr û hisên biyanîyan jî tên dikevin nav me, di dil û hişê me de cih digirin, û rû û gonê me ên manewî diguhêrin, diheşifînin.

Paşî vê gotinê, qesda me, awayê edebiyata me ji xwe têt seh kirin, û ew rêya ko tê re dixwazin herin bi xwe vedibe û dikeve pêşîya me.

Vêca divêt ko em bi zmanê dê û bavên xwe, bi zmanê şîrîn û delal, bi zmanê kurdî, bi kurdîya xwerû binivîsinin, û fikr û hisên xwe ji çîrok û stranên kurdî bigirin.

Ji xwe Ehmedê Xanî berî sêsed salî vê rêyê ji me re vekiri bû. Lê heyf paşîyên wî pê ve ne çûn.

Xanî xurtîya zmanê xwe hêj wê gavê hesiya bû, û ji wan re ko pê ne dinivîsandin bi beyta jêrîn dixwest bide zanîn.

*” Sâqî şemirand vexwar durdî  
Mavendî - derî lisanî - kurdî ”*

Êdin çax e, ko em bidin pey Xanî.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## HAWAR HEBE GAZÎ LI DÛ YE

**Ji bona brayê min Osman Sebrî**

Şeveke tarî. Çav çavan nabîne. Qeşa erdê wek gîzanan lingên min ên xwas dibire. Bayê reş carnan dikeve guhekî min û di ê din ra derdikeve. Qet nizanî ko li kû me ? Heyîna xwe bi lêxistina gopal li erdê dizanim. Ev çend roj û şev e bi vî awayî diçim, dawî nayê, ji welatê berf û bagerê xelas nabim...

Belê, îşev jî wek her şev tarî ye. Berf û bager ji awakî li min dide. sar e, dimezmidim. Tewş e, livîn di min nema, deng ji min dernayê. Tinê sê dangan min kire gazî û hawar !..

Gelo, ev xewn e ? Çavên xwe vedikim bawer nakim. Lê dizanim ev deng, dengê kurê min e. ” Bavo! Bavo! ”

— Ha kurê min ez li kû me ?

— Bavo! Bavê min li mal e, çima çavê xwe venake?

Dîsan bi tirs ko min çavên xwe vekir min dît ez li mala xwe, di nav zarowên xwe, li cihê xwe me. Kurê min (Hîng-ran) li ber serê min runişt û got:

— Bavo, gava ko romo welatê me dişewitand tu hê li kir bûyî. Ji ber vê yekê me xort û canan hevdu girt û dijminên xwe qels kir, me welatê xwe ava kir. Divêt ko bavê me jî bihata. Lê te xuya nekir, ji xwe min xewna te jî dîtî bû ko tu di tengasiyê de yî; tu li me ”Hawar!” dikî. .

Min şal û şapikê xwe tev şidand û çaxê zinaran derbas kir, ez hatim. Min dît



ko bavê min ji serma û pûkê qefiliye;  
dilê te tinê davêt; hema min bavê xwe  
girt û pirtûgên xwe lê şidand û me rêya  
mal girt. Ev çend rûj e em hatine; dê  
rabe; îcar tu me bi jîn ke !

Jiyîn çiqas delal e  
Di nêv bav û biran da.  
Dil heye ko ne nale  
Ber birînên riman da.

Ev birîna riman e  
Barekî pir giran e  
Kezeb, gurçik ne mane  
Li pepûkên xwehan da

Hawara me vaya ye,  
Xewa bêkêr bela ye,  
Qet şik têda ne ma ye,  
Di gotinên yaran da.

**Qedrican**

## DI DORA DINYAYÊ DE

Bê şik e ko xwendevanên me ji mijû-  
layîya me a bingehî pêve dê dil bikin ser  
her tiştên dinyayê serwest bibin. Me ev  
stûna ha ji bona wî vekir. Ji hejmara  
duwim ve emê dest pê bikin û xwende-  
vanên xwe ser bûnebûwên dinyayê ser-  
west bikin.

## XATIRXWAZÎYA MEMÎ

Mem got, dê kerem ke ezbenî tu  
Dêka min î tu, ne bay î wek dû,

Qedre te erê gelek giran e,  
Mem qedre dêyan gelek dizane.  
Ser pêşir û sîng û paşila te

Germî kê dida ? tinê dilê te  
Dadê tu yî tu, tu dadika min,  
Destê te hejand mehdika min.

Alos î erê, erê tu dê yî ;  
Fêkê te me, ez tu dar û ra yî

Dadê megirî xwedê piyar e,  
Lawê te ye Mem ji dê re yar e

Mak î erê tu, tu yî dilovan  
Lingê te de Mem peşb e, qurban

Iznê bide min ko dilbirîn im.  
Dadê ji te re keça te bînim.

**DR. K.A Bedir-Xan**

Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan, Memê Alan bi awakî  
nû nezimandîye. Hin menzûmeyên wî di Hawarê de  
bêne belav kirin. Ev menzûma ha yek ji wan e.

## Hêvî Ji Xwendevanan

### *Ji bona Elfabêya kurdî*

*Em, ji îro ve, elfabêya kurdî rûpel bi  
rûpel di komelê de belav dikin. Pêşde-  
tir di şiklê kitêbê de bêt derêxistin.*

*Ji vê belavkirinê qesda me ev e ko her-  
çî xwenda û zanayên kurdan hene, rûpe-  
lên elfabê yek bi yek, xêz bi xêz, pirs bi  
pirs, bixwînin, qenc bala xwe bidin û her  
çî kêmanîyan bibînin ji me re binivîsî-  
nin, da ko em wan kêmanîyan rast  
bikin.*

*Jû pêve, ez ji wan tiştêkî din jî hêvî  
dikim. Ji min re ji bona her rûpelê pir-  
sînen nû peyda bikin û rêkin.*

*Li rûpela pêşîn me sê herf danîne (a  
d r) û bi van çend pirs çêkin. Dibê ko*

*bi van herfan pirsinen din jî bèn çêkirin. Di rûpela duwim de herfên me bûne pênc (a d r e m) me bi wan jî çend pirs dîtin. Heya ko hinekî din jî peyda bibin.*

*Bi vî awayî xwendevanên me dikarin bi me re bixebitin û elfabêya me biedilînin û qencitir bikin.*

*Ji pirsan pêve gora herfên her rûpelê cimleyên spehî û bihikmet, mamik û medhelokan jî bi kêrî me tên. Lê divê ko xwendevanên me xwe bilezînin û heta heft, heşt rûjan cuhabên xwe bigehînin me. Da ko di hejmarê duwim de em bikarin wan belav bikin.*

## F E R H E N G O K

### ARMANC

Her tiştê ko ji bona avêtina nîşanê têt daçikandin. Paşîya tiştê ko çavê mirov lê ye û dixwaze xwe bigehîne wî: Berikê wî li armancê ne ket, armanca Hawarê pêşxvestina zmanê kurdî ye.

### BENDEWAR

Pêgirêdayî: Heçî kurd hene hemî jî bi kurdên Îraqê ve bendewar in.

### ERDNIGARÎ

Ilma ko bi her awayî wesfa erd û dinyayê dide; çiya, çem, deşt, bajar, tendûrek, gol, newal h.p. Erdnigarîya kurdistanê.

### BINGEH

Hîm û eslê tiştêkî: herçend zmanê kurdî û farisî di kikitên xwe de ji hev vediqetin lê di bingehî de digihin hev.

### CIYOK

Pirsên ko mana wan nizingî hev an wekhev in: wek rêkirin û şandin.

### DEHKER

Rastîya tiştêkî ko bi temamî û ji binî ne nas e û carinan veşartî ye: Ji gotina xelkî re guh mede dehkerê meselê ez dizanim.

### DÎROK

Pêşîya tiştêkî an mirovekî. Dîroka dinyayê gelek kevn e. Dîroka jîna Selahe-dîn bi serê xwe dinyayek e.

H.P..... Heta paşî..

### JÎNENIGARÎ

Awayê jiyînê û tevayîya biserhatîyên mirovekî jînenigarîya wî ye.

### PRONIVÎS

Her tiştê pêkhatî, nivîsandî nenivîsandî, ko awa û rêveçûna xebat û kerekî nîşan dide, û berî destpêkirinê têt çêkirin: Me pronivîsa xebata xwe pêkanî, êdin divêt ko em dest bi xebata xwe bikin.

### FERHENGOK

Ferhengok komela tevayîya pirsên zmanekî ye. Ferhengok ferhenga kiçik e ko tê de pirsinen wî zmanî peyda dibin. Ferhenga kurdî, ferhengoka Hawarê.

### ZMANAZÎN

Tevayîya qeydeyên zmanekî zmanazîna wî zmanî ye.

Herwekî me di serstûna xwe de got pirsin hene ko ji zarekî ketine lê di yekî din de dijîn. Ji Lewre dibe ko di nav bendên me de pirsinen din jî hebin ji hin xwendevanên me re nenas in.

Em ji wan hêvî dikin bila ji me mana wan bi pirsin. Da ko di ferhengoka hejmarê duwim de em bikarin mana wan jî bidin.

**KIRIYARÎYA KOMELÊ**

Kiriyarî: Ji bona Sûriya, Tirkiya,  
Ecemistan, Îraq û welatên Qefqasê:

Salekî 500 Qirûş-sûrî

Şeşmehkî 300 Qirûş-sûrî

Sêmhkî 175 Qirûş-sûrî

Ji bona welatên din :

Salekî 150 Frenk

Şeşmehkî 090 Frenk

Sêmhkî 050 Frenk

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Şam : Taxa Kurdan

**Xweyî û midirê berpirsiyar**

**Mîr Celadet Alî Bedir-Xan**

SAL 1

ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 2

1 HİZÊRAN 1932

Komela Kurdî \* Revue Kurde

## TÊDEXISTÎYÊN KOMELÊ

|                  |                     |
|------------------|---------------------|
| Civata arikariyê | .....               |
| Tola welêt       | .....               |
| Lehî             | .....               |
| Ta, tawî û tabir | Dr. Ehmed Nafiz     |
| Xanî             | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Elfabêya kurdî   | C. A. Bedir-Xan     |
| Du egîd          | Dr. K. A. Bedir-Xan |
| Ferhengok        | C. A. Bedir-Xan     |

## BIRÊ WERGERANDÎ

|             |             |
|-------------|-------------|
| Gundê Nûava | Qedrican    |
| Berdêlk     | Osman Sebrî |

Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932

## CIVATA ALÛKARÛYÊ JI BONA KURDÊN BELENGAZ

Vê paşîyê di jiyîna miletê kurd de tiştê mezin, biesas û xêrkar hatiye çêkirin. Kurdên Cizîrê ji bona xweşkirina halê kurdên belengaz civatek bi navê jorîn danîne.

Pêrûz ji wan re, pêrûz. Xwedê mala danîyan ava û xweş bike û şolê wan bibe serî.

Bi vê civatê ji kêmasîyên me ên bêhejmar yek ji nav hate hilanîn. Devê kortaleke kûr ko her rûj jiyîna me dikot, rayên me dicût, pê hatiye girtin.

Ji vê civatê re herwekî danî di pêşgotinka nizamnamê de dibêjin, ji herkesî bêtir em, miletê kurd, hewcedar bûn.

Pêşgotinka nizamnamê sebebên danîn û çêkirina civatê ji me re gelek qenc dide zanîn.

Min jî dil kir xwendevanên xwe serwest bikim. Da ko ew jî wek min pê dilşa û kêfxweş bibin.

Ev e pêşgotinka nizamnamê:

” Kurdino! Em miletê kurd, ji her kesî bêtir hewcedarê arîkarîya hev in. Ji me re ewçend zanîn û hiner û hinerwerî jî divê. Ji lewra ko em ji bêxweyîti û berberîyê ketine binîya kortala nezani û belengazîyê. Ji bona ko em bikarin bên ser xwe û ji vî halî bifilitin, divê em destgîrên hev bibin, xwe bidin ber barên hev û yekdil û yekdeng qerara xwe bidin. Ew qerara ko me hemîyan ji nezani, ji belengazî, ji zîvarî û ji dilîyê dê xelas bike. Danîyên vê civatê hêvîdar in ko hon bi tevayî bi wan re biçin, ji ya wan bikin, pişt bidin wan û bixebitin, da ko ev karê hanî ê qenc û reha-

kar biçe serî.

Tu şik nîne, heke hon holê bi me re bixebitin, miletê me zû bi zû ji vî halî xelas dibe û rûj bi rûj birêve ber bi qencî û avahîyê ve diçe.

Madam heta îrû ji nav me ew dewlemendên camêr derneketine ko bi derbê hezar zêran bidin û ji bona miletê xwe dibistanan û binyanên xêrê çêkin, divê em xwe bi xwe bixebitin û bi yek du qirûşên xwe wan hezar zêran bidin hev.

Ev qirûşên ha ji me re, ji welatîyên me re rêya xwendin û zanîn û ya xweşîyê dê vekin. Ev yek du qirûşên ko hon ji civata xwe re bidin ji bona her yekî we ne beha ne. Lê ko gihane hev bi kêrî miletê me tên û pê gelek tişt çêdibin. Bi qirûşên we dibistan tên çêkirin, malek pê ava dibe, dermanên çend nexweşan pê tên kirin, û hon bi dayîna wan feqîr û bi nedayîna wan dewlemend nabin.

Xebata me, xebata danîyên civatê destpêkirin û rêberî ye. Civat bi arîkarîya we, bi têkil bûna we ava û xweş dibe, û karê civatê bi vî awayî diçe serî.

Bê şik e ko heçî hej miletê xwe dikin û di rayên wan da xwîna kurdî a pak digere arîkarîya civatê ji bona wan deyn e, deynekî mezin, bilind û miqedes e.

Ji xwe her kes deyndarê miletê xwe ye, ji ber ko ewî ew bi xweyî kiriye, ji ber ko her kesî nanê miletê xwe xwariye û her kes dizane ko ” Nanê mêran li mêran bi deyn e ”. Werin, xwe bilezînin û deynê xwe ji miletê xwe re bidin”.

Gotinên danîyên civatê li hire xelas

dibin.

Ji van gotinên gewherîn re gelek tişt nînin ko em bikarin zêde bikin. Tinê di heqê rayên civatê û ser awayê arîkarîyê divêt em çend pirsan bibêjin.

Sernîveka civatê di Hesîçê de ye. Di her bajar û gundên mezin ên Cizîrê de malikên wê hatine vekirin û hin bi hin vedibin.

Sernîveka civatê ji bona danîna dibistanekê û lêkirina xestexanekê ji niho ve xwe kar dike.

Heç ko arîkarîya civatê bikin arîkarîya xwe dikarin rast bi rast li Hesîçê ji sernîveka civatê re bişînin.

Arîkarîya civatê bi her tiştî dibe, ne tinê bi pere. Çaxa benderê nîzîng e. Xwedan gund û cotkarî dikarin ceh û genim jî bidin. Heke ji sernîvekê re şandina wan dişwar e, dayî dikarin bidin nimînendeyê civatê ew jî digehîne civatê.

Nimînendeyê civatê li Şamê Dr. Ehmed Nafiz beg e, ko kurdên Şamê hemî jî rind nas dikin.

## STÛNA ZAROWAN

### T o l a W e l ê t

Welat! welat! kanî xweşî ?  
Qewî îrû tu nexweş î.

Kanî ew ken, kanî geşî ?  
Çîman wilo wek dilreş î ?

Çîman wisa tu bêmad î ?  
B'kurê xwe re xeber nadî ?

Kul û kûvan ji her alî ;  
Lewra welat wer dinalî .

Destên tirko li te ketin ;  
Bi xwîna te sor bûn repin .

Mîr û mela dar ve kirin ;  
Xort û xurtan ji te birin .

Ez ko kurd im ji bîr nakim .  
Bi xwîna xwe divê rakim .

Ez bixwînim, xwenda bibim ;  
Mezin bibim, zana bibim .

Mêrkuj bibim bi nav û deng ;  
Ez hilgirim top û tifeng .

Tola te jî evda te jî ,  
Dê hilînim doza te jî .

Şam: 7 Tîrmeh 1931

## L E H Î

Tifaq û yekbûn, zexmî û xurtîya civatê ye. Nifaq û berberî qelsî û jariya wê ye.

Divê cihanê de her tişt her mezinahî bi tifaq û yekbûnê, bi dayîna hev berbarên hev, bi hevghana mirov û bi hevghandina xebatên wan hatine pê.

Milet û dewletan bi tifaqê gihane bilindîya her tiştî û bi nifaqê ketine binîya kortala neyînê.

Ji lewre mirov dikare bibêje heyîn di tifaqê de, neyîn di nifaqê de ye.

Xurtî û zexmîya yekbûnê di lehîyê de gelek qenc têt dîtin.

Ma lehî çî ye?

Lehî ji hevghana dilopên baranê pêve ne tu tişt e. Peşkên baranê gava ji

hev cuda û yek bi yek dikevin rûwê erdî, erd wan dadiqurtîne, tihnîya xwe pê vedikujîne. Lê gava digehin hev, hingî ji wan peşkên qels lehîke boş radibe. Dilop û peşkên baranê di yekbûnê di tifaqê de ne.

Erdê dilopxwer êdin di destên wan de lehîstokek e. Ew serdestên erdî ne. Bi erdî re dileyizin; sînga wî qul dîkin, têdikevin, bilindiyên wî hildiveşînin, kendalên wî diqelişînin.

Lehî wek hûtekî har û hêç radibe ser xwe, ji pal û kaş û newalan dadixure. Li ber wê tu kes, tu tişt; bican, bêcan nema dikare bisekine. Lat, zinar, kevir, rêl, dar, direh serên xwe li ber xurtîya tifaqa dilopan ditewînin û lehî, ew şahinşehê yekbûnê ewan mîna çilowên sivik dide pêşîya xwe, rêş dike, dimale.

Halê kurdan jî ev e.

Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tîn daqurtandin. Ko gihane hev dibin lehî, lehîke boş, tu kes, tu tişt li ber wan nikare bisekine.

Felata welatê me di rabûna vê lehîyê de ye.

**Bêrût: 28 Tebax 1929**

## STÛNA FEQEHAN

### TA, TAWÎ Û TABIR

Yekî ji feqehên deşta Hesinan ji me nexweşîya tayê pirsîyar dike. Me pirsîyarîya wî da bijîşkê xwe û jê cuhabekê daxwaz kir. Ev e, reşbeleka feqeh û cuhaba bijîşkî.

*Deşta Hesinan: 23 Gulan 1932*

*Ezbenî ! Min stûna xwe -stûna feqehan- xwend. Gelek tişt hene ko divêt em ji te bipirsin. Heval nav hev de şewirîn û me got bila pirsîyarîya me a pêşîn nexweşîya tayê bibe. Da ko em jê xelas bibin, eqlê xwe bidin ser hev û bikarin tiştînen din jî bipirsin. Ji lewre ko ji tayê eqlê me ne ser hev e, em jê gelek aciz in.*

*Paşî, ez destên te maç dikim û hêvîdarê cuhaba te me.*

*Hesenê Koçer*

### Cuhaba bijîşkê me:

” Xelkê deşta Hesinan ji hesinî çêkirî bûwana jî diviya bû heta niho di veytûna tayê de bihatana helandin. Herwekî dihelin jî.

Ji xwe birê welatê me ê germîyan û deşt ji vê afetê xerab dibe. Gava ji xelkî têt pirsîn, xelkê nezan dibêjin ko nexweşî ji ava gundî ye. Nik dilê wan ava wan ne paqij e, bijehr e, herçî vedixun pê dikevin.

Lê ne welê ye. Ew ava zelal û şîrîn ko di ber gundê we re dibore û gundê we pê şên û ava dibe, di eslê xwe de pakij e, avîje ye, kanîya jiyîna we ye. Jehr û

nexweşî di nezani û tiraliyê de ye.

Niho divêt ji we re bidim zanîn ew avên pak ko kanîya jiyînê ne, çawan nepak û jehr û axû dibin.

Herwekî nas e, gava av serberdayî diherikin, li deştan belav dibin di çal kortal û di her cihên nizm de dipingirin, ji wan pingavan berpê dibin. Pingav bizemanî ve dibin çirav, di dora wan de giya, stirih û zil şîn dibin. Di nav wan de pêşî (kelmêş) cih digirin, hêlînên xwe çêdikin. Jê difirin tên li ser dest, rû û laşên me datînin, bi me vedidin. Mirovên pêvedayî di nav (6-21) rûjan de pê dikevin û dibin tawî.

Di destpêka nexweşiyê de laş û leb-tên mirov dişkên, direcifin, piştire germ dibin. Halê nexweşiyê ji sê çar saetan heta sê çar rûjan dom dike û bi xwêh dankê derbas dibe, pêşdetir ev halê ha an her rûj an di serê du sê rûjan de car-kê vedigere tê. Heke nexweşî derman nakin pêde diçê û dibe (taya-veşartî). Di taya-veşartî de rengê nexweşan zer dibin, xwîna wan diçikin, zikê wan dîperçifin, dikevin halekî ecêb, dibin wek meşkekî vala ser du darikan an ser qeysikekî daçikandî. Di vî şiklî de nexweş zû bi zû namire lê ji derba xwe dikeve, bi kêrî tu tiştî, tu kesî naye. Ne mal, ne zar û zêç, ne welatê wî jê tu fêde nabînin. Perîcar ji avînê jî dikeve, zarowên wî nabin, ko bibin jî nexweş û kêmsihet dertên. Bi tiştêkî kiçik dimirin. Ji bona wî jiyînê din namîne. Heta ko Ezraîl bê hawara wî di nav êş û tehlîyê de dîperpîte, vedigevize.

Evê ha şikle e. Şiklekî din jî heye jê

re (taya-xebîs) dibêjin. Di taya-xebîs de şiklînen giran hene ko di nav sê çar saetan de dikujin. Ev şiklî perîcar di zarowan de têt dîtin.

Ev e ta. Hon dibînin ko ta nexweşî-ke giran û xedar e. Ji tîfo, kolera û ji webayê xirabtir e. Nexweşîke welê ye rayê heyîna me, rayê heyîna miletî dikoje.

Bi gotinên jorîn qenc xuya kir ko ev nexweşîya xedar ji pêşîyan, pêşî ji pingav û çiravan têne pê, lê tucar ne ji ava zelal ko xwedê pesna wê di quranê de da û di heqê wê de (we cehelna minel maî kule şeyîn hey) me her tişt bi avê jiyandine, gotiye.

Vêca ko me kanîya nexweşiyê peyda û dijminê xwe bicih kir divêt ji bona kevandin û qelandina wî bixebitin.

Me goti bû ko ta ji pêşîyan, pêşî ji pingavan çar dibin, lê ne ji avê, ji xwarinê an ji fêkî û terahîyan.

Belê dijmin pingav e. Ji lewre ko pingav û ava men hêlîna hêkên pêşîyan in. Icar divêt em bala xwe bidin di dora xwe de tu pingav û çiravan mehîlin. Ji bona wê jî divêt, avên sekinî bêne herikandin, çiravan bêne zuwa kirin, di dorê de herçî zil, stirih û giya hene bêne jêkirin û digel rayên xwe xeritandin.

Ko av herikîn, çirav zuwa bûnê din pêşî nikarin hêkên xwe li dorên me berdin. Ji me dûr dikevin em jî ji tayê xelas dibin.

Ji bona zuwa kirina çiravan awakî qenc heye. Ew jî danîna darên Evkalip-tos e. Ev darên ha ji nik hikûmetê pey-



da dibin. Divêt jê bêt daxwaz kirin. Herçî avên biçûk, mirov dikare li ser wan gazê birêşîne.

Nexweşîya tayê ji her wextî bêtir di çaxa fêkî û benderê de boş e, ji lewre, xesma di wê çaxê de divêt mirov ji xwe re miqate bibe.

Xebata bîngehî herwekî me got herikandina avan û zuwandina çiravan e, lê ji hêlekî din bi standina dermanên tabir mirov dikare xwe jê biparêze. Dermanê tabir silfato ye, berî ewilî silfato dermanekî erzan e. Di pişt re hikûmet herwe belav dike. Silfato erzan me be jî herhal jiyîna we jê bihatir e.

Vêca ji bona parastinê di çaxa tayê de yanî ji havîna pêşîn heta payîza paşîn divêt mirov di heftiyê de du caran, serê her sê rûjan gramekî silfato bixwe. Mirovên silfatoxwarî ji pêşyan bêne pêvedan jî bi tayê nakevin. Heçî bi gotinên min ve çûn tucar nexweş nakevin. Lê heçî ko pê ve neçûn û nexweş ketin divêt xwe nîşanê diktorekî bikin. Heke diktore ne ket dest divêt xwe bi xwe derman bikin.

Awayê dermankirinê jî ev e:

Mirovên gihaştî ji hebên silfato -her hebê wî çarîk gram- her rûj çar heb, zaro heta deh salî sê heb, şeş saetan berî halê nexweşiyê, serê saetê hebek distînin. Zarowên yeksalî tinê niv heb distînin.

Bi vî awayî heftîkê xwe derman dikin. Piştî heftîkê du heftiyên din dermanê xwe sê rûjan distînin û sê rûjan berdin. Ev e, ta, tawî û tabir. Heke hon ji ya min dikin nexweş nakevin, ko bikevin jî zû bi zû qenc dibin.

**Dr. Ehmed Nafiz**

## X A N Î

Ew nûr e, herê li erdê şîhrê  
Şîhra me ye, şîhra bendewarî

Seydayê me ye, melayê yekta,  
Ava kiriye bi şor, qesran,

Parîsê gulî bi şorê kurdî,  
Ava te dikir melayê xanî.

Bê zêr û kevir, ji pêta arî.  
Ava te dikir serayê şîhrê.

Gewher ew e, ew û can e bistam,  
Destpêkire ew, û da ew encam.

Ruhnahî te da, li erdê kurdan,  
Ruhnahîya te, delala yezdan.

Hêvîn tu î, tu çavê sayda,  
Ferzane î tu û lawê mewla.

B'sazê, te dikir, te da wê cûşîş  
Ey hişvekiro! te da wê xwaşiş.

Şeştarê te ye, ko da me zanîn,  
Firdews li kû ye, bihar û havîn.

Gul, bilbil û ney meqam û jale,  
Tev de dikirin fixan û nale.

Zêrker tu î tu ne pîlewer tu,  
Seyda yî herê, û ser hiner tu.

Meywa te xweş e û avdar e.  
Wek Xanî kî ye? tu kes nikare.

Bercîs tu î tu, tu rêberê me,  
Textê te di dil û ser serê me.

Tirba te ne ax e, canê Xanî.  
Tirba te dil e û cawîdanî.

Rehmet bi te ye û pesna yezdan,  
Heyrana te ne, xulam û xaqan.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## ELFABÊYA KURDÎ

-2-

Herwekî di gelek tiştan de têt dîtin dibe ko di cara pêşîn de di elfabêya me de jî kê m û zêde hin kêmanî dê bikevin ber çavan.

Ev kêmanîyên ha di eslên xwe de ji kêmanîyê bêtir paşîya hin kotekîyan in ko mirov ji wan nikare xwe bide alî.

Ji lewre piştî dan zanîna elfabê divêt awayê hevedudanîna wê û kitkitên bingehên wê bèn ravekirin. Da ko xwendevanên me qenc têbigehin ko ew kema-nîyên ha herwekî me got ne kêmanî, lê di azîna elfabê de tiştinen adetî ne.

Ev benda ha ji bona berhevdana wê hatiye nivîsandin. Lê, berî destpêkirina berhevdanê divêt herçî esas û bingeh hene ko ji me re bûne hîm û elfabê li ser wan hatiye danîn bêne xuya kirin.

Me ev bingehên ha di dora şeş destû-  
ran de gihiandine hev.

I- Ji wan niqtan pêve ko xasê denga-nîya zmanê kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabê-ya tirkan nîzing xistin û jê ne dûrketin. Armanca elfabê sekinandina dangan li ser kaxezê bi şiklan e, şikl bi herfan tèn nîşan kirin, û herf qebalewî û bihemd in. Ji lewre nîşankirina dengê (ڤ) bi (ç) û yê (ڤ) bi (ç) û bi hevguhartin û cihgu-hastina wan wekhev û bêferq e.

Lê bi vî awayî kurdên welatê jorîn û heçî ko elfabêya tirkî dinasin dê bika-rin bê dişwarî ya kurdî hîn bibin û komel û kitêbên me bihêsanîtî bixwînin.

II- Herçend dibe, ewçend dengên her-fên latînî ên adetî ko di zmanên din de nas in, di elfabêya kurdî de hilanîn û neguhartin. Bi vî awayî kurd dê bika-rin elfabêya biyanîyan û biyanî ya me bi hêsanîtî fêr bibin.

III- Nîşankirina her dengî bi herfeke serxwe û ji awayê herfên hevedudanî xwe dûr xistin. Bê şik e ko hînbûn, xwendin, nivîsandin û lêkdana herfên serxwe ji yên hevedudanî hêsanîtir e.

IV- Her dengî bi herfeke cihê nîşan kirin, yanî ji awayê nîşankirina çend dangan bi herfekê an dengê bi çend herfan, xwe dan alî

Ev awa ji fikra çêkirina elfabekê bi hindik herfan an ji qesda qenc liserse-kinandina danganîyê dikare bizê. Lê pê her du jî nakevin dest û di zmanî de bila sebeb pirsinen di şiklî de ciyok peyda dibin û di nivîsandinê de tevlihevîke mezin berpê dibe.

Ji xwe di tu zmanî de danganî û nivî-sandin ne lêvên yek in, û nivîsandin nikare bi tevayî li danganîya wî zmanî bê. Lewre ko kitkit û rengên danganî-yê bi elfabêyê nayin nîşan kirin û li ser kaxezê sekinandin. Welê bûwa diviya bû elfabêya her zimanî ji (50-60) herfan hevedudanî bibe.

V- Herçend heye, ji barkirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî.

Nîşan ji hêlekê di nivîsandinê de bi vegera qelemê wextî dide winda kirin. Ji hêla din bi jibîrkirina nîşanê herf vedigerin ser şiklên xwe ên eslî, bînîşan,

û tevlî-hev dibin. Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev jî dişwarîke din e. Ji lewre ji bona tevayiya herfên binîşan me ev ( ^ ) pejirand, û bilindek nav lê kir. Ji ber ko dengên herfan hem diguherîne hem bilind dike, û ji nîşanên wek (.,-,') qenc têt veqetandin. Ji xwe boş bûna nîşanan nivîsandinê kirêt dike.

VI- Herfên welê bijartin ko di şiklên xwe de li hev bên û bikevin hev. Ji lewre diviya bû ko em di nav herfên latîni de bimînin û ji elfabêyên din wek yûnanî û rûsî herfan megirin. Me jî welê kir û elfabêya xwe bi hindik guhartina dengên herfên latîni û bi barkirina hinan bi bilindekê çêkir. Bi vî awayî û gora destûrên jorîn me elfabêya xwe bi sih û yek herfan hevedu daniye. Herwekî di destpêkê de me da zanîn. Sehîtiya ko di her sê zarên kurdî de hatine çêkirin xuya kirine ko di zmanê kurdî de dengên bingehî ev sih û yek deng in. Ew jî bi van sih û yek herfan hatine nîşan kirin. Belê, herfin hene ko geh zirav, geh stûr, geh ji pêşî, geh ji paşîyê tên xwendin. Lê ev ferqên ha ne ji guhêrîna cihderka dangan, lê belê ji guhêrîna rengê dangan têne pê, û ji lewre di elfabêyê de nayin nîşan kirin. Ji ber ko elfabê tinê dangan nîşan dike, ne rengê dangan.

Ezê bi dengdaran dest pê bikim, ji sih û yek dengdarên kurdî, dengên hevdehên jêrîn, di elfabêya her zmanî de, bi ferqên kiçik, yek in.

**b d g h k l m n p r s t f v w y z**

Tinê di elfabêya tirkî de (q) û (w) nînin, Ji ber ko di zmanê tirkî de denginen cihê

wek (v) û (w) ; (k) û (q) nayin dîtin. Dengê herfa (w) ji xwe di tirkîyê de peyda nabit.

**dûmahik heye**

## DU EGÎD

Du egîd çû bûn şerê welêt û dîl keti bûn. Gava ew birin nav koma dijminan, serên xwe dan ber xwe. Seh dikirin ko Kurdistan winda bûye, eskerê kurdan şikestine, revîne û serekên wan hatine girtin.

Her du egîd li ser van xeberên tehl digiriyan û yek ji wan digot:

— Çiqas ez têşihim, birîna min çiqas dişewite.

Ê din digot:

— Stran vemirî, govend sekiniye. Min jî divê ez bi te re bimirim, lê di pişta min de jin û zaroên min hene, bê min dê perîşan bibin.

— Pîrek ji bo min çî ye? Zaro ji bo min çî ye? Pêteke bilintir di dilê min de rabûye. Pîrek û zaro heke birçî ne, berde bila herin bigerin, welatê min, welatê min winda bûye.

— Bra hêvîyek ya min ji te heye, heke ez niho mirim, laşê min bi xwe re bibe, û min li erdê Kurdistanê veşîre.

Kolosê min dane ser sînga min, tifînga min bi destê min û xencera min bêxe ber pişta min. Ez dixwazim wisa rakevim û bibihîzim, wek nobetdarek di gorînê de, heta ko dengê topan û şehîna hespan bên.

Dema reprepa hespên egîdên kurdan di ser tirba min re biborin û dengê tîfîng û topan bên, ez bi çekên xwe ve ji tirba

xwe, xwe hilavêjim, ji bo standina welatê xwe!! ji bo standina welatê xwe!!...

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## FERHENGOK

### Azîn

Awayê tevayîya zanînekê an tişteki. Azîna elfabê, yanî tevayîya qeyde û destûrên ilma elafabê. Berdêlka wê di zmanê Elmanî de "lehre" ye.

### Berhevdan

Ser tişteki, ji bona diltijîkirina hevdu şexalî û sehîti kirin. Bi saetan ve me da ber hev lê dîsan me dilê yek tijî ne qir.

### Berpê-bûn

Hatin pê. Ji serxwebûna welateki re xebateke mezin divêt, serxwe bûn bê xebat û fedakarîyê berpê nabe, nayê pê.

### Binyan

Ji her texlîti avahîyê re binyan têt gotin. Xanî, burc, qesr, olî, mizgeft h.p.

### Bihemd

Heçî ko ne bêhemd e.

### Boş

Zehf, gelek. Li ser welêt baraneke boş hat.

### Bijîşk

Ewê ko bijîşkî dike. Bi xweşkirina jiyîna mirovan mijûl dibe û wan derman dike.

### Dibistan

Ew dera ko tê de hîn dikin. Di dibistana gundê me de deh zaro hene.

### Dişwar

Ne hêsanî, zehmet.

*Dişwar e gelek belayê xurbet,  
Binve, kezeba min binve lo lo !*

*Emîn Alî Bedir-Xan*

### Dil

Ne aza, girtî, hesîr.

*Dîlê dîlana te me  
Îşev mêvanê te me  
Sibe ser rêka xwe me.*

### Doz

Dehwa û daxwaz, paşîya daxwazê .

*Xwelî li ser te dikim,  
Dest bi deng û ceng dikim.  
Doza Şeng û Peng dikim,  
Dehwa şerîet dikim.*

### Geşî

Halê geşbûnê. Geş, ew tişt e ko bi ruhahî ye, bel û vekirî ye.

*Bihnûnîya dewleta te geş bit,  
Qasî tu hebî dilê te xweş bit.*

*Emîn Alî Bedir-Xan*

### Gewherîn

Ji gewherî çêkirî, wek gewher.

### Havîna-pêşîn

Meha salê a çaran. Ji xwe kurdmanc mehan bi du awan bi nav dikin. Bi navên serxwe û bi navên çaxên salê.

|                   |                 |
|-------------------|-----------------|
| 1 - Adar          | Buhara-pêşîn    |
| 2 - Nîsan         | Buhara-navîn    |
| 3 - Gulan         | Buhara-paşîn    |
| 4 - Hizêran       | Havîna-pêşîn    |
| 5 - Tîrmeh        | Havîna navîn    |
| 6 - Tebax         | Havîna-paşîn    |
| 7 - Îlon          | Paîza-pêşîn     |
| 8 - Çirîya-berî   | Paîza-navîn     |
| 9 - Çirîya-paşî   | Paîza-paşîn     |
| 10- Çîleya-berî   | Zivistana-pêşîn |
| .....             | Kanûna-berî     |
| 11- Çîleya-paşî   | Zivistana-navîn |
| .....             | Kanûna-paşî     |
| 12- Sibat (gecok) | Zivistana paşîn |

### Hêsanî

Ne dişwar. Ji bona her kesî zmanê wî hêsanî ye, ne dişwar e.

### Qebalewî

Bi qebale, û gora dilxewaz an lihevhatinê çêkirî, ne kotekî.

### Kotekî

Tiştêqî bêhemd, bi zorê, bivê nevê. Ez nedîçûm, kotekî ez birim.

### Kûvan

Êş, kul, keser.

*Sed ah û kûvan û keser,  
Heft eyn û lam çûn j' hicretê.  
Feqehê Teyran*

### Nimînende

Evê ko heyînek an heyîna tiştêkî dini-mîne, raber dike.

### Pejirandin

Ji tiştêkî re ko têt dayîn an gotin herê kirin û pê ve çûn, qebûl kirin.

### Ravekirin

Ji binî, ji rayî vekirin û dan zanîn.

### Rehakar

Ewê ko rehayê, xweşiyê dide.

### Tol

Evd, evdin, heyf.

### Têgehîştin

Qenc fehm kirin û berketin. Herçend tu bibêjî jî ew têngagehit.

## GUNDÊ NÛAVA

Avên herikî.. Baş û beşçe... Di nav van beşçeyan de her texlît darên biber, li ser van daran ji her cisnî (cinsî W.) çivîk pev diçin û bi her zmanî dixwînin! Ji van çivîkan a ko kezeba min dişewitîne û hindir li min diperitîne; şalûl e. Bejin û xwendina wê ruhniya çavê min û qînata dilê min e.

Gundê me di nav van rezan ji panz-deh malan heqîd daniye; wargeê (wargeyê, wargehê W.) me, mezela civata gundê me ye.

Paşîvan li ser wargeh, navrojan di nav mêrga rezê me de em dicivin. Pirs û galgalên me teva pev xweş in.

Kula welat, çima holê giran û ji bîr na be? Heta niho me digot: Em bê der

û poxan in, ji lewre hergav birînên me  
diaxivin û ji hesreta erdê, û kalan û  
bavan em dîn dibin, vêca me çi divê?  
Gund gundê me, bexçe û baxên me.  
Tekûz e, hertişt, hertiştê me!

Ma qey wisa ne? Carekê werin, hin-  
dirê min verojin dilê min jê derînin û bi  
kêreke tûj çînî çînî bikin, wê gavê ev  
çînyên dilê min ewê bêne peyivîn û pê  
re bêne girîn. Lê dizanim hon xwe nagi-  
rin hêstirê çavên we, ewê çemê Amêdî-  
yê derbas bike. Şûnda honê bizanin ko  
ez ne tenê dilketîyê xweşikîya şalûlê me.  
Ez dilketîyê dengê wê me jî ko jiyîna me  
ya der li der di nav nikilên xwe da tew-  
tew dike û bi vê dawîkilamê dawî tîne.

Xweyî bin li gundê Nûava gundê we,  
mizgîn û hawara bajarê we!!

**Qedrican**

## B E R D Ê L K

*Ji Qedricanê canbira ra*

Jiyîn xweş e bi xurtî  
Li Kurdistan bi kurdan,  
Bav û biran; çi bikim?  
Hemû min tê bi derdan.

Min dil tucar ne nalî  
Min zar tucar ne kalî  
Bi dilhişkî bi lalî  
Sînga xwe da ber riman.

Min îşev dît xewna rast  
Deng û gazî çi xweş hat  
Digot rabin kurdino !!  
Tev biran û tev xwehan.

Derban li me tu zanî  
Rim nîne giş nezani  
Xopan kirin kurdanî  
Ev tiral û nezanan.

Hawarê, xweş awa kir  
Dilê kurdan pê şa kir  
Zar û ziman awa kir  
Jîn û xweşî belav kir.

**Osman Sebrî**

Kanîya Ereban 18-5-1932



SAL 1

# HAWAR

HEJMAR 3

ÇARŞEMB

15 HİZÊRAN 1932

Kovara Kurdî \* Revue Kurde

## TÊDEXISTÎYÊN KOMELÊ

Hevxistina zmanan  
Şeva we xweş  
Quncika bijîşkî  
Elfabêya kurdî  
Silêman Bedir-Xan  
Ferhengok  
Dibistan

Dr. K. A. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan  
Dr. Ehmed Nafiz  
C. A. Bedir-Xan  
Qedrîcan  
C. A. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan

## BIRÊ WERGERANDÎ

Lavelav  
Pîrozname  
Bi hinceta Piroznamekê  
Ma çiman diçî

Dr. K. Bedir-Xan  
Hamid Ferec  
C. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan

Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932



## DI DORA HEVXISTINA ZMANAN DE

Gava xwedê dinê afirand û ew ava kir, jê re intizam da. Ji lewre ko bê intizam tu tişt nagehe, nameşe, tucar nikare heta paşyê bimîne.

Her tiştên dinê di destên qanonên xwedê de ne. Tu tişt nikare xwe ji fermanên qanonan dûr biêxe jê bifilite. Her tişt bindestê wê ye.

Intizam ji nizamê derdikeve, û nizam ji qanonê. Qanon ew tişt e ko, bisemt, birê, bicih û rast e. Xwe her car naguhêre, lisersekinî ye, herwekî rabûye, welê jî pêşve diçe. Her tişt û awayên wê abadinin.

Qanon du texlît in. A pêşîn, ew e ko ji mêj ve, ji berî ve, ji ber xwedê ve hatiyê danîn, yanî danîyê wê xwedê ye. A din ew e ko ji ser û mêjîyê mirovan, ji hiş û jiyîna wan, ji dîrok û rêzikên wan têne pê. Ev qanonên ha qanonên civakî ne.

Di vê dinyayê de, zayîn û mirin, ciwanî û pîrî, rabûn û ketin, her tişt bi hikma qanonan çêdibin. Buhar û Havîn, Paîz û Zivistan, rûj û şev, boş bûna bayî, barîna baranê. Hatina berfê, hemî bi qanonên xwedê diqewimin.

Tu kes li ser qanonên xwedê ne xweyîyê hikm e, qanonên civakî li ser civat û miletan xwedan hikm in. Ev qanonên ha, dikarin biguhêrin, bikevin şiklekî din. Ji ber ko xwedê bi guhêrîna wan ferman kiriye. Bî vê guhêrîne civat û miletan pêş ve diçin, dikemilin.

Dîroka dinê raberê me dike ko gelek millet keti bûn dîfîyê, bi sedan salan ve

tê de ma bûn. Pêşdetir bi xebat, bi camêrî, bi zanîne ew milletên ha, xwe ji dîfîyê vekirin, ji bin nîrê bindestiyê rabûn, xwe aza kirin û bûn serxwe.

Ma kî heye ko nizane, xwedê hesin çire afirandiye? Xwedê ew afirandiye ji bona ko dil ne dikir, tu millet, ne yek jî, xulamîtîya miletekî din bike. Xwedê hesin afirand ji bona ko milletên dîl, pê qelem, tîfing û şûr çêkin û xwe ji bindestiyê, ji nîrê dîfîyê bifilitînin.

Heye ko mirov ji xwe bipirse, ma çiman xwedê miletan neyarên hev dike. Cuhaba vê pirsîyarîyê hêsanî ye.

Lewma ko ji qanonên xwedê yek jî şer, qrên û pevçûn e. Xwedê dixwaze, ê xurt, ê baqil, ê zana, ê kêrhatî di dinê de bimîne û hevsara wê bêxe destên xwe. Her dema jiyîna me, her helqelka me, her gava xebata me şerek e.

Ne tinê em, çarwa û giya jî di şer di hevxiştinê de ne. Jiyîn û mayîna me tinê bi xebat û bi hevxiştinê ye. Yê ko, xwe ji xebat û şerî dide paš dikeve çalê, dikeve gorina mirinê.

*Zman jî wek her tişt li hev dixin, neqeba wan nîne, di şerî de ne. Ji ber ko her zman dil dike mezintir bibe hawîrdorên xwe veke, bikeve lêvên nû, serên nû, Ev yek. Jû pêve zman dixawazin, zmanên din bikujin û bikevin şûna wan. Dîroka dinê ji me re dide zanîn ko heta niho gelek zmanên dinê hatine kuştin. Ji wan zmanan re "Zmanên mirî" dibêjin.*

*Pevçûn û hevxiştina zmanan kereker*

û bêdeng e.

*Belê, ev şer, bêdeng e, bê top û tîfing, bê balafir û mitralyoz e. Lê belê hikma wî ji her şerî bêtir, mezintir û xirabtir e.*

*Di şerê zmanan de, rihê zmanan tên standin, xurtîya dil û canên wan tên şkê-nandin û pêta heyîna wan tên vekuştin.*

*Zmanên ko li hev dixin dest bi kuştina pirsên hev dikin. Dil dikin, herçend heye ewçend bikevin hindurê zmanên din, tê de cih bibin hêdî hêdî bikevin kûrîyên wî zmanî û di paşîyê de çarnîkarên wî bigirin, ewî jî hîm û rîknên xwe hildiveşînin û ser xerabeyên wî binyaneke nû ava dikin û tê de, di nav wê avahîya nûjen de dibrûskin.*

Herçend zmanê me ne keti be jî bin vê talûkeyê, heke em miqate mebin dê bikeve.

Berî ewilî gelek pirsên biyanî hene ko ketine nav zmanê me. Gelek kurd zmanê xwe ji bîr kirine, pê nikarin bixwînin, binivîsînin. Ev hal davîya hevxiştina zmanan e.

Ma zmanê me ne spehî ye? Ma Kurd xwendin û nivîsandinê nizanin? Ma ji bo her tiştî nav û pirsê kurdî nîne? Çawan nîne?

Belê heye. Lê belê, kurd û zmanê me di hevxiştina zmanan de me hinek kêm kiriye.

Gelek kurd hene, ji zarên xwe re pirsînin biyanî têkil dikin. Heçî holê çêdikin xwe davêjin bin hikma zmanên biyanîyan.

Kurd halê şerî rind dizanin. Dijmin bi derbekê perîşan nabe. Di hevxiştina

zmanan de jî holê ye.

Her pirs kozîkek e, û her pirs ko em pê emel nakin ji zmanê me dikeve û winda dibe, li şûna wî pirsêke biyanî tê û dikeve, welê kozîkek ji destê me diçe. Bi pêveçûna vî halî kozîk yek bi yek ji destê me dertên û paşê bi tevaî em şargeha xwe wenda dikin. Yanî zmanê me wek mirovekî birîndar, nexweş dikeve û dimire. Vêca ji bona vejandina zmanê me divêt kurd hemî, gava daxêvin, an dinivîsînin, bala xwe bidin, û pirsên ne kurdî tev li zmanê xwe mekin.

Bi vî awayî, zmanê me pirsên xwe ên jîbîrkirî an windabûyî ji nû ve peyda dike. Ji milê din jî pirsên nû dizên û halo zmanê me vedigere ser xurtîya xwe a pêşîn .

Miletêkî dîl ko zmanê xwe winda ne kiriye, wek girtîyek e ko mifta zindana xwe bi xwe re hilaniye.

Zmanê me gelek kevn e, zmanekî dewlemend, spehî û freh e. Lê em zmanê xwe rind nizanin. Me ew hêj nas ne kir. Berî her tiştî divêt em hîne zmanê xwe bibin da ko bikarin wî nas bikin û bidin nas kirin.

*” Ev meywe eger ne abdar e.  
Kurdmançî ye, ev qedere li kar e.”*

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## STÛNA ZAROWAN

## Şeva We Xweş

Şev e, şev e; roj çû ava  
Hingûrê re cihê xwe da.

Roj safirî ket li doran,  
Soringa wê ma li boran,

Lê, şûna xwe vala nehişt,  
Hêv û stêrik şandin ji pişt.

Hêdî hêdî hilhatine,  
Li ser seran xweş hatine.

Ber bi me tên ji zozanan,  
Belav bûne li ezmanan.

Hatin hatin pêrgî-hev bûn,  
Pêwr û mêzîn rengî-hev bûn.

Xemilandî geş û şîrîn,  
Dinêrîn me ji kakeşîn.

Deşt û newal mîna sih in,  
Pozên çîyan wek birih in.

Xuya nakin herçî dûr in,  
Herçî gir in, tev de hûr in.

Xewa min têt xewa şîrîn,  
Li min xweş e, cih û nivîn.

Himbêz bikim dayîka xwe,  
Ez xwe bidim landika xwe.

Hêvî dikim sibeke geş,  
Guhdarino şeva we xweş.

**Celadet Alî Bedir-Xan**  
Şam: 18 Tîrmeh 1931

## Kuncika Bijîşkî

## Nexweşî û Dermankirin

Hesenê Koçer ji me nexweşîya tayê pirsî  
bû. Di hejmara paşîn de me peydabûn,  
belavbûn û dermankirina nexweşîyê ji  
xwendevanên xwe re bi benkeke dirêj û  
digel her texlît kitkitên wê da bû zanîn.

Di nav gund û eşîrên kurdmancan de  
ji tayê pëve her celeb nexweşî têne dîtin.  
Lê, ew ne wek ta ne ko bi hin tevdîran  
ji binî bêne qelandin. Digel vê hindê,  
mirov dikare xwe ji wan nexweşîyan jî  
biparêze. Lê îrû danînka me ne ew e.  
Danînka me a îrû dermankirina nexwe-  
şan e.

Di bakurê Sûrîyê de ji Cizîra mîr  
Şeref heta rojavayê Cerablîsê bi sedan  
gundên kurdmancan û eşîrên kurdmanc  
hene ko bê dîktor in. Hêj tu dîktor pê  
li wan ne kiriye. Heçî nexweş dikevin bi  
destên tebîbê kurdmancî têne derman-  
kirin. Carinan, lê kêm, diçin bajaran û  
xwe nîşanê dîktoran dikin. Tebîbên  
kurdmancî, ev dîtorikên ha tiştan  
dizanin ko carinan bikêrî nexweşan tên  
Lê ne her gav.

Piştî dayîna cuhaba Hesenê Koçer li  
dermankirina nexweşên xwendevanên  
hawarê fikirîm. Min ev awa ji xwe re saz  
kir. Nexweşên xwe ji dûr ve di vê kun-  
cîkê de dermankirin. Nexweşan nexwe-  
şîyên xwe ji min re binivîsinin ez jî di  
rûpelên Hawarê de şîratan (şîretan w.)  
bidim wan.

Di dîktorîyê de ji bona ko dîktor  
bikare li ser nexweşîyê vebe divêt nex-  
weş wesfa nexweşîya xwe jê re qenc bidit

zanîn.

Ber vê yekê û ji bona hêsanî kirina wesfdana nexweşiyê min ji nexweşan re pirsiyarîyên jêrîn pêk aniye.

Nexweşên ko awayê dermankirina nexweşiyên xwe ji min dê bipirsin divêt yek bi yek li pirsiyarîyên min ên jêrîn vegeerînin

1- Çend salî yî?

2- Ji kengêve nexweş î?

3- Nexweşîya te çawan dest pêkir?

4- Ji çi teşîhî? Ku derên te teşîhin?

5- Nexweşîya te pêde diçe an carinan rahe dibî?

6- Di dema nexweşiyê de çi dihesî?

7- Heta niho te xwe nîşanê diktorekî kir? ger te kir diktorekî çî gote te û çî derman daye te?

8- Bêrîya niho bi nexweşîyeke din keti bûyî? Ger pê keti bûyî bi kûjan û kengê?

Eve pirsiyarîyên min. Heçî li wan qenc vedigerînin qenc jî tî derman- kirin.

**Dr. Ehmed Nafiz**

## ELFABÊYA KURDÎ

-3-

Herçend di hin pirsên erebî de ko keti- ne nav zmanê tirkî ji (ك) pêve (ق) hebe jî, tirk van du herfan cihê cihê bilêv nakin, (ق) a erebî gora danganîya zmanê xwe wek (ك) ke stûr dixwînin û herdukan ji cihderkekê derdixînin. Ji ber vê yekê van her du dangan bi herfa (k) nîşan kirine û herfa (q) yekcar ne existin nav elfabêya xwe.

**W-** Herwekî me got di elfabêya tirkî

de (w) jî nîne. Tirk dengên (w) û (v) wek- hev bi lêv dikin û (و) a erebî wek (v) a kurdî û fransîzî dixwînin. Lê di zmanê me de herfên (v) û (w), herwekî di zma- nê ingilîzî de heye, cihê cihê têne dîtin û kurd dengên van her du herfan ji cih- derkên cuda derdixînin.

Gelek pirsên kurdî hene ko bi guhê- rîna van herfan û bi ketina wan li şûnê hev di mana wan pirsan da ferqînen mezin têne pê, wek niho:

kevandin kewandin

dev dew

vir wir

ava awa

evî ewî

Herwekî têt dîtin me dengê (ف) bi (v) û yê (و) bi (w) nîşan kirin. Niho divêt em texmîna wan tiştan bikin ko di heqê awayê nîşankirina wa de dikarin bîn gotin.

Di paşîya vê bendê de sê cedwel hene. Cedwela pêşî ji me re nisbeta herfên kurdî nîşan dide.

Gora wê cedwelê di zmanê me de nis- beta (v) 329/33798 û ya (w) 557/33798 e. Yanî di qisekê ko (33798) herf hene (v) (329) û (w) (557) caran derbas dibe.

Jê dixuye ko di zmanê kurdî de (w) ji (v) bêtir e. Ji lewra, me dengê (ف) bi (w) û yê (و) bi (v) nîşan bikirana çêtir ne dibû? Bi vî awayî me dengê van du herfan ji dengên xwe ên navmiletî- ko îrû wek dengên wan ên adetî têne hesêb dûr bixistana.

Dûrxistina dengên herfan ji dengên xwe ên adetî, gora destûra me a duwîn, tinê di kotekîyê de, an bi destxistina

fêdeke mezin de, bihata çêkirin.

Kotekî yekcar nîne, fêde hebe jî gelek kiçik e, ne welê ye ko em ji bona wê destûreke xwe a bingehî feda bikin.

Belê (v) bi yek dran e, û (w) bi du dranan e. Lê her du jî bi derbkê, bi liveke qelemê tên nivîsandin, ne ko (v) bi derbekê û (w) bi du derban.

Jû pêve di danganîyê de (w) du (vv) tê hesêb, bi vî awayî deng û şiklên wan jî lihevtên. Ji xwe di zmanê frensizî û di hinên din de (W) re (double v) yanî (du car v) dibêjin

Y- Ev herfa ha di hin zmanan de carinan dengdar û carinan dengdêr e. Herwekî berdêla wê a erebî (ع) jî carinan dengdêr û carinan dengdar e. Me ew, tinê bi dengê xwe ê dengdarî exist nav elfabêya xwe.

Yar - diyar - derya - beyar  
Ev herfa ha di nav pirsên kurdî de gelek hindik têt dîtîn. Perîcar dikeve navbera du dengdêran û wan digehîne hev

|       |         |       |
|-------|---------|-------|
| Derzî | derzîya | Zînê  |
| Rê    | rêya    | welêt |
| Ba    | bayê    | kur   |
| Tilî  | tilîyên | wî    |

Ji hêla din ev herfa ha hîn bi hîn dikeve nav zmên û pêde meyildarîya ketinê dike. Di zmanê kurdmancî de gava pirsêke ko paşîya wê bi (o) an (û) tê, dengdareke biyanî dibit (w) yek dikeve navbera wan û wan digehine hev.

Parsû, vê parsûwê, parsûwa stûr  
Çilo, vî çilowî, çilowê ter

” Dûmahik heye ”  
**Celadet Alî Bedir-Xan**

### Silêman Beg Bedir-Xan

Silêman beg, kurê Xalid beg Bedir-Xan e. Di (1890) mihacirîyê de hatiye dinê, li Stenbolê di Siltanîyê de xwendîye, xortekî jîr, eqilmend û delal bû, ji miletê xwe gelek hej dikir.

Vê paşîyê yekî ji hevalê min ji min re şihreke wî da bû. Ev şihir li ser Kurdistanê, li ser welêt hati bû nivîsandin. Min jî bi vê hêncetê dil kir serhatîya Silêman begî di vê kuncikê de vejînim û pêre navê wî ji winda bûnê xelas bikim.

Hejkirina welatê wî jê ra bû bû îmanek. Herwekî-di şihra xwe-di beyta jêrin da dibêje:

*Hiba welat ji îman e  
Ax Kurdistan ax Kurdistan!*

Hesreta welat, jê re bûbu kulekî mezin:

*Eşqa welat dil şewitand*

*Can û ciger tev peritand*

Her çend welatê biyanîyan lê xweş dihat. Lê halê zozan bi awakî din didît:

*Herçî welat wek şekir e*

*Halê zozan şîrîntir e*

Gava ev ax û kesera ha ji dil hat û di şihra xwe da:

*Sed ah! ji destê firqetê*

*Sed ah! ji bo vê hicretê*

Nivîsand kesî lê mêze nekir qerara xwe a dawî da:

*Heta kengê vê xurbetê*

*Da em biçin nav miletî*

Û bêtirs çû nav welat, heval û hogirê xwe.

Ji bona dîtina welat, wî cehd kir. Xwedê jî jê ra miyesser kir. Di nav xortên kurdan da ruhê kurdîtyê tehimand,

ji wan re xwendin û rêya rast nîşan da. Lê, hezar esef xwedê pê ra nebir serî. Emrê wî di wê rêyê da nîv qurmiçî bû, bû qurbana gula tirka, rûvîyê wî li ser sungîyê tirak geriya...

Belê, Silêman beg bi ciwanî serê xwe di rêya welat da da. Bîst û du salî bû. Lê, hesreta welat pê ra ne ma. Digel vê qasê rêya xwe ne qedand. Lê bi nêvî kir, fikr û serhatiyên wî ji bona xortên kurdan, bû dersek.. dersek bi ibret.

Îrû xortê me yên ko Silêman begî dinasin hemî jî bi serê wî sund dixun û dixwazin wek Silêman begî di rêya felata welat da bixebitin. Ger wê rêyê ne qedînin jî tubeis ji aqîbeta Silêman begî ra nine. Xwedê ki barana rehma xwe lê bike û me jî bi rehma wî şa bike

**Qedrican**

## F E R H E N G O K

### Civakî

Yê civatê, bi civatê re girêdayî, xwe dighîne civatê, rêzikên civakî, qanonên civakî. Yanî ew rêzik û qanonên ko jiyîna me a civakî digerin.

### Zar . Zarawa

Zman, birê zmanekî. Di zmanê kurdî de sê zar hene. Zarê Dumilî, Zarê Lorî û Zarê Kurdmançî.

Zarawa, di nav yek zarî de awayên gotinê û bilêvkirinê.

### Yekîfî . Yekbûn

Yekîfî, pêk û lihevanîna kitkitên tişte-kî ko di hîm û bingehên xwe de ji yek rayî ne, ne cuda ne. Ko bi yekîfîyê digihin hev û bi tevayî heyînek ditînin pê,

û êdin ji hev venaqetin.

Yek bûn, yek bûn jî wek yekîfî ye. Lê di yekbûnê de ew tiştên an kesên ko hatine lihevanî an dayîn hev, dibe ko ne ji yek rayî bibin û rûjkê ji hev vebin û veqetin.

### Dotmîr

Keça mîr. Di rêzika Kurdistanê de herçî torin û maqul gora rêzên xwe dihatin bi nav kirin. Wekî niho: Mîr, Mîrek, Pismîr, Dotmîr, Dêmîr, Jinmîr, Axa, Pisaxa h.p.

### Liservebûn

Naskirin, karin bi nav û nîşan kirin. Bijîşk li ser nexweşîya min venebû yanî nikari bû bizane ez ji çi têsihim, nexweşîya min çi ye.

### Xwenda . Xwendewar

Her kesê ko xwendin û nivisandinê dizane xwenda ye. Lê xwendewar ew kesê ko gelek xwendîye û di vî warî de xwenda behre bûye.

### Vên

Bi tevayîya xurtîya dilê xwe xwestin û li ser sekinîn, pê biqerar bûn.

*''Sifatên di seb'e ji bo zilcelal  
Bizan heft in ey arifê pur kemal;  
Xweşî, şîn û zanîn û vên û kelam  
Bihîstin digel dift bû temam.''*

*Ehmedê-Xanî*

### Niktezan . Niktebêj

Ewê ko nikteyan dizane û dibêje. Filan kes niktezan e. Behvan Niktebêj e. Nikte ew gotin e ko mana wê ji bona herkesî ne kifş e. Têgehiştina wê hinek dişwar e. Bi awakî welê lihevhatiye ko mana wê yekcar rast mebe jî, dîsan kêfa mirov jê re têt. Ji xwe spehîtiya wê jî di wê de ye.

Herwekî xwendevanên me dizanin navbera Şêxê Barzan û hikûmeta Iraqê ser e. Kurdên Barzan vê paşiyê çend balafirên Iraqê daxistine. Di nav zabitên balafiran de inglîz jî iraqî jî hebûn. Barzan iraqî kuştin û dest bi îngilîzan ne dan. Xelkî jî Şêxê Barzan pirsîn:

— Te çire iraqî kuştin û inglîz hiştin, iraqî misilman, inglîz file ne; diviya bû tu inglîzan bikujî û iraqîyan hilîni. Şêxê ciwan û niktezan li wan vege-rand û got:

— Min jî lewma kuştin. Ji ber ko ez naxwazim xirabî li xelkî bikim. Min misilman kuştin, ew bûne şehîd û bi destê min çûne bihuştê. Min inglîz bikuştana, ji lewre ko file ne, biçûwana dojhê.

### Nûjen . Kevnar

Nûjen, Herçî ko ji nû ve hatiye çêkirin, çaxa çêkirin û danîna wî ji me ne dûr e, ji me re nas e. Ne kevnar.

Kevnar, Her tiştê kevn, lê ewçend kevn ko dema çêkirin û danîna wî ji me dûr e, ji me re ne nas e, di zmanê pêşyan de çêbûyî. Ne nûjen.

### Abadîn

Tişt an kesekî ko davî û paşya wî nîne, naye, her gav dimîne, tucar wînda û xirab nabe. Heyîna xwedê abadîn e, ji ber ko xwedê herwekî ne zaye, namire jî. Ehmedê Xanî bi Memo-Zînê, navê xwe di dîroka Kurdistanê de abadîn kiriye.

### Vejanîndin

Ji mirinê anîn jiyînê. Ji nû ve jiyîn dayîn.

*”Şerha xemî-dil bikim fesane,  
Zînê û Memî dikim behane.*

*Nexmê we ji perdeyê derînim,  
Zînê û Memî ji nû vejînin.”*

*Ehmedê-Xanî*

### Cejn

Şahînet, roşahî, îd. Cejna te pîrûz be.

## D I B I S T A N

Dibistan ew dere ko em tê de dixwînin. Wek dibistana gundê me.

Di dibistanê de mamhoste û zarowên gundî hene.

Ji zarowên dibistanê re şagirt dibêjin. Ez jî şagirtek im. Lewra ko diçim dibistanê û dixwînim.

Her rûj subehî şagirtan kitêb, defter û qelemên xwe didin hev û diçin dibistanê.

Mamhoste dersa şagirtan dibêjit, şagirt guhdar dibin, qenc bala xwe didin ko rind têbigehin û hîn bibin.

Mamhoste di cihekî bilind de rûniştîye, Jê ra diyarok dibêjin.

Şagirt li rex hev li ser rûniştekan rûniştî ne. Li ber şagirtan berkêşk hene.

Li ber min jî berkêşk heye. Gava ders kuta dibe, berkêşka xwe ber bi xwe ve dikişînim, kitêb, defter û qelemên xwe tê de vedişêrim, diçim hewşa dibistanê digel heval û hogirên xwe dileyizim.

Di kuncê dersxanê de depreş heye. Depreş li ser sepikî suwarkirî ye.

Mamhoste, carinan, ji diyaroka xwe datê û bi tebeşîrê li ser depreşî dinivîsîne. Herçî ko devkî qenc nayin seh kirin, bi nivisandinê jî me re dide zanîn. Hin caran jî şagirtan radike, dersên wan ji

wan re dide nivisandin û xeletên wan  
derdixîne û rast dike. Pêr mamhoste li  
ser depreşî tişteki xweşkok nivisandi bû,  
Hêj di bîra min de ye:

” Çiyayên bilind bê mij nabin  
Newalên kûr bê av nabin ”

**Celadet Alî Bedir-Xan**

### L A V E L A V

Xwedan malî, xwedan perde,  
Cihê te geş, hemî erd e.  
Bi awazî, tena denga  
Te xuliqandî, te kir ava.  
Tu hem derdî, tu hem darû  
Te kir meh ro te kir şev ro.  
Te naxafa, te naxurde,  
Tu davêjî dilan perde.

Ya reb tu heyî, tu rehm û nûr î,  
Tu destek î tu hesin û şûr î.  
Tu rehm î, tu efserê mela yî,  
Gencîneyê tev, şeh û geda yî.  
Ya reb tu î, tu şahê dewran  
Textê te li ser stêr û ezman.  
Textê te ser efserên şehan e  
Bejna te ji çavê min nihan e.  
Ser çend şehan tu bûyî xunkar  
Lewra ne dikir tukes jî înkâr.  
Ya reb tu hî tu padişahî  
Tu merhema her birîn û ahî,  
Bexşende tu î lê derdmend im,  
Serferîşk î mam û jar û bend im.

**Dr. Kamuran Alî Bedir-Xan**

### MA ÇIMAN DIÇÎ

- Ji Ekrem beg re -

Dilketî me, dîl im ez, dotmîr û fer-  
mandarî tu!  
Sal û hîv herdem tu î, hem rove-  
jîn hem rohilat,  
Dîl im ez, dîla welatî; ez jî qurba-  
na te me,  
Gewre ye hêvîn û jîn, lê gewretir  
al û welat!..

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

### P Î R O Z N A M E

Brayê gevre û xoşewîst Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan!

Le paş destguşîn. Demêk bû çawra-  
nî stareyekî gelawêjî kurdman dekird.  
Taku diwênê be çawî xoman dîman ke  
ewîş hemû govarî (Hawar)-e ke çawî  
hemû kurdêkî rûn kirdiwe, hîwaman wa  
ye ke be tînî pirîşkî geş kurdistan rûnak  
katewe û hemû kurdêk be dem em  
Hawarewe biçê bikewîne ser rêgay rast  
û bo yekyêti kurdan hewl bideyn.

Be nawî giş lawêkî kurdî Îraqewe  
pîrozî (Hawar)-tan pêşkeş dekem.

Reca ekeyn lemewdiwa hewl biden bo  
tewhîdî lehcat ta weku hemû kurdê wek  
yek îstîfade le (Hawar)-tan biken. Ama-  
deyn bo hemû xidmetkarîtan. Îtir yarî-  
de û dewamî (Hawar)-tan le Yezdan  
teleb dekeyn. . . . .

**Hamid Ferec**



## BI HINCETA PÎROZNAMEKÊ

Herwekî di stûna xwe de bêt dîtin, yekî ji xortên kurdên Îraqê, bi navê Hamid Ferec, ji Hawarê re pîroznamekê şandiye. Tê de ji ber xwe û ji ber hemî xortên kurdên Îraqê ve derketina Hawarê pîroz dikit.

Heta niho me Hamid Ferec nas nedikir. Ev cara pêşîn e ko em bi heyîna wî dihesin. Ewî jî me nas nedikir. Lê ji ber ko Hawar -herwekî Hawar a her xortekî kurd e -Hawar a wî ye, Hamid jê re xweyî bû.

Hamid Ferec xortekî kurd, şagirdekî dibistanê, Hawar dikeve destê wî, pê bendewar û şa dibe, ew roja ko Hawar ketiye destê wî jê re cejn e, cejneke mezin, cejna vejîn û vejandina zmanê kurdî ye. Tavi kiryarê Hawarê dibe û dilbendîya heval, nas, nenas, tevayîya xortên kurdên Îraqê dike û ji me re, ji Hawarê re pîroznamekê rê dike.

Ji hêla din xwe dide pêş, ber emrê Hawarê, ber emrê zmanê xwe disekine. Ji me dipirse, gelo çi xebat, çi kar heye ko pê xidmeta zmanê xwe, xidmeta nijad û milletê xwe bike.

Tukes nikari bû ji Hawarê re diyariyekê ji pîrozname Hamid Ferec, mezin-tir, biqedir û hêjatir bişîne. Diyarîya Hamid Ferec diyariyeke welê ye ko bi kirîne naye kirîn, bi daxwazê nakevit dest. Ew tişteki biha ye ko ji vîn û ji xurtî

û dilbawerîya kurdanîya Hamid zaye. Hamid Ferec herçend bi vîn û dilbawer e ewçend bi hiş û jîr e jî. Hamid dixwaze û rind dizane çi dixwaze û jê re çi divêt.

Herê ji me re şîretinen qenc û biha dide. Ji me hêvî dike û dixwaze ko em ji bona yekîtîya zmanê kurdî bixebitin.

Belê xebera wî ye. Ji xwe me, di pronivîsa xwe de ew esas, bi mada jêrîn ve danî bû.

2- Sehîtiya zarên kurdî û berhevda-nîna wan...

Ji bona yekbûna milletê me welê jî diviya bû. Ji ber ko yekbûna milletan bi yekîtîya zmanî dest pê dike.

(Bizmark) yekbûna Elmanyayê li ser yekîtîya zmanê elmanî danî bû. Vê yekîtîyê (Loter) jê re çêkirî û pêk anî bû.

Yekbûna kurdan jî bi yekîtîya zmanê kurdî çê dibe. Yekîtîya zmanî jî bi yekîtîya herfan dest pê dike. Yanî di yekîtîya zmanî de yekîtîya herfan gava pêşîn e.

Pesin û spas ji Yezdanê pak re, Hawar elfabêya kurdî belav kir û wê gavê avêt.

Êdin divêt herçî xwenda, xwendewar û zanayên kurd hene bi vê elfabêyê bini-vîsînin û nexwenda jî hînî wê bibin.

**Celadet Ali Bedir-Xan**

SAL 1

# HAWAR

HEJMAR 4

YEKŞEMB

3 TÎRMEH 1932

Kovara Kurdî \* Revue Kurde

## TÊDEXISTÎYÊN KOMELÊ

Ber tevna mehfûrê  
Yekbûn û yekîfîya kurdî  
Elfabêya kurdî  
Ferhengok  
Zerî kubarê

C. A. Bedir-Xan  
Dr. K. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan  
.....

## BIRÊ WERGERANDÎ

Gotina welat  
Lawikê min  
Hacî Qadir Koyî  
Ey kurdîne wuşyar bibin

Cegerxwîn  
Dr. K. Bedir-Xan  
Hevîndê Sorî  
Hacî Qadir Koyî

Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932

## BER TEVNA MEHFÛRÊ

Rindê û Zîzê xwehên hev û ji bavê xwe sêwî bûn.

Bavê wan Bengî axa, digel brayê wan ê mezin Zinar û bi çend pismamên xwe ve di wextê Şêx Seîdê rehmetî, di şerê serxwebûna Kurdistanê de ji bona welat û milletê xwe di meydana rûmetê de keti bû.

Rindê sêzdeh û Zîzê panzdeh salî bû. Brayê wan ê kiçik Gefo hêj nû keti bû nehan.

Şerê serxwebûnê ji heşt mehan bêtir ajoti bû. Eskerê kurdan bi ser Diyarbekrê de girti bûn, keti bûn nav Xarpûtê û bajarên Kurdistanê ên din.

Ji ber ko tifaqa wan ne yek bû, mirovên wan ên xwenda, ko bikarin karên serxwerabûnê bigerînin, kê m bûn, û ji hêleke din jî di çend deran de bêbextî hati bû kirin; serxwerabûn ne çû serî û tirkan ji nû ve Kurdistana bakurî vegirtin. Serek, Şêx û mezinên kurdan bi dar ve kirin, jin û zarowên wan, bi hezaran kuştin, malên wan zemt kirin.

Di vê navê de mal û gundê Bengî axa jî talan kirin û jin û zarowên wî birçî û tazî hiştin.

Xelkê mala Bengî axa êdin nikari bûn di cihê xwe, di gundê pêşiyên xwe de rûnin.

Dêya wan; jinikeke jêhatî, keçbavek, zarowên xwe da bû hev û guhasti bû bajarekî kiçik, li cihêkî welê ko tukes ew nas ne dikirin. Dê ji sibê heta êvarê di mala xelkî de dixebitî, bi şev gore diristin û dîsan kara wê bi kotekî têra

debara wan dikir. Lê diviya çend pere jî bidin alîkî û ji bona xwendina Gefo bicivînin.

Ma Bengî axa ne wesandî bû ko bila Gefo bixwîne, mezin bibe, evdina bav û welatîyên xwe veke û di rêya felata welatê xwe de bixebite.

Ji xwendinê re dirhav diviya bû.

Dê xwe dişidand. Hêj zêde dixebitî, lê tiştêk bi ser de nedixist.

Ji bona anînciha wesiyeta mêrê xwe qerara xwe da û her du keçên xwe êxistin xebatê.

Di wî bajarî de mehfûran çêdikirin. Keçikan di wextê xweşiyê de bi çêkirina mehfûran mijûl dibûn, pê dileyîstî. Ji lewra gelek ne ajot ji her duwan re xebat hate dîtin. Her rûj subehî xelkê mala Bengî axa kar dibûn û her yek diçû bi alîkî ve.

Dê mala xelkî, keçik tevnê û lawik dibistanê.

Gelek ne borî zivistana welatê jorîn bi ser de hat.

Cilên wan tenik û kevn bûn, li wan sar bû. Zîzê çend caran nexweş ket.

Lê diviya bû li ber her tiştî rawestî û bixebitin, da ko wesiyeta Bengî axa li erdê mehîlin û bînin cih.

Keti bûn çileyê zivistanê. Dihat bihîstî, filan duhî bi şev bi rêve qefiliye.

Kûçe û kolanên bajêr bi berfê dagirtî bûn. Çend ban ji giraniya berfê hilveşiya bûn.

Tevna ko Rindê û Zîzê li ser dixebitî di holkê de vegirtî bû. Banê holê

qulêr û pîpokên kulekên wê şikestî bûn.

Rûjekê her du xweh li ber tar û powên tevnê rûniştî, hepo lêdixistin. Her du jî, ji sermayê diricifîn, dranên wan diririkîn, gûmikên Zîzê qerisî bûn, hepo ji destê wê ket û du hêstirên germ pêve çûn. Nema dikari bû ber êşa sermayê bisekine. Bi dengê xwe ê zîz gote Rindê:

— Rindê, xwehê! ma êdîn ne bes e? Tu nabînî ko em her du jî qefilîne. Dê rabe em herin mal, biqevî nav cihan û canên xwe bigermînin.

Rindê zûda pê hesiya bû, lê xwe berder ne dikir. Dîsan ji xwe re bû xweyî, ne da ber sistîyê, tinê xweha xwe da himêza xwe, guvaşt û maç kir.

Rindê ji Zîzê bi du salan mezintir bû. Lê di wê çaxê de ew du sal hing pênc salan hêja bûn. Rindê ji dêya xwe bêtir pê mijûl dibû û ew bi xwedî dikir.

Zîzê hêdî hêdî digirî lê nedinalî. Rindê destên xweha xwe di nav yên xwe de diguvaştin û dixebitî pê bigermîne. Piştî gavekê xweha xwe rûnand rex xwe û jê re got:

— Ma Zîzê tu nizanî ko xebata me ji bona Gefo ye. Ji bona xwendina Gefo ye.

— Belê Rindê çawan nizamim, wer ne bûwa kengê dêya me em didan xebatê.

— Ne xwe çire digirî?

— Tu nabînî êdîn nagirîm, lê tişteke heye, ma dinya tev ne zivistan e, buhar û havîna wê jî heye. Bila Gefo li havîne bixwîne û li zivistanê tevda li malê rûnin, ma nabe?

— Dibe Zîzê, lê bavê me wesandiye ko bila Gefo zana bibe, bizane, rêzika

dinyayê bigerîne. Ji bona wê jî xwendina havîne têr nake, divêt li zivistanê jî bixwîne, da ko zana bibe.

— Ma çire Rindê, ewende bixwîne, bila qasê kekê me Zinar bixwîne ne bes e? Zana bûn jî, ji bona çî?

— Ji bona welêt Zîzê. Heke kekê me Zinar qenc xwendî bûwa, rûja ko eskerê kurdan bi ser Diyarbekrê de girti bûn ne dihişt ko esker bibin çend bir û herin bajarên din û di dora Diyarbekrê de kêmbibin. Lê bi êrîşkê Diyarbekir distand û mesele safî dikir. Dibêjin ko vê xeberê dijminan bi xwe gotine. Te niho seh kir.

— Belê, Gefo bixwîne û welêt

— Û welêt bifilitîne, welat bi xebata mirovên xwenda xelas dibe.

— Ko xelas bû, dê bibe çî?

— Dê bibe bi serê xwe?

— Ko bû bi serê xwe?

Di wê demê de serhoste ko tirkek bû li wan daborî û galî, dijûnan li wan kir û got "Yine mî laqirdi Kurd Pîçlerî.."

Keçikan bi tirkî nizanî bûn. Lê ji awayê gotina wî seh dikirin ko xeberan li wan dide. Keçikên din ko di holê de dixebitîn bajarî û hemî jî kêmbû zêde bi tirkî dizanî bûn û pê xwe diparastin.

Tinê Rindê û Zîzê, ko bi tirkî nizanî bûn diketin ber çavên serhoste. Serhoste digot: "Disan galgal ne! pîncên kurd..."

Ew ne cara pêşîn bû. Lê Rindê û Zîzê nikarî bûn hîn bibin. Her car wek cara pêşîn berdiketin. Lê deng nedikirin. Dêya wan ji wan re goti bû, xwe ragirin, deyn mekin, heta ko em bigehin

miraza xwe, Gefo bidin xwendin.

Ko serhoste dûr ket, Rindê gotina xwe pêş ve ajot:

— Ko Kurdistan bi serê xwe bû, hingî her tiştên welatê me, ji me dibin. Ev serhoste jî ji kurdan têtê bijartin û pirsas kurd ne wek îrû pirsas dijûnê lê pirsas pesnê dê bibe. Ne tinê serhoste, lê ji hakimana heta paleyan hemî, ji me, ji miletê me dê bibin. Wê gavê ev zmanê ko em pê daxêvin û ji me re şîrîn e di her derê de bête gotin û bihîstin. Îrû em di zîvarîyê de ne, malên me ji destê me hatine standin. Çire? - Ji ber ko em kurdin û dewleta kurdan nîne.

Bavên me, brayên me, pismamên me bi dar ve kirin. Hemî, ji bêxweyîti. Lê gava ko em bûne serxwe, hingî kurdanî ji me re heqê jiyînê dê bide. Ji bona standina wî heqî ji me re brayên xwenda divêt.

Welatê me xweyîyê zarowên xwenda bûwa heta niho, bi serê xwe dibû û bav û brayên me nedihatîn kuştin em jî nediketîn vî halî, serhoste jî xeberan li me nedida. Niho ket serê te ko ez û tu, em dixebitin, yekî ji wan mirovan bixweyî bikin. Ew jî brayê me ê kiçik Gefo ye.

Zîzê dengê xwe birî bû. Ne digirî, ne jî tiştek digot. Dest avêti bû hepowê xwe û dixebitî. Hepowê xwe wer dişuxiland ko tilîyên wê ji gûmikên xwe qey agir vedimistin.

Tinê di vegeerê de ji Rindê re qewîti kiri bû ko ji dêya xwe re tiştekî mebêjî.

Sibetir dinya hêj sartir bû, Rindê û

Zîzê çû bûn xebata xwe. Heta hingûrê jî xebitî bûn.

Gava vegeeriyana hatin mal û rûjanîya xwe dan dêya xwe, dê dît ko Zîzê wê rûjê ji xweha xwe qemerîyek û niv bêtir anî bû. Berê jê kêmtir dianî. Dê ecebmayî ma. Ji Zîzê pirsî. Ewê got:

— Dadê heta niho min rind nizanî bû em çire dixebitin, Rindê qenc da min seh kirin û ket serê min, û îrû min ji Zîzê (150) girê bêtir girêdan. — Zîzê ji te re çi got?

— Jê bipirse dadê, ez wek wê nizanî min rind bibêjim.

Rindê û Gefo jî, xwe gihandi bûn wan. Rindê dest bi gotinê kir lê nikari bû biqedîne, çavên wê hêstir dikirin. Dê jî digirî.

Di guhekî mezê de piştencera Bengî axa hilavistî bû. Jû pêve di destên wan de tu tiştê wî ne ma bû.

Ji xwe re kiri bûn adet, di demên tengî û zîzîyê de ew ziyaret dikirin.

Her çaran berên xwe dan xencerê û ketin himêzên hev.

**Celadet Alî Bedir-Xan**  
Bêrût: 5 Çirîya-Berî 1927

## YEKBÛN Û YEKÎTÎYA KURDÎ

Ew Lor û Bextiyarî Baban;  
Kurdmanc û Hevremen û Zazan;

Kurdên, ji welatê Rom û Sorî,  
Kurdên Ecem û Îraq û Sûrî,

Kurdên ji welatê jor û jêrîn;  
Serçav bilind û zexm û nêrîn;

Kurdên ji Blûc û Kurdên Efgan,  
D'hêvî de yek in û yek di raman,

Yekbext in hemû, ne bextiyar in,  
Ser erd û dinê, liyan û jar in.

Zerdeşt bû melayê kevnê kurda,  
Qanon bû çiraya zendavesta,

Ew felsefeya qedîm û pir nûr,  
Zendî, zmanê kevn û meşhûr;

Zerdeşt û çiraya zîvê Zerdeşt;  
Ruhnî ew e, ser çiyar û ser deşt.

Her kat ji kitêba Zendavesta,  
Pêtek bû li dil, gurî di desta,

Ristem ji me ye û şah Nadir,  
Siltan Selahedînê denggîr,

Xanî û Melayê Bate, Teyran;  
Gî kurd in hemû, ji xwîna kurdan.

Nabî ji me ye, û Şêx Ehmed;  
Hîmê me ye Zend û dewleta Med.

Agrî, Sîne, Wan û Mûş û Zîlan,  
Kanî ne, ji wan vejîne xortan,

Sinî, Elewî û Eyzedî çî ? ? ?  
Em bûne xulam û mane birçî !!!

Kurd in ne cuda ji dar û ra ne,  
Bin destê Xwedê û yek xwedan e,

Kurd in hemû em, ji yek nijad in,  
Tev dad û kerem û pak nihad in.

Bextên me yek in, ne sê ne çar in  
Em Kurd in û tev bira û yar in.

Agrî, Sîne, Wan û Mûş û Zîlan,  
Kanî ne ji wan vejîne xortan.

Sinî, Elewî û Eyzedî çî ? ? ?  
Em bûne xulam û mane birçî !!!

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

Bêrût: 23 Gulan 1929

## ELFABÊYA KURDÎ

-4-

Di hin deran de ev (w) yên ha bi (y) re  
xwe diguhêrînin:

*Vê Parsûyê, Parsûya stûr*

*Vî çiloyî, çiloyê ter*

Gelo bi çî awayî ev du herfên ha pev  
diguherînin?

Birekî biçûk ji kurdmancan -herwekî  
xelkê Botan- dengdêra (û) zrav dixwî-  
nin, yanî ne wek almanan lê wek Fren-  
sizan bilêv dikin.

Ev kurdmancên ha dengdêra (o) jî  
wek (û) wa adetî -ko di Fransizîyê de bi  
(ou) têt nîşan kirin- dixwînin. Bi vê fer-  
qa ko di bilêvkirina wan de hergav meyl-  
darîyek ber bi (o) ve heye.

Ev kurdên ha ko van du dengdêran  
nêrm dixwînin ji bona hevghandina van  
dengdêrên din -herwekî bi (ê, î, a) têt  
çêkirin- li şûna (w) (y) kê ditînin.

**dûmahik heye**

## FERHENGOK

**Zerdeşt**

Berê kurd zerdeştî bûn. Zerdeşt pêxemberê wan bû. Ehmedê Xanî ko pê dizanî bû, di (Zîno-Mem) de bi beyta jêrîn ve li zerdeştîbûna kurdan îşaret dikit û dibêjit:

*”Malê xwe ji rengê qewmi-Zerdeşt  
Da agir û gazîya xwe rahişt”*

*Ehmedê Xanî*

**Zendavesta**

Wek her pêxember Zerdeşt jî xwedan kitêb bû. Zendavesta navê kitêba wî ye.

**Zendî**

Zmanekî kevn e. Zmanê me, zmanê kurdî jê hatiye girtin, yanî eslê zmanê me zendî ye. Zendavesta bi zmanê zendî hatiye nivîsandin.

**Kat**

Di kitêba Zerdeşt de, lajê an stranin hene. Ji wan re kat têt gotin. Katên Zerdeşt.

**Gûmik**

Serfîyên tilfîyan, nermikên tilfîyan.

**Tar û po**

Benên tevnê; yên drêjahî û pehnaî.

**Hepo**

Şehê hesinîn. Pê girên mehfûran têt şidandin.

**Zîvarî**

Belengezîya mirovên mezin û dewlemend.

**Hingûr**

Piştî êvarê, destpêka şevê.

*”Şeva tarî ji hingûrê kifş e.”*

**Med**

Miletêkî kevn e. Miletêkî arîniyad e. Med medeniyeteke mezin anîne pê. Kurd ji medan dahatine, kurd zarowên medan in.

**Afirandin**

Anîn pê, anîn wicûdê, xuliqandin. Xwedê erd û ezman û mirov afirandin.

*”Xwedê afirandin ji bo wî felek  
Ji bo xidmeta wî şihandin melek.”*  
*Ehmedê-Xanî*

## LAWIKÊ MIN

Gava ko fermana kurdan rabû em hêj nû zewicî bûn. Şevêkê tu pir dereng mayî û gava tu hatî mal, di destê te de tivngeke nû û çend sed berik hebûn. Dilê min tirsîya û ricîfî. Min ji te re bi dengêkî lerizî digot:

— Gurgîn... dîsan çi heye? Te li min bi hêvîna çavan û bi kesera dilan mêze kir, paşê bi dengêkî xurt li min vege-rand.

— Dawet dest pê dîke.

Di welatî de şeş meh şerekî zor çê bû, jin bî bûn, zaro sêwî man. Kurd destpêkî de dijmin şikandin. Lê, paşê bi bêbextî hatine şikestin.

Gava tu di şer de bûyî min ji te re kurikek anî. Êvarekê, ez li ber deriyê malê sekinî bûm, çavên min li rê bûn. Min dît tu hatî. Herdu destên te bi xwîn bûn. Di ser sînga te de birîneke kûr û vekirî hebû. Te, ez himêz kirim û te got eskerên dijmin di ser şopa min de ne;

bawer ke niho ewê bên û min bigrin,  
megrî!!!

Tinê vê demê ji bîra meke. Paşê tu bi  
gavên lez çûyî ser dergûşa kurê xwe yî  
pêncmehî Tacîn, û te ew hilanî û jê re  
got:

— Tacîn!! Dilê te ji bona arîkarîya  
Kurdistanê ye. Xwîna te ji bona şer û  
rijandinê ye. Te kurê xwe dikir dergû-  
şê û eskerên dijminan diketin hindirê  
malê....

Lawikê min! Îro pênc sal qediyane ko  
em, ji hev dûr hatine êxistin. Tu niho  
di kortalekê de bi çarsed camêrên kurd  
radikevî.

Xwedê dizane... çermê rû û sînga te  
perçîfî û laşê te riziyaye.

Lê, Gurgîn! Bizane ko her şev berî  
here rakeve, kurê te Tacîn zend û des-  
tên xwe ên nerm davêje ser stoyê min  
û bi çavên xwe ên zelûl û bikeser li min  
mêze dike, min maç dike û ji min re  
dibêje:

— Dayê!.. Dayîka min bavê min re  
binivîsîne ko mezin bûme. Dilê min ji  
bo hejkirina Kurdistanê ye, xurtîya min  
ji bona arîkarîya Kurdistanê ye, xwîna  
min ji bo şer û rijandinê ye!!!

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## GOTINA WELAT

Welatê min digotî min: birazî  
Li nezmê guh bidêre ger dixwazî

Cegerxwîn î kurê min tu ji derda  
Selavan zû ji min bighîne kurda

Bibêje ez keçik bûm, ta ko bûm pîr  
Nedî min xwe wekî vê salê êsîr

Serê min bû sipî, pûş û pelaxe  
Li jêrî min çu' nîne xeyrî axe

Ji çavê min diçin sed av û sed co  
Ji min êdî dikin gazinde zaro

Xerab bûye ji min sed xan û qûnax  
Nemaye bo yetîman xeyrî yek max

Nikarî bête nik min merdê rêwî  
Heçî nik min hemî zarok û sêwî

Kuranê min pir ji xuşkên xwe re pak in  
Welê pirsê li dapîra xwe nakin

Cizîr û Şehrezor û qeti'ê Îran  
Hemî qîzê min in pîrê bi qurban

Ciwan in surperî ne serbilind in  
Gelek xob û zerîf gewr û rind in

Efff in pir delal in berzewac in  
Gelek pak in welakîn bê rewac in

Ricakar im ji te ey lawê kurdî  
Tu xuşka xwe nexî ber êş û derdî  
Bide her yek cihangîrek zemanî  
Wekî Yusif, Selahiddînê sanî

Welê bêje ji bo wê re eyan e  
Ev e xuşka min e rind e ciwan e

Ji hersêkan tu kîjanê dixwazî  
Tu nas nakî ji bil navê mecazî

Sidaqa wan tifaq û îttîhad e  
Tu kê bigrî ji bo te ew mirad e

**Cegerxwîn**

Amûde: 11 hizêran 1932

”Ev helbesta seydayê Cegerxwîn, ji”  
Gotina welat ” ya ku di dîwana wî ya  
dudiyar de ye, hinekî biferq e. (wergêr)



**HACÎ QADIR KOYÎ**

Hacî Qadir Koyî şairî qewmî, berz û be qîmetî kurde. Le salî 1232 h. le gundî (Gorqerec)-î nêzîk Koysinceq hatûwete dinya, le paşan çuwete Estemûl û le wê mêwanî kuranî Bedir-Xan paşa buwe û le salî 1312 le wê wefatî kirduwe. Hacî Qadir yekemîn şaire ke helbestî qewmî û millî danawe û bewe xerîkî wuşyarkirdnewey kurdan bûwe û lapedey (laperey W.) helbestî xeramî pêwe dawe.

**Hevindê Sorî**

**EY KURDÎNE WUŞYAR BIBIN**

Xakî Cizîr û Botan ye'nî wilatî kurdan  
 Sed heyf û sed mixabin deyken be Ermenistan  
 Wa rêgatan debesrê êlatî Caf û Bilbas  
 Ger mirduwin le germiyan memnû'e biçne kwêstan  
 Kamî kiç û hetîwî şîrîn bê raydekêşin  
 (Hawar) debene berkî peşme dexîl û aman

Sertan le qur helênin werin halman bibînin  
 Çonîn le destî zilmî bêdînî dûr le îman  
 Em qiseye ke kirdim nagate çend salî tir  
 Em halete debînin yek yek be çawî xotan  
 Herçî weku beyanim bo kirduwin be tehqîq  
 Peyda debin sêgane kam qur bikeyn be serman.  
 Lem bigene îttîfaqê peyda biken be merdî  
 Ferqî nebê şîwan û cotyar û mîr û gawan  
 Ger hîç nebê be oyun tabî' be dewletê bin  
 Bêgane çake dijmin nek dijminî le xoman  
 Romî weku benî mûn kes piştyan pê nebestê  
 Kewtûne dawî xoyan pejmurde mawin heyran

Kwa! walî (Senenduc) begzadekey (Rewandiz)  
 Kwa! hakimani (Baban) mîrî (Cizîr û Botan)  
 Kwa! ew demey ke kurdan azad û serbexo bûn  
 Sultanî mulk û millet sahibî ceş û irfan  
 Coşêk biden weku heng tedbîr biken be bê deng  
 Esbabî şer peydaken top û tifeng û hawan  
 Hacî kesêke bê kes bo êwe qur depêwê  
 Gwê lê deken zerîfe nayken bela le xotan

**Hacı Qadir Koyî**

## ZERÎ KUBARÊ

—1—

Were lê lê! Zerî Kubarê  
 Zerî Kubarê  
 Minê Zerî Kubara xwe dîti bû  
 Li pala qubê  
 Ser keçikê xwedan îman û çavreşê  
 Sto bi ribê  
 Xwedê rebê alemê  
 Mirazê' dost û guhdaran bikira  
 Ya min û bejna zrav jî  
 Li serê sibê

—4—

Lê lê! buhar bû, çaxa  
 Konan û vegirtinê  
 Zerî Kubara min nesax bû  
 Li ber mirinê  
 Ezê malê' gundî û cîranan  
 Hewes nakim  
 Serekî bidim ê  
 Lê lê! Zerî Kubarê  
 Zerî Kubarê  
 Te ez xapandim, te ez şikandim

—2—

Lê lê! buhar bû, çaxa  
 Konan û vegirtinê  
 Zerî Kubara min nesax bû  
 Li ber mirinê  
 Heke malê' gundî û cîranan nebîya  
 Serekî bidim ê

—3—

Lê lê! Zerî Kubar, te ez xapandim  
 Te ez kir' me destmalek  
 Ser destê' xortê Omerîyan, te ez gerandim  
 Te ez kir' me têlek, ji têlê' tembûrê  
 Dame destên nezanan, te ez şikandim  
 Lê lê! Zerî Kubarê  
 Zerî Kubarê

**SAL 1**

**ÇARŞEMB**

# **HAWAR**

**HEJMAR 5**

**20 Tîrmeh 1932**

**Kovara Kurdî \* Revue Kurde**

## **TÊDEXISTÎYÊN KOVARÊ**

**Edebiyatî kurdî  
Lorîya Bedir-Xan  
Alê Kurdan  
Delalîya zarowan  
Dildizîya gulekê  
Besreka zêrîn  
Elfabêya kurdî  
Şîn û pesna Zîne  
Ferhengok**

**Hevindê Sorî  
C. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
E. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Qedrican  
C. A. Bedir-Xan  
Dr. K. Bedir-Xan  
C, A. Bedir-Xan**

## **BIRÊ WERGERANDÎ**

**Pesna Dêrikê  
Wilatî Kurdan**

**Cegerxwinê Kurdî  
Evdilxaliq Esîrî**

**Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932**

## EDEBÎYATÎ KURDÎ

Lêraneda demanewêt be kurtî basî edebiyatêk bikeyn ke ilaqeyêkî zorî heye legel edebiyatî dinya, we be -taybetî edebiyeta arî. Nextêk le hendê edebiyatî rojawa dekat, û hendê ley cuda debêt, ewîş "edebiyatî Kurdî" ye.

Herwekû tarîxî kurdan be nezanrawî mawetewe we heşta betewawetî le lay tarîx zanekan nezanrawe, edebiyatî kurdîş bew çeşne malûm niye we malûm nebûwe. Herwekû ême betewawetî ew şitane nazanîn ke tasîrî kirdiwete ser kurdan, we tarîxî kurdan berweha ew şitane nazanîn ke tasîrî kirdiwete ser edebiyatî kurdî. Inca ew şitane aya siyasî bê, komelî ( civakî ) bê yan dînî. . . h.p.

Hemîsan çünke qewmî kurdî tûşî lafawî gelan û qewman bûwe, we qewmanî cuda cuda hemû exlaqî, edebî, komelî (civakî) tasîr yan kirdiwete ser yan, zimanîşyan tasîrî lêyan kirdiwe.

Ew milete bêganane ke hatûnete kurdistan û em wilateyan dagîr kirdiwe, kem û zor tasîryan leyan kirdiwe we şitêkyan becê hêştiwe, we beşî kurdey ke kewtûwete ber em lafawane lejêr tasîrî dîn û ziman û tabiyat û ehwalî komelî ewane mawtewe. We çünke qewmî kurd nezan bûwe, we medaniyyetî ew millêtane zor bûwe, destiyan kirdiwete werگردinî meddeniyyet lêyan. Inca legel medeniyyet. şitî dêkeşyan werdegird. Wekû: Ziman, edebiyat, helbest, ehwalî komelî...h.p.

Leber ew şitane ke le serewe gotman kurdekan hetakû êsta ke le zimanî xoy-

an ziyatir, le edebiyatî zimananî bêganane têdekoşîn. Her be boney ewewe kurdekan bo edebiyatî kurdî tênekoşîwne, we edebiyatî kurdî -ewey ke heye- herwa be nezanrawî mawete we.

Hemû xwêndewaranî Hawarî xoşewîst dezanîn ko gelî kurd gelêkî arî ye, yanî Hindî-Ewrûpî ye. Leber ewe zimanî kurdî we edebiyatî kurdîş wekû zimanan û edebiyatanî dîkey arî ye, we edebiyatî kurdî le edebiyatî Farsî, Hindî, Yonanî kon, Rûsî, Firensizî, Elemanî...h.p. zor dekat. Inca bo ewe ke em heqîqete çak têbigeyn, ba hendêk basî edebiyat û çeşnanî bikeyn.

Edebiyat pêk hênan û gotinî meşk û fikrî însane be çeşnêkî ciwan û xoş û saf ke tasîr bikat le ser insan, aya insan xemgîn û dilteng dekat, yan ferehnak û dilxoş û keyfdar dekat.

Edebiyat ew şitaneye ke le dilî insan gird debêtewe we, dêt û deçêt û derî dekate derewe, we deylêt be zimanêkî şîrîn û ciwan.

Inca edebiyat bêjîn û gotinî hemû ştek niye, beşkû ibarete le gotin û bêjînî ştek ke bestirawe be (jiyan)-ewe, we ke pêwistî jiyane. Yekê le edîbanî Misrî.. gewre "Abbas Mehmudî Eqqad" gotiwyetî:

Jiyan çi ye we edebiyat çi ye!!..

Du şitîn le yek şit dururst kirawin we be yek dezû çênrawin we le yek karxane der çûne. Lemew pêş xelk, pêy nedewîst ke boyan ispat biken ke edebiyat be bê jiyana pêk nayêt, belam êstake zor pêwîstyane ke boyan ispat bikrêt ke jiy-

an be bê edebiyat nabêt. Legel eweşda ferqêk niye le beyanî em du heqîqete: Mebest her wekû her jiyane edebiyatê-kî heye, hemû edebiyatêkîş jiyane-kî heye, we her dukyan be yek çîşt depêwrêt we berzî û nizmî dezanrêt.

Ey we xwa hîç jiyane be bê meyl û cazibe debêt! We hîç meyl û cazibeyêk be bêjîn û gotin pêkdêt!! û hîç qiseyêkî rast û ciwan û qinc û jîkele debête yek legel qiseyêkî naşîrîn û şewaw û alozaw!!

Cewabî em sualane hemû emeye ke jiyane be bê edebiyatêk rêk nakewêt ke ley biweşete we. We berzî û nizmî edebiyat her wekû jiyane be aynî şit depêwrêt...

(tewaw ne bûwe)

**Hevindê Sorî**

## Lorîya Bedir-xan

- Ji Haco axa re -

Herwekî xwendevanên me di stûna xwe de bixwînin, di vê hejmarê Hawarê de, em lorîyekê belav dikin:

” Delalîya Zarowan ”.

Ewînde herkes bawer bikî ko ew lorîya ha delalîya Bedir-Xanê mezin, lorîya bapîrê min e. Lê ne welê ye.

Bi vê lorîyê ne bapîrê min Bedir-Xan, lê neviyê wî, brayê min Bedir-Xan dinivînan û dilorandin.

Ev lorîya ha ko bi xwe, bi zman û mana xwe ve hêja ye, ji bona min, ji hêleke din bîreke mezin û zelûl e. Pê bapîr, bav, dê û brayê min -ko her çar ji zûda gehîştine rehmeta xwedê- tene bîra min.

Ji ber ko Bedir-Xan navlêkirî ye, tê da navê bapîrê min heye. Ew Bedir-Xanê ko bi xurtî û mezinahîya xwe ve navê xwe, li şûna navê malbetekê xistiye (1)

Ew Bedir-Xanê ko ji bona yekîfîya Kurdistanê xebitîye, ji bona serxwebûna Kurdistanê ketiye şer û qrênan û her tiştên xwe di vê rêyê de feda kiriye û ji bona wê jî miriye,

Ew lorî bavê min ji brayê min re gotiye.

Ew bavê ko ji min re ne tinê xwîna xwe a pak daye -ew xwîna kurdî ko bi hezar salan ve di zozanên Botan de bi bayên bakurî honik dibû û di Cizîrê de di nav germîya lat û zinarên Burca-belek de dikeliha, û her gav di meydanên şer û rûmetê de ji sîngên dahatîyên malbata Azîzan dihat rêtin û ji rayên wan vedimîzt- lê ez bi dil û hişê kurdanî bi xwedî kirim û xistim wê rêya ko ew bi xwe û bavê wî tê de mirin.

Ev lorî, dêya min distrand û pê brayê min dinivînan.

Ev dêya ko gava ez hejdeh, nwanzdeh salî bûm û min dil kir ez bikevim mekteba herbîyê, ji min re gotî bû:

— Ma ji te re ne namûs e? Tu çawan bikevî mekteba herbîyê û bibî zabîtê tirko. Ev tirko ko welatê te ji destê te standine, mîletê te xistine xulamîyê, bapîrê te dîl û malbata te perîşan kirine û hon avêtine zîvarîyê.

Ev lorîya ha ji brayê min ê kiçîk Bedir-Xan re dihat gotin.

Ev brayê ko xwedê di menfayê de da û di menfayê de standî bû. Ev brayê kiçîk û delal ko di nav sê çar saetan de

ser ejnûwên bavê min, di keleha Ekayê de mir.

Ji wan pêve di vê lorîyê de bîra xweha min jî heye. Xweha min pîştî mirina brayê me, di şîna wî de, bi dengê xwe ê zîz ji me re ew dinehwirand û pê em digirîyandin.

Carkê, min ev lorî ji Haco axa re xwend, û goti bû ko heçî zarowên mala me ko navê Bedir-Xan li wan dikin ji du sê salan bêtir najîn û dimirin.

Axa hinik fikirî û li min vegerand:

— Ji ber ko rehmetî navê xwe nadê tu kesî ji lewra min jî ev benda ha -ko halaneke eşîrwarî ye- pêşkeşî axayê xwe kir.

**Celadet Alî Bedir-Xan**

<sup>1</sup> Herwekî nas e, navê malbata mirekên Botan Azîzan e.

## ALÊ KURDAN

Alê Kurdan di nav rok.

Çi bedew û biheybet.

Bi çar reng î, rengên te,

Çi delal û çi xweşkok.

Xêzek kesk û xêzek sor,

Nav sipî û nîvek zer.

Keskesor e, bi roj e,

Ev li jêr û ew li jor.

Semyana keç û lawan,

Rûmeta jin û mêran.

Neyarên te pir jî bin,

Tu dê bidî bera wan.

Ko çirisî roja te,  
Dê belav bin mij û dû.  
Rabe ser xwe ser bilind,  
Nîzing bûye rûja te

**Herekol Azîzan**

*Lorî*

## DELALÎYA ZAROWAN

-1-

Binve xweşîya dil û du çavan,  
Dadê ji te re her rû nighban,  
Da zû tu mezin bibî Bedir-Xan  
Binve kezeba min binve lo! lo!

-2-

Hişyar mebe, niho ne genc e,  
Mehdik ji te re bizane genc e,  
Bê xew mebe paşîya wê renc e  
Binve kezeba min binve lo! lo!

-3-

Xweşhal î wekî kevok û berxan,  
Fekrandina te melek jî heyran.  
Pak e neseba te dadê qurban,  
Binve kezeba min binve lo! lo!

-4-

Dewra felekê li ser me kîn e,  
Bextê me reş e, kezeb birîn e;  
Mesken ji me re niho nivîn e,  
Binve kezeba min binve lo! lo!

-5-

Ne mal û ne saxî û ne rahet,  
Talan kirine hemî ji mihnet;  
Dişwar e gelek belayê xurbet,  
Binve kezeba min binve lo! lo!

-6-

Çerxa felekê wekî nesîm e,  
Ho nabe xwedê gelek rehîme.

Rûja xweşîyê dibit kerîm e,  
Binve kezeba min binve lo! lo!

-7-

Hewqas tu mebêje ev çî hal e  
Bê sebr mebe welê menale;  
Ewn û kerema Xwedê heval e,  
Binve kezeba min binve lo! lo!

**Emîn Alî Bedir-Xan**  
Sparte 1906

### Dildizîya Gulekê

Li ber derfîyê Diyarbekrê parîzekî mezin heye. Ev parîz bi sosin û rêhanan, bi lale û benefşan xemilandî ye.

Her êvar bayekî xweş û honik bi wan gulêlîkan re dileyize. Bihnûnî di hêlanoka bayî de xwe dihejînin.

Avên zelal ji sîngên quleteynan divizîkin. Ji ezmanî, stêrik, bêdeng li wan fedikirin.

Di bin wê erdê de, di binanîya hîmên wî parîzî de kortalek heye. Kortal, kortaleke tarî.

Di wê kortalê de Şêx Seîd bi hevalên xwe ve veşartî ye. Ji wê kortalê deng nayit. Kortal ker û di guhdarîyê de ye.

Di wî parîzî de her şev gulek vedibit. Rengê wê ji lîvên bûkan sortir, pelên wê bel û geş in.

Gava destekî biyanî drêjî wê dibe, pelên gulê tîn yêk.

Ew gul guleke bi nav û deng e. Kurdên ko di şerê welatî de hazir bûn, dildizîya wê gulê dizanin. Dizanin ko spe-

hîtû û geşîniya gulê nîşanek ji imîda Kurdistanê ye.

Dizanin jî ko di nav her pelê wê gulê de hezar axên birîndaran, hezar evdên şehîdan, bi hezaran hêstirên sêwî û jinûbîyan, bi hezaran şînen welatîyan di xew de ne.

Şevkê, zabitekî dijmin bi delala xwe ve hat û ket nav wî parîzî. Bi gavinen hişk û kanc pê li çîman û bihnûnîyan kir.

Heşînahîyên zrav şkestin, pelên kulîlkan ji hev ketin.

Di nav bayê êvarê de nalîneke zîz û zelûl hebû.

Zabit, çengê wî di bin çengê delala wî de, xwe da ber gulê û dest avêt gulê. Gul dil kir xwe bigre. Lê ewî ew çînî.

Wekî gul ket nav destên wî, sînga xwe vekir, xwe geş kir.

Her duwan ew bihn kirin û mirin.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

### Besreka Zêrîn

- Ji rêberê me ê gewre Qedrî beg re -

**Besreka zêrîn xerab û qotoyê Mekso**  
şikest

**Tûrcela xopan bêkes ma Bazbelek çû**  
bûn ji dest

**Banîya Kanîhinarê Dêrika rengîn bû**  
mest

**Meyperest bû bûn ji derdan rûjbe rûj**  
gazî dixwest.

Îro Meks; mîrê Besreka zêrîn, ne hati



bû dîwanê. Di alîyê malê de li ser kur-kê qwîzîn rûniştî, serê xwe kiri bû nav kefên destên xwe, mat, ji xwe re texmînanan dikir.

Xelkê malê bîr dibirin ko tişteki mezin lê qewimîye. Mîr madê xwe dikir, ji lewra tukes ne wêrî bû nêzîngî wî bibe.

Pêlekekê visan ma. Piştî gavekê ji vê bêhişîyê veciniqî. Simbêl keti bû dev. Çavên wî bû bûn wek kodîkek xwîn; mûwên wî gijgijî, nola şûjînan... Deng li kurê xwe Şewl kir:

— Kurê min Şewlo, herwekî tu dizanî vê paşîyê, Mîrzo-yê Burca-Metînan bûye kelemek û ketiye çavê me. Bi ser da dixwaze xweha te Pîroz bi kotekî ji me bistîne. Ez, ko Mekso, Mîrê Besreka zêrîn im û hetanî vê gavê min qehra tukesî ne kişand, ma ko ya Mîrzo-yê Metîni... Tu bawer nakî, ev e reşbeleka wî:

*Burca-Metînan 10-7-1200*

*Mekso !*

*Ev reşbeleka min a çaran û bizan a dawîn e. Heta nihû te guh ne da. Xwedê mezin e ji guhnedana vêya re? Ma qey tu bawer nakî ko ez fermana Metînan li serê te rakim, ew Besreka ko pir li ber dilê te bihurîye ezê xanxerab bikim. Ew dotmîra ko tu hêjayî min nabînî ezê para dilê xwe bikim. Ka binêrim tu çi dibêjî?..*

*Mîrza fîroz*

Şewloyê Mekso bi kerbeke mezin xwend. Ev reşbelek çi bi bongî hati bû nivisandin. Canê Şewlo ji nişka ve rici-fî. Li bavê xwe mêze kir û got:

— Bavo! desthîlanîn mifta xêrê ye. Çêtirê vê tu dizanî.

Meks dîsan fikirî, dizanî bû ev, ne parîyê daqurtîne ye. Êdin kişandina cila bê namûsiyê li serê xwe şerm dît. Çar neçar ji kurê xwe re got:

— Çekên xwe gerêdin, her tiştê xwe tekûz bikin da ko îcar hustûyê Mîrzo di bin wî vekim! Reşbelekek bi vî lewnî ji Mîrzo re şand...

Mîrzo-yê Burca Metînan li ser reşbeleka Meks pir tehl bû. Bi carekê fermana Metînan li ser Besreka zêrîn ve reşand. Dêrika çayê mazî û Banîya Kanîhînarê di ber lîngan de çûn. Ew xortên bi navê bazan dihatine gotin, xwe ji Tûrcelê beradan, li ber Metînan kozîk vegirtin. Her du alî ketin ber hev. Şer dest pêkir.

Hêvîna dilê Mîrzo qeynata çawê Pîroza keçîn bû. Pîroz, li ser banê qesrê digerrîya, dilê wê çargopal lêdixist, tengasîya bav û bira û pismamên wê jê re ne tu kul, lê xurtîya Mîrzo Fîroz ji bona wê dilxweşîke mezin bû. Ji vî alî, wî alîyê Qesrê ve diçû dihat; paçê hevirmîş wek pêlê behrê li ser canê wê pêl dibû; dilketiyê wê li hember, bi hêvîna wê ra diajot ser bav û bira û pismamên wê û ew dişkênandin.

Felekê, berê xwe jê guhêrî bû; neçara Mekso ne ma; Besreka Zêrîn xera bû. Pîroza Qîzîn biderda...

Êdin ji bona xwe jiyîn bikêr ne dît; Serê xwe li zinarekî xist û perçivand, mejîyê xwe teqand...

**Qedrican**

## ELFABÊYA KURDÎ

-5-

Ji ber ko bilêvkirina (y) ji ya (w) hêsa-nîtir û (y) dengdareke nerm e, hêdî hêdî dikeve zarên wan kurdan jî, ko dengdêra (û) stûr û (o) wek xwe dixwînin.

Carinan jî di nav pirsan de dikeve şûna (w):

Suwar - siwar - siyar

Ji hêla din bi (h) re jî diguhêre:

|       |         |         |
|-------|---------|---------|
| Gerîn | gerihan | geriyan |
| Bezîn | bezihan | beziyan |
|       | Dihar   | diyar   |
|       | Mehîr   | meyîr   |
|       | Giha    | giya    |

Ji aliyê din di pirsan erebî de ko keti-ne nav zmanê me diguhêre û dibe (ê)

|        |       |
|--------|-------|
| Zeyneb | Zêneb |
| Xeyr   | Xêr   |
| Xeyret | Xêret |
| Zeynel | Zênel |
| Feyzî  | Fêzo  |

Divêt bête nîşan kirin ko di zmanê erebî ê axaftinê de jî ev (y) yên ha carinan diguhêrin û dibin (ê)

**J. G.** Ji van ku dengdaran me (j) ê xis-te nav elfabêya xwe bi wî dengê ko fren-siz wê bi lêv dibin û (g) herwekî elman wê dixwînin.

**dûmahik heye**

## PESNA DÊRIKÊ

- Ji brayê nazdar û ciwan  
Qedrîcan re -

Dêrik çi xweş e, bi dar û av e  
Ev av e, li erdê bû belav e,  
Yek Xab e, belê bihuşta me'wa  
Pir mişmiş û sêv û darên selwa  
Pir gwîz û hejîr û xox û hinar  
Sed kanî û aş û gol û cobar.  
Yek dî heye, pê dibên Kulêbê  
Gorî ye ji wê re Xurs û Şêbê.  
Pir aveke sar û rind û şêrîn  
Pir dar û ber û giyayên rengîn.  
Bilbil digirî bi ax û zar e  
Daxwaza wê komela Hewar e.  
Mizgînî didê Heval û yara  
Qedrî ko li Şamê bendewara  
Çepkan dikutin dibên bravo!  
Qurbana te bin xweh û brawo!

**Cegerxwînê Kurdî**

## F E R H E N G O K

**Parîz**

Beşçeyê bihnûn û kulîlkan, xemilandî û lêkdayî. Bi frensîzî jê re (park) tête gotin.

**Mehdik**

Xelkê Botan dibêjin. Kurdmancin hene jê re landik, hinen din dergûş dibêjin.

**Fekrandin**

Nihêrtin, meyizandin. Fedkire binihêre.

**Ejnû**

Çok, kab. Kurdmancin hene wek fren-sizan jê re (jinû) dibêjin.

**Heyîn . Neyîn**

Heyîn: halê hebûnê. Heyîna Xwedê ji mêj ve ye û abadîn e.

Neyîn: halê nebûnê. Heyîn û neyîna wan wek hev in. Ji heyînê ketiye neyînê.

**Dîlbend . Dîlbendî**

Ewê ko bi du an çend zmanan dizane, û pirsên zmanekî bi pirsên zmanekî din dide zanîn, dîlbend e. Dîlbendê me her çend bi kurdmancî rind dizane lê frensîzîya wî hinik kême.

Dîlbendî: Karê dîlbendan. Filan kes dîlbendîyê dike, yanî dîlbend e.

**Bronkara mezin û xweşwîsta hemîyan  
Celadet Alî Bedir-Xan**

Mîrê mezin! Kovara Hawarê pir deng û binçîney ilim û zanîne û payey tund û qaimî sen'et û fenn, pilley nerdewana, çûna berew jor û serkevtina ezmana mîletê kurdî beste ziman û mayeyî firehbûna gote û lawîj bera rêyê lêhindabiwanî Kurmanc û çiraya xwêdevaranî pir hoş be hezar dilxweşî û kêf û stranîne me le horga(meclîs) Ismaîl beg da xwend.

Gelêk bira û xweş hawalanî dilsojî rûniştî bûn. Me ke be kenîn û kêf ve xwend. Û bo ev pîrozî û geyştina Hawarê horge xo me daye razandin be yadî rohî pakî bira ciwan û saxî û selametî hî paşîyeçî mawan û be şereffî mezin û xawer hîmetî mezintan me dest kir be kêf û şadî û ûd û kemaçe û gramofon nêzik sê seat me hogirî xoy berneda.

Kovara Zarî Kurmancî ko ta ko niha me ragirti bû, ji wan rojan da dê derkewêt. Me nîsxey wan teqdim dekeyn. Êtir Xudê hawalewe bêt, mîrim.

**Seyid Hizni**

*ŞÎN Û PESNA ZÎNÊ*

Bilbil û gul, parîzê Botan û rengê çav û meng  
Bin siha şîn û keser wek hêstir e, hawar û deng.

Pilpilî, kokîyê zer, nêrgiz benefş û lalezar;  
Wek nivîna Zîna Zêdan, nalenal û giryezar.

Ev stêrên zêr û zîvîn ruhnîya erd û dinê  
Bin pêyê bawîşkê Şînê bîr kirin hej û kenê,

Dengê kund û bûm, eylo ser dilê çaxa buhar  
Ser newal û fêd û kanî hêstirek bû aşîkar

Destê reş, qey hilçinandî, rûyê tavê ser zevî;  
Yek kevanjen, hat û avêt ser dinê tîrê şevê.

Ney dinale, solîn û mêrg, parîzan guhdane wê  
Şahîya dil, deng û govend nav keser çû û revî.

Nûbuhar, havîn û paîz û zivistan jî ne ma  
Dora wan çaxa ketin, lêlan û berf û ah û ba.

Nikil û teyr û dadika dunîkîlan,  
Dîstrên, paxendê wan, Zîn ket li çalan û kelan.

Gevre ye ev şîna Zînê, Zîna Zêdan giryedard,  
bêheval in gul û bilbil, bê heval e lalezar.

Ruhnîya Ewrex û Dêrgul, ruhnîya Burcabelek  
Ruhnîya erdê Cizîrê, ruhnîya Qesra Felk

Ruhnîya efser û tac û ruhnîya rexta nivîn  
Ruhnîya carî xulam û ruhnîya Adar û şîn

Ruhnîya Tacîn, Çeko û ruhnîya mîrê Ezîn  
Ruhnîya parîzê jînê, ruhnîya jar û hezîn

Ruhnîya xizan û sêwî ruhnîya ezman û çeng  
Ruhnîya polad û Ristem ruhnîya çavan û reng

Ruhnîya kanî û hûrî ruhnîya bihna buhar  
 Ruhnîya bîcade, gewher, ruhnîya zîvînîtar  
 Ruhnîya erdê welat û ruhnîya ar û bihuşt  
 Ruhnîya av û çîman û ruhnîya dar û bihuşt  
 Ruhnîya zimridê xusrew, ruhnîya bistamê Key  
 Ruhnîya ney û blûr û ruhnîya paxendê mey  
 Ruhnîya seyda, hewarî, ruhnîya firdewsê bext  
 Ruhnîya hêlîna jaran, ruhnîya ekwan û text  
 Ruhnîya nermî, delalî ruhnîya rêl û çîyan  
 Ruhnîya şêr û piling û ruhnîya mêrg û giyan  
 Ruhnîya hêvîn û pêtan ruhnîya Efrasiyab  
 Bendeyê Zîn e firişte, bende ye Tehmasiyab  
 Ruhnîya sor û sipî û ruhnîya Zer û heşîn  
 Ruhnîya pîr û ciwan û ruhnîya hawar û şîn  
 Merhema hêstir û jarî merhema çaxa xirab  
 Merhema ah û birîn û merhema kalan û bab  
 Zîna Zêdan, Zîna ezman, Zîna nêreng û delal  
 Zîna xortan û firişte, Zîna çav û bab û kal  
 Dilketî ye Zîna Zêdan, dilketî xortan û pîr  
 Ser dilan hêvîn şah e, efser e, ser şah û mîr.


**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## WILATÎ KURDAN

Kabira merwane mal û xaneyî wêranî min  
 Tê bige zanînî fen û kirdewe w irfanî min  
 Roleyî kurdim silahşorim le meydanî şera  
 Alem eyzanê çilon bû Rustemî meydanî min  
 Ger biroy geşt û guzarî bax û baxatim bikey  
 Her delêy (Allahu ekber) çend xoşe seyranî min  
 Awî bermawey mine nîwey cîhan têr aw eka  
 Bo Îraq û el-Cezîre rohe em awanî min  
 Mezre'ey kêlgey wilatim bote enbarî cîhan  
 Rizqî Îran û Ereb te'min eka xermanî min

Bo bilindî xoy be qurbanî jiyanî gel eka  
 Giyan û malî hîçe la serkirde-w goranî min  
 Rû bida bo dîn û millet zerreyê kurtî-w be dî  
 Giyan eden naken tehemmul alim û şêxanî min  
 Ew kese bedbîne îspatî cehil bo xoy eka  
 Wa eka înkârî zor û debdebe w dewranî min  
 Laperrey tarîxî alem şahide bo dewrî min  
 Diyare hêsta Taqî Kîsray dewletî Sasanî min  
 Iddî'ayî ilmî mosîqa emin îspat eka  
 Rast û sêgaw û beyat û lawik û heyranî min  
 Piyawî wek siltan Selahiddîn Eyyobim buwe  
 Fexre bo îslamî alem kirdewey sultanî min  
 Inqîlabî çonî pêk hêna le Îslam û Ereb  
 Mîr (Ebû Muslim) bû serkirdey gelî şêranî min  
 Nadirî Efşarî Abdilkerîm Xanî Zenî  
 Dwênê dengî da le alem setwetî şahanî min  
 Guftugo ba întîhay bê xatimeş bê bem qise  
 Nisbetî arî bese bo en'ene-w inwanî min

**Ebdilxaliq Esîrî**



SAL 1

DUŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 6

8 Tebax 1932

Kovara Kurdî \* Revue Kurde

## TÊDEXISTÎYÊN KOVARÊ

Zozanê Tocî  
Berdêlk  
Ji min bawer bibe  
Melayê Cizerî  
Hawar e  
Dik û rovî  
Mar û mirov  
Hêva çardeşevî  
Welatê Kurdan  
Elfabêya kurdî  
Sê malo gundo  
Kurdewarî

Nemirê Miksî  
Qedrican  
Dr. K. A. Bedir-xan  
Herekol Azîzan  
Bozan Şahîn  
Çirokbêj  
Çirokbêj  
Qedrican  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan  
Stranvan  
Faiqê Bêkes

## BIRÊ WERGERANDÎ

Hawar  
Ji bona Hawarê  
Gulbankê hişyarîyê

Şakir Fetah  
Cegerxwînê Kurdî  
Mela Elî

Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932



## ZOZANÊ TOCÎ ÇAWAN BÛ , ÎRÛ ÇAWAN E ?

Yek ji zozanên meşhûr Kurdistanê (Tocî) ye. Teqriba bi sê hezar metrowan ji rûyê behrê bilindtir e.

Di mabeyna Erdîş û Diyadînê da zozanekî bi av û kanî bi gul û giya ye. Çiqeder rindiyên tebîî hene xwedê jê dirîx ne kiriye. Berîya şerê mezin da çawan bû? Îro çawan e?

Pêşîya şerê mezin da Tocî cihê geşt û seyrana keç û xortên di Heyderan, Ademan, celalîyan bû.

Cihê rindan, bedewan û delalan bû. Li her alîkî kon û xêwet li milî hev drêj dibûn. Keriyên mihê sor û çavreş li nav gul û giyan da winda dibûn.

Li milekî şehîna hespan, li milekî kalîna mihan ji komên suwaran ji refê bêrîvanan û çiyayên delal jîndar dibûn. Adeta her alîkî da wek coybarên avê ken û şahî diherikîn.

Îro çawan e? Eywah... ew çiyayên delal û dilrûba, ew zozanên cenetasa îrû cihê hirç û guran e. Cihê kêrgû û rovîyan e.

Ne hesp e, ne suwar, ne pez e, ne şivan, ne bêrî ye, ne bêrîvan.

Gelo çî li wan qewimî û çî bi wan hat?

Bar kirin bi cîkî ve çûn yan şerekî mezin li wan qewimî û hemî telef bûn.

Belê di pêşîya şerê mezin da tirko ji bo vekirina rêya Tûranê dixebitîn.

Dixwestin tirkên Enadolê digel tirkên Tûranê mitesil bibin. Di mabeyna wan da tu hail memînin. Ew jî bi mehwkiri-na kurdan û istîla kirina Azerbeycanê dihat wicûdê. Feqet tetbiqatê fikrî melûnane ji wan re mimkin ne bû.

Wextê ko şerê mezin destpêkir û xwe ra firset xenîmet zanîn dest bi kuştina file û tehcîra kurdan kirin. File li pêş çavên wan kuştin, piştî wî dest bi derêxistina wan kirin. Ewî li Tocî, Sbînek, Şerevdînê li ser avên sar, li ser kevîyên berfê, li nav gul û giyan da, bi şîr û şekir mezin bûyî, tirkan mal û menalên wan ji destên wan girtin, tazî û birçî ji welatên wan derêxistin, hindêk şandine germa Mosilê, birek li Çiqûr-Owa, Edenê, qismek li şorezara Qonyeyê rast qirin. Ev qewmê nezanê wajûnbext hêja desîsa tirkan xeberdar ne dibûn. Hikûmeta tirkan di cihê miawenet da wesaitî imhaya wan tedarik dikir. Ew jî wek berxên nav çingalê gurî da bi tewrekî masûmane minteziri ecelî mewûdê xwe dibûn.

Yên ko nehatin tehcîr kirin li cihê xwe mayî, ji nezanîya xwe hêj dostê tirkan bûn, ji bo mizeferiyeta wan xwîna xwe dirêhtin.

Mihacirên kurd tazî, birçî seffil û belengaz hêdû hêdû mirin, heta ji sedî deh xelas ne bûn.

Ewên ko xelas bûn jî pirên wan nika-rîyan xwe bigehînin welatê xwe, dîsa ava bikin. Ewên ko çûyî jî îrû tirk xwîna wan dirêjin li cihê çiyân û zozanan wan davêjin hebs û zindanan.

Dê bigrî çiyao bigrî! zozano bigrî! kanîyê bigrî, bê xweyîo, rebeno Nemiro bigrî.

**Nemirê Miksî**

**B E R D Ê L K <sup>1</sup>***- Ji Lorîya Bedir-Xan re -***-1-**

Rabe mêzeke, hebek li doran  
 Te xew dirêj kir, em pir li ber man  
 Êdin mezin î , lolo lawecan  
 Rabe Bedir-Xan! dê rabe lo lo !!

**-2-**

Hişyar be êdî, niho pir qenc e;  
 Axa Kurdistanê, ji te re genc e;  
 Paşîya xewê, bizane renc e,  
 Rabe Bedir-Xan! dê rabe lo lo !!

**-3-**

Gurê devbixwîn kete nav berxan  
 Ma nizanî berx? berx zarê Kurdan  
 Bûne armanca rimanên roman  
 Rabe Bedir-Xan, dê rabe lo lo !!

(1)Lorîya Bedir-Xan, di bin sernameya delalîya zarowan û di hêjmara pêncê, rûpela dudowê Hawarê de belav bûye.

**J I M I N B A W E R B I B E**

Robar hêdî hêdî diherike, pêlên wî sar û xweş in. Ava wî bi kef e, û wek zîv gewr e.

Meşa wî li destê, wek rêveçûna dest-girtîyan û bûkan bialûs e, beza di nav çîyan û gellîyan de, wek reprepa hespên serhişk e.

Lê gava ez jê re dibêjim ko ez hej wî dikim bila ji min bawer mebe!!

Rêl kesk e, siha wê honik û çak e. Li ser çiqilên daran, çûkan dişeqin. Pelên wan ter in.

Lê gava ez jê re dibêjim, ko ez hej wê dikim bila ji min bawer mebe!!!

**-4-**

Dewra felekê, eger ko kîn e,  
 Razan ji me re, qet bi qêr nîne  
 Mesken ne nivîn, dar û devî ne,  
 Rabe Bedir- Xan, dê rabe lo lo!!

**-5-**

Îrû ye namûs, îrû ye xeyret  
 Der û poxanan, em bûne ibret  
 Êdin bes nîne, divê hemiyet  
 Rabe Bedir-Xan! dê rabe lo lo !

**-6-**

Çerxa felekê, eger nesîm e  
 Pêşî ko herçend, kozik kemîn e  
 Çavê xwe veke, xwedê kerîm e  
 Rabe Bedir-Xan dê rabe lo lo!!

**-7-**

Çîman nabêjî, gelo çi hal e,  
 Sebra me nema, binal bikale  
 Rabe ji me re, meydan kemal e,  
 Rabe Bedir-Xan, dê rabe lo lo!!

**Qedrican**

Azman heşîn û avîje ye. Stêr wek gewher û mirarîyan dibiriqin. Heyv bi ruhnaîya xwe distire.

Lê gava ez jê re dibêjim, ko ez hej we dikim, bila ji min bawer mebe.

Buhar bibihn û rengîn e, bi stran û kêf e. Şîranîya wê xweş, xweşîya wê şîrîn e. Tebîet ji xewê radibe û dikene. Her kunc bi kulîlk û mêrg, bi av û dar in.

Lê gava ez jê re dibêjim ko ez hej wê dikim bila ji min bawer mebe.

Can şîrîn e, jiyîn spehî ye. Ez hêj ciwan im. Min hêj bîst û pênc buhar ne dîtî. Gelekî hej jiyîn û hêvînê dikim.

Lê gava ez ji wan re dibêjim ko ez hej wan dikim, bila ji min bawer mebin.

Dê û bav, ap û xwal, pismam û dotmam çiqas delal in.

Bi wan re runiştin û di ber tifikê de axaftin çiqas delal û xweş e. Li ser çiy-an û zozanan bi wan re gerîn û bezîn gelekî çak e, pê dilê mirov vedibe.

Lê gava ez ji wan re dibêjim ko ez hej wan dikim bila ji min bawer mebin.

Heval heval e, lê bra delal e. Çiqas ez hej brayê xwe dikim.

Lê gava ez jê re dibêjim ko ez hej wî dikim bila ji min bawer mebe.

Ez dilketî me. Delala min spehî ye, wek berfê gewr e, wek agira germ e, û wek gulan sor e.

Dilê min di çavên wê de dîl e. Lê gava ez jê re dibêjim ko ez hej wê dikim, bila ji min bawer mebe.

Lê welatê min, welatê dê û bavê min, welatê kal û kalikên min, welatê min ê şîrîn, gava ez ji te re dibêjim ko ez hej te dikim ji min bawer bibe.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## JÎNENIGARÎ :

### MELAYÊ CIZERÎ

Mela yek ji şair û zanayên mezin û navdar yê Kurdistanê ye. Navê wî Ehmed Nişanî bû. Lê bi navê Melayê Cizerî nas û dengîn e. Mela di Cizîrê de xwedê daye. Xwendina wî a pêşîn jî di Cizîrê de bûye. Piştê ji bona xwendinê çû bû Iraq, Sûriye, Misr û Ecemistanê.

Berdevkê mîrê Cizîrê bû. Lê carekê jê enirî û çû bû Diyarbekrê. Mideke xweş li wê maye, birek ji şîrhên xwe li

Diyarbekrê nivîsandîye. Lê paşê dîsan vegeriya û hati bû Cizîrê. Salên xwe di welatê xwedêdana xwe de qedandine.

Bejna melê ne kurt ne drêj, lê navîn bû. Rûwê wî girover, sipî û sor bû. Çav û birihên wî reş bûn. Riha wî sivik bû. Guliyên wî hebûn dihatin heta ber gûhê wî. Por, rih û guliyên wî hergav şehkirî bûn. Enîya wî fireh, stowê wî drêj bû. Rêveçûna wî bi lez bû.

Keftîyek davêt ser serê xwe, yeke din jî li ser dipêçand. Xeftanek li ber bû. Pêlaveke sor têxiste pêyên xwe. Eba werdigirt. Hergav biken bû. Bi dora xwe re xweş dikir, dilê xelkî ji xwe nedihîşt.

Mela di Cizîrê de çûye rehmetê. Di taxa Torê di Medresa-Sor de veşartî ye. Tirba melê ziyaretgah e, xelk gelek qedrê wî dizanin.

Feqehên Kurdistanê dîwana wî bi destên xwe re digerînin. Hin beytên wê ji ber dikin û qesîdeyên wê di civatan de dixwînin.

Tirba melê qenc hati bû ava kirin. Lê vê paşîyê tirba wî xirab kirine. Eskerên tirk kêlên wê şkenandin kevîrên dora wê birin û ji xwe re kuçên tifikan çêkirin.

Dîwana melê li Berlîn û li Stenbolê hatiye çap kirin. Bi destên xelkî re gelek nixeyên destnivîs hene.

Mela ji zmanê xwe pêve bi farişî, erebî û bi tirkî jî dizanî bû. Ber destên wî gelek feqeh bi xwedî bûne. Şairê navdar Feqehê-Teyran jî, ji feqehên melê bû.

**Herekol Azîzan**

## HAWAR E

Hawar e kurê min hawar e,  
 Tu xew meke.  
 Gerek e ko sindûf û merbend,  
 Te zemt meke.  
 Gulfyên keçên kurdan  
 Di destên roman da,  
 Hawar dike  
 Tu xew meke lawê min ha were,  
 Tu xew meke

**Bozan Şahîn**

## JI ZÎN Û MEM

## WELATÊ KURDAN

Dicle û Ferat û ava Xabûr  
 Dengîn.. di ser dinê de meşhûr

Firdews e diyarê ap û xwalan  
 Axa wê nivîna bav û kalan

Ser Bozêrewan û zînê xweşreng  
 Mem lez dibezî ser ewr û ser meng

Bajar û gund qesr û burcan  
 Gî dilxweşî ne bi şewq û şadan

Ava ye bi reng û dewlemend e.  
 Ser erd û dinê jî bêmenend e

Her cih bi eşîr û kanîyên çak  
 Hêlîna welat û şadiyek' pak

Îlon, Tebax, Tîrmeh, Adar,  
 Nîsan û Gulan û cot û bazar

Her rûj û heftî hêv û salan  
 Dîroka welat e rûpelên wan  
 Bav û kur û keç û mam û pismam  
 Pismam mirin di şopa dotmam

Kurdmanc teva mirovên hev bûn  
 Yek jî ne cuda hemî jî tev bûn

Cotkar û şivan bi ken kirin şor  
 Ser mêrg û zewî û solinê sor

Parone û ga û golikên reş  
 Gamêş û medek gedek hemî geş

Hogeç û bizin û berx û nogen  
 Wek av û co sipî û rewşen

Cih cih bi bihuşt zmanê kurdî  
 Cih cih bi meqam û zarê kurdî

Ava ye welatê kurd û kurdan  
 Gencîne ye Zîn û çavê Alan.

**DR. Kmiran Alî Bedir-Xan**

## HÊVA ÇARDEŞEVÎ

Hênîşka min li ser balgê, serê min,  
 di nav kefa destê min î paldayî, lingê  
 min î rastê bi erdê ve nîranî; destê min  
 î çepê li ser çonga lingê min î çepê  
 bû...Jû pêve min xwe winda kir hişê min  
 ji serê min çû, ketim bajarê xewn û xey-  
 alan.

Gava ko min, li jêrê xwe, li deryayê  
 mêze kir, agirekî bi gûr, pêtên wê hil-  
 tên û datên, çavên min ji ber ruhniya

wê venedibûn; tîrêjan davîtin ronîka çavên min...

Di nav deryayê de agir: agirekî wisan bi silorî... ma tu car tê bîra tu kesî? Min serê xwe ji deryayê bilind kir û li jor mêze kir, Hêvek çardeşevî... Bi min re kenîya û bi xapandina min re mizmizî.. û got:

- Lo lawikê delal; ma ne ma tu ji vê bêhişiyê hişyar bibî? Ev, qederek e ez li bende te me...

Tu diqefilî, min germî da te, bi germa min tu ji xirîna mirinê xelas bûyî. Dê rabe ji çêyîya min re berdêlvan bibe!

Lê tiştêk heye divê ko ez jî veneşêrim, min çêyê bi te kir ne ji bona te, belkî ji bona xwe...

Belê, Min tu dît nedît, bêhemdî xwe varqilîm. Bejn û bala te, ez bêhiş kirim.

Ma çiman nabêjim? A bê hiş ez im!.

Lawikê min ez hêvîna te me!!

Herê, tê bîra min li min sar bû, diricîfîm, dilerizîm...

Ew serma ne ji qeşa erdê, ne ji pûka berfê, ne jî ji borîna ba û baranê bû. Ew serma, ji bêkesiyê, û ji rebeniyê bû...

Xwîna min hişk bûbû, hêvê ter kir û bi ser da dibêjî ez, hêvîna te me. Gelo ez çiyê wê bibim? Devê min nagere û hêv li bende cuhaba min e. Lo, xwedê, ez çi vegeînim? ko hêva xwe dilxweş bikim.

Damarê livînê kete zimanê min, min dilkir, dest bi galgalan bikim, lê çi bibînim: Min dît, ji qozîya bakur û roava ewrekî reş, bi mij û xumam bi lez û bez gihîşte ser hêva min. Gotina min di qirîka min de ma. Hêv, reş dixeniqî..

(Ji xewê veciniqîm)

Ax ! Ax ! gewra min, rinda min, dilketîya min. Tu bi çi lewnî têt xewna min ?

Ew, ne xewn bû, ew, ne xeyal bû, ew, ne hêv bû.

Ew ser hatîyek qewîmî; gewra min, rinda min, dilketîya min bû. Ewrê reş jî dizanim kî bû.

Mifsido, ewro! te destê min ji gewra min kir, û gotina min a dawî jî, di qirîka min de hişt.

Ez, niho bi ax û keser, bi qîrîneke bilind diqîrim:

Şermesar im ! gewra min. Ez jî hêvî-nê te, gorîyê te, candayê te me !!

**Qedrican**

## D Î K Û R O V Î

Di gundekî xerab de, dîkek hilkişiya bû ser dîwarê xanîkî û bang dida. Rovîyek daborî, xwe da ber dîwêr û deng li dîkî kir û got:

— Keko, dîko çi dîkî hir?

Dîk lê vegeîrand û got:

— Rovîyo ma tu nabînî gundê me xerab bûye. Ez jî bang didim, dixwazim çend gundî û cotkaran bidim hev û gundê xwe ji nû ve ava bikim.

— Heke welê ye, ma tu nizanî ko ez jî cotkarekî kêrhatî me, dê were cihekî nîşanî min bike, ji xwe re koxekê ava biqim û dest bi xebatê bikim.

Dîk qaîl bû, ket pêşiyê, rovî da pey, ko herin nik kefxweyê gund ji rovî re erdekî bibijêrin.

Dîk danehati bû, di ser dîwaran re derbas dibû, diçû.

Gava gehiştin kavilekê, dîk xwe dahi-lanî deng li kefxwê kir.

Kefxwê rabû, rovî dît.

Kefxweyê te tajîyekî fêris bû. Rovî baz da, tajî ket pey, da heta kuna wî.

Sîbetir rovî dîsan daborî. Dîk ew nas ne kir. Çîroka ava kirina gund jê re got.

Rovî kenî û lê vegerand:

— Bextreşo dîko, hetanî ko tu kizîrê vî gundî yî û tajî jî kefxweyê wî ye, ev gund tucar ava nabe.

Çîrokbêj

## MAR Û MIROV

Mirovek bi rê ve diçû. Rastî marekî hat. Mar keti bû bin kevirê mezî. Ne dikarî bû derkeve, ne jî bilive. Dilê mirov pêve ma. Xwe da ber kevirî, kevir rakir û ew xelas kir.

Mar xwe dawêşand, ser zikê xwe rabû û drêjî wî kir. Bi wî vedaya. Mirovî got:

— Maro, heyran, ma çawan dibe min tu ji mirinê xelas kirî, tu dixwazî min bikujî.

Marî got:

— Ma ji mej ve em ne dijminên hev in, ezê bi te vedim.

Mirov kir ne kir, mar jê nedigeriya. Paşî, gote wî:

— Qet mebit em herin ji eqilmende-kî bipirsîn.

Mar qaîl bû, û dan rê. Gavekê çûn rastî rovîkî hatin. Mesela xwe jê re gotin. Rovî li mirovî fedkirî û kenî. Pişt

re gote wan:

— Divêt ez cih bibînim ko bikarim qerara xwe bidim. Şûn da vegeyriyan û hatin ber kevirî.

Rovî ji mirov re got:

— Tu kevirî rake.

Ewî ew rakir. Rovî ji marî re got:

— Tu jî bikeve bin.

Mar kete bin û mirov kevir berda ser.

Bîstekê man, rovî deng ne dikir. Marî got:

— Rovîyo kanî qerara te, ez di bin kevirî de pelixîm.

Mirov dil dikir ko here. Rovî xwe li buwara wî girt û got:

— Careke din, vî kevirî ji cihê wî rameke.

Çîrokbêj

## ELFABÊYA KURDÎ

-6-

Berdêlên wan di elfabêya erebî de ev in:

گ - گ ژ - ج

Ş- Ev herf berdêla (ش) a erebî ye. Dengê vê herfê di fransîzî bi (ch), di elmanî bi (sch) û di inglîzîyê de bi (sh) têt nîşan kirin.

Ji herfên latînî ji bona nîşankirina vî dengî di destê me de tu herf ne ma bûn. Gora destûreke me diviya bû ko em bi herfên hevedudanî emel mekin. Destû-ra me a pêşîn em dixistin nîzîngî elfa-bêya tirkî.

Ji hêla din cihderka vî dengî gelek nîzîngî cihderka herfa (s) ye.

Miletên ko di zmanê wan de ev deng

nîne li şûna wî (s) dibêjin.

Di zmanê yûnanî de (ş) nîne. Ji lewra yûnanîyên ko nû dest bi frensizîyê dikin şûna (chambre-şambr) (sambr) dibêjin û pirsra (paşa) (pasa) dixwînin.

Di encamê de me ev deng, wek tirkan, bi vê herfê nîşan kir.

Ji xwe ev şikl di elfabêya xelkê Romanyayê de, ji mêj ve hebû.

**X-** Ev dengê ko di elfabêya erebî de bi herfa (خ) têt nîşan kirin. Di hin zmanên arî de jî heye, wekî niho elman wî dengî bi (ch) nîşan dikin. Lê mîletên din, wek yûnanan, bi (x) dinimînin.

Ev herfa ha di hin elfabêyan de, wek ya frensizan, du dangan bihev re dinimîne û dide xwendin, yanî dengê wî wekî heye.

Herwekî:

Alexandre - Aleksandre

Exemple - Egzemple

Ji ber ko dengê wê ê dûtakî ji me re ne gerek bû, me ev herfa ha wek yûnanan û hin mîletên din ji bona nîşankirina dengê (خ) êxiste nav elfabêya xwe.

**K. Q -** Dengên ko di erebîyê de bi (ق) û (ك) nîşan dikin û ji hev bi gelekî cihê ne di zmanê me de jî cihê cihê peyda dibin.

Digel vê hindê (ق) a kurdî ji ya erebî nermtir û siviktir e. Mîrov dikare bibêje ko (ق) a me nizingî wê (q) yê ye ko di pirsra (qristal) de têt dîtîn û frensiz (cristal) dinivîsin.

Ji bona nîşankirina van dangan di destê me de du herf hene: (k) u (q).

Gelo bi kîjkê dengê pêşkî û bi kîjkê dengê paşkî divêt bête nîşan kirin.

Deng wekî ji pêşîya devê mirov derdikeve pêşkî û gava ji paşîyê derdikeve paşkî ye.

Herwekî (ق) paşkî û (ك) pêşkî ye. Ji ber ko dengê (ق) ji qirikê û dengê (ك) ji pêşîya wî derdikeve.

Di zmanê frensizî, elmanî û di hinên din de (ku) dengê dide ko rast bi rast bi rast dengê wê (ك) yê ko di pirsra (kar - كار) de têt bihistin.

Xelkê Eşîra Bêrtî ji çaryekê re carinan (kart) dibêjin. Di zmanê frensizî de ji (kuart) heye û mana wê jî çaryek e.

Tinê frensiz (t) ya paşîn naxwînin û wek (kar - كار) a kurdmançî bê (t) dixwînin. Di van du pirsan de dengê (ku) a frensiz û (k) a kurdî wek hev in û di tu tiştî de ji yek hev ne cuda, ne kêr, ne zêde ne.

**dûmahik heye**

## H A W A R

Hawar!.. guwaya çî nawêk leme ciwantir bo rojnameyekî îmroy kurd rêk ekewê?

Hawar: Le çawî hemû kurdêka dexwêndrêtewe; heta ku dar û berdî wula-tekeşman deqîjênî. Hawar! hawar! . .

Hawar: dukelêkî reşî ah û naley lêqewmawanî kurd le derûnî Salihîyewe dête derewe....

Hawar: Awazêkî tund û karîger le komele gorî mirduwanî Eyyûbî û Bedir-Xanîyewe dête derê..

Hawar: Naleyke le şwênêk dête derewe, nowerastî rojhelat û rojawaye, şwênî diwarojî alem, belam cênîşînî êstay kurd...

Hawar: Nemamêke be destêkî zana le zewîyekî be pîta nêrawe, belam bo emey ber û bûm bida debê çawdêrî bîkrê ta gewre debê...

Inca be hemû hêzî xomewe deqjênim: Hawar dênime ber ew kesaney dû pûlyan le gêrfan da ye, kertêkî bo jiyanî em kovare dabinên.

Hawar dênime ber ew biwêj û nûseraneman, bo ew zana û têgeyîştuwane-man, ke perdey zemanê le goşey penhanî da şardûniyewe: Xoyan derxen, qelem bixene kar be nûsîn tozê yarmetîy em rojname newnemame biden...

Hawar dênime ber ewaney ke yarmetî pûl û nûsînyan pê nakrê, bikoşin em kovare be naw, gewre û biçûkî kurdan da bilawî bikenewe..

Hawar dênime ber ewaney ke her hîçyan lê nakrê, hewl biden em (komele)-yan destkewê bixwêninewe, yaxud be xelkî bixwêninewe ta le xoyan û le xelk bigen.

Çunkî em kovare her pîtey (qiseyey) be destî yekêkî zana û têgeyîştû nûsrawetewe; her qiseyey le dilêk hatûte derewe, be nasikî wek perrey gul, be qayimî (bo parastinî xoşewîstîy kurd) wek sinûqî pola wehaye her bîrey le mêşkî yekêk hatiwete derewe, kurd û kurdistan wek heykelêkî gewre û bilind hemîşe le pêş çawyaye, le xewda bewewe xerîke, le bêdarîşda her bewewe xerîke.

Çunkî em kovare hî yekêke bêçûy gewretirîn û payedartirînî xanedanî kurde, xanedanêk newe û neteweyan bo

pêgeyadin û têgeyandinî kurd xerîk bûn.

Oh Hawar!... Ezanim le kwêwe deyt û le qurgî kê dêyte derewe!... Eger leşyîş le şwênî xoy netwanê bicûlê, be xwa giyanî hemû kurdperwerêk: Le serûxwarî kurdistanewe defirête lat, ew denge bê hêzet be hêz deka... Debê ew dengeraset be gwê rojhelat û rojawa da biçê... Dilî mirdû û zîndûy diwê rastperestî pê raçenê!.. Êşî zamî çend sedsaley kurdî be sezmanyar têgeyênê.

**Şakir Fettah**

## JI BONA HAWARÊ

*Ji bo mîrê zirav û giran û serfiraz û hunermend Mîr Celadet Alî Bedir-Xan*

Yinde go bi navê Cegerxwîn hatiye naskirin destê te maç dikim û bê hejmar silavan li cenabê alîşan dikim. Hebûna serê te li cîhanê ji padişahê mezin dixwazim û bi van çend xweşxwanê jêrîn ez Hawara te pîroz dikim. Welê dîsa wek pîrozname (Hamid Ferec) nabe çiko wî ciwanmêrî berî her kesî Hawara te pîroz kir.

Hezar carî pîroz bitin ev Hewar  
Hezar ah û zarîn dikin lê ez im  
Gelek xob û rind e wekî gulîzar  
Ji wan bilbilan ê Cegerxîn û jar  
Gulistanê zarê me ye ey ciwan  
Dibêm ax welat ax welat ax welat  
Ji bo bilbilê dilnexweş bû bihar  
Evîna te kuştim kirim tarûmar



Çi mêweyek şêrîn berê wê giha  
 Welat pir xweş e çol û deşt û çiya  
 Pesendîde go min berê wê dixwar  
 Li zozanê jorî di cihên avên sar  
 Çi bistanekî pir xweş û pir bi av  
 Di nîva welat min dîye sê bihuşt  
 Heye tê de xox û bihok û hinar  
 Kilêbî û şaxî û çola Hesar  
 Li ber wê heye beşçevanek mezin  
 Hesar gelek xweş e deşt û çiya  
 Şehinşah û paşa ye û xundekar  
 Rez û bağ û beşçe beroj û zinar  
 Serfiraz û comerd e ew beşçevan  
 Hewar e pir ciwan e keç e nûgiha  
 Didî her kesî wî berê avîdar  
 Gelek dîlber û nazik û nazedar  
 Hezar bilbilê dilşewat û bi xwîn  
 Qelen kêm e erzan e pêncsed qirûş  
 Di nêv bağê wê de dikin ah û zar  
 Bixwazin ji Alî Celadet bi xar.

**Cegerxwînê Kurdî**

### **GULBANKÊ HIŞYARÎYÊ**

Çavê xwe veke ji xewab rabe  
 Mêze ko welat hemû xerab e  
 Carek li welatê xwe binêre  
 Rovîgah pişt çûna şêr e  
 Ew deşt tijî ji mêrg û ava  
 Roj tê de ji zû ve çûye ava  
 Ew goh zimiridên di ser de  
 Berfin dihelin û bağ di bin de  
 Ew bağ tijî gul û lale  
 Murxê seherê li ber dikale  
 Lewra go refek ji kund û zağan  
 Hêlîn kirine di nava bağan  
 Bilbil ko bi zarê xwe dixwîne  
 Zağ jî ji xwe deng bi derdixîne

Ber jî rebat e gihaye jêrîn  
 Cîkê xwe yê jêr bi jor bigorîn  
 Carek here ser çiya û zozan  
 B' awazekî jînî ban ke kurdan  
 Bêje hemû yek bibin bi hev re  
 Canê xwe bidin biçûk û gevre

**Mela Elî**

## KURDEWARÎ

Kurde ta key bê xeber bî, nustinet bê arî ye  
Wasitey dwa kewtinet imroke her bê karî ye.

Seyrî em qewmane ke çûn bûn û îsta bûn be çî  
Heyf e bo tu wa esîrî boy te ebd û carî ye.

Itifaqî ger nekey lem cehle xot rizgar nedey  
Paşe rojet qelbe be xwe îş û nûşet zarî ye.

Nîwero ye helse êtir bergi sistî dakene  
Zulmeti şew wa be ser çû we'deyi wişyarî ye.

Rêynezanî berbide-w rêgey mearif bigre ber  
Neştimanet zor ke sase-w jînî her xembarî ye.

Bêkesa qet'î ser bexweyî qed nekey  
Kurdewarî zendewe-w mihtaci litfî barî ye.

**Faiqê Bêkes**

## S Ê M A L O G U N D O !

-1-

— Xelkê delal mi' di' serê vî çiyayî  
 Sê biskê' di' şê  
 — Hûrik, hûrik —  
 berdane ser vî bayî  
 —Şeva nivê şevê, were tewafa sîng û berê  
 Hê' şîr tê ne geriyayê  
 Yar yar yar, sê malo gundo!

-2-

Ez çûme derê çeman, çem ê sar in.  
 Zozanê' bavê te bilind in,  
 Berf û baran lê dibarin.  
 Îsal, sala hefta ye,  
 Berî lawikê min ketiye  
 Welatê xerîb û xurbetê,  
 Sing û berê min fadilê!  
 Bê mihas û bê tîmar in.  
 Yar, yar, yar Xopano gundo!

-3-

Çavên min ê reş, kil derman e  
 Îrû, sê rû', çavên min qerimîn,  
 Li derê van rêyan e.  
 Xwezî min zanî ba  
 Civanê min û bejna zirav  
 Çend rû' mane.  
 Yar, yar, yar, kambaxo gundo!

-4-

— Çiyako! bilindo! rê di ber e,  
 Ezê bişînim Diyarbekra xopan,  
 Heyasekê bînim, ji bejn û bala te re.  
 Xelkê delal mîna mêkewekê  
 Ji ên qereberbanga sibê, kew di ber e.  
 Yar, yar, yar, Xerabe mao gundo!

-5-

Heyranê! Heyranê, heyraneke dî jî  
 Te sê biskê' di şê, berdane ser darê  
 dergûşê, dihinîjî;  
 Te şewitand malê gundî û cîranan  
 Te şewitand lihêfa serçavê min jî,  
 Yar, yar, yar dêngê maqulan li te  
 Nayê gundo!

**Stranvan**

SAL 1

PÊNCŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 7

25 Tebax 1932

Kovara Kurdî \* Revue Kurde

## TÊDEXISTIYÊN KOVARÊ

Kurdmanc qenc in  
Cemîlê Haco  
Mêrê min  
Birîn  
Edebiyatî kurdî  
Hesinker  
Fehengok  
Mişo û Xido  
Elfabêya kurdî  
Delalê Eysê

Cemîlê Haco  
C. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Hevindê Sorî  
Qedrican  
Herekol Azîzan  
Herekol Azîzan  
C. A. Bedir-Xan  
Stranvan

## BIRÊ WERGERANDÎ

Le Hawarda  
Zarê kurdmancî  
Ey fecir  
Ji xwendevanan re

Serjêr  
Hawar  
Lawêkî Kurd  
Hawar

Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932

## KURDMANC QENC IN LÊ NEZAN IN

Kurd qenc in û xwîna wan hemî namûs, rûmet û cisaret e. Ji lewra wilo radibin hevdu dikujin û malên hev dixun.

Yek ji wan serê xwe ji êdin re natewîne. Ji ber ko çavê xwe di vî îşî de vekirine. Çi xortê ko nû radibe, çavê xwe li qenciyê digerîne, her dibîne mêrê qenc û meşhûr ko xelk pesnê wî dide, ew e ko mêran dikuje û talanan ditîne û serê xwe ji berberê xwe re natewîne.

Ew xort jî radibe dest bi kuştin, talan û berberiyê dike û xebateke zor dixebite çima ko jê re pesn e. Heçî mêrê kurd ê ko kete îşkî her dixwaze ko li pêşîya hevalan be. Pir caran jî em dibînin ko yekî kurd bi çend hevalan re -ko ne ji miletê wî- dikeve îşkî, ger xwendin be, mêranî be, ger hemalî be, ewê kurd li pêşîya hevalên xwe hemîyan e. Çima tebîet û cisaretê wî qebûl nake ko kes li pêşîya wî bibe.

Heke miletê kurd jî mîna van miletên din ko îrû pêşde çûne, zana bûne dê dîsan li pêşîya hevalan hemîyan bûna û di nav miletan de meşhûr bibûna. Lê piçkî şûnda mane.

Dermanê zanabûnê jî ev e. Heçî ko kurd e û dibêje ez çêlîyê kurdan im divê arîkarîya civata xêrî bike, her kes li gora halê xwe, da ko civat jî bikare menfî-tekê li me bike, zarowên me bide xwendin û dibistanan bîne devê derfîyê me. Ma ne çêtir e ko em şêst heftê zêrên zer li yek zarokî bidin heta ko em li bajar- kî ji van ên dûr bidine xwendin? Ew şêst

heftê zêr ji civata xêrî re bit em dikarin sed zarokî pê bidin xwendin. Ji ber ko ewê dibistana bîne devê derfîyê me. Mes-ref li zarokan naçe.

Tu tişt jî , mirovan zana nake ji xwendinê pêve.

*Cemîlê-Haco*

**Cemîlê Haco** -Nivîsevanê benda jorîn Cemîlê Haco ye. Gelo Cemîlê Haco kî ye. Ciwan e, pîr e, li kû di kîjan dibistanê de xwendiyê.

Herwekî di encamê de kifş bibit hêjaye ko em bikevin pê van pirsîyarîyan û li wan vegerînin.

Cemîlê Haco xortekî bîst û yek salî ye, ne ketiye tu dibistanan, û ber destê tu kesî de ne bi salan ne bi mehan ne xwendiyê, ji zmanê xwe pêve bi tu zmanan jî nizanî.

Cemîlê Haco kurdmancê pêşîn e ko xwendin û nivîsandinê bi elfabêya zmanê xwe û bê arîkarîya zmanên din elimiye.

Di sala hezar û nehsed û sîh de, ji ber ko em derbasî xetê bû bûn hikûmetê em anî bûn Şamê û lê rûniştandî bûn.

Hingî em çendek bûn. Cemîl jî bi me re bû, tevda di Taxa Kurdan de, bi mêvanî li mala Elî axa Zilfo cih bû bûn. Şev û rûj nav hev de rûdiniştin.

Ez bi elfabê û zmanazîna kurdî mijûl dibûm. Min ji her kesî tiştêk dipirsî û her kesî ji mijûlahîya xwe re bendewar dikir. Cemîl ji herkesî bêtir bendwarî nîşan dikir, qenc berdiket û têdigehişt.

Cemîl yekcar nexwenda bû. Hêj

qelem ne kiri bû destê xwe. Çavên wî hîn li ser tu xêzên herfan ne geriha bûn.

Ev, ji bona min jî derbeke qenc bû. Ji kurdancekî nexwenda re elfabêya xwe hîn kirin.

Hingî, di destê me de tiştêkî çapkirî nîn bû, bivê nevê, Cemîl elfabêya kurdî bi destnivîsê hîn dibû. Min her rûj jê re çend herf nîşan dikirin û bi wan re persin çêdikirin.

Cemîl di nav heftekê de elfabêya kurdî xelas kiri bû. Êdin bi elfabêya zmanê xwe dikari bû her tişt binivîsîne û destnivîsên rind bixwîne.

Ev e Cemîlê Haco û benda wî a pêşîn "Kurd qenc in lê nezan in".

Divêt ko Cemîlê Haco, ji bona xortên kurdan nimûne bibit. Heçî xortên kurd hene ko hej welat û milletê xwe dikin û dixwazin xidmeta wan bikin bila Cemîl bînin pêş çavên xwe û wek wî bixebitin û ji xwe re û ji milletê xwe re bifêde bibin.

Di heqê benda wî de çi bibêjim, çawan pesna wî bidim ez jî nizanîm. Hewqas bibêjim ko heta niho tu kesî sebaba berberîyê û nifaqa kurdan bi vî rengî û bi vî zelalîyê ne dîtîye, ne jî nîşan kiriye.

Her bijî Cemîlo! Xwedê te ji mal û milletê te re bihîlit.

**Celadet Alî Bedir-Xan**

### Mêrê min di şerî de ye !

Di welatî de şerkî xurt, serxwerabûneke mezin çêdibû. Mîr û axa, eşîr û gundî, jin û keç hemî dixebitîn.

Ji ser çiyayên bilind, ji zozanên çeleng dengê şerî û stranên welatî dihatin.

Can û dil, lêv û dev şa dibûn. Gotin distirand.

Di pala çiyayê Herekolê de, di gundekî ava û xweşik de, xelkê gund direqisîn.

Rûj, hêdî, hêdî di gencîneya ronahîya xwe de vedimirî. Di ser serê çiyayê Herekolê de roj wek efsereke zêr dibiriqî.

Herekol xêw û şah e, roj tacê wê.

Ewr di nav rengên sor û heşîn, al û kesk dibezin û dikevin himêzên hev. Îşev şeva daweta Zîn û Zend e. Zîn û Zend îrû deh sal in bi zencîra hêvînê bi hev re girêdayî ne. Sibe Zend ê here daweta welatî, daweta mêr û camêran, egîdên kurdan.

Roj vemiriye. Pûşîyeke reş ket li ser çiyayê Herekolê û berfê gewr. Ba nîne.

Rêl bêdeng e radize. Hêv di navbeynawê ewran de, bi rûyê xwe ê zîvîn dikene.

Di pala çiyayê Herekolê de, di gundekî ava û xweşik de du dil bextiyar in.

Sibe zû saet şeş e. Blûr û zirne bi çil xortên kurd dimeşin. Zend di nav wan de ye. Zend cem delala xwe, dizgirtîya xwe, jina xwe tinê şevêkê ma. Serê wî giran e, dilê wî dişewite. Dilê hêvîna delala xwe ye.

Şev e, şeveke tarî. Bakî sar û xurt tê, berf û baran bi hev re dikevin. Di nav zinar û rêlan de ba difikîne. Dengê wî kûvî ye.

Zend tîfinga xwe dide hevalê xwe, bê Zîna xwe nikare, rêya xaniyê xwe digire.

Di paş wî re, dengê tifingan û hêdî, hêdî  
guregurên topan vedimirin.

Ezman bi stêran tijî ye. Berf û baran  
sekinîne. Ba westiyaye. Bes ji dûr ve  
ewrekî reş dilive.

— Li derfîyê Zînê didin. Zîn ji hun-  
dir dipirse. Dengê mêrê wê têt:

— Zînê... veke... ez im.. Zend.. mêrê  
te..Zîn derî vedike, ji Zend re mêze  
dike...bi çavekî sar û tehl û jê re dibêje:

— Mêrê min Zend.. bi welatfîyên xwe  
ve di şerî de ye!!! û derî digire.

**Dr Kamiran Alî Bedir-Xan**

## B I R Î N

- Şêr bi lepê xwe -

Mêrg û zevî xirbe ne  
Gund û qesr tirbe ne  
Bilbil mirî gul mirî  
Ne rez maye ne tirî.

Ne gul û ne kulîlk man  
Ne parîz û gulistan  
Ne dengê xweş ne meqam.  
Pêve j'ah û intiqam

Çavên bûkan b'hêstir in  
Kund digirîn distirên  
Ne pez mane ne şivan  
Ne blûr û blûrvan

Gelî, Çiya guwah in  
Ne xulam in ne şah in  
Deşt û newal bi xwîn in  
Dîroka me dixwîn in.

Rêl û dehlik bûne zer  
Zevî bûk in kezîzer  
Xwelî bûne xerabe

*Yezdanê me de rabe*

*Bi camêrî nikarin*

*Bi bêbextî dikarin*

*Em jî ker in û kor in*

*Ji pira wan diborin*

*Ne qesr ma ne serban*

*Ne mîrek ma ne siltan*

*Ne saxî ma ne mirin*

*Hîmê me jî dibirin*

*Ken vemirî girîn ma*

*Derman çû û birîn ma*

*Keçik çû û kezî ma*

*Û aheke rizî ma*

*Gulistan bû kevristan*

*Ber çavên min Kurdistan*

*Arîkarê me nîne*

*Hêvî! çirakê bîne!!!*

*Çavê Binefş heşîn e*

*Sosin jî ket, bişîn e*

*Ne giya ma ne rêhan*

*Li parîzê Kurdistan*

*Ne ma lê lê ne lo lo*

*Qirik, kund, gur û eylo*

*Dikenin xudan saz in*

*Kezeba me dixwazin*

*Mêrg û zevî xirbe ne*

*Gund û qesr tirbene*

*Bilbil mirî gul mirî*

*Ne rez maye ne tirî*

*Hawar çû û hêstir ma*

*Nijdî mir û hêstir ma*

*Mamik kur û dirêj e*

*(Şêr b'lepê xwe) dibêje..*

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## EDEBIYATÎ KURDÎ

-2-

Ewane ke kem û zor malûmatêkyan heye le edebiyatî zimananî ewrupa dezanin ke le zemanî konewe, hetakû êstake leser sê paye serkewtiwe we êstakeş edebiyatî ewrupa debête sê çeşnewe. Ewiş: Edebiyatî goranî, edebiyatî çîrokî edebiyatî komîdî (temsîlî)

Edebiyatî ewrupa we betaybetî, edebiyatî yonanî kon le payey yekemînî derkewtinî hemû ibaret bû le goranî, we lew deme yonanîyekan fikr û mêşkî xoyan be "helbest" rêkdexist we destyan dekirde bêjînî ew helbeste be goranî. Ew şitane ke le dilyan deculayewe hemûyan rêkdexist be helbestî goranî, ke degeran le naw şax û dolanî dolanî Yonaniştan, yan ke dadeniştin le ser roxî behrî (Îce) dengyan heldebrî we destyan dekirde goranî bêjîn, heta ewendey pêneçû ehwalayan gorra, we destyan kirde medih kirdin û helbest heldan le ser piyawanî gewre, qaramanan, we palewananî xoyan, hendê car ew helbestaneyan drêj dekirde we ber be medih kirdinîş nedeman, beşku destyan dekirde rêkxistinî jiyani ew piyawane: le dayik bûnyan gewrebûnyan, xu we rewîştian, mirdinyan be helbestêkî dûrudrêj, we be şewqêkî germewe destyan dekirde bêjîn û gotinî ew helbestane. Be kurtî: Yonanîyekanî kon helbestî çîrokîyan dadena, yanî edebiyatyan le payey goranîyewe serkewte payey (çîrokî)

Înca engawêkî drêj edebiyat le payey çîrokî mayewe, heta nexte nexte serkewt û geyişt payey Komîdî, inca her lew

demewe bû ke edebiyatî komîdî le.. ewrupa peyda bû we bilaw bwewe.

Eme payekanî serkewtinî edebiyatî wilatanî rojawa ye. We eme payekanî serkewtinî edebiyatî gelanî arîye. Aya le wiltanî Kurdistan ru wergêrîne duwawe we binorîn le tarîxî edebiyatî, em payane debînîn yan na??...

Madam edebiyatî kurdî, edebiyatêkî arîye, debê weku edebiyatî zimananî rojawa wa bêt, we debê beser ew payaneda ser kewtibêt.

Belê; edebiyatî kurdî le zemanî konî pêşûda goranî bûwe, we kurdanî zemanî pêşû fikr û mêşkî xoyan, awatî dilyan, hemû be helbest rêkxistiwe, we destyan kirdiwete bêjîn û gotinî ew helbestane be goranî. Kurdanî pêşû -her wekû beşêk le kurdanî îmroş awatî dilî xoyan be helbest danawe, we ew helbestaneyan be goranî gotuwe; le damenî çiyayan, yan, leser rûbaran, yan leser kanî û serçawekan be bilwêr, yan be şimşal ew helbestaneyan gotuwe.

Înca nexte nexte eme serkewtuwe, we hezyan nekirdiwe ehwalî palewananyan çîrokî ciwan û şîrîn û qincyan tenya be helbestêkî goranî bibêjin, we her bewe bimênêtewe. Beşku destyan kirdiwete rêkxistinî ew şitane, ehwalî ew piyawe bilindane be çend helbestêkî çîrokîyû dûrudrêj we detyan kirdiwete bêjînî we xwêndinewey le beynî xoyan da.

Her bew çeşne edebiyatî kurdî le payey goranîyewe serkewt bo payey çîrokî; we kurdekan destyan kirde dananî helbestî çîrokî, yan rêkxistinî çîrokî xoyan be şiklî helbest.

Inca çunke edebiyatî Komîdî bestra-



we be qewme bilinde mutemeddineka-  
ne we, we zor pêwistî medeniyete, we  
çunke hêšta hetaku êstake be tewawetî  
pruşkey hetawî medeniyet wilatî kur-  
distanî rûnak nekirdiwetewe, we şaran  
û dêhatî kurdistan be bergî ciwanî med-  
eniyet nerazawatewe, leber ewe edebi-  
yatî komîdî le kurdistanda dernekewtu-  
we, we edebiyatî kurdî hêšta negeyişti-  
wete payey sêyem.

(tewaw ne bûwe)

**Hevindê Sorî**

## MIŞO Û XIDO

Du degbêjên deşta Sirûcê, Mişo Beke-  
bûr û Xidoyê Hindawî hati bûn ziyare-  
ta Hawarê. Her du jî Berazî, Mişo Pijî  
û Xido Elaedînî.

Mişo peyakî bejnokurt û stûr, Xido  
bejnnavîn û ziravik e. Emrê Mişo di  
dora pêncihî, yê Xido di dora sih û pênc-  
can de ye.

Ji me re Memê-Alan strandin, Xido  
bû Mem û Mişo Zîn.

Xido: Mem li ser hespê xwe, li ser  
kanîyê sekiniye, davêje ser Zînê :

*Ez Mem im, tu Zîn î  
Ez kurê mîrê Mexribîyan im  
Tu keça Mîr Zengîn î  
Ez xwedanê 1500 xortên kurdan im  
Tu xwedîya 40 carîyên kember  
zêrîn, bi xelxalên zîvîn î.*

Mişo, ji Zînê ve lê vegerand:

*Lo! lo! Memo bejnzravo li fena tayê  
rêhanê pêda tine tûk û kelemo!*

*Ji dilê min re şifa û hem merhemo  
Xeyala dilê min bi kul, bi elemo!*

Mişo çend beyt ji şihreke xwe jî gotin:

*Em biçûk bûn, pir nezan bûn  
Ko mezin bûn, cangiran bûn  
Li pêş çavên me dûman bûn  
Ev sûcên bav û kalan bûn  
Em ne dane ber xwendinê  
Da bibînin rengê dinê  
Îrû jî hat rûja mirinê*

Mişo dît ko ji beytên wî re kêfa min  
hat, çendekên din jî gotin:

*Rojek hilat li me zer bû  
Hêla xwedê li ser me bû  
Herçend rabû xweş xeber bû  
Paşê ne ma diçû ava  
Hêv û stêrik li nêv nava  
Em jî hemî tevda biçin*

*Çi şîretên kur û bavan  
Bibînin bejn û balavê  
Bi ruhniya her du çavan.*

Di dema rabûnê de, Mişo Hawarê di  
destê xwe de gerand, dil kir ko li me jî  
xweş bikit. Ev e diyariya wî:

*Va îşa vaye vanî  
Dêrgul bi mêrg û kanî  
Sê mêran qelem anî  
Her sê jî Bedir-Xanî*

Dengbêjên me piştên xwe dan felekê,  
berên xwe dan oxurê, xatir xwestin û  
çûn. Oxura wan li xêrê bit.

**Herekol Azîzan**

## ELFABÊYA KURDÎ

-7-

Belê me goti bû ku (ق) dengekî paşkî ye. Herçend ev deng, rast birast di zmanên arî de nîn be jî, di navbera (k) û (q) de kêm û zêde ferqek heye, û di wan zmanan de jî herfa (q) di eslê xwe de, gora dengê herfa (k) dengekî paşkî nîşan dike.

Zmanên latînî ên îrû vî dengî perîcar bi herfa (c) nîşan dikin. Ji ber ko ev du herfên ha, di zmanê eslî de, berî hatina pê, zmanên latînî ên îrû bi hev guherîne.

Di zmanê latînî ê kevn de (K) bi tinê di pirsên (Kaeso) û (Kalendae) karî bû xwe hilîne, di ên mayîn de (c) yek ketiye şûna wê ko xelkê Romayê ew mîna (K) yek bi lêv dikirin û dixwendin. Herwekî di pirsên (cable, café, corbeille, corbe, cristal) de, ko bi (c) kê têne nivîsandin, û ev (c) gora dengê (qu) yê dengekî paşkî dide. Lê belê di zmanê elmanî de ko ev (K) yên ha bi (c) ne guherîne ev pirsên ha bi (K) têne nivîsandin: (Kable, Korb, Kaffe, Koffer, Kristal)

Niho divêt em hinikî bi behayê (Q) ya kurdî ê dengî mijûl bibin. Ji bona wê jî ezê (Q) ya kurdî deynim ber (c) ya frensizî û (ق) a erebî.

Dê em pirseke frensizî bibin : (cri) dengê (c) ya wê gelek nîzîngî (q) ya me ye, û di navbera vê (c) yê û (q) ya pirsra (qîr) hema tu ferq nîne mana wan jî yek e, (cri) di fransezîyê de (qîr) e.

Wekî niho, mirov dikare pirsra kurdmancî (Qrên) bi elfabêya frensizî wek (crên) binivîsîne.

Li ser berhevdanîna dengê van herfan min çend tecrîbe çêkirine ko di zanîna wan de hin fêde hene, herwekî:

1- Min ji hin xortên kurd re -ko ew hînî elfabêya kurdî kiri bûn- pirsra (cristal) da nivîsandin. Tevda li xwe geriyên û paşê bi hev re herwekî di elmanîyê de tete nivîsandin di şiklê (Kristal) de nivîsandin.

2- Min ev pirs ji hin xortên kurd re da nivîsandin ko herfên erebî nas dikirin lê bi erebî nizanî bûn. Bi (ق) kê û di şiklê (قریستان) "qrîstal W." de nivîsandin.

3- Min ev pirs ji kurdekî re da nivîsandin ko bi erebî dizanî bû û bi salan di medreseyan de xwendî bû, melayê min berî ko binivîsîne, hinikî sekinî, pirs çend caran bi lêv kir, di guhê xwe re kir û ji min re got:

4- Gora bilêvkirina kurdekî nezan ko bi erebî nizane divêt (قریستان) "qrîstal W." bête nivîsandin. Lê ko bi erebî hate xwendin dengekî paşkî dê bidit ko ji hundirê qirikê têt û kurdmançekî nezan nikare derêxîne û weke xwe bi lêv bike. Ji lewra bi imlake erebî a fesîh divêt (کریستان) "krîstal W." bête nivîsandin.

- Min ev pirs ji erebekî re da nivîsandin. Qet li xwe negeriya û tavil di şiklê (کریستان) "krîstal W." de nivîsand.

Nisbeta (q) di zmanê kurdî de (150/33798) û ya (k) (1056/33798) e. yanî di zmanê me de (k) ji (q) bêtir e, û nivîsandina (k) ji ya (q) yê hêsantir e, û (k) ji (q) zûtir tete nivîsandin.

(dûmahik heye)

Celadet Alî Bedir-Xan

## F E R H E N G O K

**Deng**

Vê paşîyê û gora mehcetê, ji pirsra deng me çend pirs hevedudanîne. bi hênceta pirsra (deng) ko di elfabêya kurdî de derbas dibe, em dixwazin van piesên nû û hevedudanî ravekin û ji xwendevanan re bidin zanîn.

**Dengî**

Bi deng re girêdayî, pê bendewar.

**Dengîni**

tevayî û halê ” dengî ”, herf carekê bi şiklên xwe, carekê bi dengîniya xwe, têne seh kirin.

**Dengayî**

Pîşeya dangan, pê tevayîya dengên zmanekî tête seh û nîşan kirin.

**Guwah**

Ewê ko tiştekek dît an bihistiye, piştê awayê çêbûna wî gora dîtina an bihistina xwe dide zanîn.

**Pêşki**

Her tiştê ko ji pêşîyê ye.

**Dengê Pêşki**

Ew Dengê ko ji pêşîya dev derdikeve.

**Paşki**

Her tiştê ko ji paşîyê ye.

**Dengê Paşki**

Ew Dengê ko ji paşîya dev derdikeve.

**Cihderk**

Cihê derketinê. Kanîya tişteki. Cihderka (b) lêv in, yanî dengê herfa (b) ji lêvan derdikeve.

**Ravekirin**

Ji rayî vekirin, pêş çavan xistin û dan zanîn; îzah kirin.

**Herekol Azîzan**

## ZARÊ KURDMANCI

Kovareke kevn e. Ev heft sal in, xweyîyê wê ê xwedan vîn û hîmet, Mîrza Huznî Mukriyanî kovara xwe di Riwandizê re derdixînit.

Mîrza Huznî berî hingê li Helebê bû. Ji xwe re çapxanekî saz kir û bi xwe re biri bû Riwandizê. Zarê Kurdmanci di wê çapxanê de tête çap kirin.

Lê sed heyf û mixabin ko zarê Kurdmanci ji bê xweyî tê, ev du sal in, rûpelên xwe li xwe girtî bû û nikari bû derkeve.

Di bîst û sê tîrmeh û 1932 û di roja şembehê de ji nû ve vegeriya jîyînê û derket. Tê de gelek tiştên qenc û bi fêde hene. Xêzên jêrîn ji benedê wê ye ko sernama serbihurdîya (biserhatîya) Kurdatî hildigre:

*” Serbihurdî gevre û nawdaranî Kurd le salî hezar û du sedê hicrî heta hezar û sê sed. Lem kovare da yek be yek ev piyawê gevrane basî ekeynewe deyxeyne ber çawî xwendîware xweşewîstekanî zarê Kurmanci.*

*” Ê evane be kitêbiş teqdîmyan ekrê, le esrî çîwarde bergî yêkemîn we le ewelî em esrewe heta emro be bergî duwem nawinrawe.”*

Hawar hevala xwe ne a nûza lê ji nû ve za bi germîya dilê xwe hemêz dike û

tê xweşhatina wê.

Ji Yezdanê pak jê re jiyîneke dirêj daxwaz dikit û pê re ji xwendevanên xwe hêvî dikit ko kiriyarî Zarê Kurdmancî bibin da ko ev kovara kurdî bikarî bi jîjt û xidmeta millet û welatê xwe bikit.

**Hawar**

## LE HAWAR DA

Le Hawara dilêkî tewawe, cigerêkî xwênîn, çawêkî pir firmêsk ebînim.

Le bédengî şewda le nêw dengî giry-anî minalanî bêbawik û jinanî bê role, û nalînî ciwanemerganda dengî (Hawar)-im dête gwê, nazik... dilgîr...

Lam le tîjtirîn awazî mûsîqî hezîn şêrîntire dête gwêm ew denge espayîye her weku şiney nesîm, wirşey giya, naley qumrî, qaspey kew û tavgey avî rûbar.. dête gwêm. Weku ahî hezîni sere mergan ... Bê çirpe, bê sîrwe... bê deng.... meng... Le tirsî çavî bidan, le samî destî duşminan be espayîy dête gwêwewe ah. Natiwanim bilêm çi karî le dilim ekat ??

Natwanim bilêm çi yadigarî le demaximda rast ekatewe û le çi perêkî dilim eda !!. Le kam e'sabim ekewê !.

Dengî Hawar le Şamewe dête gwêm le paş ewey deşt û biyabanî bêgane (biyanî) kêw û keji xoman ebirê. Belam te'sîrekey nagorrê le dilî min da, nek be tenha her le dilî min da, belko li dilî hemû kurdêkîda. Gulê sîsî hîwa egeşî-nêtewe, meylî azadî taze ekatewe, le

perîşanî û parçe parçeyî xoman egeyn.

le Hawar da le esmanî bêtemî adab-da dûr le tenî siyaset bê ewey ke zerrey zencîrî esaretman bête gwê, û kelepey ubûdiyyetman çaw pê bikewê, ya destî xwênawî duşminman bibînin.. Dûr lemane le bin sêberî darî hîwada ehesyînewe nesîmî serbestî û azadî hel emjîn, his be şêrîni jiyân û xoşî serbexoyî ekeyn. Le Hawarda hevalî kurde ceger xwî-nekanman ezanîn, şêwey peşewî jînî hejarî nezanî Kurd û minalanî gîrûdey bê bav bra ebînin.

Le Hawarda giyanêkî bilind, dilêkî be hêz, çengêkî asinîn, gerdenêkî azad, û damenêkî pak ebînin ke hemûyan le leşêkda gir bûnewe û be dengêkî berz (hawar) ekat û ewtê:

” dilê min ji bo hejkirina Kurdistanê ye, xurtîya min ji bona arîkarîya Kurdistanê ye, xwîna min ji bona şer û rijandinê ye !!!”.

Le Hawarda wêney çiyayanî xwênîn û dolanî gulgulî rengî wilat, û nimûney merdayetî şêraney Kurd ebînin...

Le Hawara... le naw bergî ew kovare kurdîyeda hîway jiyân eçêjîn, xuncey azadî be xwên geşawebûn ekeyn dilêkî be hêza le tengane perwerde kirawda ebînin... Le Hawarda kurdêk taze gençêkî azad.. jiyânêkî şêrîn ebînim. Bo yê pêwîste şev û roj (hawar) bikeyn û le yezdan biparênewe û bilên:

” Bijî Hawar... bimîn xewî Hawar ”.

Ta weku dengî Hawarman egate perdey kirdigar destî xwênawîman dawênî duşmin egrê, zarî wişk û tînûman awî ilm û fen û zanistî enoş. Ewsa be çengî asinîn weku hetû cergî duşmin derbihênîn, toley bav û bray xoman bisendîn.

Êtir ... bijî Hawar .... bimîn xêwî Hawar.

Serjêr

## HESINKER

Hesinkerek şev û rûj, dixebitî ji dil can Xebata wî zincîrek, ko naqete tu caran Her carekê ko çakûç, lêdixist dilxweş

dibû  
Imîda wî qewîtir, hêviya wî geş dibû  
Çend rûj holê pêşveçûn, min jî bala xwe

didida  
Zincîr hê ew zincîr bû, dîsa weke xwe  
dima

Bi wî çakoçê biçûk, ew zincîra qerase  
Ma tucar tê şikandin, gelo kî pê hesas e  
Çûme ez nik hesinker, min jê kire pirsîyar

Li ber pirsîyara min, karê xwe kir hebek  
sar

- Lo! mamê min î delal, kerema xwe  
erzan ke

Dilopek ji derdê xwe, ji min re jî  
nûş'canke

Herçend bala xwe didim, ev çakûç û ev  
zincîr,

Tinê bûye derd û kul, tiştêkî din nakev  
bîr!

Heta kengê? tê wisan, bi teqîn û reqîn  
ke

Xêrgunehê vê toqê, ji bendê re telqîn ke.

— Wey ser çavan tu hatî, lo lawikê  
zemanî

Ji xwe ez bûm çavnihêr, te bi xwe kir  
xuyanî

Hêj hetanî vê demê, tukes nehat bi  
meraqq

Ne gotin gelo çi ye, ev teqîn û ev teraqq  
Guhdar bibe kurê min, tu hêjayî xuya ye  
Sirê ji te veşêrim, ew ji bo min ceza ye  
Berî ya min ferztir e, gotina bav û kalan  
Gelek li cî gotine, rehmet li wan bi baran  
Wan gotine " yê bêsebr, tim tihin û tim  
bê av

Hûrik hûrik bi derzyê, qulteyn dibin  
sardelav "

Ev xebat û cehda min gotina bavanî ye  
Ger îrû neçe serî, bo sibê hêsanî ye  
Bê imîdî ne qenc e, tu destê xwe vemale  
Ne ez zêde xweh bidim, ne tu bo min  
binale

Yekdest em bi repînkîn, heval dibe zil-  
celal

Bira toqa dîfîyê, bibe polayê zelal  
Em vê toqa lanetê, ji serê xwe biderxin  
Hingî bira bibînîn, ya em gur in ya berx  
in.

Qedrican

*DEALÊ EYŞÊ*

-1-

Delalê Eyşê. Delalê Eyşê!  
 Çiya bilind in, ez te nabînim  
 Destê xwe ser sînga te bigerînim  
 Li dinyayê weka te ez nabînim.

-2-

Delalê Eyşê, Delalê Eyşê!  
 Ezê tenbûrkê çêkim, ji çarde perdan  
 Ezê têlan bêxim ê, ji kul û derdan  
 Jinê delal, ji mêrê xerab  
 Têtine kuştin, nayine berdan.

-3-

Delalê Eyşê, Delalê Eyşê!  
 Ezê tenbûrkê çêkim, ji hestûwên maran  
 Ezê têlan bêxim ê, ji biskê yaran  
 Ezê devî deynim, bin guh, guharan.

-4-

Delalê Eyşê, Delalê Eyşê!  
 Ezê tenbûrkê çêkim, ji hestûwên çûkan  
 Ezê têlan bêxim ê, ji kezîyên bûkan  
 Na, ez nazewicim dosta min piçûk e.

-5-

Delalê Eyşê, li min û li wî dilî  
                             O li wî dilî  
 Bejna te kulîlkan, nû xemilî  
 Dê û bavê te ser min û ser te  
                             Çûne gilî  
 Leyla li min î, Leyla li min î  
 Terka te nakim heta xirêna mirinê  
 Ez têr bûme êdî, ji vê gotinê.

**Stranvan**



**SAL 1  
HEJMAR 8**

# **HAWAR**

**ANNÉE 1  
NUMÉRO 8**

**DUŞEMB  
12 İlon 1932**

**LUNDI  
12 Septembre 1932**

**Kovara Kurdî \* Revue Kurde**

## **TÊDEXISTÎYÊN KOVARÊ**

**Şêraniya zmanê kurmancî  
Rêya Teze  
Strana dilan  
Dawet e  
Edebiyatî kurdî  
Hawarek  
Kurdekî kiçik  
Bêriya welat  
Ala Kurdan  
Ferhengok  
Elfabêya kurdî  
Tirsim ez bimirim  
Yelî delal**

**C. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan  
Hevindê Sorî  
Wecdî Cemîl Paşa  
C. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
C. A. Bedir-Xan  
Dîlokvan  
Stranvan**

## **BIRÊ WERGERANDÎ**

**Ji Xanî ra  
Hişyarname  
Ez gorîya bangê te me**

**Behmen Zeredeşt  
Lawê Fendî  
Mamoste**

**Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932**



## ŞÊRANÎYA ZMANÊ KURDMANCÎ

Wekê ez gehîştim Bêrûtê roj çû bû ava û sê saet ji şevê derbas bû bûn. Sibetir, berî nîvro, ji mêvanxanê derketim, min da kûçe û kolanan, û gehîştim meydana Burcê. Dinya germ, ba şil, bihna mirov teng dibû, diçikiha.

Min xwe da ber siha qehwekê, canê xwe divêsihand.

Burc meydana fireh û drêjkî ye. Di nava wê de parîzekî kiçik lê spehî heye. Bi giya, bihnûn û daran xemilandî ye. Tê re aveke kiçik dibihure û dikeve nav bêrmeke tenik. Erda bêrmê ji kevirên şehkirî û benevşgon raxistî ye. Rengê avê tê de winda dibe. Pêrm wek zevîyeke benevşîn xuya dike.

Li serê meydanê, sê kûçeyên mezin - ji bakur, ji rojhelat û rojava- xelkê bajêr ditînin û lê dirijênin.

Xelk di nav kûçeyan de mîna robaran diherikin. Ev sê robarên ko di meydana de digihin hev, dibin lehîke boş û xwe didin ber parîzî. Di ber caxên parîzî re pêlên lehîyê dişkên û lehî dibe du bir, birek di ber rastê û birê din di ber çepê parîzî re diherike, heta piştî Serayê, paşê, dilopên lehîyê, ber bi behrê ve, ji hev dikevin û belav dibin.

Xelk di ber min re dibuhirîn. Pîr û ciwan, jin û mêr, dewlemend û belengaz; ji her rêzê, ji her rayî, ji her nijad û miletî.

Min ew ji belg, dêm û serçavên wan nas dikirin.

Carinan şefqekî gewr û pehn bi şaşî-kekî kesk diketin ber; kumekî sor di ser

çarîkekê re diqeliqî. Jinikeke zik mezin, wek denekî, gêr dibû û diket piştî keçî-keke narîn û bejnzrav.

Ev e, pêxwasek, qaşo bê hemdê xwe destên xwe di ser hêt û navkelên van pîrek û keçikan re digêrîne.

Min canê xwe vêsîhandi bû. Rabûm, ketim nav pêlên lehîyê. Ji nişkê ve, ji kolanekê, çend serîyên bi kum û destmal li min der bûn.

— Ne lo!... hê zû ye... ma çîman...dev jê berde... Heso digot... na herê..guh mede....

Qet ne dihat bîra wan ko ez jî bi zmanê wan dizanim, ko ez jî yek ji wan im.

Ji xwe ji min re zilamek divîya bû ko hûrmûrên min hilgire, bibe mêvanxanê. Min deng li yekî kir.

— Xorto, heke vala yî bi min re were.

Xortê ko min deng lê kiri bû, ji hevalên xwe veqetiya û da pey min.

Heta ko em gihîştin dikanekê min deyn ne kir. Li dikanê min cihareyek da wî û me dest bi axaftinê kir.

— Xorto, tu xelkê kû derê yî?

— Ez xulam, ez bedlîsî me.

Lê zmanê wî ne zarê xelkê bedlîsî bû, min got:

— Ma çîre dibêjî ko bedlîsî yî, ji zmanê te kifş e ko tu ji dora Mêrdînê yî.

— Belê, xebera te rast e, lê ez eslê xwe dibêjim. Ez bedlîsî me, lê di mihacirîyê de derketim û di dora Mêrdînê de bi xwedî bûme, ber vê yekê...

— Kengê hatiyî Berûtê?

— Ev bû salek û hin, ma ez xulam tu ji kûjan welatî yî?

— Divêt tu jî , ji zmanê min bizanî.

— Gora zmanê te tu ji welatê Botan î, lê di vî bajarî de tu botî nînin.

Pêlekê sekinî. Kifş bû ko difikrî û di bîra xwe de li tişteki digeriha. Di pey re, rabû ser xwe, hat destê min û got:

— Ez xulam, li sûçê min menêre, min aniha tu nas kirî. Ji xwe min bihîsti bû ko yek ji we li Bêrûtê ye. Min dil dikir ez herim ziyareta wî lê min fedî dikir. Xwedê ji min re li hev anî.

— Belê yek ji me li Bêrûtê ye, lê ew ne ez im, ew brayê min e. Ez li Şamê rûdinim.

Di pey re ez û xweyîyê dikanê em ketin bazara kaxeza Hawarê. Ji xwe ji bona kirîna kaxeza Hawarê hati bûm Bêrûtê.

Min şuxlê xwe kuta kiri bû. Kaxez bi rêhesinê bihata rêkirin. Tinê kaxeza çermî min bi xwe re bibira. Xortê min çermê Hawarê kir pišta xwe û me da rê.

Em çû bûn dikaneke din. Min bi xweyîyê dikanê re xeber dida. Kurdmancê min di kurçikekê de li ser tetikan rûniştî li min dinêrt û dikenî. Min jî bi devkenekê jê re got:

— Xorto, te xêr e, çire dikenî?

Xêr e ez xulam, ji kêfa kurdmancîyê, ji kêfa kurdmancîya te dikenim. Belê li Bêrûtê kurdmanc zehf in. Ji sibê heta êvarê em bi kurdmancî xeber didin. Lê gava ji devê te dibihîzim hêj bêtir kêfa min jê re têt. Ax ez xulam, tu nizanî kurdmancî çiqas şêrîn e.

— Na herê, kurdmancî kengê bûye şêrîn

— Bi serê te ê ezîz, tu zman wek kurdmancî ne şêrîn e. Ez bi tirkî rind niza-

nim, lê min ew gelekî bihîstiye. Li Îraqê min erebî û inglîzî gelek bihîstine. Li Sûrîyê her rûj erebî û frensîzî dibihîzim. Ez van datînim ber hev û dibînim ko şêranîya zmanê kurdmancî di tuwan de nîne. Lê çî fêde ew bi kurdmancî nizanin.

— Ma bizanîyana çî dibû?

— Hingî, ji kurdmancîyê pêve bi tu zmanan xeber ne didan ....

**Celadet Alî Bedir-Xan**

## R Ê Y A T E Z E

Rûjnameke kurdmancî, bi herfên nû, bi kurdmancîyeke xwerû, li Rewanê, di şikleki spehî û çeleng de derdikeve.

Vê paşîyê çend hejmarên wê gehîştine destê me. Çavên me pê biruhn bûn, dilê me şa û geş bû.

Kurdmancên Rewanê ji rûjnamê pêve çend kitêb jî derêxistine. Me sê çar rûj mijûlahîya xwe bi wan kirin.

Ji nav rûpelên wan ên taze û ter bihna kulîlkên çiyayê Elegozê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de şal-û-şapikê kurdmancî, xencer û piştxcera kal û kalikên me dihatin dîtin.

” Rêya Teze ” wek navê xwe taze ye, nû ye, nûbar e. Lê ji Hawarê kevntir, bi emr jê mezintir e. Hejmara wê a paşin ko gehîştîye destê me a pencî û nehan e. Li gora ko Rêya-Teze rûjnameke dehrûjkî ye, berî salkê û hin dest bi derketinê kiriye.

Ev çend beytên jêrîn ji kitêbeke kurd-  
mancên Rewanê ye:

Eyşê, Qurban, rabe j'xwê  
Herin mektêbê. dersxanê  
Welatê kitêban pir şêrîn e  
Meriv li wê dinya dibîne  
Dê û bavê me tarîyê da bûn,  
Ji dinê bê hes, bê xeber bûn.

Dîsan ji wê kitêbê şihreke zarokan:

### Bizina Pîrê

Bizina pîrê çû çolê  
Lê da berf û bagerê.  
Pîrik derket ji malê.  
Li bizina xwe digere  
Hê! hê! .....

Bizina xwe digere  
Surê pozê pîrê bir,  
Pozê pîrê werimî;  
Guran bizina pîrê xwar;  
Pîrê li ser digirî  
Way! way!.... liser digirî

Ji bona îro me hevqas got, pêşdetir  
em dîsan ji Rêya-Teze behs bikin.

Em ji hevalê xwe re rêyeke xweş û  
dawîyeke geş hêvî dikin. Divêt ko her  
gav me hay ji hev hebît û gerek e ko em  
hevdu ser xebata hev serwext bikin.

**Herekol Azîzan**

### STRANA DILAN

Lêvên te du pêt in  
Çavên te stêr,  
Diranên te mirarî  
Dilê te dêr.

Ava bi ronahî  
Wek Zerdeşt î  
Dinê û ezman î  
Mêrg û deşt î.

Sor î rohelat î  
Deng û nay î  
Buhar û blûr î  
Brûsk û ba yî.

Porên te zêr û zer  
Canê te zîv  
Tu bibe ji min re  
Taştê û şîv.

Taûsê arper î  
Kenîna bûk  
Bikene dimirin  
Bakur û pûk.

Tu ewrên ezman î  
Tu keskesor  
Li ber lamên te lez  
Dimire sor..

Tijî hêvîn tu î  
Hesret jî tu  
Zana û ferzane  
Şîret jî tu

Çûkeke delal î  
Dengekî çak  
Kaniya zelaî î  
Wek berf î, pak.

Xwesteka min tu î  
Strana min î  
Mêkewa min tu î  
Şivanê min î

Xezala min tu î  
Çavên te reş  
Ez beranê te me  
Sînga min geş.

Pêşnivêjê te me  
Tu mizgeft î  
Dilê min ezman e  
Tê de stêr î.

Di çavê' roj û hêv;  
Ronahî tu,  
Li qesra spehîyan;  
Avahî tu.

Sînga te çiya ye  
Tu agir î  
Li buhiştê hêvîn  
Pêxember î

Bêkes im û tinê  
Û bê dotmam  
Di vê dinyayê de  
Bê govend mam.

Kulîlka Adar î  
Bihna buhar î  
Tu deng û hawar î  
Stêra êvar î

Pêşnivêjê te me  
Tu mizgeft î  
Dilê min ezman e  
Tê de stêrk î.

Porên te zêr û zer  
Canê te zîv

Tu bibe ji min re  
Taştê û şîv

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

### *D A W E T E*

Ji zozanan hat quling  
Xeber anî ji xweyîng  
Dibê werin dawet e

Dawet e xweş dawet e  
Ji kurdan re rûmet e  
Dawet şer e, şahînet.

Bê xweyî man gund, kelat  
Gazî dike ev welat  
Dibê werin hewar e.

Bê kezî man keç û bûk  
Di rêlan de ba û pûk  
Bê belg mane dar devî.

Navno dikin kurdanî  
Ne heliştin mêranî  
Kurdino rabin dawet e.

Herê lawo dawet e  
Dawet e xweş dawet e  
Bûka te jî Kurdistan.

Kezîyên wê delal in  
Çi nermok û şepal in  
Ber meqesê mede wan.

Dengê avê çî zîz e  
Newal jê re ezîz e  
Welat! welat! welato!

Ji zozanan hat quling  
Xeber anî ji xweyîng  
Dibê werin hewar e.

**Celadet Alî Bedir-Xan**

## EDEBÎYATÎ KURDÎ

-3-

Lewaney serewe be tewawetî derde-kewêt ke edebiyatî kurdî edebiyatêkî arî ye, we bilinde, we berze, we herwekû edebiyatî zimananî arî qabila bo berzbûnewe we serkewtin. we her çende med-eniyyet le kurdistanda bilaw bibêtewe ewende edebiyatî kurdî serdekewêt we berz debêt.

Ba nextê binorin lew hezaran çîroka-ne ke kurdekan helyan bestwe, we day-an nawe, be tewawetî biyan xwênîne-we, lew deme dezanîn ke hîç ferqêk niye le beynî edebiyatî ême, we edebiyatî zimanêkî rojawa we lew de me bilindayî edebiyatman deselmênin.

Aya helbestî çîrokî (Mem û Zîn) çî ferqêkî heye legel helbestî çîrokî yonanî kon (Ilyada) !!...

Aya ew helbestanî çîrokîye ke imro le ewrupa deybînîn çîferqêkî heye legel helbestî çîrokîyî imro ke le kurdistanda bilaw bûwatewe!!...

Ewende pê nawêt, her nextê binorin lem çîrokey xwarewe we sirincî lê bide-yn ew deme bilindayî edebiyatî xoman têdegeyn.

Em helbestî çîrokîyey xwarewe le deş-tî Herîrî rojhelatî (Hewlêr)-ke beşî nawerastiye le Soran bilaw bûwetewe. We lew nawe be (şîrî leşkerî) benaw bange. Çûnke danerekey nawî (leşkerî) bûwe. Lem çîroke da basî (Mîr Suleyman begî Herîr) dekat ke axremîn paşay emaretî Herîr bûwe. Em qaremane çend salêk beramber turkan radewestêt, we hera dekat, le paşan deşkêt û degîrrêt

û debrêt bo Estemûl legel leşkirîy piya-wî. Mîr Suleyman beg xuşkêkî zor ciwanîdebêt ke nawî (Xanzade Xatûn) debêt.

Leşkerî hezî lê dekat. Inca şewqî ser-bexoyî le layêkewe we girpey hez lê kir-din le layêkî dikewe agir le diliber dedat. We dest dekate dananî em helbes'e ciwan û şîrîney xwarewe:

"Le wî dewrim denorî heta ewî zema-nê, le wî zemanim denorî heta dewrî Qubad Xanê, le dewrî Qubad xanim denorî heta dewrî Xan Suleymanê, le dwerî Xan Suleymanin denorî heta dew-rî Cum Cume sultanê, le dewrî Cum Cume sultanim denorî heta dewrî şahî Newşîrewanê. Ekim ne dît wekû mîrî Herîr û Herîr begiyan, le dîwanî hîze romyan, helbestê be giranê. Ewro ke dadesubhaynê, çî modet nîne lo ewî axay, ewetanê be tenê maytewe le wila-tî xerîbiyan bebê Xudanê.

Ewroke serê min dehêşe, dilê min qed hadî nabê leber giryan, eger emin roj-im lê helatibû le hêmû qedem û heft şaran, dedatin le geliy Amedî geli Sûla-qê, dedatin le serî Herîr û Herîr begi-an, dedatin le çemî Sûredê, le min xem-liye be kulunkî sêwî we henarî we ewan we mîrate dar hermeyan, hemû ales seherî, beyanî komelêkî bulbulan, êke şaloran, be çirike çirikê le naw da dekin dad û fixanê. Eger le hîkewe beser bêne xwarê komelêkî mehbûb û zerdiyan deyan gût: leşkerî!!... Eger etu hezde-key le xoşîyan qebûl nakey taliyan, bige-re rewekî tûlan digel xêzanêkî tajiyan, herewe serî Herîr û Herîr begiyan bike zewq û sefay ewan zerdiyan. Dênewe le

kolf qesarê, besik berdanê, xine lênanê çawreş kirdinê degel kaniyan arekêkî tinoke be tinoke deçorêtwe le gahî şare kezyan.

Ewroke şayîyek degerê le serî meydanê, têdaye ayşî Suleyman begî degel mîrê medyan; eger şîrekî bigrî be pênc sed zêrî lê pêşra bidey le sîngî ewan zerdîyan. Le ber dilê min cezme çî nukar nake leber ilûd û meçîdî ewan taqe şayîyan, emin le paş axê xom swar nabim leçî muanekan deber piştî xom ranekem çî xenceran helnagirim çî nasiraniyan heldigirim keşkolêkî derwêşan, postalêkî haciyan; û depremewe leberî estiryar, deçimewe naw qewme gelêkî lewan dasinyan. Ewroke dade subhaynê çî modet nîne, lo ewî axa, ewetanê be tenê maytewe le wulatî xeribîyan, we nayêtewe ser ew mûlk û dewletan, heta ebed û ebel ebedîyan.

### Hevindê Sorî

## H A W A R E K

*Ji xweyîyê Hawarê, apê min ê dalal  
Celadet Alî Bedir-Xan re :*

Min çend xeber ji bona Hawarê nivîsandine. Ji apê xwe hêvî dikim bi çavekî qenc li wan mêze bike.

Ez yek ji wan kurdên piçûk im ko bi şev rûjan, bi rûj şevan dijmêrim û di dilê xwe de dibêjim: gelo Hawara me kûjan rûjê ê bê?

Rûjên postê bi me nas in. Di wan rûjan de em çavnêrîya wê dikin.

Rûja ko Hawarê ji postê distînim, dikim bin paşila xwe û newêrim zû zû vekim. Ji ber ko kêfa dîtina wê ji xwe jî didexisim. Hêdî, hêdî piştta wê vedikim, li çermê wê dinêrim, li têdexistîyên wê agah dibim û paşê dikevim nav rûpelên wê.

Hawar kanîyeke zelal, ez merivekî tihî im; piyan piyan jê vedixwim, agirê dilê xwe pê vedikujênim.

Apo, tu nizanî Hawar bi me çiqas xweş e, çiqas delal û beha ye. Tu zanî çira apo? Ji lewre ko ev sê çar sal in ez di dibistana biyanîyan de dixwînim, hîn ez bi xwe ne hesîya bûm lê ev Hawara dilşewat ez dîn kirim. Şev û rûj dixwînim, bendên wê ji ber dikim, û dîsan jê têr nabim.

Ez û hevalên xwe em nav hev da şewîrîn. Belê herçî ko bi zmanê me hate nivîsandin ji me ra hêsaniyê, xwendina wê bikêf e. Ko me ew carkê xwendêdî ji bîra me naçe. Ma ji bona herkesî jî ne wisan e. Herê zmanê herkesî jê re şêrîn û hêsaniyê. Ji lewra her kes bi zmanê xwe dixwîne û dinivîsîne. Tinê em kurd di dibistanên xelkî bi zmanê xelkî dixwînin. Ma çira ji bona çêlîyên kurdan jî dibistanên cihê çênakin ko em tê de bi zmanê xwe bixwînin.

Tu zanî apo min çî kir. Ser vê yekê ez rabûm û çûm cem bavê xwe û min jê re got:

— Bavo tu çira min dişînî dibistana biyanîyan. Di wan dibistanan da zmanê Hawarê nîne. Ew zmanê ko zmanê min e, zmanê kurdmancî ye.

Bavê min hinik sekinî serê xwe kir ber xwe, madê wî guhêrî, bi dengê giran,

lê zîz, li min vegerand û got:

— Lawo xebera te ye. Divêt ko tu di dibistanên kurdan da bixwînî. Lê sed heyf û mixabin dibistanên kurdan hêj ne hatine pê. Belê di çavên te dixwînim, tu dixwazî ji min bipirsî: ” Ma çira heta niho dibistanên me çênekirine? ”. Çênekirine, ji ber ko herçî xwenda û zana rabûne şûna ko xidmeta miletê xwe bikin, xidmeta miletên din kirine. Zmanê miletên din pêş ve birine û yê xwe şûn ve hiştine.

Gava ji bavê xwe veqetiyam, dilê min dişewitî ez gelek ber xwe diketim. Ji xwe ra, ji milet û zmanê xwe ra, heyfa min dihat. Herê gotinên bavê min rast bûn, pêşîyên me ji milet û zmanê xwe ra guh ne dan. Ma îrû, îrû jî guh nadin.

Herê ez bala xwe didim, ji çend mezin û zanayan pêve, tukes di Hawarê de hawar nake, naye hawara Hawarê. Ez dibînim ko li wê meydana ko Hawar ji miletê kurd ra vekiriye tukes hespê xwe najo ê. Belê tukes nakeve tirad û meydanê.

Ez ji mezinên xwe dipirsim, we çira em anîne dinyayê. Ji bona ko em bibin dîl û xulamên xelkî? an em jî wek xelkî xudan rûmet û bişeref, û bi serê xwe bijîn. Heke wan em ji bona xulamîyê anîne, xwezî ne anîyana û warên xwe kor bihiştina.

Apo, ez ji te hêvî dikim bila ew mezinên ha li min megirin. Ma Hawar ne ji bona hawar û gazîyê ye. Ez jî di rûpelên Hawarê de hawar dikim.

Apo, te carkê di bendeke de digot: ”Kurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tên daqurtandin. Ko gihane

hev dibin lehî, lehîke boş. tukes, tu tişt li ber wan nikare bisekine. Felata welatê me di rabûna vê lehîyê de ye.”

Belê apo, ew dilopên baranê em in, em kurdên piçûk. Divêt mezinên me, me bi dil û hişê kurdancî bixwedî bikin, da ko em bigihin hev û bibin ew lehîya ko me bifilitîne û bigehîne mirazê me.

Paşî ez tîm destên te apê min î delal.

**Wecdî Cemil Paşa**

## KURDEKÎ KIÇIK

### Hêvîyeke mezin

Di vê hejmara Hawarê de bendeke heye: ” Hawarek ”. Nivîsevanê wê Wecdî, ji mala Cemil paşa, kurê Mihe-med begî ye. Wecdî lawikekî sêzdehsalî ye.

Wecdî berî sê salan bi bav û mamên xwe ve hatiye Sûrîyê û îrû digel pismamên xwe di dibistanên Hesîçê de dixwîne. Wekê ez li Hesîçê bûm, wecdî dihat nik min, me bi hev re xeber dida, ji min re çîroka Rostemê-Kurd digot. Hej min dikir û wek mamekî xwe li min dinihêrt.

Wecdî heta îrû ji xwendevanên Hawarê bû, bi vê bendê bûye yek ji nivîsevanên wê.

Belê Wecdî bi salan kurdekî kiçik e lê ji bona dawîyê hêvîyeke mezin e.

Çavê min Wecdî!

Eve, herwekî te dil kir, min jî welê, benda te êxiste Hawarê û belav kir. Ji benda te re gelek kêfa min hat. Tu pê xeberdoxîya hemî hevsa û hogirên xwe dikî. Belê hevsa û hogirên te jî wek te

difikirin, êdin ew jî dixwazin her tiştî bi zmanê xwe hîn bibin û di dibistanên kurdan de bixwînin.

Ewle be kurê min, hêdî hêdî, birêve, ew jî dê çêbibin.

Heta hingî divêt hon bi xwendina Hawarê rind hînî zmanê xwe bibin.

Belê xebera te ye; xwenda, zana û dewlemendên kurdan, herwekî divîya bû, welê ne hatine hawar û gazîya Hawarê. Lê me hêvî heye, ew mirovên cangiran jî hêdî hêdî ji çêrandin û mezinkirina zikên xwe bigerin û herkes gora halê xwe, hin bi qelem, hin bi dirhavên xwe bêne hawara me. Lê em li hêvîya wan ne sekinîn û nasekinin jî. Ji ber ko ji hezaran pêrewî re pêşrewek divêt.

Paşî, ez çavên te maç dikim, Xwedê te ji bav û militê te re bihêle, kurê min î delal.

**Celadet Alî Bedir-Xan**

## BÊRÎYA WELAT

Ax... dilê min çiqas bêrîya wê dûrî-yê dike !! Wê dûrîya ko di nav wê de ezman bi renekî din heşîn e, stêr wek çavên delalan dibiriqin, û çiya rawestiyane.

Bêdengîya rêlan, min dikişîne bin siha xwe. Dixwazim di bin çiqilên berû, qizwan û kenêran de rûnim.

Çiqas bi dilekî şewitî, ez dixwazim guh bidim guşguşa pelên daran. Dixwazim herim ronahîya hêvê, bi ser zinar û ser serê çiyayê de bibezim.

Tinê li wê derê, di wê spehîfî û delalîyê de, dikarim bidil bikenim.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## ALA KURDAN

Ronahîya dil û çav;  
Diyarîya dê û bav;  
Pêsiira wî roj û tav,  
Spehîfîya ax û av

Ala kurdan ser be ser  
Sor û gewr e kesk û zer.

Qehremanê ceng û şer;  
Qiblegahê mê û ner;  
Cayegahê can û ser  
Afitaba dar û ber

Ala kurdan ser be ser  
Sor û gewr e kesk û zer.

Hêvîya xortan û mêr,  
Mihreba mizgeft û dêr  
Şahê evd û şahê şêr  
B'ring û bihn e zîv û zêr.

Ala kurdan ser be ser  
Sor û gewr e kesk û zer

**Dr. Kamiran A. Bedir-Xan**

## F E R H E N G O K

### Mêvanxane

Xanîyê ko mêvan û rêwîyan bi pere dihewînin. Wek odayên gundên kurd-mancî. Lê bi vê ferqa ko odayên me herwe ne, Mêvanxane bi pere ne. Bi firensizî (Otêl) dibêjin.



**Vêsihandin**

Rahet kirin. Xwe vêsîhandin, xwe rahet kirin e.

**Belg**

Ji belgên daran pêve ji cil û girêdanê re jî têt gotin.

**Kuta-kirin**

Xelas kirin, qedandin. Me dersa xwe kuta kir. Dersa me kuta bû.

**Agah**

Xeberdar, serwext. Ez agah bûm, ez xeberdar bûm.

**Xeberdox**

Ewê ko bi nav û navê çendekên din, ber hemîyan ve dibêje.

Xeberdoxî: Xeberdox-bûne.

**Herekol Azîzan****ELFABÊYA KURDÎ**

-8-

Ji sebebên bîngêhî pêve ko yek bi yek hatine ravekirin, ber vê yekê jî me nîşankirina (Ç) ê bi (q) û ya (ك) ê bi (K) çêtir û rastir dîtin.

C, Ç -Di destê me de (C) û (Ç) mane. Me ev ji bona nîşankirina dengên (Ç) û (Ç) hilanî bûn.

Gora eslê van herfan dengê (Ç) ji (ç) bêtir bi (c) dihat nîşankirin. Herwekî di latînîya kevn, di babelîska şeşa de, ko diket pêşîya (e,i,y,æ,œ ) dengê (Ç) a me dida, mîna dengê (z) ya elmanî, wekî niho di pîrsên jêrîn de: (Ceres, Cicero, centum, circus, Cyrus, César, céto, caremonia).

Digel vê hindê me ev herf ji pêşîya

xwe vekir, dengê wê ê kevn da alî û em di warê qebaleyê de man. Ji ber ko qebale li destûra me a pêşin çêtir dihat û ji bona feda kirina wê destûrê çî fêde çî kotekî hebû.

Di zmên de nisbeta wan jî hema yek e.

C : 102/33798 Ç : 103/33798

Di encamê de me dengê (Ç) bi (c) û yê (Ç) bi (ç) nîşan kirin.

Li hire dixwazim tiştêkî di çavên xwendevanan re bikim.

Ew dengê ko di elfabêya erebî de bi (ز) têtê nîşan kirin di hin dewerên Kurdistanê û di pîrsinan de ne wek dengê xwe ê nas lê bi awakî din têt bilêv kirin. Bi awakî welê ko ser dengê (z) ya elmanî diçe.

**DENG DÊR**

Herwekî me berê jî goti bû dengdêrên kurdî di drêj an kin bûna dengên xwe de sersekinî ne. Yanî dengdêreke drêj tucaran kin nabe û ya kin drêj. Di yûnanîya kevn de jî dengdêr holê bûn, dengdêrek geh kin geh drêj ne dihat xwendin. Tinê di yûnanîya kevn de dengdêrinen navîn jî hebûn ko di zmanê me de nînin.

(dûmahik heye)

**Celadet Alî Bedir-Xan**

**Tirsim Ez Bimirim**

Tirsim ez bimirim dilo heyran  
Li vê paîzê delalo  
Li vê paîzê.

Tirba min çêkin dilo heyran  
Li binîya gûzê delalo  
Li binîya gûzê.

W'ezê ramûsim dilo heyran  
Sê biskê' di Qîzê hoyo  
Sê biskê di Qîzê delalo  
Sê biskê di Qîzê.

Tirsim ez bimirim dilo heyran  
Li vê buharê hoyo!  
Li vê buharê.

Tirba min çêl.in dilo heyran  
Li binîya darê hoyo  
Li binîya darê delalo  
Li binîya darê.

Ezê ramûsim dilo heyran  
Sê biskê yarê' hoyo  
Sê biskê yarê' delalo !  
Sê biskê yarê '.

**Dilokvan**

## HIŞYARNAME

Hawar Kurdno ! nekin nekin  
Renca neyar ji bîr nekin  
Şev û rojê hon xew nekin  
Mêranîya xwe hon zêde kin

Hawar Kurdno ! nekin nekin  
Yekîfîya xwe wenda nekin  
Namûsa xwe paymal nekin

Hawar Kurdno ! eme pir in  
Çavên me kesî nabirin  
Naxebitin pir xizan in  
Em bi qanûnan nizanin

Hawar Kurdno ! bilezînin

Zarokê xwe bixwînînin  
Bi qanûnan bizanînin  
Belkî doza me hilînin

Hawar Kurdno ! nekin nekin  
B'zmanê neyar galgal nekin  
Zmanê Kurdan hon fireh kin  
Keç û bûkan paymal nekin

*Herê lê herê lê herê lê zerîyê  
Ez î nexweş im nexweşê li tayê yo  
Bira cîkê min daynin li zozanê  
Mêrgemîrê*

*Li ber belekîya berfê yo  
Belkî keç û bûkê êla rengîn bên  
herin seyrangaho*

*Çeleng gewra min destê xwe bide  
Bin serê min evdalê xwedê yo  
De wayê de wayê feleka mal şewitî  
xayîne mi ra nayê*

**Lawê Findî**

## JI XANÎ RA

*Çend xeberekî kurdewarîne  
digel ruhê Ehmedê Xanî*

Xanî tu bes e bike hewarê  
Rabe tu biliv ji wê mezarê  
Bifikir tu bibîn diyarê Zînê  
Sor e wekî gul hemî ji xwînê  
Dûman û girî ji xanimanan  
Çawan digehête asimanan  
Feryad û fişanê duxt û bûkan  
Zarî û hewarê van biçûkan  
Cewira weled-heramê Cengîz  
Ne rez hiştine ne bax ne parîz  
Wêran kirine kelat û bajar

Talan kirine mezar û bazar  
 Cîkê zerî û delal û rindan  
 Lê ir'ir e hirç û bûm û kundan

### Lê

Bê hêvî mebe binêr tu carek  
 Kurdên bi şîraq bibîn mibarek  
 Îro qe nemaye wan nîfaqek  
 Pêkve hemî bûne îtîfaqek  
 Tawisî û îsewî misilman  
 Ji Sêwas heta bighête Loran  
 Yek can û dil û yek hewar in  
 Bilcumle li gazîyê bi kar in  
 Şeş sale hemî bi xwîn dibazin  
 Azadî-w xwebixweyî dixwazin  
 Ya dê bimirin û ya bijîn mêr  
 Qet laîq e Kurd bminite êsîr

**Behmen Zerdeşt**

Bayezîd : 15 hizêran 1932

### EZ GORÎYA BANGÊ TE ME

Hawar hawarî Kurd e  
 Deng û gazî welate  
 Mizgînî xwe nasîn e  
 Hatî be dengî Hawar  
 Kîj û kur, pîr û ciwan

Hawar hate çiyayan  
 Deşt û gund pê lerzan  
 Bangî azadî Kurdan  
 Yekbûnî Xweşî dilan  
 Kewte naw mal û xêzan

Herdem be demî Hawar  
 Pêk de koşîş û hawar  
 Huşiyar debine Kurdan  
 Ladeben şîna welat  
 Ez gorîya bangê te me

**Mamoste**

AKRE: 28 hezêran 1932

## YELÎ DELAL

-1-

Yelî delal, delal.....  
 Delal.....  
 De rabe emrê dilê min bi gorî  
 Sebra dilê min bê te naye delalo !

-2-

Yelî delal! suwarê' me suwar bûne  
 Berên xwe dane w'alîyê rojhile da  
 Pêşîya selefê suwaran danî bû kûna çiyayê Evdilezîz  
 Paşîya selefê suwaran danî bû kûna girê di Kewkeb'da  
 Dê xwezî ji xêra Xwedê ra  
 W'ezê bibima baqekî gulan û rêhanan  
 W'ezê biketama destê lawikê xwe da  
 De w'ezê rûjê sê caran banê min biketa ber simbêlê reş da

-3-

Delalo destê min berde  
 Zikak û kolanê' gundê me teng û tarî ne  
 Şeytan û avanê' gundê me gelek in.  
 Şeytan û avanê' gundê me gelek in  
 Dibê hinek ji wan bi hênceta agirî  
 Sibê, bêne bi ser halê min û te de delalo!  
 Delal.....  
 De rabe emrê dilê min bi gorî  
 Sebra dilê min bê te naye delalo!

-4-

Yelî delal, delalê mala bavê min di xewa şêrîn de  
 W'ezê dil nakim ji xewa şêrîn rakim  
 De w'ezê herim sûka Diyarbekra şewitî  
 Ebakî ji sorê besrawî ji kenarê delalê bavê xwe de bînim delalo!  
 Serê sibehê pê dakim.

-5-

Yeli delal.....  
 Yeli delal, heçî cuhabek ya xêrê  
 Ji kenarê delalê mala bavê min de ji min re bîne  
 " — Sehet xweş "  
 " — Ya te jî "

W'ezê bidim ê ciwanika ber mehîne  
We heke pê qaîl ne be  
W'ezê bidin ê sed û bîst kîs û zînetê malê dinê  
De heke bi wan jî qaîl nebê  
Sed û bist aşên mala bavê min hene  
W'ezê bidim ê, li binê sonikê, Nisêbînê  
Delal.....  
Emrê dilê min bi gorî  
Sebra dilê min bê te nayê delalo!

**Stranvan**

---

**SAL 1  
HEJMAR 9**

# **HAWAR**

**ANNÉE 1  
NUMÉRO 9**

in  
30 Ilon 1932

VENDREDI  
30 Septembre 1932

**Kovara Kurdî \* Revue Kurde**

## **TÊDEXISTIYÊN**

## **KOVARÊ**

**Welat û Al  
Melayê gulê  
Dilkoçerê  
Kurdistan  
Mîr û mar  
Ji mirovên kê m re  
Kula dil  
Ez û Hawar  
Elfabeya kurdî**

**C. A. Bedir-xan  
Cemîlê Haco  
Dr. K. A. Bedir-xan  
Dr. K. A. Bedir-xan  
Koçerê Botan  
Dr. K. A. Bedir-xan  
Cegerxwînê Kurdî  
Elî Seydo  
C. A. Bedir-xan**

## **BIRÊ WERGERANDÎ**

**Daxwazname  
Çend pend  
Mîr û keşe  
Marşa Kurdî  
Zinine xew  
Mişorî diwaroz  
Awatî dûrî**

**Ehmed Namî  
Emîn Alî Bedir-xan  
Koçerê Botan  
M. Ehmed Bofî  
Pîrot  
Lawêkî Kurd  
Goran**

**Çapxana Tereqî  
ŞAM - 1932**

## WELAT, WELATÎNÎ Û AL

Welat erdê bav û kalikên me ye.

Welat ew der e ko, pêşîyên me li wê rabûne, ji bona avahîya wê xebitîne û li wê mirine.

Welat ew diyare ko, em têde sekinîne û rûjekê di nav axên wî de bêne veşartin.

Xelkê welatekî, welatîyên hev in. Borî, hal û dawîya wan bi hev re girêdane. Zmanê wan, girêdana wan, her hal û lebtên wan mîna hev in. Pêşîyên wan li rex hevdû rabûn, rûniştin û mirine.

Welatî bi Qencîya hev şa dibin, ber xirabîya hev dikevin. Şîn û şahînetan wan yek in.

Xelkê welatekî brayên hev, pismamên hev in. Hergav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşî, avahî û azahîya welatê xwe dixebitin.

Kam û armancên wan yek in.

Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînên xwe bêperwa drijênin. Herê dixebitin ko welatê wan mekevit bin destên miletên din.

Lê miletin hene ko welatê wan, bi awakî, ketiye bindestên neyar û dijminan. Wek welatê miletê me, Welatê Kurdistanê.

Ev miletê ha ji bona rizgarîya welatê xwe dixebitin.

Xebata wan ev e: Rûjekê berê biyanîyan ji welatê xwe derînin û mîna miletên din biserxwe bibin, di nav hev de bi xweşî, û bi qencî bijîn. Herkes hej welatê xwe, hej welatîyên xwe dike.

Hejkirina welêt di dilê me de hêvîne-

ke mezin û bilind e. Em pê xurt, zexm û canfeda ne. Jê re welatînî dibêjin.

Welatînî di hundirê me de agirekî miqedes e. Pêta wî agirî ji me re her tiştên welêt dide hez kirin. Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya, deşt, dar û kevirên welatê me ji yên welatên din spehîtir, xweştir û şêrîntir in.

Her milet xweyîyê alekê ye. Al nîşana milet û welat e.

Tevayîya heyîna miletan di ala wan de civiyaye.

Al, namûs, rûmet û bextê miletan e.

Zarowên her miletî ji bona bilindî û biqedrbûna ala xwe, bêperwa xwe didin kuştin.

Ala her miletî jê re beha ye. Di cejn û şahînetan de qesr, seray, xanî û kûçeyan pê dixemilînin, di ber wê re diborin, slavan lê dikin, wê maç dikin, datînin ser serên xwe.

Alên miletên biserxwe, di ser kelat û bajarên wan re li pêl dibin, di rêveçûna leşkerî de divekin (dikevin W.) pêşîyê.

Lê alên miletên dîl, wek ya miletê me, ji her derê biderkirî, lihevtewandî li ser dilê zarowên wan de hilandî ne.

Miletên dîl dixebitin, xwînên xwe dirijênin ko biyanîyan ji welatê xwe biqewirînin û alên xwe li ser kelat û bajarên xwe ji nû ve daçikînin.

Ala her miletî bi çend rengan û bi şiklekî din e.

Ala kurdan, ji jor ber bi jêr ve, ser hev, sor, sipî û kesk e, di nava wê de roj diçirise.

Divêt zarowên Kurdistanê bixebitin û rûjeke berê wê rojê hilîna, ber bi ezmanê Kurdistanê ve bilind bikin, li wê bibrûskînin, welatê xwe ser avahîya xwe a pêşîn vegeirînin û di bin tava wê re biserxwe û bi kamiranî bijîn.

**Celadet Alî Bedir-Xan**

## MELAYÊ GULÊ

Wextekî li bajarê Hesenkêfê belengazek hebû. Jineke wî jî hebû. Navê jinekê Gulê bû.

Belengaz herûj milek êzing dianî bajêr û difiroto, dida bi qirûşekî, dudowan û rûja xwe pê derbas dikir.

Rûjekê ji rûjan jina qêzî û miftî çûne ser avê, ko cilên xwe bişon. Jina belengaz jî çû û ser wan re cilên xwe şuştin. Gava jina Qêzî û ya miftî çav li jina belengaz kirin ko ewê cilên xwe di ser wan re dişo, hema rabûn dest bi jinekê û dijunan kirin. Drêj bûne, pora wê vedirûn, ji ber ko ava cilên wê a biqrêj bi ser wan de dihat.

Gula belengaz jî li wan teqsîr nekir, û paşê pol poşman cilkên xwe tev kirin û dest bi girî kir, çû mala xwe hal hewalê xwe ji mêrê xwe re got.

Merik jî got:

— Hermet ez belengaz im û ew Qazî û miftîyê bajêr in, ma ezê çi bikim, sixêf û lêdana te ji wan re ma.

— Nabit, ez li tu cihan rûnanim, yan tu ê bibî mela, yan tu ê min berdî, yekê ji her duwan ji xwe re bigre.

— Hermet, ez ne bi xwendinê diza-

nim, ne dikarim li pêşîya du camêran nimêj bikim, ez dê çawan bibim mela. Ez hêvî ji te dikim tu bela xwe ji min veke, ez kêrî vî îşî nayim.

Kir nekir bela jinekê ji xwe venekir. Reben mêrik rabû ser xwe, çû sükê şaşeke xwe peyda kir û çû ser pira bajêr sekinî. Deftera xwe bi destê xwe re girt.

Pîrekek hat serê pirê, ko belengaz dît jê pirsî:

— Mela tu çi îşî li vir dikî?

Ez niştan çê dikim, pîreka ko mêrê wê hej wê neke ez dikarim bikim ko jê hez bike. Jinikê got: Mela ez di bextê te me, mêrê min hej min nake, ko tu careke min bikî hema tu çi bixwazî, ez ji te re sekinî me.

Sitilek mast jî bi jinekê re heye. Melê got jinekê:

— Vê sitila mêt û mêtîdîkî bide min ezê nivîşteke te çêkim ko mêrik hej te bike.

Jinikê rabû, mast û mêtîdîk, da melê. Ji xwe rebenê melê nizane tiştêkî binivîsîne, piçek kaxez reş kir û li hev tewand da jinikê û je re got:

— Di nav kezîyê xwe de girêde.

Jinikê jî mîna melê jê re got wisa kir.

Ji ba Xwedê mêrik hej jinikê kir, hej kirineke zor. Xwedê ji melê re li hev anî, heçî ko tê nik melê jê re nivîstekê çêdike, miraza wî tete cih.

Nav bi melê ket, Melayê Gulê holê, Melayê Gulê halo.

Teyrekî hakimê bajêr jî heye, li nik hêkim pir delal e. Rûjekê teyrê wî winda bû. Çiqas pirs kir ne kir pejna teyrê xwe nekir.

Rûjekê hinekan gotin:



— Ya hakim ko ne Melayê Gulê teyrê te derêne, êdin tu nema teyr dibînî, lê ko melayê Gulê li kitêba xwe binihêre, ewê tavil derfîne, heçko xwendakî pir xurt e.

Hêkim du xulam rêkirine pey melê. Bi rê de mela çav li teyrê hêkim dikeve, dinav çavê darekê de. Mela jî deng nake heta gihîşt nik hêkim. Slav da hêkim, ewî jî slava wî vegerand, mela rûnişt, hêkim got:

— Mela xelk pir pesnê te dide ko tu xwendakî pir xurt î, gelo rast e?

— Belê ezbenî .

— Mela teyrêkî min pir delal hebû, ev çend rûj in winda bûye, min divê tu teyrê min derênî.

— Bi saya Xwedê û ilmê ezê teyrê te derênim.

Carekê mela kitêba xwe vekir, pa Xwedê bide mela ne bê zane nê pê. Ma berê teyr ne dîti bû. Li kitêbê nihêrt û ji hêkim re got ko teyrê te li filan derê ye.

Xulam çûn, di wê derê de ko melê gotiye teyr dîtin û anîn.

Hakim ecebmayî ma, rabû ji melê re pênc zêr dan.

Mele perê xwe hılanîn, çû mal, gote pîreka xwe:

— Hermet te ez kirim belakê ko ez xelas nebim, îrû hal hewalê min ev bû li ba hêkim, lê hema Xwedê ji min re lihev anî. Êdin bela xwe ji min veke, ezê ji vê melatîyê bigerim, melatîya bi derewan naçe serî

— Qet ez qebûl nakim, tu ê mela bibî.

Mela reben ma ser halê xwe. Paş çend rûjan xişrên keça hêkim winda bûn.

Dîsan hêkim şand pey melê da ko xişrên keça wî derêne.

Bivê nevê mela rabû, bi dilekî kul çû derîzana hêkim.

Hêkim digel jin û keça xwe li eywanê rûniştiye. Mela slav li wan kir û kitêba xwe vekir. Lê hal ew hal e, mela tu tiştî nizane. Li keçê dinihêre, dibîne ko Qulek di derpêyê keçikê de heye. Mela jî li Qulê şaqiz dimîne. Dawî hêkim got:

Mela tu çima wilo difikirî û cuhab nadî?

— Ezbenî, çiqas ez li kitêbê dinihêrim fikrê min li ser qulê ye.

Ser vê gotinê keçik rabû ser xwe û got:

Nûka hat bîra min, xişrên min di filan Qulê de ne.

Dîsan Xwedê ji melê re li hev anî. Hêkim deh zêr dane melê û kir berdevkê xwe.

Çend rûj borîn, sebeteke hêkim tijî pere winda bû. Dîsan şandin pey melê. Hêkim jê re got:

— Mela hal hewal ev e, tu çi dibêjî.

— Ezbenî, min ji te divê çil qaz, çil weqî birinc û çil rûj mihlet, bitifaq ezê sebetê derînim.

Tiştên ko melê xwestin, hêkim jê re dan. Melê birinc û Qazên xwe hılanîn û çû mal. Ko xwedê jê re li hev ne anî mela kengê sebetê derêne. Çavê melê li wê bû ko her çil Qazî û birincî bixwe û ji xwe re baz de. Jina xwe re qewîti kir ko Qazekê şerjêke, weqîkî birinc têxe zikê wê û zixurekî jî berde nav û bike şiv.

Jinikê mîna melê jê re got wisa kir. Bû êvar, qaza xwe di nava xwe de danîn dest bi xwarinê kirin. Paş ko qaza xwe

xelas kirin, melê rahişt zixurê ko di zikê qazê de bû, avêt refikê û got:

— Hermet tu ji bo Xwedê şehde be, yek ji wan çû.

Dizên sebetê jî çil mirov in. Yek ji wan tê ber quleka xanîyê melê dihesisîne gelo mela çi bikit, sebetê derêne.

Ê diz gava gotina melê dibihîze di dilê xwe de dibêje: "mela em nas kirine" û baz dide. Mela bi xwe ji Qazê re dibêje.

Diz diçe hevalên xwe serwest dike. Du sê rûjan ser hev tîn ber kuleka xênî. Mela bi jina xwe ve Qazê dixwe, zixurî davêje refikê û dibêje:

— Dudo ji wan çûn.. sisê ji wan çûn...

Diz qail dibin ko mela bi wan hesiyaye, ji tîrsa xwe sebetê ditînin nik melê û dikevin bextê melê.

Mela sebetê dibe û diçe nik hêkim.

Hêkim sebetê vedike, dibîne ko qirûşek jî jê wînda ne bûye.

Hakim pir dilxweş bû, rahişt çil zêrî dan melê. Êdin zman ser zmanê melê re ne man, mela bû îmamê bajêr.

Rûjke îne hêkim şand pey melê da ko li pêşîya wan nimêj bike. Mela çû bihurt hundirê mizgeftê, li ber mihrabê ma sekinî, nezane bang bide ne jî qamet bike, ma heyirî, li dora xwe dinihêre nizane çi bêje. Hema carkê got şilb, li devê derî da û baz da. Hêkim û civata xwe çawan ev dîtî dan pey melê derketin derve. Ko paşîya wan ji mizgeftê xelas bû mizgeft derxunkî ket.

Weke mela ev dît bihna xwe da û ji hêkim re got:

— Ezbenî min zanî bû mizgeft bike-

ve, ji lewre min baz da.

Hakim rabû xwe avêt ser destên melê û jê re got:

— Li dinyayê tiştêk nîne ku tu nîza-nî, em hemî koleyên te ne, herçî jî bixwezî ez ji te re sekinî me.

Melê got:

— Ezbenî ezê tiştêkî ji te bixwazim, min divê ko tu qazî û miftîyê bajêr bispêrî min. Ji ber ko pir neqenc û fesad in.

Hakim rabû her du spartine melê. Melê jî bi vî karî heyfa jina xwe ji qazî û miftî hilanî.

**Cemîlê-Haco**

## DILKOÇERÊ!!

Çavên te xweş heşîn in.  
Çima bi xem bi şîn in  
Dengê te nerm zelal e  
Biken' bibêj' menale !  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilkoçerê b'nav û deng.

Delala min tu naz î  
Dengşîrîn î bi saz î  
Bi çavên te dinê geş  
Sînga te gul, gulîreş.  
Rêl ez im, tu bihn û reng  
Dilkoçerê b'nav û deng.

Tu aheng î b'lûr î  
Tu alûs î bi nûr î  
Ez dil im tu germî yî  
Xurt ez im, tu nermî yî.

Rêl ez im, tu bihn û reng  
Dilkoçerê b'nav û deng.

Ez Gulan im tu gul î  
Tu ahengê bilbil î  
Ez birîn im, tu derman  
Ez Qurban im ez heyran.  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilkoçerê b'nav û deng.

Deşta dil de ask tu î  
Hişê min re bask tu î  
Çavên te xweş heşîn in  
Çima bi xem bi şîn in?  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilkoçerê b'nav û deng.

Salên te hê ne hejde  
Di refê spehîyan de  
Dotmîr î, bûyî serek  
Xulamê te me bê şek.  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilkoçerê b'nav û deng.

Tu dotmîr î û mîr î  
Şehyane yî bi jîr î  
Dengê te nerm zelal e  
Biken' bibêj menale !  
Rêl ez im tu bihn û reng  
Dilkoçerê b'nav û deng.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## KURDISTAN

Êvar e  
Pir sar e  
Çol e, gir û çîyan bê dar in  
Tarî ye  
Zarî ye  
Bê te dil û can birîndar in.

Welat e  
Şewat e  
Hêstirên min dikevin; çem e ,  
Dîlê min  
Dilê min  
Êdî were delalê !!! dem e.

Mamiz î  
Bi saz î  
Kanîya stêr bû dilê min, mir  
Hejkirin  
Tum birîn  
Xwelî bûn ne ma pêt û agir.

Adar e  
Hawar e  
Camêr tev dimeşin, bê Al in,  
Stran û deng  
Gul bê reng  
D'mehdikan de zaro dinalin.

Gir û ber  
Qrên û şer  
Top û tîfing diricifin.. Ah!!  
Ax û dar  
Gî Xwîndar  
Ne mîrek ma ne siltan û şah!

Kel û gund  
Cihên kund  
Jin û keç burc û qesr gî kêmbext  
Li gorinan  
Berazan  
Bûk jî mir, ne ma serîr û text.

Talî reş  
Bîst û şeş  
Lê dil ne mir ne bû ax û rijî  
Hêstir reş  
Sîng, dil geş  
Canên me gî camêrî tijî.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## MÎR Û MAR

Mîrek yê Cizîrê gelek xurt û dewlemend bû. Êxiste serê xwe ji xelkê xwe re qencîkê bike.

Zencîrek da avêtin ser pira bajêr, di ser nîvê wê re jî zengilekî fêris da hila-vistin.

Mîr banker di nav welêt de gerandin. Ewê ko bikare zengilî bihejîne, mîr miraza wî dê bîne cih.

Rûjkê Xelkê Cizîrê bi rimêna zengilî rabûn, ber bi pirê ve çûn ko bizanin kê zengil hejandiye.

Çi dîtin. Şehmarek, xwe pêçandiye zengilî bi kerb û qehrê zingilî dihejîne.

Xelk lê kom bûn û dan ber qîran, da ko mar xwe jê veke. Fêde ne kir, mar zengilî bêtir dihêjand.

Xeber gihandine mîr. Mîr wezîrên xwe hinartin pey ko mar here balê. Mar da dûv wezîran û çû xafa mîr. Serê xwe dahiland kir erdê û paşê hilda, devê xwe ber bi ezmanî ve vekir.

Mîr ji wezîrên xwe pirsîyar kir, gelo daxwaza mêr çi ye.

Di koma wezîran de wezîrekî karnas û şehraza hebû, got:

— Ezbenî, mar kiriye tiştêkî daxwe, nikari bû, nêçîra wî di gewrîya wî de maye.

Li devê mêr fedkirîn, strowên markî xuya dikir. Xeratek anîn stro birîn û mar fillitandin. Mar da rê û çû.

Sibetir mar di hewşa burcê de xuya kir. Bi devê xwe ve hûşiyekî zêrîn hildigirt.

Tukesî nikari bû mana vê ecêbê bizane.

Zmanê mêr geriya û ji mîr re got:

— Mîrê min meheyire, ev hûşiyê zêrîn ji mêwekê tê ko di nav rezên te de şîn dibe. Di wextê pêşiyên te de ew mêw hergav holê hûşiyên zêrîn didan. Ji ber ko pêşiyên te bi xelkê xwe ve adil û mih-rivan bûn, zilma xelkî ne dikirin.

Mîr ji mêr pirsî:

— Heke ez jî bi xelkê xwe adil bibim ew mêw ji min re jî hûşiyên zêrîn nade Mar serê xwe hêjand û got:

— No, ezbenî ew edalet ko ji bona hûşiyên zêrîn tete çêkirin tu hûşiyên nayîne.

## Koçerê Botan

### KULA DIL

Begê min, serwerê min ey Celadet Şehê min, rêberê min pur edalet Tu binivîse di Hawarê selavan Ji ber min ve li kurdmancan temaman Çi kurdmancên Enadol û çi Sûrî Çi loran û çi gewran û çi sorî Çi gavan û çi sapan û çi mîr e Gelek behtir li kurdmancên Cizîr e Ji Nafiz beg bipirse ey begê min Çi derman e, ji bo derdê dilê min Birîndar e, ji ber daxa welat e Gelo derman heye jê re, li ba te Belê Îsa ji ezman hate xwar e Welê dîsa ne dî jê re tu çare Bi ser sînga me danî destê taze Di rengê ayînê dî dil ne saz e Dikir qîrîn digo derdê evîn e. Ev e, derdê li Ferhad û Şîrîn e Ev e, derdê ko pê çûne Mem û Zîn Tu dê bimrî bi vî derdî Cegerxwîn.

Cegerxwîné Kurdî

*Vê paşiyê Cegexwîne me ê xweşewîst û hêja ji me re çend bend û xweşxwan rêkirne. Ji ber ko ev hejmara ha tijî bû bû me ji xweşxwana jorîn pêve tuwên din nikari bû belav bikin. Ko Xwedê hez kir di hejmara deha de emê çendekan pişkeşî xwendevanên xwe bikin.*

### Ji mirovên kê m re

- Bi Zerdeşt ve -

Jiyîn kanîyeke xwestinê ye. Lê, di wan doran de ko mirovên kê m digel paqijan vedixun, kanî bijehr in.

Ez hêj her tiştên pakij dikim, lê nikarim devê mirovên kê m û tihniya peyayên pîs bibînim.

Wan bi kêmayiyên xwe ava zelal jehrdar kir.

Gava wan navê xeyalên xwe ên pîs kirin xwestek, armanc û axaftin jî jehrdar bû.

Weke wan dilên xwe ên şil û şeylo didin ser agirî, agir bêkêf dibe, dikeve reşiyê û dû dike.

Eql û hiş bi xwe şayîya biriqandinê dixin dûr û dikevin tarîyê. Hin peyayên ko ji jiyînê xwe dane paş, ew tinê ji mirovên kê m xwe dûr dixistin.

Lewra ko ew ne dixwestin kanî û agir bi wan re par bikin.

Hinên din ko ketine çolê û bi heywanên kuvî ezabê tihniyê kişandin ne dixwestin bi hêştirvanên pîs li kevîya kanîyekê rûnin.

Carina ji xwe re dipirsim.

—Ma jiyîn hewcedarî mirovên kê m û peyayên pîs e ??

Camêrên wek teyrok û badevê hatin û pê li qirika peyan kirin. Ewan dil dikirin devên kortalên pîs û bêşerm bigirin.

Brao!! ma dilxwaza te ne aveke pakij û avîj e û kanîyeke zelal e?

Hingî xwe bilind ke, di bilindayiyê de kanîyeke zelal û pak heye, di dora wê de mirovên pîs û peyayên kê m rûnanin.

Di wê de agir bireng e, dû nake, bi pêteke sor diçirise.

Brayê min!! dizanim ko tu pê kanîyekê digerî.

Havîna dilê te wê honikayiyê dixwaze.

Were, di wê de, bêdengîyeke nerm heye, ew bilindayî hêlîn û welatê me ye.

Em hêlîna xwe li ser dara dawiyê ava bikin.

Eylo bi nîkilên xwe ji me re zad dê bînin.

Belê, em tucaran destên xwe dirêjî xwarina ko mirovên kê m û peyayên pîs jê dixun, nakin

Ew destên xwe ên bêşerm dirêjî xwarina me dê bikin û pê dev û zmanên xwe dê bişewitînin.

Em wek eylo wek berf û çîyan di rex bayê xurt de, dê bijîn.

Emê carkê wek bayeke zor bi mirovên pîs û peyayên kê m bikevin û bihna wan bigirin.

Brayê min!! ji dijminên xwe re şîretan bike ber bi bayî ve tif mekin.

**Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan**

## E Z Û H A W A R

Wek piranîya kurdên ko di welatên biyanîyan de radîbin û ji bona xwendinê ji malên xwe jî dûr dikevin, min jî zmanê xwe rind nizanî bû.

Piştî qedandina xwendina xwe nezaniya zmanê min li min ji berê girantir dihat. Min dil dikir rind hînî zmanê xwe bibim. Hawar hat hawar û gazîya min, û ji min re bû mamhoste. Ji lewre çiqas pesnê wê bidim jî dîsan nikarim bêm ber qencîya wê.

Nivîsandina Hawarê bi herfên di nû gelek baş e. Ji ber ko zmanê me, zmanê kurdî zmanekî arî, Hîndo-Ewropî ye û tinê bi herfên mîletên arîzman rast û qenc têt nivîsandin.

Ji bona ko ez bikarim ramana xwe çetir ravekim divêt birhaneke wî nîşanî xwendevanên Hawarê bikim.

Wekî niho, berî derketina Hawarê mamhosta min pîrika min bû. Hingî min zmanê xwe bi herfên erebî dinivîsandin. Lê sibetir herçî ko min berî rûjke nivîsandi bû, min nikari bû ez bixwînim û weke xwe bilêv bikim. Ser vê yekê min dev ji herfên erebî berda û ji xwe re herfên latînî elfabêyek çêkir. Êdin bi elfabêya xwe min her tişt qenc dinivîsand û rast dixwend.

Gava Hawar derket min elfabêya xwe û ya Hawarê danî ber hev û dît ko her du elfabê gelek nîzingî hev in. Ne gerek e ko ez bibêjim, ev nîzingayî ez gelek şa û kefxweş kirim.

Par çû bûm Kurdîstana jêrîn. Li Bexdayê min Tewfîq Wehbî beg dît. Ew

jî bi elfabêkê mijûl dibû. Lê berîya wê elfabêya Hawarê derket û me da pey.

Li Silêmanîyê di Civata Zanistîyê de min çend xortên xwenda nas kirin. Bi tevayî digotin ko zmanê me tinê bi herfên latînî têt nivîsandin û ne bi hinên din. Herwekî îrû jî em dinivîsîn.

Lê divêt herçî xwenda û zanayên kurdan hene pişt bidin me û elfabêya me belav bikin, bi xwe hîn bibin û ji xortên nûgiha re hîn bikin.

Eli Seydo

## ELFABÊYA KURDÎ

-9-

Dengdêrên kin ev in: e, i, u

Dengdêrên drêj ev in: a, ê, î, o, û

**A, O** - Ev du dengdêrên ha di zmanê me de jî wek yên zmanên din têne bilêv kirin, lê hergav drêj in û tucar kin na bin. Weko:

A - çak, dar, pak, bar.

O - zor, gol, lor.

Tinê di zarê nivro de carinan wek (eu) ya frensîzî û (o) ya tirkî têt xwendin. Hingî bi danîna dû deqan li ser (o) ye têt nîşan kirin: köl, göl

**Ê** - Gava me sehîtiya danganîya kurdî dikir em rastî dengêkî hatin ko nîzingî ( **فتة ثقيلة** ) yê erebî ye.

Ev dengê ha ko di cara pêşin de li (a) yeke kin dimîne di rastîyê de ne (a) yeke kin e, û nikare bibe jî. Ji ber ko di zmên de (a) ya drêj heye û kina wê nikare hebe.

Di encamê de xuya bû ko ev dengê ha ji (e) ke stûr pêve ne tu deng e. Belê ev dengê ha (e) ke welê ye ko stûr têtê xwendin û herçî dengdarên ko didêre stûr dide xwendin

Ev dengê dengdêrî tinê di hin dewe-rên Kurdistanê de têtê bihistin, ne di hemî deran de.

Hebû ko em vî dengî bi danîna du deqan li ser (e) nîşan bikin. Herwekî (e) yên pirsên (pz) û (sd) ko bi herfên erebî bi  $\text{ط} \hat{u} \text{ص}$  wek  $\text{بط} \hat{u} \text{صد}$  dihatin nivîsandin û dengdarên wan stur dihatin xwendin.

Ji hêla din ev ferqa bilêvkirinê di hin pirsên erebî de ko ketine hundirê zmanî têtê dîtin.

esker ... ereb ... elî

êsker ... êreb ... êlî

(dûmahik heyê)

**Celadet Alî Bedir-Xan**

## D A X W A Z N A M E

Min dî ruhnîkî hil bûbû ji Damas Şefeq da bû Cizîrê-w erdê Qafqas Berê Birca Belek lê pirsiyar bûn Min gotî wan kî pênc herfê hawar bûn Ne dî Namî li nav Kurdan yekî mêr Ji bo çapa Hawarê çêbikî zêr... Silavê gewheranî le'î û durr J' ber Kurdê Cizîrê hediye rê kir Tu xweş hatî Hawarê serserê min Te sohtî can û cergê dijminê min Ricûkar im ji mîrê xwe Celadet Wetenperwer xwedanê text û dewlet Tu roznamakî Kurdî bo me çêkî

Serê salê bi herfên nû verêkî  
Bese Namî xeberdana go pir bî  
Wekî durr bî ewê her bê qedir bî

**Ehmed Namî**

## Ç E N D P E N D

Nakes hemî bûne mîr û axa  
Yê ev kirî mala wî ne ava

Rabe here nik heval û kalan  
Da tu nekevî newal û çalan

Dermanekî çêke bo birînê  
Da tu nekevî di nav nivînê.

**Emin Alî Bedir-Xan**

## M Î R Û K E Ş E

Carekê mîrê Cizîrê derketi bû gerê. Rêya xwe xisti bû Tora Hevêrkan. Şevêkê di gundekî filehan de ma. Di vî gundî de dêrek hebû. Mîr çû bû ziyareta dêrê. Ji keşeyê dêrê re got:

Ezê ji te sê pirsan bikim, lê ne niho piştî sê mehan û ne li hir, li Cizîrê, heke te li wan veğerand ezê te bikim petrîq û heke te nizanî veğerînî ezê te ji keşetî-yê bêxim û bikim dergevanê dêrê.

Mîr da rê û çû. Keşe ket texmînan. Keşe ro bi ro diçelmisî, ji sibehê heta êvarê riha xwe dikir nav destên xwe û vedikişkişand. Di dilê xwe de digot: " Xwedêo tu Xwedêyê min î çak î, ez jî

keşeyê te î rind im, ev çi bela ye ko te aniyê serê min, ezê çawan li mîr vegeerînim ”.

Keşe xweyîyê pez û şivan bû. Halê keşe diket ber çavê şivanê wî jî. Carekê şivan ji keşe re got:

— Bavo, ev çi halê te ye. Çi dest daye te. Ji sibê heta êvarê difikirî û ber xwe dikevî, ka bêje xulamê xwe belko min tevdîrek jê re dît.

Ji xwe keşe li yekî digeriya ko derdê xwe jê re bêje. Rabû derdê xwe ji şivanê xwe re got. Şivan kenî û got:

— Ma ev jî tiştek e. Mîr çi dikare ji me bipirse ko em nikarin lê vegeerînin. Qet xem mexwe, min bişîne Cizîrê ezê bizanim lê vegeerînim.

Keşe pê qaîl bû û dilê xwe rahat kir. Sê meh bûn temam. Keşe şivanê xwe rêkir Cizîrê.

Şivan xwe gihand Birca Belek û derket xafa Mîr. Mîr bi kêf bû. Ji şivan pirsî û got:

— Keşe, ka bêje di behrê de çend dilop av hene

— Hejmartina dilopên ava behrê gelek hêsanî ye. Tenê divêt tu emir bikî ko devên çeman bigirin.

Mîr kenî û got:

— Xweş çihab e. Pirsiyariya duduwa, heke ez xwe bifiroşim çend zêr dikim?

— Bîst û neh.

— Min ev seh ne kir, ev çi hejmar e?

— Mîrê min tu zanî ko Îsa pêxember, bi sih zêrî hati bû firotin. Herhal qaîl î ko jê bi zêrekî kêmtir bêfirotin.

Mîr ev jî eciband û jê pirsiyariya paşîn pirs kir:

Keşeo, ka bêje min niho ez di dilê xwe

de çi dibêjim.

— Ez xulam ev ji hemîyan hêsanîtir e. Niho tu di dilê xwe de dibêjî ko ez keşe me, ne? lê ne welê ye, ez şivanê wî me, keşe li gund e....

**Koçerê Botan**

## MARŞA KURDÎ

Gelî biran werin cengê  
Bişoyîn dil ji vê jengê  
Bibêjim ez heta kengê  
Nehin yek j' me bi vê rengê

Hawar heye em çi bikin  
Werin da em xwe kar bikin  
Karê li çîyan kar bikin  
Da hon ji xwe re kêf bikin

Gelî biran bigrin govend  
Bigrin cîkî delal û rind  
Binpenc bikin wekî esed  
Dê j' we bixwazin her meded

Kêf û xweşî her pê we ye  
Hon vê bizanin her we ye  
Ev welat û cîkê we ye  
J' biyanîyan re bê fêde ye

Hon çi bikin bê lome ye  
Çavnêr in em l' destê we ye  
Bizanin ev şanê we ye  
Welleh û billeh ev we ye

Ez ko kurd im ez kurdî me  
J' cîkê xwe re ez gorî me  
Ne bê dost û bê xwedî me  
Ger ala bê li serê rê me

Ez ko kurd im divê bikim  
Evan bran ji xew rabikim



Ez bidim şîr wan ker bikim (1)  
Bav û kalan pê sax bikim

Bav û kalên me pir baş in  
Lê em digel hev dilreş in  
Îro qewî em nexweş in  
Maçû dikim çavên geş in

Ez kurdîyê şernexî me  
Xulamê Mîrê Botî me  
Her wext ji wan re gorî me  
Celadet Alî begê me

Ey beg û ey mîr, ser û şah  
Wek xurşîd, hewr û ba û mah  
Hon ji me re pişt û penah  
Daîm ji we re her Allah

### Mustefa Ehmed Botî

(1) Heye ko ev malik holê be : Ez bidim şîr wan gir bikim (Wergêr)

### Z Î N I N E X E W

Şewêkî rûnak wek çihrey dildar,  
Asman bê pele, zewî xamoş bû,  
Cîrîwey estêre le dûr weku tar,  
Bo dilî birînar zor be xuroş bû.

Le laye şiney dilguşay şemal,  
Le laye bilbil mest boy gul,  
Minî bêçareş gîrûdey xeyal,  
Badem pir ekird le xwênawî dil.

Hêndem xwardewe xwênî geş û sûr,  
Nema twanay seyrî tebîet,  
Bazim da, derçûm le cîhan, le xilqet  
Fîrîşte asa firîm serewjûr ...

Katê mandû bûm, şabalim şika,  
Niştmele le naw gul û gulzarê,  
Cêyekî تنها, ne bû giyandarê,

Mamewe bê kes, bê yar, bê newa.

Ta çaw bir bika her lalezar bû,  
Giyandarî tenya balindey bê xem,  
Tar û ribabî dengî huzar bû,  
Hiç bû le çawya baxekey Irem.

Xistmiye tirsewe çolî û tenyayî,  
Hatewe bîrim belênî Yezdan,  
Beheşte witim, êre bê guman,  
Nema lam îtir bîrî dinyayî.

Hawarim kirde Êzedî bêçûn,  
Fîryad resim bê lem wehşetzare,  
Ya rehberim bê bo rêgay derçûn,  
Ya ne halîm ka lem ser û kare ...

Nagah le penay darêkî berza,  
Hate derewe pîrêkî fanî,  
Serapa bergî sipî le berda  
Pîrçêkî dirêj heta ser şanî,

Dû çawî geşî berraq û pir nûr,  
Rûyêkî beşûş royîştinêkî weqûr ...

Nizîk bô we lêm fermûy "ey role,  
" To çît, çi kareyt, ademîzadî ?  
Bendît, azadî, matî, dilşadî ?  
Çon rêt kewtote em cêga çole ? "

Witim "min kurd im netewey Sasan  
Perestîşkarî Azer û Êzed,  
Hatûm bibînîm ehdî pêşînyan,  
Têbigem dewrî Dara û Yezdegird,"

"Birêjim boyan firmeskî xwênî,  
Hawar berme ber tacdarî Mîdya,  
Bilalêmele, bikem zar û şîn,  
Taku Hirmizman biga be fîrya."

"Fermûy" ba biroyn bo lay  
Akbatan,  
Le wê bibîne be herdû çawit,

Giyani pêşînyan, Mîdiya û Keyan,  
Êstays hewl eden bo berzî nawit”.

Be cûte roştin ta geyîne şarê,  
Pir le awazey şayî û zemawen,  
Pir le firîşte-w perî şox û şen,  
Nemdî le nawya xembarî carê...

Le her la yarî, goyîn, ciltên,  
Le her la teqey nalî şore swar,  
Le her la cilwey rûyekî nazdar,  
Le her la lencey yarêkî şîrîn.

Le her la şorê, saz û newayê,  
Le her la destey şoxanî xoş gil,  
Le her la bangî, sêgaw sebayê,  
Le her la çîmen, sihney xoş gul.

Lew lawe koşkê, berz û serazad,  
Pencey lê eda legel kehkeşan,  
Serfirûy ebû mangî direxşan,  
Dax le dilî bû Babil, Ur, Akad...

Desteye gurdî ciwan û cengawer,  
Poşîde zirê û bergî asinîn,  
Gurz û rim be dest, cengî-w dilawer,  
Dewreyan dabû, bûbûn be perjîn...

Pirsîm le rehber ” kê ye xawenî,  
Em koşk û sera, em qesr û cahe? ”  
Fermûy ” nişîmen paytextî, şahe,  
Muferteke xolî, dar û dewenî ”.

Le paşî kirnûş û sipasî Yezdan,  
Destûrman wergirt bo xizmetî şa,  
Çûyîne astanî Keywan le asman,  
Le taw debdebey serî sur ema...

Xwawendey Babil, qeyserî Roma,  
Fir’ewnî Misir û şahî Naramzîn,  
Hemû secdeber, zan û berzemîn,  
Bo textî Dara-w îwanî Kîsra...

Şahî kişwergîr bom hate guftar,  
Fermûy ” pêşkeş ke sipasî Xisrew,  
Be kurdî bedbext, be kurdî hejar,  
Bid pê mijdey jiyanêkî new,

Rojî her heldê, firar eka şew  
Be rast egerê axirî zînine xew.”

Pîrot

## MIŞÛRÎ DIWA ROJ

*Bo lawanî kurd !*

1- Birakanim ! Caran waman ezanî eger îmro nanêkman bê hîç mişûr xwardinî sibeynêman be pêwîst ne ezanî. Le ber eme detwanim bilêm: Herçî natewawîyek heye le wilatekemana, çî ilmî, çî îqtîsadî... htd. gişîfî leber mişûr nexwardine û leber bê bakî hatûte meydan û zil bûwe. Inca, êwe ke le diwaroj da cêy bawk û bapîrtan ekewête des û ebin be mamostay pêşkewtinî qewmeketan be başim zanî le (Hawar) da hawartan bînim ber û le natewawî weten û millet tozêk bastan bo bikem ke le heyatî emelîtana tewawî biken. Û pelfî millet bigrin û bîben bo sahey pêşkewtin û serbestî. Lem cûlaneweye da be eqil û mentiq hereket biken.

Çûnkî le herekata le eqil û mentiq dûr kewtinewe milletî pê mehû ebêtewe ke emeş xizmet nîye, xiyamet û cînayete... !

2- Hawxwênekanim ! Pêrewî êstay jiyanî wilat û milletekeman zor narêke, hîç mumkîn niye şan be şanî medeniyet birwa : Xurafat mêşkî milletî pûç kirdiwe ! Le ber eme, le pêş

hemû şitêk da herçî xurafatêk le malî xotana, le şarî xotana le dêhat da çî xurafatêk ebînin, hemûy senge û berd bînin !!! Ewîş be şênayî. Le fecrî tarîxewe ta Şerî Gewre kurd, ye'nî millete xoşewîstekeman legel eqwamî rojhelat da nasyawî hebû. Be hoy şerî Gewrewe legel rojaweyekanîşa nasyawî peyda kird. Meziyyetî esasî milletekeman, ye'nî kurd, be hoy tenha nasyawî legel eqwamî rojhelata fewtawe, darizawe, dawêşawe.

Le hemû hengawêkî teceddud û pêşkewtintana yekser lasayî ewropayekan bikenewe; lasayî rojhelatî kirdinewe le teceddud da bo ême bê kelke. Çûnkî le Şerq da û be taybetî le dewr û piştî xomana çî ebînin hemû be medeniyet reng kirawe belam nawekey hewa ziyatir hîçî tiya niye. We esasen ewropayekan le tecedduda mamostan û tiya pîr bûn.. Be fêrbûnî zibanyan etwanin yekser medeniyetî heqîqîyan lê wegirin.

### 3- Milliyet muqeddestire le hemû mu'teqedatêk:

Qewmeketan gelê felaketî dî û eger êwe be ezm û sebatêkî berzewe hewlî bo neden, tûşî felaketî ziltir ebê. Sebebî heqîqî eme ke hemû ferdêk le eynî derece da me'nay millîyet tê negeyîrawe. Ta êsta minewweranî muhteremman her hewlyan dawê ke miteneffizan fêrî mifkûre millî biken. Êwe ebê çak bizanin her ewan kurd nîn.

Cûtyar, fellah, darfiroş, awdêr, sen'etkar, ticar hemû kurdin. Ferde le sertan le heyatî emelîtana legel cûtyara, fellaha, şiwana, gawana, ticara,

sen'etkara, awdêra, be sûretêkî dêmoqratanane bicûlênewe û têbigeyênin millîyet muqeddestire le hemû mu'teqedatêk û lezetî bixene mêşkewe, û têbigeyênin lem esre da bê millîyet jîyan mihale û ebê kurd bo kurd bijî.

Bo pêşkewtin çîman ewê ?

#### 4- Zanist - leşxaxî - saman

**a- Zanist :** Çûnkî xotan legel zanist xerîkin be pêwîstî nazanim basî zanistan bo bikem. Le wilatî muqeddesmana zanist be dû rêge da erwa.

1- Mektebî resmî

2- Xwêndin le mizgewta.

Millet bo ye ewladî hoy enêrête mekteb û mizgewt bo xwêndin ke medenî û esrî bê. Êwe pêwîste millet têbigeyênin herdû layan yek bixen ta efkârî millet le me ziyatir nebê be dû kertewe. We efradî millet le yektirî nagen eger wa bimêninewe.

**Metbûat :** - Bo pêşkewtin û serkewtin û serberzî millet, metbûat wek aw, hewa, pêwîste. Qedrî zibantan bigrin, cilêkî ciwanî leber ken! elifbay taze bilaw bikenewe, elifbay kon, kon bû.

Kitêbî ilmî, edebî, îctîma'î, îqtîsadî binûsin, tercemey biken, le çapî biden, bibin be aboney xezete û mecelle. Êwe cesaretî edebî bixene mêşkî milletewe. Tewsî'î metbû'at û neşrî muellefat be isûlî şîrket bo kurd zor başe û zor be sûkî miwefeq ebê û kurd ekewête dewrî întîbahî heqîqîyewe.

**Mektebî millî :** Ême mektebî millîman niye, eme natewawiyekî bê aman û gewreye. Êwe ke dilbrîndaranî kurdin

û cigersozin hewl biden mektebî millî zor ken! Diyare ke xoman leşî xoman derman nekeyn kes nayka! (hezar sal bîkey bêgane perestî le axirî da dênî nuşistî) îbret. Mektebî dêhat rêk bixen.

**Tarîx û coxrafiyay millî :** Zor şûreyîye bo xwêndewaranî kurd û be taybetî bo ême ke ta êsta teqriben hîç hewlman nedawe bo ziyad kirdinî tarîxman! Ebê çak bizanîn, lawanî eqwamî kun be kunî wilatyan egerrên bo tewsi'î tarîxyan. Çûnkî tarîxî millî xaliqî şî'ûrî milliye û wilat gerran zê = hisî birayetî û nasyawî exate mêşkî efradî eqwamewe. Be kurd û Kurdistan çî lawêkî bizanê Hîmalaya çend berze? Mêsêsîpî çend dirêje ? Berlîn çî ye û çî tiyaye? werin bigerên be dêhata, bizanin ladeyî kurd le çî halêk da ye, çon ejî? Çend qiwetî be serewe? Çî exwa? Bo lawaz û hejare, Kurdistan çî new'e me'denêkî tiyaye? We kê xwênî kurd emjê?

Ey lawan! ey mubeşşîranî serkewtin û serberzî! bigen be firay milleta.

**Qamûsî kurdî :** Înqîlabatî zemanê, ewaridî tebî'î, zibanî kurdî şeq û peq kir-diwe, hewl biden qamûsêkî 'am biken ta neslî atî le yektirî bigen. Beme xizmetêkî gewre bo 'alemî kurd eken. Hawxwênekanîm.

**b- Leş saxî :** Milletekeman qedrî leşî sax kem ezanê, çûnkî herçî pareyekî heye be desî çend eşxasêkewe û murşidêkî dilsozî nebuwe ke fêrî bika be sûretêkî fennî xoy derman bika. Millet fêrî sihet biken. Û pê bilên esrî 20-em esrî nuşte niye, esrî şîrinçe, esrî madde

û quwwete. Beme millet leşsax û dewlemend ebê.

**c- Saman :** Kurdistan ke malî kurda-ne, û qebrî dujminmane û qibley millîmane, serwetî tebî'î zore. Aw û erazi be bereket şelaley be quwwet me'denî weku newt, zêr û zîw û xelûz, asin benexî tiya heye, heywanat û nebatatî cuwê cuwê zore bêşe û cengeli bê hesabe.

Wetenê û milletê ke emende dewlemend bê heyf niye ? şoreyî niye ? abrû-çûn niye ? ewladî feqîr bê. heyf niye destî zillet bo esbabî me'îşet pan bikatewe! Hewl biden! em millete ke xotan ewladî cigergoşey ewin le feqîrî rizgarî biken. Be çî ? Şirket.

Şirketî cil, tutûn û cigere, dar û xelûz. mîwe, hubûbat, seyrangay hawînan. kitêb nûsîn. Hîç nebê bem şirketane gelê parey wilatekeman nadeyn be bêgane ke minnetman lê nazanê. Ke pareşman bû hemû şitêkî pê ekeyn birakanîm.

**Lawêkî Kurd**

## A W A T Î D Û R Î

Ey çaw, çeşnî bazî qefes helwerê perit,  
 Kuwa bale tîjekanî nîgay husnî dîlberit? . .  
 Kuwanî dû çawî mest? Kuwanî?  
 Kuwanî biroy pêwest? Kuwanî?

Kuwanî zulfî reş?  
 Kulmî al û geş? . .  
 Kuwa heykelî cemal? . .  
 Kuwa husnî bêmîsal? . .

Ey gwê, zelifî çawim û ber to û pena ebem,  
 Dengê le yarî dûrewe çî bikem le zîl û bem?!  
 Ba bê xendey pir aheng bê!  
 Nexmey nazî şox û şeng bê!

Zirey bazin bê!  
 Berew lay min bê;  
 Harey heyasekey,  
 Wurşey kirasekey! . . .

Ey hissî şamme, le çaw û le gwêçke me'yûsim,  
 Bonê le yarewe dênê xitamî efsûsim;  
 Ba bê, bonî henasey bê,  
 Pir be sînem wek tasey bê

Ba bê, boy memey  
 Le dirzî suxmey;  
 Bonî weneş, gul,  
 Mêxek, etir, simil. . .

Ey lamise, eger çî nebû deng, û reng, û bo. .  
 Wek şêt, be eqîlî xamewe, xom xiste bextî to;  
 Kuwa temasî leş nermî?  
 Kuwa lezzetî koşî germî? . .

Kuwa memkî pir çing;  
 Lêmoy baxî sing? . .  
 Kuwa maçî lêwî al;  
 Cur'ey ebed-xeyal? . . .

Ey xatiratî 'umrî guzeştem, û dexîlî tom!  
 Xinkawî behrî dûrî nekey eşqî rencerom!  
 Cilwet le çawim wun nebê,  
 Hergîz lay to nûstin nebê;

Çeşnî awêne  
 Daim binwêne;  
 Eşqî qedîmî yar  
 Ta wextî ihtîzar!! . . .

### GORAN

Em şî'rane, le ser isûlî(feqere) rêkxirawin. Her feqereyek, îbarete le çwar beyt. Beytî yekem û çwarem le ser weznî erûz witrawin; duwem û seyemîş le ser weznî pencem.



# FERHENGOK



**A**

|              |                                  |
|--------------|----------------------------------|
| <b>Al</b>    | Sorê vekirî                      |
| <b>Astan</b> | Stêrka (kewkeb, planet) Saturnus |
| <b>Awat</b>  | Dilxwezî, şewq                   |
| <b>Awêne</b> | nînik, eynik, mirêk              |

**B**

|                          |  |
|--------------------------|--|
| <b>Badem pir ekir</b>    | Min bade (qedeh, kase) tijî dikir                    |
| <b>Bak</b>               | Tîrs   |
| <b>Balinde</b>           | Teyr   |
| <b>Baxê Erem</b>         | Baxekî bi nav û deng e (navê wî di Quranê da hatiye) |
| <b>Be şênayî</b>         | Bi nermî, hêdî hêdî                                  |
| <b>belam</b>             | Lê, lakîn  |
| <b>Belên</b>             | Soz, ehid  |
| <b>Berd</b>              | Kevir  |
| <b>Berg</b>              | Cild, qab, cil                                       |
| <b>Berraq</b>            | Biriqokî, bi ruhî                                    |
| <b>Berz</b>              | Bilind   |
| <b>Beşûş</b>             | Devliken, devkenok                                   |
| <b>Bestin(debesrê)</b>   | Girtin(tê girtin)                                    |
| <b>Bexşende</b>          | Efûkar   |
| <b>Beyt</b>              | Malika şîir  |
| <b>Bêçû</b>              | Nevî, nesil  |
Comme notre langue ressemble par sa construction et spécialement par sa lexicologie plutôt à l'allemand qu'à l'arabe, évidemment ceci aussi doit être fixé tel qu'il est. Bien que langue parlée en orient on ne voudra pas lui donner comme soeur la grande langue orientale, l'arabe.

En un mot nos articles seront les fidèles et nettes impressions de tout ce que nous traiterons.

Ce genre d'étude objective, a été, malheureusement négligé jusqu'ici par les intellectuels d'autres pays orientaux, par crainte d'être considérés comme primitifs et

même barbares. Il n'est pourtant ni intelligent, ni utile de transformer la réalité des choses. Il est préférable de les présenter sous leurs véritables cachets, puisque ce sont eux qui nous caractérisent comme peuple ou nation distincte.

Si ces coutumes sont incapables de nous rendre heureux dans le développement du mode de vie sociale, sous l'empire des nécessités du temps présent elles se modifieront et se développeront tout en se conformant aux aspirations du peuple, de manière à former une continuation de toute une culture nationale.

On doit naturellement faire exception aux systèmes et méthodes scientifiques. Ceux-ci sont des institutions, de nos jours, devenues tout à fait internationales.

Tout peuple qui tend à se moderniser et se reformer doit accepter les formes et les procédés les plus neufs et les plus perfectionnés. Car les premiers sont de la culture pure, tandis que les seconds une civilisation générale.

\* . \*

Les textes et les noms propres qu'on citera seront écrits avec l'alphabet kurde. Les lecteurs en étudiant l'alphabet kurde, très simple et phonétique arriveront facilement à les lire.

D'autre part nous nous mettons à la disposition des orientalistes et de tous ceux qui voudraient avoir des explications complémentaires sur les sujets traités. Nos pages leurs sont ouvertes pour toute question qui intéresse de près et de loin le kurde, le kurdistan et le kurdisme.

### LALANGUE KURDE

La langue kurde est une langue aryenne. Langue Indo-Européenne, Indo-Germane.

D'après les dernières recherches archéologiques et philologiques, il semble que la langue actuelle dont les Kurdes se servent, est la langue des Médes, comme celle des Persans et celle des Parses.

On admet aussi que la langue Kurde tire ses origines de la langue Zende et celle des Persans de la langue Pehlewi.

Même aujourd'hui le Kurde parlé pas les Kurdes des alentours de [Hemedan] s'appelle [Qurdiya Zendi] qui veut dire le [Kurde Zende]

Dénomination qui tend à disparaître en devenant simplement Qurdî

Il y a déjà trois siècles que le poète Kurde «Ehmedê-Xanî», auteur de «Mem û Zîn» fit allusion à la similitude de la langue des Kurdes et de la langue des Médes.

La poète fait de longues reproches aux hommes de lettre Kurde d'avoir négligé leur langue et d'avoir écrit en arabe, en persan et en turc, et il dit textuellement :

(à suivre)

## Qiriyariya Qomelê

Qiriyari : Ji bona Sûriya, Tirqitya  
Ecemistan, Irak û welatên Kevkasê :

|          |     |            |
|----------|-----|------------|
| Saleqî   | 500 | Kirîş-sûrî |
| Şeşmehqî | 300 | Kirîş-sûrî |
| Sêmhqî   | 175 | Kirîş-sûrî |

Ji bona welatên din :

|          |     |       |
|----------|-----|-------|
| Saleqî   | 150 | Frenq |
| Şeşmehqî | 90  | Frenq |
| Sêmhqî   | 50  | Frenq |

Her tişt bi navê xweyî têne şandin :

Şanî : Taxa Qurdan



### ABONNEMENTS

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase :

|        |     |    |
|--------|-----|----|
| 1 an   | 100 | f. |
| 6 mois | 60  | f. |
| 3 mois | 35  | f. |

Pour tout autres pays :

|        |     |    |
|--------|-----|----|
| 1 an   | 150 | f. |
| 6 mois | 90  | f. |
| 3 mois | 50  | f. |

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire :

Emir Djeladet Anli Bedir-Khan

Damas : Quartier Kurde

Xweyî û midirê berpirsiyar :

Mîr Celadet Ali Bedir-Xan

كلمة: ( bel — der, ser, qer )  
 i — هي ما تقابل الكسرة في اللغة العربية كالكسرة من  
 كلمة ( من min )

u — لا يصح مقابلة هذا الحرف بالضمة تماماً فهو يقارب  
 الضمة بلفظة ( كُرْدُ — qurd ) gur, guvaştin  
 والاحرف الصوتية الممدودة هي :

a — هي ما تقابل الالف الممدودة ( آس — as ) awa, av  
 e — هي ما تقابل الياء المستعملة في الكلام العامي ككلمة  
 (خير) وهي لا توجد في اللغة العربية الصحيحة: der, zêr, nêr  
 i — هي ما تقابل الياء الممدودة بلفظها العربي الحقيقي  
 ( جديد ) zin, şin ( cedit )

û — هي ما تقابل الواو الممدودة بلفظها العربي الحقيقي  
 ( نور — ûr ) dûr, rûr, qûnar

o — لا يوجد لها مقابل في اللغة العربية وهي تقابل ال ( o )  
 الافرنسية وتلفظ دوماً ممدودة ولا توجد بحالة قصيرة .  
 والاحرف الصامتة هي كما يأتي :

b = c ج ، ج = ç ، د = d دض ، g = ك  
 h = x ، خ = x ، z = ج ، k = ق ، q = ك ، l = ل  
 m = n ، م = n ، p = ب ، r = ر ، s = س ، ص = ص  
 s = ش ، t = ط ، f = ف ، v = ث ، w = و  
 y = ي ، z = ز ذ ظ

بما انه لا يوجد في اللغة الكردية حروف ( ض ، ص ، ط  
 ث ، ط ، ظ ، ذ ) لذلك نفي كل الكلمات التي اخذها الاكراد  
 من اللغة العربية ، يلفظ حرف ( ض ) مثل ( د ) و ( ص ) مثل  
 مثل ( س ) و ( ط ) مثل ( ت ) و ( ذ ، ظ ) مثل ( ز ) .  
 لقد دخل على اللغة الكردية من اللغات الاجنبية زيادة على  
 حروفها حرف الحاء والغين في بعض أنحاء البلاد الكردية .  
 فلذلك اعطينا لهذه الاحرف الصور الآتية :

h = ح حال — hal  
 x = خ غار — xar

موقعها بين سائر اللغات . ودرس العلاقات والروابط  
 اللغوية التي تربطها بها .

٢- درس وتبع مرافق ومعالم ودواوين الامة  
 الكردية في مختلف المناطق والأرجاء التي يقطنها  
 الاكراد .

٣- درس مميزات الرقص الكردي باوزانه  
 واوضاعه . ودرس مميزات الموسيقى الكردية وثبتت الحانها

٤- البحث عن الاوضاع الاجتماعية كالدين  
 والعادات والاخلاق البائدة والتي لا يزال يعمل بها  
 الاكراد . وتعيين المبادئ الاجتماعية التي كانت وما  
 برحت مسيطرة على حياتهم .

٥- جمع واحصاء الآثار العلمية والأدبية ونشرها  
 ودرس آثار وترجم رجال العلم والأدب من الاكراد .

٦- البحث عن احوال البلاد الكردية من حيث  
 توزع سكانها ومن حيث اوضاعها الاجتماعية والسياسية  
 والتاريخية وطبيعتها الجغرافية .

٧- درس جغرافية كردستان على اساس توزع  
 العشائر قبل « الامير شرف » وفي ايامه وبعده .

## الاحرف الهجائية الكردية

تألف الاحرف الهجائية الكردية من احدى وثلاثين  
 حرفاً :

a b c e ç d i g h x é j i k q u l m n o p r  
 s ş t û f v w y z

الثانية من هذه الاحرف هي صوتية والاخرى صامتة .  
 ان الحرف الصوتي في اللغة الكردية لا يكون احياناً  
 قصيراً واحياناً ممدوداً انما يكون اما قصيراً واما ممدوداً بصورة  
 مطردة .

فالاحرف الصوتية القصيرة هي :

e — هي ما تقابل الفتحة في اللغة العربية ، كالفتحة من

صاحب الامتياز والمدير المسئول

الامير مهدي عالي بردخان

k - (kar) کلمه سنده کی (k) نك غير تلاقدين

• تلفظنه تقابل ايدر .

q - (kâzim) کلمه سنده کی (k) نك برآز قالين

تلفظنه .مادالدر . فرانسزجه ( quatre ) کلمه سنده کی  
( que ) مسيدر .

x - عربلك (خ) سنك عيندر .

xx - انگليزجه (xx) در (Whisky, Tramway)

عربلك تور كچه املاده ( vesl ) شكنده ياز يلافت  
كلمه ده کی (v) بی تلفظلي كبی

بعض مناطقده كوردلر (ح) و (غ) یده تلفظ  
ابلمكده درلر . بو حرفلر كوردجه ده مبادلری اولان  
حرفلك اوزر بنه ( .. ) اشارنك وضعيله و الفبا خارچنده  
اولق اوزره شو صورتله گوسترلشدر .  $h = \bar{h}$   $ç = \bar{ç}$

نقطه مسز (i) و اشارنلي (g) تدارك اولنه مديغندن اشبو  
نور كچه عبارله ای الفبا بهري بالضرور اسکی حرفله ترتیب  
ایداشدر .

بری عربلی

هدفنا و خططنا

لقد اسسنا مجموعه (هاوار) لغاية علمية وادبية  
محصنة، فهي اذا لن تندخل في الشؤون السياسية مطلقاً .  
اننا نريد ان نخدم في هذه المجموعة اللغة الكردية  
والادب الكردي؛ وقد وضعنا لذلك برنامجاً نسير عليه  
في بحثنا ودرستنا كما يلي :

المبدي الاساسية :

۱- نشر الالقاء الكردية الحديثة بين الاكراد .

و درس اللغة الكردية وتدوين قواعد هاو البحث في مختلف  
لهجاتها . و البحث عن القواعد والاصول التي خضعت  
لها هذه اللغة في تطورها منذ اقدم العصور . وتعيين

کوردجه الفبا

کوردجه الفبا ( ۳۱ ) حرفدن . م ک ب د ر .

a b c e ç d i g h x ê j i k q u l m n o  
p r s s t ù l v w y z

بو حرفلردن ( ۸ ) ى صدالى ( ۲۳ ) ى صدامز در .  
صدالى حرفلر :

a e i e i u o ù

کوردجه ده صدالى حرفلك امتدادى ناپتدر .  
بو صدالى حرف گاه اوزون و گاه قيصه اوقوناماز . بنا  
برين صدالى حرفلر قيصه و اوزون اولق اوزره معين ايکي  
غروب تشکيل ايدرلر .

قيصه صدالى حرفلر :

e i u

اوزون صدالى حرفلر :

a e i o ù

قيصه صدالى حرفلر :

e - تور كچه الفبا ده كى ( e ) نك مقابليدر .

ايداشدر ( gelmek , germek ) گهلهنده اولدبني كبی

i - تور كچه ده كى نقطه مسز ( i ) در .

u - ( w ) صدامز حرفيله ( i ) صدالى حرفلك

امتزاجندن وجوده کن بو صدایی افاده ايدر . sund

اوزون صدالى حرفلر :

( a ) - ( kalip ) کليبه سنده کی اوزون ( a ) در .

e - ( ergeç ) کلمه سنده کی ( e ) لرك اوزون  
اولارق تلفظنه مادل برس و يور يور . فرانسزجه ( peine )  
کلمه سنك ( ei ) مسيدر .

i - ( iz ) کلمه سنده کی تور كچه الفبا ده ( i )

ايه گوستر بيان و فقط دائما اوزون اوقونان بر ( i ) در .

ù - ( duradur ) کلمه سنده کی اوزون ( u ) در .

صدامز حرفلردن

b c ç d h j l m n p r s s t l v y z

تماميله تورك الفبا سنده كى حرفلك سسلر بنه مال كدرلر .  
متباقي صدامز حرفلر :

g - ( geldim ) کليبه سنده کی ( g ) در .



### الفبای کردی

الفبای کردی از بی و بک حرف ترکیب میشود :

a b c e e d i g h x e j i k q u l m n o p r s  
s t u f v w y z

هشت حرف از آنها با صدا و بیست و سه حرف بی صدا هستند .  
در زبان کردی حرف با صدا گاهی کوتاه و گاهی دراز  
نمیشود . بدین جهت حرفهای با صدا دو قسم اند . کوتاه  
است و دراز .

حرفهای با صدا و کوتاه :

e — مقابل فتحه است : پَر per

i — مقابل کسره است : فاریس faris

u — این حرف بلکه نزدیک ضمه است ولی در حقیقت

ضمه نیست : کُرد qurd

حرفهای با صدا و دراز :

a — مثال (آ) در کلمه (آمدن) ameden

e — مثال (ی) در کلمه (دیر) der با صورت که

کردها تلفظ میکنند .

i — مثال (ی) در کلمه (شیر) sir

u — مثال (و) در کلمه (روز) ruz

o — مثال (او) در کلمه (او) ضمیر شخصی

حرفهای بی صدا ازین قرارند :

b = ب ، c = ج ، ç = چ ، d = د ، ض ، g = گ

h = ه ، x = خ ، j = ز ، k = ق ، q = ک ، l = ل

m = م ، n = ن ، p = پ ، r = ر ، s = س ، ص

ث ، ş = ش ، t = ت ، ط ، f = ف ، v = ف

w = و ، y = ی ، z = ز ، ذ ، ظ .

در زبان کردی حرفهای (ض ص ث ط ظ ذ )

علیحده وجود ندارند . بدین جهت برای آنها حرفهای

جدیدی معین نشده است .

بعض کردها حرفهای (ح و غ) را تلفظ میکنند .

وآن حرفها بدین شکل نوشته میشود :

ح = h ، غ = x

آزمرو فکی ر بن ونکیر هاتی مه ؛ ژمن ژدعایی پییه  
نیشتنک نایه .

بیلی ، تو کس فی خبری بییژه ، ژلوره کو آف

نه راسته . هروکی مه گوت هر کس ب تشتکی ،

ب آواکی د کاره بی هاوارا هاواری . تنی دبه کو

آوایی هاواری نزانه . ژیره چند آوا هته :

۱- کر پیاری هاواری بوپین و ژیره کر پیاران

پیدا کرن .

۲- ناؤین مروئین خوندار لی نه مالدار کو نکارن

کر پیار بین و ناؤین مدرسان ژمره دان زانین ، دا کو

هاوار ژوانره هروه بیته شانندن .

۳- پشتی خوندها هاواری ژهفال و ناسین خوره

دان خوندن و ژمره وئین نخونداره بخوه خوندن و او

سرتیده خستی بین کومالی سروقت کرن .

۴- ژهاواری ره هر تخلیط شعر و بندان نفیساندن .

۵- چیروک ، مدهنوک و مامکان برهف کرن

و ژهاواری ره شانندن .

۶- د حقی ولات ، عشیر ، بازار و گندی خوه ده

نشتن کفن و نو ژهاواری ره ریکرن .

۷- هر تخلیط بر گهین کردستانی پیدا کون و دگل

وصفین وان ژمره هئارتن .

ژگوتنن ژورین قنج دخویه کو ژهاواری ره

آری کرن لاک هیسانی به . کسی کو دل بکه دی بکاره ژمی

\*\*\*

د دستیک ده کو ملامه د پانزده روزان ده جارکی

دی در کفه . پشتی چند هژماران کو ملامه دی

به هفتکی ولسری هر هفتی بی دی بلاف به .

تشتن راست و نراست ژى هنه .  
 از كو كرد و كردمانجز ماتم و زمانى خوهرندد زانخومين  
 اوب هفت هشت زمانين دن دانيه برهف ، كت  
 كمين وى هور هوناندنه ، قيد بن وى ژه هف در ئيخستنه ،  
 د كارم ژ بيانيان بيتر و قنچتر د هكراوى بدم خويا كرن  
 وزانين . زمانى مه ايرو هم فرهه هم تنگه .  
 فرهه : ب هر تشتى كو كرد پى مژول بونه ،  
 دست دانه وان ، دى وى وارى ده زمانى كردى هنگ  
 زمانين دن وژ هان بيتر پيشفه چويه و ملكيه وژنو  
 زمانين ملكى ب شونده نه مابه .  
 تنگه : هر چى كوژ كردان ره ناس مانه و كرد  
 پى مژول نه بونه دوى وارى ده زمانى مه راوستيايه ،  
 پيشفه نه چويه ، دجهى خووه مابه .  
 لى زمانى مه ژوان زمانانه كو بر هر تشتى نو ، پيسين  
 نو دزين و بريشه پيسين نو ژوان چار دين .  
 هر وكى خلقى كلى يى گويان ، برى چارده سالان ،  
 كافا طياره ديتن ، ناقل ب زارى خووه بالا فر ناقف  
 لى كرن . ژلوره كو ژباني ، ژبالا دفره . ديسان  
 كردمانجنن كو تليفون ديتن ، ژمسه ماوى ره بهيستوك  
 گوتن . ژبر كو دنك پى نيت بهيستن .  
 نهو ام فگرن سر گوتنا خووه ، سراوايى نفيساناندا  
 زمانى خووه .

ايرو د زمانى مه ده دو تخليط كميانى هنه .  
 وندابونا پيسين كردى و كشتا پيسين يان ناقف زمين .  
 ام چى بكن كوزمانى مه بكاره فگره سر خور يتيا  
 خووه و د ناقف زار و زار او اين خووه ده بكمله و بيه  
 زمانى نكوز .

د وندابونا پيسان ده ، پيسن هنه بى كجار وندابونه ،  
 هن هنه ژ زارى كشته لى دى كى دن دد دژ بن و چنك  
 هنه د آخافتى ده كيم تينه گوتن لى د مامك ، مدهلوك ،  
 چيروك و سترانان ده تينه بهيستن .  
 ام لپى وانن . هين ب هين ام وان د ئيخن دست  
 و د صنفين و گوراججتى ژى ژ نوفه سر آوايى  
 همدانينا پيسين كردى پيسين نو چيد كن .  
 ژ بونا پيشفه چونا زمين ، دويت ام بندين خووب  
 ئفاياون پيسان بنفيسين ول پاشيا هر هژمارى  
 فرهنگو ككى دان و تيده مانا پيسين كو د زارنده كيم  
 بونه و بين كوژ نوفه هاننه همدانين ژ خوندا نين  
 خوهره بدن زانين .

ژ خوندا نين خووه هيقي د كم فرهنگو كامه قنچ  
 بخوبين و د حقى پيسى ده كو ففكر كه وان به ژمره  
 بنفيسين ، هكه جيو كا پيسى بزنان ، او اهازى  
 ئف مانا لى فر قين وى د گل جيو كا خووه ژمره بدن زانين .  
 و كو ز ريكرن ، شانندن ، هنارتن جيو كين هفن .  
 لى د مانا بى كرنى ده ژ مانا شانندن و هنار تينى فرق هيه .  
 ريكرن هر حال بى ئيخستن و شاننده .  
 ديسان ، خبردان ، آخافتن ، پيقين جيو كين هفن .  
 گلود نقباوان ده چه فرق هنه ؟

\*\*\*

هاوار زارو ككه نوزايه ؛ زارو وامه به ؛ زارو  
 وا كرداه . وك هر زاروب خويبيادى و باف ،  
 برا و پسمامين خووه د كاره بژى . هر كس ، هر كرد  
 د كاره آر بكار يا هاوارى بكه . تو كس ميژه كو ،

# هاوار

بردی

## کوملا کردی

### آرامنج، آوایی خبات و نفیساندا هاواری

- ۱- هاوار دنگی زانینی به زانین خوه ناسینه .  
 خوه ناسین ژمره ری یا فلات و خوشی بی ئدکه .  
 هر کسی کو خوه ناس دکه ، دکاره خوه  
 بده ناس کرن .
- ۲- هاوارامه بری هر تشتی هیئتا زمانی مه دی بده  
 ناس کرن . لو ما کو زمان شرط هیئتی آپشینته .  
 هاوار ژو بیفه بی هر تشتی کو کردانی  
 و کردینی پی بندواره دی مژول بیه .
- ۳- تنی سیاست ژی دوره ، خوه نایبخه سیاستی  
 هاواری سیاست ژ جقاتین ولاتی ره هشتیه .  
 بی سیاستی بلا او مژول بین . ام ژی دیواری  
 زانین ، هنر و صنعتی ده دی بختن .
- ۴- دی بین بلاف کرن .  
 ۵- هاوارامه بری هر تشتی هیئتا زمانی مه دی بده  
 ناس کرن . لو ما کو زمان شرط هیئتی آپشینته .  
 هاوار ژو بیفه بی هر تشتی کو کردانی  
 و کردینی پی بندواره دی مژول بیه .
- ۶- تنی سیاست ژی دوره ، خوه نایبخه سیاستی  
 هاواری سیاست ژ جقاتین ولاتی ره هشتیه .  
 بی سیاستی بلا او مژول بین . ام ژی دیواری  
 زانین ، هنر و صنعتی ده دی بختن .
- ۷- آوایی خباتی - کار کی کو بکاره بچه سری ،  
 دفت ژیره پرو نفیسه ک بیت چیکرن . مه پرو نفیسا  
 خوه سر بنگمین ژیرین ایکیکریه .
- ۸- بلا فکرا الفابی یا کردی دناف کردان  
 و هینکرونوی . صنفاندا زمان آزینا کردی وهین  
 بی هین د کوملی ده بلاف کرن و پیشتر د  
 دشکلی کتبی ده در نیخستن .
- ۹- صحیبتا زارین کردی و برهفدانینا وان .  
 صحیتی سر مرو فاتیبا زمانی کردی دگل زمانین دن  
 ئین آری . صحیتی سر بنگمین زمانی کردی ،  
 سردیروک و آوایی رابون و پیشفه کتناوی .
- ۱۰- برهفکرا چیروک ، چیرچیروک و هر  
 تخلیط لازه و سترانین کردی و بریغه بلا فکرا ناوان .  
 ۱۱- صنفاندا و بلا فکرا دبواین کردی .  
 بی فان فه ژینه نگارین شاعر و مرو فین بژارته ژی  
 دی بین بلاف کرن .
- ۱۲- صحیتی سر رقص و قیده بین سترانین کردی .  
 ۱۳- صحیتی سر هر تخلیط ریز کین کردی  
 و کردستانی ، بین زمانی بوری و بین ایرو  
 و صنفاندا ناوان . صحیتی سر هاتین کردستانی  
 و پیش و صنعتین کردی .
- ۱۴- دیروک وارد نگاری : صحیتی سر فابی یا  
 دیروک وارد نگاریا ولاتی کردستانی و سر دیروکا  
 عشیران . بری ، پاشی و د وقتی مهر شرفده .
- ۱۵- آوایی نفیساندنی - در حقی زمانی مه ده حتانهو  
 گلک تشت هاتنه کوتن . دناف فان کوتنان ده



هزارم ۱



۱۵ گیلون ۱۹۳۲

# هاوار

کوملا کردی

سال ۱



یکش

تیلده خستین کومهلی

آرمانج ، آوایی خبات و نیشاندنا هاواری

فارسی

الفبای کردی

ترکی

کردجه الفبا

عربی

هدفتنا و خطتنا

عربی


الاحرف الهجائية الكردية

م ۱۹۳۲

مطبعة الترقی بدمشق

ه ۱۳۵۱

SAL 1



ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 2



1 HİZÊRAN 1932

## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

### Têdewîstiyên Qomelê

|                  |                     |
|------------------|---------------------|
| Civata arîqariyê | .....               |
| Ta, tawî û tabir | Dr. E. Nafiz        |
| Lehî             | .....               |
| Du Egd           | Dr. Q. A. Bedir-Xan |
| Elfabêya qurdî   | .....               |
| Gundê nûava      | Kedricau            |
| Ferhenggoq       | .....               |
| Tola welêt       | .....               |
| Xanî             | Dr. Q. A. Bedir-Xan |
| Berdêlq          | Osman Sebrî         |

### Birê Frensiî

|                 |       |
|-----------------|-------|
| L'alphabê Kurde | ..... |
| La langue Kurde | ..... |

*Dr. M. Khidir*  
*Opérateur et Oculiste*

Damas

Jalil

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET ENFANTILES**

Damas

Armon

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
l'Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 F.  
3 mois 60 F.  
4 mois 40 F.

Pour tous autres pays:

1 an 150 F.  
3 mois 90 F.  
4 mois 60 F.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qirîyarîya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasî:

Salqî 500 kirûs-sûrî — 100 frenq  
Şesmebîqî 300 kirûs-sûrî — 60 frenq  
Carmehqî 200 kirûs-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq  
Şesmebîqî 90 Frenq  
Carmehqî 60 Frenq

Her tişt bî navê xweyî tene şandin:

Şam: Taxa Qurdan

## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

## Civata Arîqariyê ji Bona Qurdên Belengaz

Vê paşiyê di jiyina miletê qurd de tişteqî mezin, bîesas û xerqar hatiye çêqirin. Qurdên Cizîrê ji bona xweşqirina halê qurdên belengaz civateq bi navê jorin daniye .

Pêrûz ji wan re, pêrûz , hezar pêrûz. Xwedê mala daniyan ava û xweş biqe û şolê wan bibe serî .

Bi vê civatê ji qemasiyên me ên bê-hejmar yeq ji nav hate hilanin . Devê qortaleqe qûr qo her rûj jiyina me diqot, rayên me dicût , pê hatiye girtin .

Ji vê civatê re herweqî dani di pêsgotinqa nizamnamê de dibêjin, ji herqesi bêtir em , miletê qurd , hewcedar bûn .

Pêsgotinqa nizamnamê sebebên dani û çêqirina civatê ji me re gelec kenc dide zanin .

Min ji dil qir xwendevanên xwe serwest biqim . Da qo ew ji weq min pê dilşa û qêtxweş bibin .

Eve pêsgotinqa nizamnamê :

«Qurdino ! Em miletê qurd , ji her qesi bêtir hewcedarê arîqariya hev in . Ji me re ewçend zantû û hiner û hinerwerî ji divê. Ji lewma qo em ji bêxweyîti û berberiyê qetine binîya qortalanêzani û belangaziyê . Ji bona qo em biqarin bîn ser xwe û ji vi halt bifilitin, divê em destgîrên hev bibin , xwe bidin ber barên hev û yeqîdî û yêdeng kerara xwe bidin. Ew kerara qo me hemîyan ji nezani, ji belengazi , ji zivartî û ji diltiyê de xelas biqe . Dantiyên vê civtê hevîdar in qo hon bi tevayî bi wan re biqin, ji ya wan biqin, pişt bidin wan û bixebitin, da qo ew qarê haut ê kenc û rehaqar biçe serî .

Tu şiq mine , heqe hon holê bi me re bixebitin , miletê me zû bi zû ji vi halt xelas dibe û rûj bi rûj birêve her bi kenci û avahiyê ve diçe .

Madam heta irû ji nav me ew dewlemendên camêr derneqetine qo bi derbêqê hezar zêran bidin û ji bona miletê xwe dibistanan û binyanên xerê çêqin , divê em xwe bi xwe bixebitin û bi yeq du kirûsên xwe wan hezar zêran bidin hev .

Ev kirûsên ha ji me re , ji welatîyên me re rêya xwendin û zanin û ya xweşiyê de veqin . Ev yeq du kirûsên qo hon ji civata xwe re bidin ji bona her yeqî we ne beha ne . Lê qo gibane hev bi qerî miletê me tèn û pê gelec tişt çêdibin . Bi kirûsên we dibistan tèn çêqirin , maleq pê ava dibe , dermanên çend nexweşan pê tèn qirin , û hon bi dayina wan fekir û bi nedayina wan dewlemend nabin .

Xebata me , xebata dantiyên civatê destpêqirin û rêberî ye. Civat bi arîqariya we , bi têqil bûna we ava û xweş dibe , û qarê civatê bi vi awayî diçe serî .

Bê şiq e qo heqî hej miletê xwe diqin û di rayên wan da xwina qurdî a paq digere arîqariya civatê ji bona wan deyn e , deyneqî mezin, bilind û mikedes e .

Ji xwe her qes deyndarê miletê xwe ye , ji ber qo ewi ew bixweyî qiriye , ji ber qo her qesi nanê miletê xwe xwariye û her qes dizane qo « Nanê mêran li mêran bi deyn e » . Werin , xwe bileztnin û deyne xwe ji miletê xwe re bidin » .

Gotinên dantiyên civatê li hire xelas dibin .

Ji van gotinên gewherin re gelec tişt



## Stûna Zarowan

## Tola Welat

Welat! welat! qani xweşi?  
Kewî irû tu nexweşi.

Qani ew qen, qani geşi?  
Çiman holê weq dilreşî?

Çiman wisa tu bêmadî?  
B'qurê xwe re xeber nadi?

Qul û qûyan ji her alî;  
Lewra welat wer dinalî.

Destên tirqo li te qelîn;  
Bi xwîna te sor bûn repîn.

Mîr û mela dar ve qirin;  
Xort û xurtan ji te birin.

Ez qo qurd im ji bir naqim.  
Bi xwîna xwe divê raqim.

Ez bixwînim, xwenda bibim;  
Mezin bibim, zana bibim.

Mêrquj bibim bi nav û deng;  
Ez hilgirim top û tifeng.

Tola te ji evda te jî,  
Dê hilinim doza te jî.

Şam : 7 Tirmeh 1931

nînin qo em biqarin zêde biqîn. Tinê di hekê rayên civatê û ser awayê artîqariyê divê em çend pîrsan bibêjin.

Serniveqa civatê di Hesiçê de ye. Di her bajar û gundên mezin ên Cizîrê de malîqên wê hatine veqirin û hin bi hin vedibin.

Serniveqa civatê ji bona dantna dibistanêqê û lûqirina xestexanêqê ji niho ve xwe qar diqe.

Heqî qo artîqariya civatê biqîn artîqariya xwe diqarin rast bi rast li Hesiçê ji serniveqa civatê re bisînin.

Artîqariya civatê bi her tiştî dibe, ne tinê bi pere. Çaxa benderê nizing e. Xwedan gund û colqarî diqarin ceh û genim ji bidin. Heqê ji serniveqê re şandina wan dişwar e, dayî diqarin bidin nimî tendeyê civatê ew jî digehine civatê.

Nimî tendeyê civatê li Şamê Dr. Elîmed Nalîz heq e, qo qurdên Şamê hemî ji rind nas diqîn.

## Behî

Tifak û yeqbûn, zexmî û xurtiya civatê ye. Nifak û berberî kelsî û jariya wê ye.

Di vê cihanê de her tiştêr mezinahî bi tifak û yeqbûnê, bi dayîna hev berbarên hev, bi hevgehîrana mirov û bi hevgehîrandina xebatên wan hatine pê.

Milet û dewletan bi tifakê gihane bilindiya her tiştî û bi nifakê qetîne bintiya qortala neytin.

Ji lewre mirov diqare bibêje heyin di tifakê de, neyin di nifakê de ye.

Xurtî û zexmîya yeqbûnê di lehiya de qeleq kenc têt ditin.

Ma lehi çî ye?

Lehi ji hevgehîrana dilopên baranê pêve ne tu tişt e.

Peşqên baranê gava ji hev cuda û yeq bi yeq diqevînin rûwê erdî, erd wan da-dikurtine.

Tihniya xwe pê vediqûjîne. Lê gava digehin hev, hingî ji wan peşqên kels lehiqe hoş radibe. Dilop û peşqên baranê di yeqbûnê di tifakê de ne.

Erdê dilopxwerê din di destên wan de lehîstoq e. Ew serdestên erdî ne. Bi erdî re dileyizin; singa wî kul diqîn, tediqevînin, bilindiyên wî hildiveşînin, qendalên wî diqeleşînin.

Lehi weq hûteqî har û heq radibe ser xwe, ji pal û qaş û newalan dadixure. Li her wê tu qes, tu tişt; bican, bêcan nema diqere biseqîne. Lat, zinar, qevir, rêl, dar, direh serên xwe li ber xurtiya tifaka dilopan ditewînin û lehi, ew şehînşehê yeqbûnê ewan mîna çilowên siviq dide pêşiya xwe, rêş diqe, dimale.

Halê qurdan ji ev e.

Qu: d ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tîn dakurtandin. Qo gihane bev dibin lehi, lehiqe hoş, tu qes, tu tişt li ber wan niqare biseqîne.

Felata welatê me di rabûna vê lehîyê de ye. Bêrût : 28 Tebax 1929

## Stûna Fekohan

Ta, Tawî û Tabir

Yeğî ji fekehên desta Hesinan ji me nexweşiya tayê pirsiyar diçe. Me pirsiyariya wî da bijîşqê xwe û jê cuhabeqê daxwaz qir.

Eve, reşbeleqa fekeh û cuhaba bijîşqî.

Desta Hesinan: 23 Gulan 1932

Ezbenî!

Min stûna xwe-stûna fekehan-xwend. Geleq tişt hene qo divêt em ji te bipirsîn. Heval nav hev de şevirin û me got bila pirsiyariya me a pêşîn nexweşiya tayê bibe. Da qo em jê xelas bibin, eklê xwe bidin ser hev û biqarin tiştînen din ji bipirsîn. Ji lewre qo ji tayê eklê me ne ser hev e, em jê geleq aciz in.

Paşî, ez destên te maç diqim û hevîdarê cuhaba te me.

Hesenê Qoçer

Cuhaba bijîşqê me :

«Xelqê desta Hesinan ji hesinî çêqiri bûwana ji diviya bû heta niho di veytûna tayê de bihatana belandin. Herweqî dihelin ji.

Ji xwe birê welatê me ê germiyan û dest ji vê afetê xerab dibe.

Gava ji xelqî têt pirsîn, xelqê nezan dibêjin qo nexweşî ji ava gundî ye. Niq dilê wan ava wan ne paqij e, bijêhr e, herqî vedixun pê diqevîn.

Lê ne welê ye. Ew ava zelal û şirîn qo di her gundê we re dibore û gundê we pê şên û ava dibe, di eslê xwe de paqij e, avîje ye, qaniya jiyîna we ye. Jehr û nexweşî di nezani û tiraliyê de ye.

Nihê divêt ji we re bidim zanîn ew avên paq qo qaniya jiyîna me, çawan nepaq û jehr û axê dibin.

Herweqî nas e, gava av serberdayî diheriqin, li deştan belav dibin di çal, qortal û di her cihên nizm de dipingirin, ji wan pingavan berpê dibin. Pingav bi

zamani ve dibin çirav, di dora wan de giya, stirih û zil şin dibin. Di nav wan de pêşî (qelmêş) cih digirin, hêlînen xwe çêdîqin. Jê dilirin, tèn li ser dest, rû û laşên me datînin, bi me vedidin. Mirovên pêvedayî di nav (6-21) rûjan de pê diqevîn û dibin tawî.

Di destpêqa nexweşiyê de laş û leblên mirov dişqên, direcifin, piştê germ dibin. Hêlê nexweşiyê ji sê çar saetan heta sê çar rûjan dom diçe û bi xwêh danqê derbas dibe. Pêşdetir ev halê ha an her rûjan an di serê du sê rûjan de carqê vedigere tê. Heqê nexweşî derman naqin pêde diçe û dibe (taya-veşarti).

Di taya-veşarti de rengê nexweşan zer dibin, xwina wan diqîqin, ziqê wan diperçifin, diqevîn haleqî ecêb, dibin weq meşqeşî vala ser da dariqan an ser key-siqeqî daqîqandî.

Di vî şiqî de nexweş zû bi zû namirê lê ji derba xwe diqeve, bi qerî tu tiştî, tu qesî naye. Ne mal, ne zar û zêç, ne welatê wî jê tu fêde nabinin. Pericar ji avinê ji diqeve, zarowên wî nabin, qo bibin ji nexweş û qemsihet derîten. Bi tişteqî qîçiq dimirin. Ji bona wî jiyînê din namirê. Heta qo ezrail hê hawara wî di nav êş û tehlîyê de diperpîte, vedigevîze.

Ewê ha şiqleq e. Şiqleqî din ji heye Jê re (taya-xebis) dibêjin. Di taya-xebis de şiqînen giran hene qo di nav sê çar saetan de diqujin. Ev şiqî pericar di zarowan de têt dîtin.

Eve ta. Hon dibinîn qo tanexweşiqê giran û xedar e. Ji tifo, qolêra û ji webayê xirabtir e. Nexweşiqê welê ye qo rayê heyîna me, rayê heyîna miletî diqoje.

Bi gotinên jorin kenc xuya qir qo ev nexweşiya xedar ji pêşiyar, pêşî ji pingav û çiravan têne pê, lê tucar ne ji ava zelal qo xwedê pesna wê di kuranê de da û di hekê wê de (we cehelna minel mai qule şeyîn hey) me her tişt bi avê jiyandine, gotiye.

Vêca qo me qaniya nexweşiyê peyda

û dijminê xwe bicih qir divêt ji bona qevandin û kelandina wî bixebitin .

Me goti bû qo ta ji pêşyan, pêşi ji pingavan çar dibin , lê ne ji avê, ji xwarinê an ji fêqî û terabîyan .

Belê dijmin pingav e . Ji lewre qo pingav û ava men hêlina heqên pêşyan in . Icar divêt em bala xwe bidin di dora xwe de tu pingav û çiravan mehîlin . Ji bona wê ji divêt , avên seqinî bêne heriqandin, çiravan bêne zuwa qirin, di dorê de herçi zil , stîrîh û giya hene bêne jêqirin û digel rayên xwe xeritandin .

Qo av heriqin , çirav zuwa bûn êdin pêşî niqarin heqên xwe li dorên me herdin, ji me dîrdiqevin em ji ji tayê xelas dibin .

Ji bona zuwa qirina çiravan awaqî kenc heyê , Ew ji darûna darên Evqalîptos e . Ev darên ha ji niq biqûmetê peyda dibin, Divêt jê bêt daxwaz qirin, Herçi avên qîçîq , mirov diqare li ser wan gazê birêşîne .

Nexwestiya tayê ji her wextî bêtir di çaxa fêqî û hêuderê de bose , Ji lewre , xesma di wê çaxê de divêt mirov ji xwe re mikate bibe ,

Xebeta bîngehî herweqî me got heriqandina avan û zuwandina çiravan e , Lê ji hêlaqî din bi standina dermanên tabîr mirov diqare xwe jê biparêze , Dermanê tabîr sîfato ye , Berî ewilî sîfato dermaneqî erzan e . Di pişt re biqûmet herwe belav diqe . Sîfato erzan me be ji herhal jiyîna we jê behatir e .

Vêca , ji bona parastinê di çaxa tayê de yanî ji havîna pêsîn heta paiza pasîn divêt mirov di heftiyê de du caran , serê her sê rûjan grameqî sîfato bixwe . Mirovên sîfatoxwarî ji pêşyan bêne pêvedan ji bi tayê naqevin .

Heçî bi gotîyên min ve çûn tuar nexweş naqevin . Lê heçî qo pê ve neçûn û nexweş çetin divêt xwe nîşanê diqtoveqî biqin .

Heqê diqtor ne çet dest divêt xwe bi xwe derman biqin .

Awayê dermanqirîne ji ev e :

## XANÎ

Ew nûr e, herê li erdê şîhrê  
Şîhra me ye , şîhra bendewarî

Seydayê me ye, melayê yeqta .  
Ava qiriye li şor, kesran,

Parîsê guli bi şorê qurdi,  
Ava te diqir melayê xanî .

Bê zêr û qevir, ji pêta arî .  
Ava te diqir serayê şîhrê .

Gewher ew e, ew û can e bistam,  
Destpêqire ew, û da ew encam .

Rubnahî te da, li erdê qurdan,  
Rubnahiya te, delala yezdan .

Hêvin tu î, tu çavê sayda,  
Ferzane î tu û lawê mewla .

B' sazê, te diqir, te da wê çûşîş,  
Ey hişveqiro l te du wê xwabîş .

Şestare te ye, qo da me zanîn,  
Firdews li qû ye , bihar û hevîn .

Gul, bilbil û ney mekam û jîle,  
Tev de diqirin fixan û nale .

Zêrger tu î tu ne pilewer tu,  
Seyda yî herê, û ser hiner tu .

Meywa te xweş e û avdar e,  
Weq Xanî qî ye? tu qes niqare .

Berçs tu î tu, tu reberê me,  
Textê te di dil û ser serê me .

Tirba te ne ax e, canê Xanî .  
Tirba te dile û cawidanî .

Rehmet bi te ye û pesna yezdan,  
Heyrana te ne, xulam û xakan ,

*Dr. Zamîran Alî Bedîr-Xan*

Mirovên gihastî ji hebên sîfato — her hebê wî çariq gram — her rûj çar heb, zaro heta delî salî sê heb , şeş saetan herî halê nexwestiyê, serê saetê hebeq distînin zarowên yeqşolî linê niv heb distînin .

Bi vi awayî fehtiqê xwe derman diqin Piştî heftiqê du heftiyên din dermanê xwe sê rûjan distînin û sê rûjan berdîdîn .

Eve, ta, tawî û tabin . Heqe hon ji ya min diqin nexweş naqevin, qo biqevîn it zû bi zû kenc dibin .

*Dr. Ehmed Nafiz*

## Elfabêya Qurdi

Dûmalîq : 2

Herweqî di geleq tîstan de têt dîtîn dibe qo di cara pêşîn de di elfabêya me de jî qêm û zede hin qêmanî de biqevîn ber çavan.

Ev qêmanîyên ha di eslên xwe de jî qêmanîyê bêfir paşîya hin qoleqîyan in qo mirov ji wan niqare xwe bide alî.

Ji lewre piştî dan zanîna elfabê divêt awayê hevedandanîna wê û qitqitên bîngêhên wê bîn raveqirin. Da qo xwendevanên me kenc tîbigelîn qo ew qêmanîyên ha herweqî me got ne qêmanî, lê di azîna elfabê de tîstînen adetî ne.

Ev benda ha jî hona berhevdana wê hatiye nivîsandin.

Lê, berî destpêqirîna berhevdanê divêt herçî esas û bîngêh hene qo jî me re bûne hîm û elfabê li ser wan hatiye danîn bêne xuya qirin.

Me ev bîngêhên ha di dora şes destûran de gihandine hev.

I — Ji wan nîktan pêve qo xasê dengantîya zmanê qurdi ne, di şîql û dengên herfan de, herçend heye, xwe Ji elfabêya tîrqa nîzing xistîn û jê nedûrçetin.

Armanca elfabê seqinandinîna dengên li ser qaxezê bi şîqlan e, şîql bi herfan tîn nîşan qirin, û herî kebalawî û bîhemd in. Ji lewre nîşanqirîna dengê (Ç) bi (c) û yê (Ç) bi (ç) û bi hevguhartin û cihguhastîna wan weqhev û bêferk e.

Lê bi vî awayî qurdên welatê jorî û heçî qo elfabêya tîrqi dinasin de biqarin bê dîswarî ya qurdi hîn bibîn û qomel û qitqitêbên me bîhêsantî bixwînin.

II — Herçend dibe, ewcend dengên herfên latînî en adetî qo di zmanên din de nas in, di elfabêya qurdi de hîlanîn û neguhartin.

Bi vî awayî qurdê de biqarin elfabêya biyanîyan û biyautî ya me bi hêsantî fêr bibînin.

## Du Egîd

Du egîd çû hûnşerê welêt û dil çetî bûn. Gava ew birin nav qoma dijminan, serên xwe dan ber xwe.

Şeh dijirîna qo Qurdîstan wînda bûye, esqerê qurdan şîqesline, revîne û sereqên wan hatîne girtin.

\*\*\*

Her du egîd li ser van xeberên tehl digirîyan û yeç jî wan digot:

— Çikas ez teşîbîm, birîna min çikas dişewite.

Ë dîn digot:

— Stran venîrî, govend seqîniye. Min jî divê ez bi te re bîmirim, lê di pîsta min de jî û zaroên min hene, bê min de perîşan bibînin.

\*\*\*

— Pîreq jî bo min çî ye? Zaro jî bo min çî ye? Pêteçê bilîntîrî di dilê min de rabûye. Pîreq û zaro heçê birçî ne, berde bila herîn bigîrin, welatê min, welatê min wînda bûye.

— Bra hevîyeçî ya min jî te heye, heçê ez niho mirim, laşê min bi xwe re bibe, û min li erdê Qurdîstanê veşire.

\*\*\*

Qolesê min dane ser sînga min, tîfînga min bide destê min û xencera min bêxe her pîsta min. Ez dixwazim wîsa raqevim û bîbihîzim, weçî nohetdareçî di gorîndê, hela qo dengê topan û şehîna hespanbên.

\*\*\*

Dema reprepa lespên egîdên qurdan di ser tîrba min re bîborîn û dengê tîfîng û topan bîn, ez bi çeqên xwe ve jî tîrba xwe, xwe hilavejim, jî bo standîna welêtê xwell jî bo standîna welêtê xwell.

*Dr. Qamîran Alî Bêvîr-Xan*

III — Nîşanqirîna her dengî bi herî-  
eqe serxwe û jî awayê herfên heyêdu -  
dant xwe dîr xistin.

Bê şiq e qo hînbûn, xwendin, nivisandin û heqdana herfen serxwe ji yê hevedudani hêsantir e.

IV — Her dengî bi herfeqê cihê nîşan qirin, yanî ji awayê nîşanqirina çend dangan bi herfeqê an dengeqî bi çend herfan, xwe dan alî.

Ev awajî fiqra çêqirina elfabêqê bi hindiq herfan an ji kesda kene li serseqinandinina denganiyê diqare bîzê.

Lê pê her du ji naçevî dest û di zmanî de bi li sebêh pîrsî ten di şiqî de çiyêq peyda dibî û di nivisandinê de tevliheviq mezî berpê dibê.

Ji xwe di tu zmanî de danganî û nivisandinî ne lîvên yeq in, û nivisandinî niqare bi tevayî li denganiyê wî zmanî bî. Lewre qo çitqî û rengên denganiyê bi elfabêyê nayîn nîşan qirin û li ser qaxezê seqî mandin. Welê bûwa diviya bû ellabêya her zmanî ji (50-60) herfan heve dudani bibê.

V — Her çend heye, ji barqirina herfan bi nîşanên nû, xwe dan alî.

Nîşan ji heleqê di nivisandinê de bi vegera kelemê wextî dide wînda qirin. Ji hêla din bi jûbirqirina nîşanê herf vedigerin ser şiqlên xwe ên eslî, bînîşan, û tevlihev dibin.

Pejirandina çend nîşanan bi hev re ev ji dişwariqê din e.

Ji lewre ji bona tevayîya herfen bînîşan me ev ( ^ ) pejirand, û bilindeq nav lê qir. Ji her qo dengên herfan hem diguhêrtine hem bilîndiqe, û ji nîşanên weq ( . , - ' ) kene t-t vekelandin.

Ji xwe bos hûna nîşanan nivisandinê qirêl diqê.

VI — Herfen welê bîjartin qo di şiqên xwe de li hev bîn û biqevî hev.

Ji lewre diviya bû qo em di nav herfen latîni de bîminin û ji elfabêyên din weq yûnani û rûsî herfan megirin.

Me ji welê qir û elfabêya xwe bi hindiq guhartina dengên herfen latîni û

bi barqirina hînan bi bilindeqê çêqir,

Bi vi awayî û gora destûrên jorin me elfabêyê xwe li sih û yeq herfan hevedu daniyê. Herweqî di despêqê de me da zanî.

Selîtiya qo di her sê zarên qurdi de hatine çêqirin xuya qirine qo di zmanê qurdi de dengên bîngehî ev sih û yeq deng in. Ew ji bi van sih û yeq herfan hatine nîşan qirin.

Belê, herfin hene qo geh zrav, geh stûr, geh ji pêsî, geh ji paşiyê tîn xwendin. Lê ev ferkên ha ne ji guhêrîna cihderqa dangan, lê belê ji guhêrîna rengê dengî tenê pê, û ji lewre di elfabêyê de nayîn nîşan qirin. Ji her qo elfabêtinê dangan nîşan diqê, ne rengê dangan.

\*\*\*

Ezê bi dengdaran dest pê biqim. Ji sih û yeq dengdaran qurdi, dengên hevdehên jêrin, di elfabêya her zmanî de, bi ferkên çiqîq, yeq in.

b d g h q l m n p r s t  
f v w y z

Tinê di elfabêya tirqî de (q) û (w) ninin, Ji her qo di zmanê tirqî de dengîne cihê weq (v) û (w); (q) û (k) nayîn ditin.

Dengê herfa (w) ji xwe di tirqiyê de peyda nabî.

(dûmahiq heye)

## Ferhengiq

**AZIN** awayê tevayîya zanîneqê an tîştêqî. Azîna elfabê, yanî tevayîya keyde û destûrên ilma elfabê. Berdêlqa wê di zmanê Elmanî de «lehre» ye.

**Berhevîdan** Ser tîştêqî, ji bona diltijiqirina hevdu şexalî û selîti qirin. Bi saetan ve me da ber hev

lê disan me dilê yeq tiji ne qir.

**Berpê-bûn** Hatin pê . Ji serxwebûna welateqî re xebateqê mezin divêt. serxwe bûn bê xebat û fedaqariyê berpê nabe. nayepê.

**Binyan** Ji her texlît avahiyê re binyan têt gotin. Xani, burc, kesr, olî, mizgeft h. p.

**Bihemd** Heçî qo ne bêhemd e .

**Bos** Zehf, geleq. Li ser welêt baraneqê boş hat.

**Bijîsq** Ewê qo bijîşqî diqê. Bi xweşqîrîna jiyîna mirovan mijûl dibê û wan derman diqê.

**Dibistan** Ew dera qo tê de hin diqin. Di dibistana gundê me de deh zaro hene.

**Dişwar** Ne hêsani, zehmet. Dişwar e geleq belayê xurbet. Binve, qezeba min binve lo lol  
*Emin Ali Bedir-Xan*

**Dî** Ne aza, girtî, hestr. Dilê dilana te me Işev mêvanê te me Sibe ser rêqa xwe me.

**Doz** Delhwa û daxwaz, paşîya daxwazê Xwelî li ser te diqim , Dest bi deng û ceng diqim. Doza Şeng û Peng diqim, Delhwa şertet diqim.

**Geşî** Îtalê geşbûnê. geş, ew tîst e qo bi ruhnahtî ye, bel û veqirî ye. Bihnîniya dewleta te geş bit, Kasti tu hebt dilê te xweş bit.  
*Emin Ali Bedir-Xan*

**Gewherîn** Ji gewherî çêqirî, weq gewher.

**Havîna-pêşîn** meha salê a çaran. Ji xwe qurdmanc mehan bi du avan bi nav diqin. Bi navên ser xwe û bi navên çaxên salê.

|                  |                  |
|------------------|------------------|
| 1 — Adar         | Buhara—pêşîn     |
| 2 — Nisan        | Buhara—navîn     |
| 3 — Gulan        | Buhara—paşîn     |
| 4 — Îlîzêran     | Havîna—pêşîn     |
| 5 — Tirmelî      | Havîna—navîn     |
| 6 — Tebax        | Havîna—paşîn     |
| 7 — îlon         | Patza—pêşîn      |
| 8 — Çirîya-berî  | Patza—navîn      |
| 9 — Çirîya-paşî  | Patza—paşîn      |
| 10 — Çileyê-berî | Zivîstana —pêşîn |
| Çanûna-berî      |                  |
| 11 — Çileyê-paşî | Zivîstana—navîn  |
| Çanûna-paşî      |                  |
| 12 — Şibat       | Zivîstana —paşîn |
| Geceq            |                  |

**Hêsani** Ne dişwar. Ji bona her qesî zmanê wî hêsani ye, ne dişware.

**Kebalevî** Bi Kebale, û gora dilxewaz an lihevhatinê çêqirî , ne qoteqî .

**Qoteqî** Tîsteqî bêhemd, bi zorê, bivê nevê . Ez ne diçum , qoteqî ez birim .

**Qûvan** Ês, qul, qeser. Sed ah û qûvan û qeser, Helt eyn û lam çûn jî hicretê.  
*Fekhe Ceyran*

**Nîminende** Evê qo heyîneq an heyîna tîsteqî dinîminê, raber diqê.

**Pejîrandin** Ji tîsteqî re qo têt dayîn an gotin herê qirîn û pê ve çûn, kebûl qirîn .

**Raveqîrîn** Ji bîni jî rayî veqîrîn û dan zanîn.

**Rehaqar** Ewê qo rehayê, xweşiyê dide

**TOI** Evd, evdîn, heyf.

**Têgehîstîn** Kenc fêhm qirîn û berqetîn. Herçend tu bibêjî jî ew tînagehit .

# L'ALPHABET KURDE

suite 2

Ce procédé qui peut naître du souci d'établir avec le moins de lettres un alphabet ou de vouloir fixer plus précisément la phonétique, ne peut servir qu'à la création des homonymes homographes et à engendrer d'innombrables complexités dans la dictée.

Presque dans toutes les langues, même dans celles qui sont munies du plus phonétique alphabet, l'orthographe ne correspond que plus ou moins imparfaitement à la prononciation, parce que les alphabets n'arrivent jamais à fixer ponctuellement la phonétique d'une langue.

5.— Eviter autant que possible de charger les lettres de nouveaux et de différents signes.

Les signes causent d'une part une perte de temps pendant l'écriture, ils ont d'autre part, l'inconvénient d'être oubliés ou négligés et par conséquent de rendre le son de la lettre à son origine vocale.

L'adoption des différents signes peut engendrer une extrême perplexité. C'est pourquoi nous avons préféré adopter seulement l'accent circonflexe [ˆ] qui diffère nettement d'un [.] qu'on allonge parfois par négligence ou d'une apostrophe (') et ainsi de suite. D'ailleurs l'abondance des signes rend l'écriture laide.

6.— Choisir des lettres homogènes dans leurs formes extérieures.

Quoique l'emprunt des lettres aux différents alphabets apparait au premier abord comme plus avantageux.

\*\*\*

En prenant pour base ces principes et en profitant de toutes les possibilités que nous offre l'art de transcrire l'alphabet, nous avons arrêté à (31) lettres l'alphabet Kurde.

Les recherches faites dans les trois dialectes principaux de la langue Kurde ont démontré que les sons ou lettres Kurdes ne sont autre chose que ces (31) lettres.

Il est possible de prétendre que certaines

de ces lettres sont tantôt dures et tantôt fines, tantôt antérieures et tantôt postérieures, Mais comme nous le démontrerons plus tard, ces petites différences dans une même lettres ne sont que des nuances de couleur du même son produites au cours de la durée de ce son et qui ne peuvent même pas être fixées par un alphabet phonétique comme le nôtre.

\*\*\*

Commençons par les consonnes:

Des (23) consonnes Kurdes les suivantes se trouvent presque dans toutes les langues, avec les mêmes sons à quelques nuances près, ainsi que dans le turc à l'exception du « w » et du « q ».

b d f g h q l m n p r  
s t v w y z.

w. — Il donne le son du w anglais et correspond au son consonnique du ʔ arabe qui n'existe pas dans la langue turque. Ainsi que les turcs n'ont pas distingué le q du k.

Le ʔ arabe qu'on trouve fréquemment dans la langue turque, dans des mots empruntés à l'arabe, est prononcé par les turcs comme un v français. Tandis que dans la langue Kurde, comme en anglais, les sons v et w sont distincts. Et dans différents mots d'origine Kurde par le fait du changement de ces deux sons on constate de grandes différences dans le sens de ces mots :

dev : bouche dew : lait caillé battu  
avec de l'eau

vir : ici wir : là

ev : ce ci ew : ce là

ava : prospère awa : manière, style

Maintenant examinons les opinions qui peuvent être émises au sujet de l'adoption de ces deux lettres.

On peut dire que du point de vue pratique comme la proportion du w dans la langue Kurde est  $\frac{557}{33798}$  et celle du v  $\frac{329}{33798}$

on pouvait prendre le w pour ˆ et le v pour ʔ c'est à dire vice versa, puisque ce dernier est plus simple dans l'écriture.

Par ce procédé nous aurions éloigné ces deux lettres de leurs sons internationaux.

« à suivre »

Notices sur la littérature  
moeurs et coutumes Kurdes

### La Langue Kurde

- SUITE -

2

« Sall semirand vexwar durdî

Mænendi-derî lisani - qurdî » 1

« On a laissé le pur et on a bu le dépôt, cette langue Kurde est comme celle de derî »

Après ce très court aperçu historique nous passons à l'examen de l'état actuel de la langue Kurde. La langue Kurde se divise en trois dialectes principaux:

1 — Le dialecte du Nord

2 — Le dialecte du Sud

3 — Le dialecte du Nord-Ouest.

I - Le dialecte du nord est parlé par tous les Kurdes du Kurdistan occupé par les turcs, par les Kurdes de la Caucase jusqu'à kere-Bax , par ceux de la république d'Erivan, par les Kurdes de la Syrie, par une partie des Kurdes de l'Irak habitant le Mont Sindjar et la contrée située au nord d'une ligne partant du sud du Sindjar par Mosil, et atteignant à l'est la ville de Rewandiz, ensuite par les Kurdes de la Perse habitant le nord et l'ouest du lac de Urmî, par les Kurdes du Khorasan, au nord-est de la Perse, appelés Qurdên Xweresanê, les kurdes de Khorasan.

II - Le dialecte du sud est parlé par les Kurdes de l'Irak et de la Perse à partir du sud de la ligne Mosil - Rewandiz et du lac de Urmî vers le sud et sud-est, jusqu'aux limites méridionales des Kurdes Bextiyari

III - Le dialecte Nord-ouest est le dialecte des Kurdes Dumilî. Du Dumilî on ne peut pas tracer une limite fixe quelconque, par ce que trop mélangé avec les Kurdes Qurdmanç parlant le dialecte du Nord le Qurdmançî.

« 1. La langue Mède s'appelle aussi lisani-derî c'est à dire la langue de la porte, langue du palais. Par ce que pendant l'égémonie Mède dans toute la Perse la langue officielle était celle des Mèdes.

Tout de même les points de condensation de ce dialecte sont : ( Dêrsim, Palo, Genc, Çepeqên, Maden, Piran, Egil, Siwreq, Pêçar, Çermiq. )

De ces trois dialectes le dialecte du sud est celui qui se subdivise en sous-dialectes avec des différences assez nuancées, ainsi que :

1 - Le Kurdes de Muqri qui se parle du sud du lac de Urmî jusqu'au sud de Sekiz 1

2 - Baba - Qurdî le Kurde parlé par les Kurdes de l'Irak non compris ceux qui causent le Qurdmançî dialecte du Nord.

3 - Le Kurde dit simplement Qurdî, du sud de Sekiz jusqu'au sud du Qurdmançî sah.

4 - Le Lori parlé par les tribus Lor

5 - Le Bextiyari, celui des tribus Bextiyar

Au sud nous avons aussi le Hevremani idiome propre aux Kurdes habitant la montagne de Hevreman.

Les Hevremani parlent aussi le Qurdî comme les Dumilî connaissent le Qurdmançî.

Le Dumilî a aussi par région quelques nuances, mais pas autant marquées pour se subdiviser en sous-dialecte.

Le dialecte du nord forme une unité linguistique très nette et n'accepte aucune subdivision en sous-dialecte.

En ce qui concerne la répartition des dialectes nous devons noter ceci que cette répartition ne peut jamais être considérée comme des limites délimitives pour les mots et les expressions de chaque dialecte

Les mots des divers dialectes ne diffèrent pas beaucoup l'un de l'autre. Puis, fait caractéristique qui peut être un point de départ pour une étude de l'histoire de la répartition des

1 Ce sous dialecte est commun entre le dialecte du Nord et du Sud, de même qu'il s'appelle Qurdmançiya - Muqri, comme le Kurde parlé à l'ouest de cette contrée, en Irak, s'appelle Qurdmançiya - Soran et qui se prolonge au delà de Rewandiz au nord du Hevlêr Arabella.



dialectes—un mot du dialecte du sud qui ne se trouve pas dans les contrées méridionales du dialecte du nord se recontradans une contrée septentrionale de ce dernier, ou dans le dialecte du Nord Ouest et vice versa.

Comme par exemple dans un poème Kurde dernièrement découvert à « Silêmani » et datant de 19 années après le Hejir contient le mot « qenîq » qui ne subsiste de nos jours que dans le dialecte du Nord-Ouest, Dumili.

#### Dénomination des dialectes:

Le dialecte du nord s'appelle Qurdmançî et les Kurdes qui causent ce dialecte sont appelée Qurdmanç.

Les Qurdmanç considèrent ce mot comme l'équivalent du mot Qurd et généralement ils appellent les Kurdes Qurdmanç et non pas Qurd. Mais chez les autres Kurdes cette dénomination est quelquefois différente et attribuée à d'autres kurdes que ceux du nord. C'est ainsi que les kurdes des alentours de Sekiz, Sinandiz et Sewicblax désignent avec ce mot les kurdes Baban et leur langue; comme Qurdmanç et Qurdmançî [1] Ces mêmes kurdes nomment les kurdes du nord, les Qurdmanç lolo-qurd et leur idiome lolo-qurdi. Cette dénomination provient du vocatif lo, la chez les Dumili; très employé chez les Qurdmanç.

- A suivre -

1 A ce propos je veux noter un fait qui m'a été rapporté par des hommes d'un grand âge et qui est aujourd'hui peu connu parmi les kurdes appelés Baban. La maison des Emirs de Silêmani s'appelle (Pêpe-Bebe-Beban-Baban) et les kurdes de leur principauté s'appelaient comme ceux de la contrée limitrophe Qurdmanç.

La population ayant été, en raison du régime féodale, attribuée à la famille régnante, on a désigné ces kurdes par l'expression les kurdes des Baban. Peu à peu l'usage de cette expression s'est généralisé et elle a prévalu sur celle de Qurdmanç.

Xweyî û midirê herpirsiyar :  
Mir Celadet Ali Bedir-Xan

## بر ديلك

زقديري جاني جانبرارا

ژبين خوشه ب خرتي  
ل کردستان ب کردان ،  
باؤف و بران ؛ چه بکه ؟  
حمو من تي بدردان .

من دل ت جار نه ناني  
من زارت جار نه کالی  
ب دهلشکي ب لالی  
سینگاخوه دا بر رمان .

من ایشف دبت خوناراست  
دنک و گازی چه خوش هات  
دگوت رابن کردنو !!  
تف بران و تف خوه هان .

دربان ل مه ت زانی  
رم نینه گش ت زانی  
خوپان کرن کردانی  
أف ترال و تزانان .

هاواری ، خوهش آوا کر  
دلی کردان پی شا کر  
زارو زمان آفا کر  
ژین و خوهشي بلا کر .

کابینا عربان ۱۸ - ۵ - ۱۹۳۲

عثمان صبري

صاحب الامتياز والمدير المسئول

الامير مهدي علي بدرخان

فیجا ، ژبو نا پاراستنی ، د چاخا تایی ده ، یایی ژها فینا  
پیشین حتا پاپیزا پاشین د فیت مروف د هفتیی ده  
دو جاران ، سری هرسی روژان گرامکی سلفا تو  
بخوه . مروفین سلفا تو خواری ژ پبشیمان بیته  
پیفدان ژ بی تایی نا کفن .

حچی ب گوتین من فه چون ت جار نخوش  
نا کفن . لی حچی کوبی فه نه چون و نخوش  
کتن د فیت خوه نیشانی د کتور کی بکن .  
هکه د کتور نه کت دست د فیت خوه بخوه  
درمان بکن .

آوایی درمان کربنی ژ ی آفه .

مروفین گهاشتی ژ سلفا تو - هر حبی وی چارک  
گرام - هر روژ چار حب ، زارو حتا ده سالی سی  
حب ، شش ساعتان بری حالی نخوه شی بی د سری  
ساعتی حبک دستین . زارو وین بکسانی د فیت تی  
نیف حب بستین .

ب فی آوایی هفتیکی خوه درمان دکن پستی  
هفتیکی دو سی هفتین دن درمانی خوه سی روژان  
بر د دن وسی روژان دستین .

آفه ، تا ، تاوی و تا بر . هکه هون ژ یا من  
دکن نخوش نا کفن ، کو بکفن ژ ی زو بزو  
قنچ دین . د کتور احمد نافذ

### گندی نو آفا

آوین هر کی . . باغ و بغه . . . دناف فان  
بغه یانده هر تخلیط دارین ب بر ، لسر فان داران

ژ هر جسنی چفیک پدچن و ب هر زمانی د  
خوینن ! ژ فان چفیکان آ کو کربامن دشویننه  
و هندر لمن دبریتنه ؛ شالوله . بژن و خوه ندناوی  
ره بیبا چایمن و قینانا دلی منه .

گندی مه دناف فان رزان ژ پانزده مالان  
هقد دانیه ؛ وارگتی مه ، مزلا جفاتا گندی  
مه به . پاششیقان لسر وارگه ، نافر و ژان دناف  
میر گارزی مه ده ام ، دچن . پرس و گالگالین  
مه تقا پف خوه شین . . .

کلا ولات ، چا هولی گران و ژبیر نابه ؟ حتا  
نهومه دگوت : ام بی درو یوغانین ، ژ لورا  
هر گاف برینین مه د آخقین و ژ حسرتا آردی  
باف و کالان ام دین دین فیجا مه جه دفی ؟ گند  
گندی مه ، بغه و باغین مه . تکوزه ؛ هر نشت ،  
هر نشی مه !

ماقی وسانه ؟ چار کی ورن ، هندری من  
فروژن دلی من ژ ی درینن وب کیر که نوژ چینی  
چینی بکن ، وی گائی آف چینین دلی من اوی بیته  
پبیقین و پیرا بیته گرین . لی دزانم هون خوه نا  
گرن حبستیری چاؤین وه ، اوی چمی آمسیدی  
دریاس بکه . شوندا هونی بزنان کو از ، نه تنی  
دلکتیی خوه شکیییا شالولی مه . از دلکتیی  
دنگی و به ژ ی کو ژیننا مه یا در ل در دناف نکاین  
خوه دا نو تود که وب فی داویکلای داوی تینه .  
- خوینن ل گندی نو آفا ! گندی وه ؛

مز کین و هاوارا بازاری وه !!

مه گوټبو کو تاژ پېشبيان ، پېشى ژ پنگافان چار دېن ، لی نه ژ آټی ، ژ خواری آن ژ فیکي و تراهیان .

بلی دژمن پنگافه . ژ لوره کو پنگاف و آفامن هیلنا هیکن پېشبيان . ایچار دښت أم بالا خوه بدن د دورا خوه ده تو پنگاف و چرافان مهیلن . ژ بونا وی ژی دښت ، آفین سکني بینه هر کاندن ، چرافان بینه زوا کرن ، د دوری ده هرچی زل ستره و گيا هته بینه ژ بکرن و دگل رایین خوه خرتاندن .

کوآف هرکین ، چراف زوا یون ټیدن پېشی نکارن هیکن خوه لدورین مه بردن ، ژ مه دور د کفن أم ژی ژ تایی خلاص دین .

ژ بونا زوا کرنا چرافان آواکی قنچ هیه . اوژی دانینا دارین [ آفکالپتوس ] ه اف دارین هاژی نک حکومتی پیدا دین . دښت ژی ببت داخواز کرن . هرچی آفین کچک ، مروف دکاره اسروان گازی بریشینه .

نخوه شبیا تایی ژهر وختی بیتر د چاخا فیکي و بیندری ده بوشه . ژ لوره ، خسار د وی چاخی ده دښت مروف ژخوه ره مقاته به .

خبانا بنگهی هروکی مه گوت هر کاندنا آفان و زواندنا چرافانه . لی ژ هیلکه دن ب ستاندنا درمانین تابرمروف دکاره خوه ژی پیاریزه . درمانی تابرسلفاتویه . بری اولی سلفاتودر مانکی ارزانه . ارزان مبه ژی هر حال ژینا وه ژی بهاتره .

د فی شکلي ده نخوش زو بزو نامره لی ژدر با خوه دکفه ، ب کیری نو تشتی ، تو کسی نایه ، نه مال ، نه زار و زیچ ، نه ولاتی وی ژی ت فیده ناینن . پر یچار ژ آفینی ژی دکفه ، زاروین وی ناین ، کو بین ژی نخوش و کیم صحت درتین . ب تشتکی کچک دمرن . ژ بونا وی ژ بین مهنه نامینه . حتا کو ازار ټیل بی هاوارا وی د نافع ټیش و تخلی بی ده دپر پته ، فد گفزه . . . .

أفی هاشکلکه . شکلي دن ژی هیه . ژیره ( تایا - خبث ) دیژن .

د تایا خبث ده شکلن گران هته کو د نافع سی چار ساعتان ده د کژن . أف شکل پر یچار د زارووان ده ټیت دیتن .

أفه تا . هون دینن کو نخوه شیکه گران و خداره . ژ تیفو ، کو ابرا و ژ و بایی خرابتره . نخوشیکه ولی په کو رایی هیینامه ، رایی هییناملتی د کوژه .

ب گوټنن ژورین قنچ خو یا کر کوآف نخوه شبیا خداز ژ پېشبيان ، پېشی ژ پنگاف و چرافان ټینه پی ، لی توجار نه ژ آفا زلال کو خوددی پستانوی د قرآنی ده داو د حقی وی ده ( وجعلنا من الماء کل شیء حی ) مه هر تشت ب آفی ژ باندنه ، گوټیه .

فیجا کومه کاندیا نخوه شبی پیدا و دژمنی خوه ب جهکر دښت ژ بونا کفاندن و قلاندا وی بختن .

ستونا فقهان :

تا ، تاوي و تاير

يکي ژ قهين دشتا هسنان ژمه نخوه شيبانايي پرسیار  
دکه . مه پرسبیار پیاوی دا بژیسکی خوه و ژی  
جها به کی داخواز کیر .  
آفه ، رشبله کافقه و جها با بژیسکی .

أز بی ! دشتا هسنان ۲۳ گلان ۱۹۳۲  
من ستونا خوه - ستونا فقهان - خوه ند . گلک  
تشت هته کودتیت أم ژته پیرسن . هفال ناف  
هف ده شورین ومه کوت بلا پرسبیار یامه آپشین  
نخوه شیبانایي بیه ، دا کو أمژی خلاص بین ، عقلی  
خوه بدن سر هف و بکارتن تشتن دن ژی پیرسن .  
ژلوره کو ژ تانی عقلی مه نه سر هفه أم ژی گلک  
عاجزن . پاشی از دستین ته مساج دکم وهیقیداری  
جها با ته مه .  
حسی کو چر

جها با بژیسکی مه :

« خایکی دشتا هسنان ژ هسنی چیکری بو انا دنیا  
بو حتانوه د فیتونا تایی ده بهاتانا حلانندن . هر وکی  
دحلن ژی .

ژخوه بری ولاتی مه ئی گرمیان ودشت ژئی  
آفتی خراب دبه .

کافا ژ خلکی تیت پرسین خلکی نزان  
دیژن کو نخوه شی ژا فا گوندی یه نک دلی وان  
آفوان نه پاکژه ، ب ژهره ، هر چي قدخون پی  
د کفن .

لی نه ولی یه . او آفازلال وشیرین کو دیر گندی  
ومره د بوره و گندی وه پی شین و آفاد به ، د اصلی  
خوده پاکژه ، آفیزه به ، کانیا ژ پیناوه به . ژهر  
ونخوه شی د نزانی و ترالی ده یه .

نهو دفت ژودره بدم زانین او آفین پاک کو کانیا  
ژینی به ، چاوان نپاک و ژهر و آغو دین .  
هر و کی ناسه ، کافا آف سر بردایی دهر کن ،

ل دشتان بلاف دین د چال ، کورتال و دهر جین  
نژمده د پنگرن . ژوان پنگافان بر پی دین . پنگاف  
ب زمانی فه دین چراف . د دوراوان ده گیا ، ستري  
وزل شین دین . دناف وان ده پیشی [ کلیمیش ] جه  
دگرن ، هیلین خوه چید کن . ژي دفرن ، تین  
لسر دست ، روولاشین مه داینن ، ب مه فددن .  
مروفین پیفه دایی دناف [ ۶ - ۲۱ ] روزان ده پی  
د کفن و دین تاوی .

دستپکا نخوه شی ده لاش ولبتین مروف دشکین ،  
در جفن ، پشتره گرم دین . حالی نخوه شی ژی  
چار ساعتان حتاسی چار روزان دوم دکه و ب نخو  
بهدانکی در یاس دبه .

پینشده تر آف حالی ها آن هر روز آن دستري  
دوسی روزان ده جارکی فدگره تی . هکه نخوه  
شی درمان ناکن پیدد دچه و دبه [ تابا - فشارتی ] .

د تابا - فشارتی ده رنگی نخوه شان زر دین  
خو بناوان دچکن ، زکی وان د پرچفن ، د کفن حالکی  
عجیب ، دین بولک مشکه کی فاللا سر دودار کان آن  
سرفه یسکه کی داچکاندی .

دستين تر کول نه کتن ،  
 بـ خوښانه سور بون رېن .  
 مېر وملا دارفه کرن ؛  
 خورت وُخرتان ژنه برن .  
 از کو کردم ژ پيرنا کم .  
 بـ خوښا خوه دښی را کم .  
 از بخوښم ، خوندا بېم ؛  
 مزن بېم ، زانا بېم ؛  
 مېر کژ بېم ، بناف و دنگ ؛  
 از هلگرم توپ و ننگ ؛  
 تولاته ژى ، اُفدا نه ژى ؛  
 دى هليم دوزا نه ژى .

شام : ۷ تيره ۱۹۳۱

## لهږى

تفاق و يکبون ، زخى وُخرتيا جفاني به .  
 تفاق و بربرى قلسى و ژار پياوى به .  
 د ښى جهاني ده هر تاشت ، هر مزناښى بـ  
 تفاق و يکبوني ، بـ دا پنا هف بر بارين هف ،  
 بـ هفگهانا مروف و بـ هفگهاندنا خباتين وان  
 هانته پى .  
 ملت و دولتان بـ تفاق گهانه بلنديا هر تاشتي  
 و بـ تفاق کتنه بنيا کورتالا نښي .  
 ژلوره مروف د کاره بليزه هېين د تفاق ده ،  
 نېين د تفاق ده به .

خړتى و زخميا يکبوني د لېبى ده گلک فنج  
 نيت ديتن .  
 ما لې چه به ؟  
 لې ژ هفگهانا دلوپين باراني پيه نه تـ  
 پشکين باراني گاځا ژ هف جدا و يک بـ  
 يک د کفن رووى اردى ، ارد وان دادقرينه .  
 تهنيا خوه پى فد کژينه . لى کاځا دگن هف ،  
 هنگى ژوان پشکين قلس لېکه بوش رادبه .  
 دلوپ و پشکين باراني د يکبوني د تفاق ده نه .  
 اردى دلو پخو ر ئيدن د دستين وان ده له بستو  
 ککه . اوسر دستين اردى نه . بـ اردى ره  
 دا پين ؛ سينگاوى قل د کن تيدگفن ، بلندپين  
 وى هلاډشينن ، کندالين وى د کلشينن .  
 لې وک خونکى حار و حيج رادبه سرخوه ،  
 ژ پال وکاش و نوالان دادخوره . لـ بروى  
 نوکس ، توتشت ؛ بـ جان بى جان نما د کاره  
 بسکنه . لات . زار ، کفر ، ريل ، دار ، دره  
 سرين خوه لـ بر خړتيا تفاقا دلوپان د توښن و لې ،  
 اوشهنشي يکبوني اوان مينا چلووين سفک  
 دده پيشبيا خوه ، ريش د که ، دماله .  
 حالى کردان ژى آفه .  
 کرد ژ هف جدا دلوپين باراني نه . جهي  
 جهي تين داقرانندن . کو گهانه هف دين  
 لې ، لېکه بوش ، توکس ، توتشت لـ بروان  
 نکاره بسکنه .  
 فلانا ولاقى مه د رابونافي لېرى ده به .

بيروت : ۲۸ تباخ ۱۹۳۰

سونازارووان :

## تولا وليت

ولات! ولات! کافي خوشي؟  
 قوي ابرو تو نخوشي .  
 کافي او کن ، کافي گشي؟  
 چان هولي وک دلشي؟  
 چان وسا تو بيادي؟  
 ب کري خوهره خبرنادي؟  
 کل و کوفان زهر آلي؟  
 لورا ولات ور دنالي .

سر نيڤسکا جفاتي د حسچي ده به . د هر بازار و گندين مزن ټين جزيري ده مالکين وي هانته فکرن وهين ب هين ټدين .  
 سر نيڤسکا جفاتي ژ بوانا د ايتناد بستاني وليکړنا خسته خانکي ژ نهوڤه خوهره کار دکه .  
 حسچي کو آريکاري يا جفاتي بکن آريکاري يا خوهره دکارن راست ب راست ل حسچي ژ سر نيڤسکا جفاتي ره بشين .  
 آريکاري يا جفاتي ب هر تشتي دبه ؛ نه نني ب پره . چاڅا ب بندري نيز بنگه . خدان گند وچونکاري دکارن جه وگنم ژي بدن . هکه شاندا وان ل سر نيڤسکا دشواره ، داي دکارن بدن نمينده بي جفاتي ، اوژي دکينه جفاتي .  
 نمينده بي جفاتي لاشمي دکتور احمد نافذ بکه کو کردين شامي حي ژي رندناس دکن .

اڦ قروشين هاژمره ، ژ ولات بپين مرهري يا خواندن وزاين ويا خوشي بي دي فکن . اڦ بک دو قروشين کو هون ژ جفاتا خوهره بدن ژبونا هر بيکي وه نه بهانه ، لي کو گهانه هف بکيري ملتي مه تين وبي گلک تشت چيدن . بقروشين وه دبستان تين چيکرن ، مالک پي آفادبه ، درماين چند نخوه شان پي تين کرين وهون ب دايينا وان فقير وب ندايينا وان دولندنانين .

خباتامه ، خباتا داني پين جفاتي دست پيکرن ور بيري به . جفاتا بار بگاري ياره ، ب نيکل بوناوه آفا وخوش د به وکاري جفاتي بفي آوايي د چه سري .

بي شکه کو حسچي حژ ملتي خوهره دکن ودرابين وندا خوناکردی آپاک دگره آريکاري يا جفاتي ژ بونا وان دينه ، دبنکي مزن ، بلند ومقدمه .

ژخوهره کس دبنداري ملتي خوهره ، ژ بر کو اوي او بخويي کريه ، ژ بر کوهر کسی ناني ملتي خوهره خواري به وهر کس دزانه کو « ناني ميران لميران بدينه » . ورن ، خوهره بلزبين و ديني خوهره ژ ملتي خوهره بدن .

کو تين دانپين جفاتي ل هره خلاص دين . ژ فان کو تين گوهرين ره گلک تشت نين کو أم بکارن زیده بکن . تني د حق رابين جفاتي وسر آوايي آريکاري بي دفتت أم چند پرسان بيژن .

# هاوار

کومه کردی

## جفاننا آر بکاري بي ژبوننا کردین بلنظار

حوجه داری آر بکاری یا هفن . ژ مه ره اوچند زانین وهنر وهنروری زی دئی . ژ لورا کو ام ژ بی خو پیتی و بربری بی کتته بنی یا کورتالا نرانی و بلنگازی بی . ژبوننا کو ام بکارن بین سرخوه و ژ فی حالی بفلتن دئی ام دستگیرین هف بین ، خوه بدن بر بارین هف و یکدل و یکدنک قرارا خوه بدن . او قرارا کومه حیان ژ نرانی ، ژ بلنگازی ، ژ زیفاری و ژ دیلی بی دی خلاص بکه .

دانین فی جفاتی هیقیدارن کو هون بتفانی ب وانرا بچن ژ یاون بکن ، پشت بدن وان و بختین ، دا کو اف کاری هانی ئی قنچ و رها کار بچه سری . توشک نینه ، هکه هون هولی بمره بختین ملتی مه زو بزو ژ فی حالی خلاص دبه وروژ بروژ بر بقه بر ب قنچی و آفاهی بی فه دچه .

مادام حتا ایروژ ناف مه او دولمدین جامیر درنکته کو بدریکی هزار زیران بدن و ژبوننا ملتی خوه د بستانان و بنیانین خیری چیکن ، دئی ام خوه بخوه بختین و یک دو قروشین خوه وان هزار زیران بدن هف .

فی پاشی بی د ژ بینسا ملتی کرد ده تشتکی مزن ب آسلس و خیر کار هاتیه چیکرن . کردین جزیری ژبوننا خوه شکرنا حالی کردین بلنگاز جفانک بنافی ژورین دانینه .

پیروز ژ وان ره ، پیروز ، هزار پیروز . خوه دی مالا دانیشان آقا و خوش بکه و شولی وان بیه سری .

ب فی جفاتی ژ کیاسین مه بین بی هژمار یک ژناف هاتیه هلانین . دئی کورتاله که کور کو هر روز ژ بینا مه د کوت ، راپین مه دجوت ، بی هاتیه گرتن .

ژ فی جفاتی ره هروکی دانی د پیشکوتسکا نظامناهی ده د بیژن ، ژ هر کسی بیتر ام ملتی کرد ، حوجه دار بون .

پیشکوتسکا نظامناهی سببین دانین و چیکر بنا جفاتی ژ مه ره گلک قنچ دده زانین .

من ژی دل کرخوه ندفانین خوه سر وقت بکم . دا کو او ژی وک من پی دلشا و کیفخوهش بین . آفه پشگوتسکا نظامناهی :

« کردنوا ام ، ملتی کرد ، ژ هر کسی بیتر

زنگنه و مطبعت  
أبي عبد الله الخوانساري المشرف

حرف جميع المعادن والصور الملونة واللوحات الخيرية  
طبع بطانات دار ريسان بحرف نازقة على الطراز الحديث



الطبيب  
أحمد نافذ  
المطبعة الكائن في مدينة دمشق

عرنوس

دمشق

الطبيب  
محمد حسين  
المطبعة الكائن في مدينة دمشق

صالحه

دمشق

### اشتراقات مجموعة هاوار

| وفي غير هذه الأقطار |          | في سورية وتركيا والعراق وبلاد العجم وبلاد الففاس |
|---------------------|----------|--|
| عن سنة واحدة        | ١٥٠ فرنك | ٥٠٠ غروش سوري - ١٠٠ فرنك                         |
| عن ستة شهور         | ٩٠ فرنك  | ٣٠٠ غروش سوري ٦٠ فرنك                            |
| عن اربعة شهور       | ٦٠ فرنك  | ٢٠٠ غروش سوري - ٤٠ فرنك                          |

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد



هژمار ۲



۱ هزيران ۱۹۳۲

# هاوار

بزرگ

کوملا کردی

سال ۱




مارشوب

## تبدله خستين کومهلی

|                          |                  |
|--------------------------|------------------|
| .....                    | چفتا آریکاری نی  |
| دکتور احمد نافذ          | تا ، تاوی و تابر |
| .....                    | لهی              |
| دکتور کامران عالی بدرخان | دؤا کید          |
| .....                    | الفاییا کردی     |
| قدری جان                 | گندی نو آقا      |
| .....                    | فرهنگه ک         |
| .....                    | تولا ولایت       |
| دکتور کامران عالی بدرخان | خان              |
| عثمان صبری               | بردبلات          |

SAL 1



ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 3



15 HİZİRAN 1932

## Qomela Qurdi \* Revue Kurde

### Çêdaxistiyên Qomelê

|                        |                     |
|------------------------|---------------------|
| Hevxistina zmanan      | Dr. Q. A. Bedir-xan |
| Qunciqa bijîşqî        | Dr. E. Nafiz        |
| Pêrûzname              | Hamid Ferec         |
| Silêman Bedir-xan      | Kedrican            |
| Dibistan               | C. A. Bedir-xan     |
| Elfabeya Qurdi         | “ “ “               |
| Pi hanceta pîruznameqê | “ “ “               |
| Ferhengog              | “ “ “               |
| Ma çiman diçî          | Dr. Q. A. Bedir-xan |
| Lavelav                | “ “ “               |
| Seva we xweş           | C. A. Bedir-xan     |

### Birê Frensizî

|                   |                  |
|-------------------|------------------|
| L'alphabê Kurde   | D. A. Bedir-Khan |
| Le Floklorê Kurde | “ “ “            |

Çapxana terekî

ŞAM — 1932

*Dr. M. Khidir*  
*Opérateur et Oculiste*

Damas

Salkiê

*Dr. A. Hafiz*

**SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES**

Damas

Beirout

**PHOTOGRAVURE**

**EYOUBIYE FRÈRES**

*Inscription sur tous les métaux. Gra-  
vure colorée, pancartes et tableaux en cuiv-  
re. Impression de cartes et autres en relief,  
suivant les procédés les plus modernes,*

Damas

Mulek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse,  
l'Irak et les pays du Caucase:

|        |         |
|--------|---------|
| 1 an   | 100 fr. |
| 6 mois | 60 fr.  |
| 4 mois | 40 fr.  |

Pour tous autres pays:

|        |         |
|--------|---------|
| 1 an   | 150 fr. |
| 6 mois | 90 fr.  |
| 4 mois | 60 fr.  |

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan  
Damas: Quartier Kurde

## Qirîyariya Qomelê

Ji Lona Sûriya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

|          |                            |
|----------|----------------------------|
| Salqî    | 500 kirîş-sûri — 100 frenq |
| Şesmeqî  | 300 kirîş-sûri — 60 frenq  |
| Çarmelqî | 200 kirîş-sûri — 40 frenq  |

Ji Lona welatên din:

|          |           |
|----------|-----------|
| Salqî    | 170 Frenq |
| Şesmeqî  | 90 Frenq  |
| Çarmelqî | 60 Frenq  |

Her tişt bi navê xweyî têne şandin:

Ş-m: Taxa Qurdan

## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

## DI DORA HEVXISTINA ZMANAN DE

Gava xwedê dinê afirand û ew ava qir, jê re intizam da. Ji lewre qo bê intizam tu tişt nagehe, namêse, lucar niqare hetê paşiyê bîmine.

Her tiştên dinê di destên kanonên xwedê de ne. Tu tişt niqare xwe ji fermînanên kanonan dîr biçe jê bililite. Her tişt bîndestê wê ye.

Intizam ji utzamê derdiqive, û nizam ji kanonê .

Kanon ew tişt e qo, bisemt, birê, bicih û rast e. Xwe her car naguhêre, liserseqini ye, herweqî rabûye, wê jê pês ve diçe. Her tişt û awayên wê abadînin.

Kanon du textî in . A pêsîn, ew e qo ji mêt ve , ji berî ve , ji ber xwedê ve hatiye danîn, yanî daniyê wê xwedê ye . A dîr ew e qo ji ser û mejiyê mirovan, ji hiş û jiyîna wan, ji dîroq û raziqên wan têne pê . Ev kanonên ha kanonên civaqî ne .

Di vê dinyayê de , zayîn û mirin, ciwanî û piri , rabûn û qetin , her tişt bi hiqma kanonan qedîbin .

Buhar û Havîn , Paiz û Zivistan , rûj û şev , boş bûna hayî , barîna baranê , hatîna berê , hemî bi kanonên xwedê dikewimin .

Tu qes li ser kanonên xwedê ne xweyîyê biqme , kanonên civaqî li ser ciwat û miletan xwedan hiqma in . Ev kanonên ha , diqarin biguhêrin , biqevîn şiqleqî din . Ji ber qo xwedê bi guhêrîna wan ferman qiriye . Bi vê guhêrîne ciwat û miletan pês ve diçin , diqemilin .

Dîroqa dinê raberê me diçe qo gelecq milet qetî bûn dîliyê , bi sedan salan

ve tû de ma bûn . Pêşdetir bi xebat , bi camêrî , bi zanîne ew miletan ha , xwe ji dîliyê veqirin , ji bin nîrê bîndestiyê rabûn , xwe aza qirin û bûn serxwe .

Ma qî heye qo nizane, xwedê hesin çire afirandiye ? Xwedê ew afirandiye ji bona qo dil ne diqir , tu milet , ne yeq jî , xulamîtiya miletoqî diu biçe .

Xwedê hesin afirand ji bona qo miletan dil , pê kelem , lîfing û sûr seqin û xwe ji bîndestiyê ji nîrê dîliyê bifilîtin .

Heye qo mirov ji xwe bipirse , ma çiman xwedê miletan neyarên hev diçe . Cuhaba vê pirsîyarîyê hêsantî ye .

Lewma qo ji kanonên xwedê yeq ji ser , krên û pevçûn e . Xwedê dixwaze , ê xurt , ê bakil , ê zana , ê qerbatî di dinê de bîmine û hevsara wê bixê destên xwe .

Her dema jiyîna me , her helkelqa me , her gava xebatî me şereq e .

Ne tinê em , çarwa û giya jî di ser di hevxiştîne de ne . Jiyîn û mayîna me tinê bi xebat û bi hevxiştîne ye . Yê qo , xwe ji xebat û şerî dîde paş diqeve galê , diqeve gorîna mirîne .

Zman jî weq her tişt li hev dixî , nekeba wan nîne , di şerî de ne . Ji ber qo her zman dil diçe mezintir bibê hawtdorên xwe veqê , biqeve lîvên nû , serên nû . Ev yeq . Jû pêve zman dixwazî , zînanên din biqujî û biqevî şûna wan .

Dîroqa dinê jî me re dîde zanîna qo hela niho gelecq zmanên dinê hatîne qasîtin . Ji wan zmanan re « Zmanên mirî » dibêjin .

Pevçûn û hevxiştîna zmanan qereqer û bêdeng e .

Stûna Zarowan :

Şeva Şe Şewes

Şev e, şev e; roj çû awa  
Hingûrê re cihê xwe da.

Roj salîrî qet li doran,  
Soringa wê ma li boran,

Lê, şûna xwe vala ne hişt,  
Hêv û stêriq şandin ji pişt.

Hêdi hêdi hilhatine,  
Li ser seran xweş hatine.

Ber bi me tèn ji zozanan,  
Belav bûne li ezmanan.

Hatin hatin pêrgî-hev bûn,  
Pêwr û mêzin rengî-hev bûn,

Xemilandî geş û şîrîn,  
Dinêrîn me ji qaqeşîn.

Deşt û newal mina sih in,  
Pozên çîyan weq birih in.

Xuya naqîn herçî dîr in,  
Herçî gir in, tev de hîr in.

Xewa min têt xewa şîrîn,  
Li min xweş e, cih û nivîn.

Himbêz biqim dayîqa xwe,  
Ez xwe bidim laidiqa xwe.

Hêvi diqim sibeqe geş,  
Guhdarîno şeva we xweş.

Şam : 18 Tirmeh 1931

*DjelaDet Aali Bedir Khan*

Belê, ev ser, bûdeng e, hê top û ti-  
fing, hê balafir û mitralyoz e : Lê belê  
hiqma wi ji her şerî bêtir, mezintir û xi-  
rabtir e.

Di şerê zmanan de, rihê zmanan tèn  
standin, xurtiya dil û canên wan tèn şê-  
nandin û pêta heyina wan tèn vequştin.

Zmanên qo li hev dixin dest bi quştî-  
na pirsên hev diqin. Dil diqin, herçend  
heye ewçend biqevîn hindurê zmanên din,  
tê de cih bibin hêdi hêdi biqevîn qurtî-  
ên wi zmanî û di paşiyê de çarniqarên  
wi bigirin, ewî ji him û riqnên xwe bil-

divestînin û ser xerabeyên wî binyaneqe  
nû ava diqin û tê de, di nav wê ava-  
biya nûjen de dibûsîqin.

Herçend zmanê me ne qetî be ji bin  
vê talûqeyê, heqe em mikate mebin  
dê biqeve.

Berî ewilî geleş pirsên biyanî hene  
qo qetîne nav zmanê me. Geleş qurd zm-  
anê xwe ji bir qirine, pê niqarin dixwin-  
in, binivîstînin. Ev hal davîya hevxiştana  
zmanan e.

Ma zmanê me ne spehî ye ? ma qurd  
xwendin û nivîsandîne nîzanin ? Ma ji bo  
her tiştî nav û pîrseqe qurdi nine ?

Çawan nine ! ! .

Belê heye. Lê belê, qurd û zmanê  
me di hevxiştina zmanan de me hineq  
qem qirye.

Geleş qurd hene, ji zarên xwe re pi-  
rsinen biyanî têqil diqin. Heqî holê çê-  
diqin xwe davejûn bin hiqma zmanên bi-  
yanfyan.

Qurd halê şerî rind dizanin. Dîjm-  
in bi derbeqê perîşan nabe. Di hevxiştî-  
na zmanan de ji holê ye.

Her pîrs qozîqeq e, û her pîrsa qo  
em pê emel naqin ji zmanê me diqeve  
û wînda dibê, li şûna wî pîrseqe biyanî  
tê û diqeve, wêlê qozîqeq ji distê me diçê.  
Bi pêveçûna wî helî qozîqeq yeq bi yeq ji  
destê me dertên û paşê, bi tevayî em  
şargeha xwe wînda diqin. Yanî zmanê me  
weq miroveqî birindar, nexweş diqeve  
û dimire.

Vêca ji bona vejandina zmanê me di-  
vêt qurd hemî, gava daxêvîn, an dîni-  
vistînin, bala xwe bidin û pîrsên nequrdî  
tevlî zmanê xwe meqin.

Bi vî awayî, zmanê me pîrsên xwe  
ên jibirqirî an windabûyî ji nû ve peyda  
diqe. Ji milê din ji pîrsnen uê dizê û  
halo zmanê me vedigere ser xurtiya  
xwe a pêşin.

Mileteqî dîl qo zmanê xwe wînda  
ne qirîye, weq qirtîyeq e qo mîfta zînd-  
ana xwe bi xwe re hilaniye.

## Quncîqa Bijisqî

Nexweşî û Dermanqirîn

Hesenê Qoçer ji me nexweşiya tayê pirsî bû . Di hejmara paşîn de me peyda bûn , belavbûn û dermanqirîna nexweşiyê ji xwendevanên xwe re bi bendeqe dirêj û digel her texlit qitqitên wê da bû zanin .

Di nav gund û eşîrên qurdmancan de ji tayê pêve her celeb nexweşî têne ditin . Lê , ew ne weq tan e qo bi hin tevdiran ji hîni bîne kelandin . Digel vê hindê , mirov diqare xwe ji wan nexweşîyan ji biparêze . Lê irû danûqa me ne ew e . Danûnqa me a irû dermanqirîna nexweşan e .

Di haqurê sûriyê de ji Cizîra mîr Şerêf heta rojavayê Cerablîsê bi sedan gundên qurdmancan û eşîrên qurdmanc hene qo bê diqtor in . Hêj tu diqtor pê li wan ne qirîye . Heçî nexweş diqevîn bi destên tebîhên qurdmancî têne derman qirin . Carinan , lê qem , diçin ba jaran û xwe nîşa nê diqtoran diçin .

Tebîhên qurdmancî , ev diqtorîq in ha tîştan dizanin qo carinan biqêrî nexweşan tîn . Lê ne her gav .

Pîştî dayîna cuhaba Hesenê qoçer li dermanqirîna nexweşên xwendevanên hawarê siqirîm . Min ev awa ji xwe re saz qir . Nexweşên xwe ji dîr ve di vê quncîqê de derman qirin . Nexweşan nexweşiyên xwe ji min re binivîstin ez ji di rûpelên hawarê de şîratan bidim wan .

Di diqtorîyê de ji bona qo diqtor biqare li ser nexweşiyê vebe divêl nexweş

Zmanê me geleq qevn e , zmaneqî dewlemend , spehî û freh e . Lê em zmanê xwe rind nizanin . Me ew hêj nas ne qir . Berî her tîştî divêl em binê zmanê xwe bibin da qo biqarin : wî nas biqin û bidin nas qirin .

« Ev meywe eger ne abdar e .  
Qurdmancî ye , ev keder li qare . »

*Dr. Zamîran Xî Bedir-Xan*

## Elfabêya Qurdi

3

Herçend di hin pirsên erebî de qo qetîne nav zmanê tîrqi ji (a) pêvê (s) hebe ji , tîrqi van du herfan cihê cihê bilêv naçin . (s) a erebî gofa denganiya zmanê xwe weq (a) qe stûr dixwinin û duqan ji cihderqeqê derdixînin . Ji her vê yeqê van her du dengan bi herfa (k) nîşan qirîne û herfa (q) yeqar ne existin nav elfabêya xwe .

W — Herweqî me got di elfabêya tîrqi de (w) ji nîne . Tîrqi dengên (w) û (v) weqhev bi lêv diçin û (s) a erebî weq (v) a qurdi û fransîzî dixwinin . Lê di zmanê me de herfên (v) û (w) , herweqî di zmanê inglîzî de heye , cihê cihê

wesla nexweşiyê xwe jê re kenc bidit zanin .

Ber vê yeqê û ji bona hêsani qirîna wesfdana nexweşiyê min ji nexweşan re pirsîyariyên jêrin pêq antiye .

Nexweşê qo awayê dermanqirîna nexweşiyên xwe ji min dê bipirsîn divêl yeq bi yeq li pirsîyariyên min ên jêrin vegerînin .

1 — Çend saliyî ?

2 — Ji qengêve nexweşî ?

3 — Nexweşiya te cawan dest pêqir ?

4 — Ji çi teşîhî ? Qu derên te teşîhin ?

5 — Nexweşiya te pêde diçe an carinan mîhe dîbî ?

6 — Di dema nexweşiyê de çi dîhesî ?

7 — Heta nihî te xwe nîşanê diqfe-reqî qir ? ger te qir diqter çi gofe te û çi derman da ye te ?

8 — Beriya nihî bi nexweşiyê qe din qetî bûyî ? Ger pê qetî bûyî bi qûjan û qengê ?

Eve pirsîyariyên min . Heçî li wan kenc vedigerînin kenc ji tîn dermanqirîn

*Dr. Elmed Hafîz*

têne ditin û qurd dengên van her du herfan ji cihderqên cuda derdixinin.

Geleq pirsên qurdi hene qo bi gultêrîna van herfan û bi qetîna wan li şûnên hev di mana wan pirsan da ferkinen mezin têne pê. weqî niho:

|          |          |
|----------|----------|
| qevandin | qewandin |
| dev      | dew      |
| vir      | wir      |
| awa      | awa      |
| ewi      | ewi      |

Herweqî têt ditin me dengê ( ڤ ) bi (v) û yê ( ڤ ) bi (w) nîşan qirin.

Niho divêt em texmîna wan tiştan biqin qo di hekê awayê nîşanqirîna wan de diqarin bîn gotin.

Di paşîya vê bendê de sê cedwel hene. Cedwela paşin ji me re nisbeta herfên qurdi nîşan dide.

Gora wê cedwelê di zmanê me de nisbeta (v)  $\frac{329}{33798}$  û ya (w)  $\frac{557}{33798}$  e. Yanî di kîşeqê de qo (33798) herf hene (v) (329) û (w) (557) caran derbas dibe.

Jê dixuyê qo di zmanê qurdi de (w) ji (v) bêtir e. Ji lewra, me dengê ( ڤ ) bi (w) û yê ( ڤ ) bi (v) nîşan biqirîna çêtir ne dibê? Bi vî awayî me dengê van du herfan ji dengên xwe ên navmiletî — qo trû weq dengên wan ên adetî têne hesêb — dîr bixistana.

Dîrxistîna dengên herfan ji dengên xwe ên adetî, gora destûra me a duwîn, tinê di qoteqiyê de, an bi destxistîna fêdeqe mezin de, bilhata çêqirin.

Qoteqî yeqcar nîne, fêde hebe ji geleq qîçiq e, ne welê ye qo em ji bona wê destureqe xwe a biogehî foda biqin.

Belê (v) bi yeq dran e, û (w) bi du dranan e. Lê her du ji bi derbqê, bi liveqe kelemê tîn nivîsandin, ne qo (v) bi derbeqê û (w) bi du derbîn.

Ju pêve di dengawtîyê de (w) du (vv) tê hesêb, bi vî awayî deng û şiqên wan ji lihevên. Ji xwe di zmanê trensîzî û di

## Silêman Beg Bedir-Xan

Silêman beg, qurê xalid beg Bedir-xan e. Di (1890) mihacirîyê de hatiye dinê, li Stenbolê di Sittaniyê de xwendîye, xorteqî jir, ekilmend û delal bû. Ji miletê xwe geleq hej diqir.

Vê paşîyê yeqî ji hevalê min ji min re şihreqe wi da bû. Ev şîhr li ser qurdistanê, li ser welêt hati bû nivîsandin. Min ji bi vê hêctê dil qir serhatîya Silêman begî di vê qunciqê de vejînim û pêre navê wi ji wînda bônê xelas biqin.

hinên din de (w) re (double v) yanî (du car v) dibêjin.

Y— Ev herfa ha di hin zmanan de carinan dengdar û carinan dengdêr e. Herweqî berdêla wê a erebî ( ڤ ) ji carinan dengdêr û carinan dengdar e.

Me ew, tinê bi dengê xwe ê dengdarî exist nav elfabêya xwe.

|       |      |
|-------|------|
| yar   | يار  |
| diyar | ديار |
| derya | دریا |
| beyar | بیار |

Ev herfa ha di nav pirsên qurdi de geleq hindiq têt ditin. Perîcar diqeve navbera du dengdêran û wan digehîne hev

|       |         |       |
|-------|---------|-------|
| Derzî | deziya  | Zinê  |
| Rê    | rêya    | welêt |
| Ba    | bayê    | qur   |
| Tilî  | tiliyên | wî    |

Ji hêla din ev herfa ha hîç bi hîç diqeve nav zmanê û pêde meyildariya qetîne diqe. Di zmanê qurdmançî de gava pirsêqê qo paşîya wê bi (o) an (û) tê, dengdêreqe biyant dibit (w) yeq diqeve navbera wan û wan digehîne hev.

|       |            |         |      |
|-------|------------|---------|------|
| Parsû | vê parsûwê | parsûwa | stûr |
| Çilo  | vî çilowî  | çilowê  | ter  |

« dîmahîq heye »

Celadet Ali Bedir Xan

Hej qirina welatê wi je ra bû bû im-  
aneq. Herweqî-di sihra xwe-di heyta jêrin  
da dibêje:

Hiba welat ji iman e  
Ax qurdistan! Ax qurdistan!  
Hesreta welat, jê re bû bû quleqî  
mezîn:

Eşka welat dil şewitand  
Can û ciger tev peritand  
Her qend welatê biyanîyanê lê xwes  
dihat. Lê halê zozan bi hawaqî din  
didit,

Herçî welat weq şeqir e  
Halê zozan şirintir e  
Gava çy ax û qesera ha ji dil hat û di  
sihra xwe da :

Şêd ah ! ji destê firketê  
Sed ah ! ji bo ve hicretê  
Nivisand qesî lê mîze neqir kerara  
xwe a davi da :

Heta qengê , ve xurbetê  
Da em, biçin nûy mîletî  
û bêtirs çû nav welat, heval û ho-  
gîrê xwe.

Ji bona ditina welat, wi cehd qir.  
Xwedê ji ne re miyesser qir. Di nax xo-  
rtên qurdan da ruhê qurdîtiyê tehimand,  
jiwan re xwendin û rêya rast nîşan da.  
Lê, hezar esef xwedê pê re nebî serî  
emrê wi di wê rêyê da nîy kûrmîçî bû , bû  
kurbana gula tirqa , rûviyê wi li ser  
sungiyê tiraq geriya ..

Belê , Silêman beg bi Ciwanî serê  
xwe di rêya welatda da. Bist û du salî  
hû . Lê, hesreta welat pê ra ne ma . Di-  
gel ve kasê rêya xwe ne kedand . Lê bi  
nêvîqir , fiqr û serhatiyên wi ji bona xo-  
rtên qurdan, bû derseq.. denseq bi îbret .

Îrû xortê me yên qo Silêman begî  
dinasin hemîji bi serê wîsund dixun û  
dixwazin weq Silêman begî di rêya felata  
welat da bixebîtin. Ger wê rêyê ne kedûin  
ji tubeis- ji akibeta Silêman begîra nine .  
xwêd qî barana rehma xwe lê biqê û meji  
bi rehma wî şa biqê ...

*Kedrican*

## FERHENGOG

Çîvaqî

Yê çîvatê, bi çîvatê re gîredayî, xwe di-  
gehîne çîvatê. Rêzîqên çîvaqî, kanonêq  
çîvaqî, Yanî ew rêzîq û kanonên qo jiyîna  
me a çîvaqî digerinin,

Zar. Zarawa

Zman, bîrê zmaneqî, Di zmanê qurdi de  
sê zar hene. Zarê Dumilî Zarê Lori û Zarê  
Qurdmanci.

Zarawa, di nav yeq zari de awayên  
gotinê û bilêvqirinê.

Yeqiti . Yeqbûn

Yeqiti, pêq, lihevaniya qitqiten, tîsteqî qo  
di him û bîngehên xwe de ji yeq rayî ne,  
ne cuda ne. Qo bi yeqitiyê digehin, hev û  
bi tevayî heyîneq ditinin pê, û êdin ji hev  
venakefîn,

Yeq bûn, yeq bûn ji weq yeqiti ye .  
Lê, di yeq bûnê de, ew listên an qesên qo  
hatine lihevaniyê an dayîn hev, dibe qo ne  
ji yeq rayî bibin û rûjê ji hev vebîn û  
veketin.

Dotmir

Qeça mir, Di rêzîqa Qurdistanê de herçî  
torîq, û makul gora rêzên xwe dihatin bi  
nav, qirin, weqî nibo Mir, Mîreq, Pîsmîr  
Dotmir, D'êmir, Jîmîr, Axa, Pisaxa h. p.

Liserêbûn

Nasqirin, qarin bi nav û nîşan qirin. Bij-  
îsqî şeq nexweşiya min venebî, yanî  
niqari bi bizane ez ji çî teşihim, nex-  
weşiya min çî ye.

Xwenda. Xwendewar

Her qesê qo xwendin û nivisandîne  
dizane xwenda ye. Lê xwendewar ew qesê  
qo geleq xwendîye û di vi wari de xwe-  
dan behre bûye.

Vên

Bi tevayîya xurtîya dilê xwe xwestin û  
li ser seqînin, pê bikerar bûn.

«Sifatên di seb'e ji bo zilcelal»

Bizan heft in ey arifê pur qemal;

«Xweştîştî û zanî û vên û qelam

Bihistin digel difî bû temam.»

*Chmedî-Xani*



## Dibistan

Dibistan ew der e qo em tē de dixwinin. weq dibistanā gundē me.

Di dibistanē de mamhoste ū zarowēn gundi hene.

Ji zarowēn dibistanē re şagirt dibējin. Ez ji şagirteqim. Lewra qo diçim dibistanē ū dixwinim.

Her rûj subehî şagirtan qitēb, defter ū kelemēn xwe didin hev ū diçin dibistanē.

Mamhoste dersa şagirtan dibējit, şagirt guldar dibin, kenc bala xwe didin qo rind tēbigelhin ū hin bibin.

Mamhoste di ciheqi bilind de rûniştîye, jē re diyaroy dibējin.

Şagirt li rex hev liser rûnişteqan rûniştî ne. Li her şagirtan berqoşq hene.

Li her min ji berqoşqeq heye. Gava ders quta dibe, herqoşqa xwe ber bi xwe ve diçiştoim, qitēb, defter ū kelemēn xwe tē de vedişerim, diçim hewşa dibistanē digel heval ū hogirēn xwe dileyizim.

Di qunceqe dersxanē de depres heye. Depres liser sepiqt suwarqirî ye.

Mamhoste, carinan, ji diyaroqa xwe datē ū bi tebastrē li ser depreşt dinivisîne. Herçi qo devqi qenc nayin sehî qirin, bi nivisandinē ji me re dide zanin. Hin caran ji şagirtan radiqe, dersēn wan ji wan re dide nivisandin ū xeletēn wan derdixine ū rast diqe. Pēr mamhoste li ser depreşt tîşteqi xwesoq nivisandi bi, hej di bira min de ye:

«Çiyayēn bilind bē mij nabin  
Newalēn qār bē av nabin»

*DjelaDet Cali Bedir Khan*

Niqtezan . Niqtebēj  
Ewē qo niqteyan dizane ū dibēje. Filan qes niqtezane. Belwan niqtebēje, niqteyan dibēje.

Niqte ew gotin e qo mana wē ji bona herqesî ne qifs e. Tēgehîstina wē hineq dişwar e. Bi awaqî welē libevhatiye

qo mana wē yeqar rast mebe ji dîsan q la mirov jē re tēt. Ji xwe spehîtiya wē ji di wē de ye.

Herweqi xwendevanēn me dizanin navbera Şêxê Barzan ū Hîqûmeta Irakê ser e. Qurdēn Barzan wē paştîyē çend balafirēn Irakē daxistine. Di nav zabitēn balafirān de inglîz ji irakî ji hebûn. Barzan irakî quştin ū dest bi inglîzān ne dan. Xelqî ji Şêxê Barzan pirsin:

— Te çire irakî quştin ū inglîz hiştin , irakî misilman, inglîz file ne; divîya bî tu inglîzān biquji ū irakîyan bîlînt.

Şêxê ciwan ū niqtezan li wan vegeand ū got :

— Min ji lewma quştin. Ji her qo ez naxwazim xirabî li xelqî biqim. Min misilman quştin, ew bûne şehid ū bi destê min çûne bihuştē, min inglîz biquştana, ji lewre qo file ne biçûwana dojelê.

Nûjen . Qevnar

Nûjen, herçi qo ji nû ve hatiye çeqirin, çaxa çeqirin ū danina wî ji me ne dūr e, ji me re nas e. Ne qevnar.

Qevnar, her tîştê qevn, lē ewçend qevn qo dema çeqirin ū danina wî ji me dūr e, ji me re ne nas e, di zemanē pêşiyān de çebûyf. ne nûjen.

Abadin

Tîşt an qeseqt qo davi ū paşîya wî nine, naye, her gav dimine, tucir wînda ū xirab nabe. Hēyîna xwedê abadin e, ji ber qo xwedê herweqi ne zaye, nûmire jî. Ehm-edê-Xanî bi Memo-Zinē, navê xwe di droqa qurd ū Qurdîstanē de abadin qiriye.

Vejanin

Ji mirinē antî jiyinē. Ji nû ve jiyin dayin.

«Şerha xemi-dil biqim fes me,  
Zinē ū Memî diçim hehane.  
Nexmē we ji perdeyē derinim,  
Zinē ū Memî ji mû vejînin.»

*Ehmedê-Xanî*

Cejn

Şahînet, roşahî, id. Cejna te p.rûz be .

## Bire Frensiçi :

## L'ALPHABET KURDE

## 3

D'après notre second principe nous n'aurions toléré ceci seulement que par contrainte ou par intérêt. La contrainte n'existe pas. Quant à l'avantage il n'est pas suffisamment grand pour nous obliger à sacrifier un principe fondamental.

Malgré que (v) n'a qu'un crochet et le (w) deux; tous les deux ne s'écrivent que d'un coup de plume. De plus d'après les sons que ces deux lettres produisent le (w) est le double son du (v). C'est pourquoi on trouve une analogie entre la forme et le son. (1)

Y. — Cette lettre qui dans quelques langues est en même temps consonne et voyelle nous l'avons classé dans notre alphabet seulement comme consonne.

A ce sujet sans émettre une opinion quelconque, nous donnerons quelques faits :

Cette lettre se trouve rarement dans des mots d'origine kurde. Son rôle dans la langue est plutôt de se placer avant une voyelle qui vient accidentellement à la fin d'un mot se terminant par une autre voyelle :

|       |        |       |
|-------|--------|-------|
| Derzi | deziya | Zinë  |
| Hê    | rêya   | welêt |
| Ba    | bayê   | qur   |
| Tili  | tilyên | wî    |

D'autre part on constate sa tendance de pénétrer dans la langue et de se substituer à d'autres lettres. Dans le Kurde les mots terminés par les voyelles (o, û) lorsqu'ils reçoivent une voyelle accidentelle c'est le (w) qui sert à les unir.

|       |            |         |      |
|-------|------------|---------|------|
| Parsû | ve parsûwê | parsûwa | stûr |
| Çilo  | vi çilowî  | çilowê  | ter  |

(1) Voir à ce sujet la liste No[1] dressée à la fin de cette étude.

Dans certaines régions ces (w) deviennent (y) et ce changement s'étend à d'autres régions :

|    |         |         |      |
|----|---------|---------|------|
| Vê | parsûyê | parsûya | stûr |
| Vi | çiloyî  | çiloyê  | ter  |

Ce changement s'est produit de la façon suivante : Une petite partie des Kurdes prononcent le (û) non pas comme les allemands mais comme les français et conséquemment le (o) comme un (ou) français ayant toujours une tendance vers le (o). Ces Kurdes qui adoucissent ces voyelles emploient le (y) pour l'union, mentionné plus haut. Et comme le (y) est plus facile à prononcer il commence à gagner la contrée de la majorité qui prononcent le (û) comme les allemands et le (o) tel qu'il est.

Quelquefois il remplace le (h) dans le corps des mots :

|       |         |               |
|-------|---------|---------------|
| Gerin | gerihan | geriyan       |
| Bezûn | bezihan | beziyan       |
| Mehir | meyir   | dibar — diyar |

Tout ce changement se produit de l'est vers l'ouest du Kurdistan.

Dans des mots empruntés à la langue arabe le (y) précédé par un (—) que nous noterons par (e) disparaît avec ce dernier et c'est un (ê) qui le remplace.

|         |        |       |
|---------|--------|-------|
| زَيْنَب | Zeyneb | zêneb |
| خَيْر   | Xeyr   | xêr   |
| غَيْرَت | seyret | xêret |
| زَيْنَل | Zeynel | zênel |
| فَيْزِي | Feyzi  | lêzo  |

A ce sujet il faut noter aussi que dans l'arabe vulgaire quelquefois ce changement se produit.

J. G. — De ces deux consonnes le (j) a été classé à l'alphabet Kurde avec son son français et le (g) avec le son du (g) allemand.

Q. — Cette lettre correspond au son du (ch) français (sh) anglais, (sch) allemand.

Nous ne disposons plus de lettre qui puisse servir à figurer ce son. Un de nos principes nous interdit de faire usage de lettres composées, un autre nous conduit à nous rapprocher autant que possible de l'alphabet turc. D'autre part ce son comme point d'émission est proche du (s), aussi les langues qui n'ont pas le son de (ch) le prononcent comme (s), par exemple les grecs ne connaissant qu'imparfaitement le français au lieu de dire (chambre) ils disent (cambre).

En conséquence nous avons noté ce son comme les turcs par (s). Cette forme existait déjà dans l'alphabet roumain.

X. — Le son grec du (x) figuré en allemand par (ch) existe aussi dans la langue kurde, il fallait dès lors le noter par une lettre indépendante. L'autre part nous n'avions pas besoin que le (x) figure comme en français les deux sons différents qu'il a dans (exemple—egzemple, Alexandre—Aleksandre), nous avons donc pu l'adopter pour figurer le son du (x) grec auquel il correspond d'ailleurs dans différents autres alphabets.

Q, K. — Les sons notés en arabe par les lettres (ç) et (k) et qui sont tout à fait distincts l'un de l'autre se différencient également assez nettement en kurde. Cependant le correspondant au (ç) arabe est plus doux, en kurde, il ressemble un peu aux (c) des mots français; comme cri cristal etc...

La question est de déterminer par lesquelles de ces lettres doivent être respectivement représentées le son antérieur et le son postérieur. Nous rappelons que le son est antérieur lorsqu'il est émis d'un point se rapprochant des lèvres, postérieur lorsqu'il est émis d'un point se rapprochant de la gorge.

Nous avons noté le son de (qu) français, allemand et de divers autres langues par (q) qui correspond exactement

au son de (qu) du mot. (quart). Le même mot avec la même signification existe en kurde, il s'écrit (qart) et se prononce comme (quart) avec cette seule différence que le (t) final est prononcé.

Examinons le cas du son figuré par le (ç) arabe.

Si l'on étudie le (q) et le (k) des alphabets européens, on constate que le (k) sert à noter un son postérieur par rapport à celui du (q).

Les langues d'origine latine le notent aujourd'hui par un (c), car ce changement s'est produit dans la langue mère avant la formation des langues latines actuelles.

Dans l'ancien latin le «k» ne put se maintenir que dans les mots «kaeso» et «kalendæ», dans les autres il a été remplacé par le «c» que les romains ont toujours prononcé comme un «k» c'est le cas des mots: cable, café, corbeille, coiffe, cristal qui s'écrivent par un «c» dont la prononciation est postérieure par rapport à celle du (qu).

Dans l'allemand, langue où le «k» n'a pas cédé au «c» nous voyons les mêmes mots s'écrire avec un «k»: kable, kaffe, korb, koffer, kristal.

Passons à la valeur vocale du son du «k» kurde, prenons le mot français cri. Le «c» de ce mot se rapproche au son du «k» kurde dans le mot kurde «kir», qui veut dire aussi cri.

De même le mot kurde krên peut être transcrit en français par crên.

Je me permettrai maintenant de citer quelques expériences relatives à la valeur du «k» kurde et qui semblent intéressantes du point de vue de la comparaison du «q», «k» kurde avec les sons correspondants des langues ariennes et semitiques.

I. — J'ai dicté à des jeunes gens kurdes, auxquels j'avais enseigné l'alphabet kurde le mot cristal. Après une très courte hésitation, tous l'ont écrit par un «k» comme en allemand kristal.

II. — J'ai dicté le même mot à un

kurde ne connaissant que l'alphabet arabe mais non la langue, Il me l'a écrit avec un ( ق ) قريسال.

III.— J'ai dicté le même mot à un Kurde, connaissant l'arabe, qu'il avait étudié pendant de longues années dans des Medressets. Ce dernier hésita longuement, prononça le mot plusieurs fois, l'examina par l'oreille et me fit cette observation : D'après la prononciation d'un kurde qui ne connaît pas l'arabe à tout on doit l'écrire avec un ( ق ) قريسال ( قريسال ). Mai ceci lu en arabe donnera un son qui vient de la gorge et qu'un kurde ignorant ne saura pas prononcer. En conséquence, au cours d'une dictée savante arabe il faut l'écrire comme ( قريسال )

IV.— J'ai dicté le même mot à un arabe, qui adopta la même opinion que mon compatriote lettré et l'écrivit قريسال

D'autre part ce procédé procure aussi un certain avantage pratique. En effet la proportion de q dans la langue kurde est  $\frac{1056}{33798}$  et celle du k  $\frac{150}{33798}$  et le q s'écrit beaucoup plus facilement que le k.

Il ne nous est pas possible de nous conformer sur ce point à l'alphabet turc, qui ne fait pas de différence entre ces deux sons.

C, Ç — Nous avons encore le c et le ç que nous avons réservés pour noter les sons de dj et de tch.

L'histoire paraît justifier la notation du son tch par la lettre ç.

Dans le latin postérieur du 6<sup>ème</sup> siècle, comme on sait, le c suivi de « e, e, i, y, æ, œ » rendait le son de « tch » presque comme le z allemand. Ainsi que dans les mots suivants: Ceres, centum, Cicero, circus, cyrus, Caesar, caeremomia, coetus.

Nous préférons cependant rester sur le terrain de la convention, qui nous permet de demeurer fidèle à notre principe

que rien nous oblige à sacrifier.

Du point de vue pratique la proportion de ces lettres est égale dans la langue

$$C \frac{102}{33798}$$

$$Ç \frac{103}{33798}$$

La présence de la cédille ne peut pas influencer notre choix. En conséquence nous avons adopté:

C — pour dj ج

Ç — pour tch چ [1]

«à suivre»

*Djela'det Cali Bedir Khan*

[1] Juste en passant, à propos du ç Kurde je veux noter qu'il est probable que ce son figuré par un چ dans les alphabets orientaux, est originairement un z allemand comme dans Zeitung. Dans différentes contrées montagneuses du Kurdistan on trouve des mots dont le ç se prononce comme un z allemand.

Notices sur la littérature  
meurs et coutumes Kurdes

3

### La Lange Kurde

Les Baba-Qurd et les kurdes de Soran désignent quelquefois les Qurdmanç par l'expression de Qurdèn-jijan qui veut dire les kurdes de j. Cette dénomination provient de ceci que la lettre j a beaucoup diminué au sud tandisque, au nord, est au contraire très usitée.

Le dialecte du sud porte dans son ensemble le nom de Lorî. aujourd'hui ce n'est plus qu'un terme scientifique et s'est spécialisé aux kurdes Lor. Par ce que, comme nous l'avons vu, ce dialecte est subdivisé en sous-dialecte et chaque sous-dialecte a pris un nom spécial. Seulement les «bextiyarî» sont quelquefois désignés par l'expression de (Lorèn qiqîq) qui veut dire «les petits lor» et «lor» proprement dit «lorèn-mezin» «les grands lor»

Le dialecte du Nord-Ouest s'appelle Dumilj ou encore Zazan.

### Le Folklore Kurde

Le Folklore Kurde est d'une grande richesse. Il embrasse plusieurs genres et différentes formes.

Il est évident que cette richesse est due à ce que la langue Kurde n'était pas régulièrement écrite, et la littérature écrite, plutôt théologique et philosophique, et surtout encombrée de mots arabes non usités dans la langue populaire ne correspondait pas aux aspirations du peuple Kurde, éminemment poétique.

En conséquence le peuple a cherché à satisfaire ailleurs cette aspiration, et les talents poétiques assez fréquents préféraient exploiter le domaine de la langue populaire plus fertile que celui de la langue écrite. Et grâce à ces deux facteurs la littérature populaire s'est tellement enrichie et développée qu'elle peut présenter à elle seule l'expression littéraire complète d'une époque dans les genres les plus divers.

En dehors du fait que la langue Kurde n'était pas utilisée comme langue officielle et administrative, un des principaux motifs qui ont incité les poètes Kurdes à négliger leur langue maternelle littéraire peut être trouvé dans l'influence de la religion islamique, qui pénétra très profondément les Instituts les plus intimes des peuples qui l'ont embrassée.

La religion islamique pour effacer toutes traces de l'ancienne religion des Kurdes le Mazdeisme ou religion de Zoroastre - comme elle le faisait à l'égard de tout autre peuple pénétrée par elle - a amené de nouveaux termes et expressions de théologie, qui ont permis la constitution d'une nouvelle littérature théologique; formant partie intégrale du nouveau dogme. De même est intervenue une nouvelle jurisprudence avec des codes toujours garnis de nouveaux termes empruntés à la langue du Coran.

Pour être un bon adepte du prophète et conquérant arabe au lieu de dire Yezdanê par le créateur pure il fallait dire Allah....

Cependant la langue Kurde resta plus pure que sa soeur, la langue persane. Une des raisons de cet avantage gardée par la langue Kurde a été l'impossibilité dans laquelle se sont trouvés les arabes, peuplade du désert, de se mêler aux montagnards Kurdes. Ils ne se trouvaient pas, en effet, équipés matériellement pour pénétrer dans l'habitat des montagnards Kurdes. Durant les invasions, ces

derniers, comme du temps de (Xénophon) se retiraient sur les sommets, du haut desquels ils contemplaient le va et viens de ces envahisseurs, qui pouvaient difficilement pénétrer jusqu'àuprès d'eux.

Dans le folklore Kurde nous trouvons différentes formes.

Les (çiroq) contes, (çirçiroq) légendes, qui sont généralement en prose, prose rimée [1] et par endroits versifiées, narrées par les (çiroqbêj) narrateurs et chantées par les « dênghêj et stranvan » trouvères et chansonniers.

Dans les narrations en prose et en vers le chansonnier commence à raconter l'histoire et lorsqu'il fait parler ses personnages, il le fait en vers et en chantant. Quand il y a plusieurs chansonniers, l'un d'entre eux se charge de la narration et les autres prennent le rôle des personnages de l'histoire et chantent tour à tour.

Stran-C'est le genre exclusivement musical, correspondant à peu près au Lied allemand.

Au Kurdistan la plupart des stran sont faites par les femmes.

Les stran se classent en deux catégories selon la durée de leur existence. Certains subsistent longtemps, et presque depuis les temps les plus reculés, d'autres ne sont retenus que durant peu de temps, parfois seulement durant une année.

Dans la musique Kurde on peut distinguer comme genre les lawiq, ser, diloq, lawj, bërîq, beste.

Lawiq — Sous ce titre se groupent les chansons d'amour et les chansons purement lyriques.

Ser — C'est le genre des chansons de guerre, épopée.

Dans ce genre on distingue la véritable épopée, dont le nom diffère chez les Kurdes montagnards et chez ceux de la plaine.

« 1 » la prose rimée est chantée avec une mélodie légère. Dans les morceaux de ce genre le dênghêj commence par un rime qu'il garde jusqu'au prochain arrêt, et chaque fois que la voix s'arrête rime l'arrêt avec l'arrêt précédent, et il continue ainsi jusqu'à une nouvelle chanson.

Les épopées de la plaine s'appellent delal qui veut dire beau et chaque tribu a son delal. Comme Delalê-Bersazan, Delalê-Milan Delalê-Berjyê etc. Ceux des montagnes sont désignées par l'expression de Lawiqê suwaran.

Le sujet des delal est toujours du même type. Un jeune héros part pour la guerre, sa fiancée ou sa bien aimée est à la maison, elle chante les péripéties de la guerre et les faits d'armes du héros.

Le Lawiqê-Suwaran est analogue au delal et a des passages chantés comme allegro et presto et qui tiennent d'une marche de cavalerie. Ces passages sont surtout chantés quand les cavaliers partent pour la guerre. Le chansonnier monte les accompagne et chante.

Diloz— C'est la musique du dilan et de govend, musique de danse.

Lavij, lavijoz, laje— C'est la musique religieuse, devenue assez rare. Avec cette musique on ne chante que des morceaux en Kurde, faites par les Kurdes et non des versets de Coran. Le lavij est celle des prédications et le lavijoz est approprié aux mouvements lent qui correspondent à une espèce de danse ou marche religieuse. Les mélodies tristes, chantant la nature comme les pazozq chansons d'automne, s'appellent aussi, parfois, lavijoz à laje.

Bêrite, Bêlîte — Ce sont des mélodies chantées par les étudiants. Les paroles sont les poèmes des poètes Kurdes, comme Melayê Cizêrî, Ehmedê-Xani, Melayê Batê etc.

Les bêrite se chantent par groupe. Les étudiants se groupent deux par deux ou trois par trois, et chacun des groupes chante à son tour, après que les précédents se tus.

Beste—Sont les chansons les plus lourdes, c'est presque une musique sans paroles, symphonique. Les paroles d'une beste sont seulement quelques vers, et il y a un nom propre ou un certain mot, qui se repète en s'allongeant d'une manière qu'on arrive presque à les distinguer. à suivre

D. A. Bedir-Khan

Xweyf û midirê berpirsiyar :  
Mîr Celadet Alî Bedir-Xan

کنجکی ده درمان کرن . نخووش نخووش شیبین  
خووش ژمن ره بنفیسین از ژمی د روپلین هاواری  
ده شیرتان بدم وان .

د دکتوری بی ده ژبونا کو دکتور بکاره  
ل سر نخووشی بی قبه دقیت نخووش و صفا نخووشیا  
خووش ژیره قنچ بدت زانین .

برقی بیکی و ژبونا هیسانی کرنا و صفدانا نخوش بی  
من ژنخووش شانره پر سیار بین ژیرین پیک آتی به .

نخووشین کو آوایی درمان کرنا نخووشیبین خووش  
ژمن دی پیرمن دقیت یک ب یک ل پر سیار بین  
من ژین ژیرین فگر بین :

۱ - چند سالی بی ؟

۲ - ژکنگی فه نخووشی ؟

۳ - نخووشیا نه چاوان دست بی کر ؟

۴ - ژچی تیشهی ؟ کودرین نه تیشهن ؟

۵ - نخووشیا نه پیده چه آن جارنان راحت دبی ؟

۶ - دمانخووشی بی ده چی دحسی ؟

۷ - حتانهو ته خووش نیشانی دکتور کی کر ؟

گرته کر دکتور چه گوته نه وچه درمان دایه ته ؟

۸ - بریانهوب نخووشیبیکه دن کتوبی ؟

گر بی کتوبی ب کوژان و کنگی ؟

آفه پر سیار بین من . حچی ل وان قنچ  
فدگر بین قنچ ژی تین درمان کرن .

دکتور احمد نافذ

صاحب الامتياز والمدير المسئول :

الامير جلال الدين علي محمد خان

کنجکا بڑیشکی :

نخوہاشی و درمانگرن

حسنى كوچر ژ مه نخوہ شيبا تايي پريسي بو .  
 دِه ژمارا پاشين ده مه پيدا بون ، بلاف بون و درمانگرن  
 نخوہش يي ژ خوہندفسانين خوہ رہ ب بند کہ  
 دريژ و دگل هر تخليت کتککين وي دابوزانين .  
 دناف گند و عشيرين کردمانجان ده ژ تايي پيہ  
 هر جلب نخوہ شي تينه دبتن . لي اونه وک تانه  
 کوب هن تفديران ژ بني بينه قلاندن . دگل  
 في هندی ، مروف کيم وزيدہ دکاره خوہ  
 ژ وان نخوہ شيان ژي پاريزہ . لي ايرو دا  
 نينکامہ نه اوه . دانينکامہ آايرو درمانگرن  
 نخوہ شانه .

د باکري سوري ده ژ جز يرا مير شرف حثاروژ  
 آقاي جرابلسي ب صدان گندين کردمانجان  
 و عشيرين کردمانج هه کوي دکتورن . هيژ  
 ت دکتوربي لي وان نکره . چچي نخوش  
 دکش ب دستين طبيبين کردمانجي تينه درمان  
 کون . جارنان ، لي کيم ، دچن بازاران و خوہ  
 نيشاني دکتوران دکن .

طبيبين کردمانجي ، آف دکتور و کين ها  
 نشنتان دزان کو جارنان ب کيري نخوہشان  
 تين ، لي نه هر گاف .

پشتي داينتا جها با حسني کوچر لي درما نکرنا  
 نخوہشين خوہندفانين هاواري فکريم . من آف  
 آواژ خوہ ره ساز کر . نخوہشين خوہ ژ دورفه دفي

مايسان دجي ؟

- ژاکرم بک ره -

دلکتی مه ، ديلم از ، دوغير و فرمانداری نوا  
 سال وهيف هر دم نوي ، هم روفون هم روهلات ،  
 ديلم از ، ديلا ولاتي ؛ از ژي قرباناته مه ،  
 کفره به هيئين وزن ، لي کفره تر آل وولات .  
 دکتور کامران عالی بدرخان

د که و دخوازه و ام ژبونا بکيتيا زماني کردی  
 بخيتن

يلي خبراوي به . ژخو . مه ، دپير و نيفيسا  
 خوهده او اساس ، ب مادا ژيرين فه داني بو .

۲- صحيتيازارين کردی و برهندا نيناوان . . .  
 ژبونا بکبونا ملتي مه ولي ژي دفيابو . ژبر کو  
 بکبونا ملتان ب بکيتيا زماني دست پي د که .

(بزمارک) بکبونا الماني لي سريکيتيا زماني  
 الماني داني بو . في بکيتي بي (لوتر) ژيره  
 چيکري و پيک آني بو .

بکبونا کردان ژي ب بکيتيا زماني کردی  
 چيدبه . بکيتيا زماني ژي ب بکيتيا حرفان  
 دست پي د که . ياني د بکيتيا زماني ده بکيتيا  
 حرفان گافا پيسته .

پسن و سپاس ژ يزداني پاک ره هاوار الفا پييا  
 کردی بلاف کرووی گافي آفیت .

أدن دفت هرچی خوہ ندا ، خوہ ندوار  
 وزانين کرده ب في الغابي بي بنفيسين  
 و نخوہنداژی هيني وي بين .

مدارت عالی بدرخان

## ب. هیئتی پیر و ز نامی

هر وکی در ستونخواه ده بیت دیتن بکی  
 ژخورنن کردین عراقی ، ب نائی حامد فرج ، ژ  
 هاواری ره پیروز نامکی شانديه . تیده ژ برخوه  
 و ژبرحمی خورتن کردین عراقی فه در کتتا هاواری  
 پیروز دکت .

دکفه و دمره .

فیجا ژ یونا فراندنا زمانی مه دفت کرد ،  
 حمی ، کافا داخین ، آن دنفیسین بالاخوه بدن  
 و پرسین نگر دی تفلی زمانی خوه مکن .

ب فی آوایی زمانی مه پرسین خوه مین  
 ژ بیرکری آن وندا بوی ژ نوفه پیدا دکه ، ژملی دن  
 ژ ی پرسین نو دزی و هالو فد کره سر خرنیا  
 خوه آپیشین .

ملتیکی دیل کو زمانی خوه وندا نکره ، وک  
 گر نیکه کو مفتا زندانا خوه بخوه ره  
 هلائیه .

زمانی مه گلاک کفته ، زمانیکی دولند ،  
 سپهی و فرهه . لی أم زمانی خوه رند تران ،  
 مه او هیژ ناس نکر . بری هر تشتی دفت أم  
 هینی زمانی خوه بین دا کو بکارن وی ناس  
 بکن و بدن ناسکرن .

« ائب میوه اگر نه آبداره ، »

« کردمانجی به ؛ او قدر لکاره . »

دکنور کاران عالی بردخان

حتا نهو مه حامد فرج ناس ند کر . اُف جارا  
 پیشینه کوم أم ب هییناوی دحسن .  
 اوی ژی مه ناس ند کر . لی ژبرکو هاوار -  
 هر وکی هاوار اهر خورتنی کرده - هاوار اوی  
 به ، حامد ژیره خوبی بو .

حامد فرج خورتنکی کرد ، شا کردکی دبستانی ،  
 هاوار دکفه دستی وی ، پی بندوار و شادبه ، او  
 روزا کو هاوار کیته دستی وی ژیره جژنه ، جژ  
 نک مزن ، جژنا قژین و قژ اندنا زمانی کردی به .  
 تافل کر پیاری هاواری دبه و دیلندیا هفال ، ناس ،  
 ناس ، تقابلیا خورتن کردین عراقی دکه  
 و ژمره ، ژ هاواری ره پیروز نامه کی رید که .

ژ هیلا دن خوه دده پیش ، برامری هاواری ،  
 برامری زمانی خوه دسکته . ژ مه دپرسه ، گلو  
 چه خبات ، چه کار هیه کو بی خدمتا زمانی  
 خوه ، خدمتا نژاد و ملتی خوه بکه .

ت کس نکار بو ژ هاواری ره دیار یکی ژ  
 پیروز ناما حامد فرج ، مز نتر ، بقدر وهژا تو بشینه .

دیاریا حامد فرج دیار بکه ولی به کو ب  
 کرینی نایه کرین ، ب داخوازی ناکفت دست . او  
 تشتیکی بهابه کو ژ فین و ژ خرنی و دلپاوریا کر  
 دانییا حامد زابه .

حامد فرج هر چند ب فین و دلپاوره او چند  
 ب هس و ژیره ژی . حامد دخوازه و رند دزانه چی  
 دخوازه و ژیره چی دفت .

هری ژمره شیر نهن قنج و بها دده . ژ مه هیفی



## پيروز نامه

برای گفروه و خوشه ویست میرجلادت عالی بدرخان!  
له پاش دست گوشین . ده میک بو چاوروایی  
ستاره به کی گه لایوژی کوردمان د کرد .  
تا کودوینی به چاوی خومان دی مان که نه ویش  
کوفاری (هاوار) . که چاوی همو کوردیکی  
رون کرده وه ، هیوامان وایه کو به تینی پریشکی  
گش کوردستان روناک کانه وه و همو کوردیک  
به ده م نه م هاواراه وه بچی تابکه وینه سر  
ریگای راست و بو به کیه تی کوردان  
هه و ل بده یین .

بو ناوی گش لایوچی کوردی عراقه وه  
پیروزی (هاوار) تان پیشکه ش ده که م .  
رجانه که یین له مه ودوا هه ول بدهن بو  
توحید لهجات تاو کو همو کوردی وک بهک  
استفاده له (هاوار) تان بکن . آماده یین بو هه  
مو خدمتکاریتان . ایتر یاریده ودوایی (هاوار)  
تان له یزدان طلب ده که یین . . . . .

### مامه فرج

دشری زمانان ده . رحی زمانان تین ستاندن .  
خرتیا دل و جانین وان تین شکیناندن .  
زمانین کول هف دخن ، دست بکشتنا پرسین  
هف دکن ، دل دکن ، هرچندهیه اوچند بکفن  
هندری زمانین دن ، تیده جه یین ، هیدی هیدی  
بکفن کوربین وی زمانی و د پاشیپی ده چار

نکارین وی بگرن ، اوی ژهیم و رکینن خوه هلوه  
شینن و سر خرابیین وی بنیانکه نو آفابکن و تیده  
ذناف وی آفا هییا نوژن ده پیروسکن .

هرچند زمانی مه نه کسه ژی بن وی نالو کیی  
هکه ام مقانه مین دی بکفه .

بری اولی گلک پرسین بیانی هنه کو کتنه  
ناف زمانی مه ، بیشتره گلک کرد زمانی خوه ژبیر  
کر نه ، پی نکارن بخوینن ، بنفیسینن .  
اف حلال پاشییا هفخستنا زمانانه .

ما زمانی مه نه سپه یه ؟ ما کرد خوه نندن و  
نفسیساندانی ترانن ؟ ماژبو هر آشتی ناف و پرسکه  
کردی نینه ؟ چاوان نینه ۱۱ .

بلی هیه . لی بلی کرد و زمانی مه د هفخستنا  
زمانان ده مه هتک کیم کر به .

گلک کرد هنه ، ژ زارین خوه ره پرسنن  
بیانی تیکل دکن . حچی هولی چیدکن خوه  
دقیزن بن حکما زمانین بیانیان .

کرد حالی شری رند دزانن . دژمن ب دربکی  
پریشان نابه . د هفخستنا زمانان ده ژی هولی به .

هر پرس کوزککه و هر پرساکو ام پی  
عمل ناکن ژ زمانی مه د کفه و وندا دبه ، ال  
شونا وی پرسکه بیانی تی و د کفه ، و ولی  
کوزکک ژ دستي مه دجه . ب پیقه چونا وی  
حالی کوزکک ب بیک ژ دستي مه درنن ،  
و پاشی ، ب تقایی ، ام شار کها خوه و ندادکن .  
یانی زمانی مه دبه وک مروکی بریندار ، نخو هش

## لاڙه لاق

مخزان مالي ، مخزان پرده ،  
جهي نه گس ، جي آرده .  
مب آوازي ، ته نا دنگا  
ت خلقاندي ، نه کر آقا .

ت همدردی ، ت هم دارو  
ت کر مهرو ، ت کر شفو .  
ت ناخانا ، ت نا خرده ،  
ت داڙی دلان پرده .

\*\*\*

يارب ت هيبي ، ت رحم ونوري ،  
ت دستي ت حسن وشوري .  
ت رحمي ، ت افسري ملابي ،  
گنجينه بي تف ، شه و گدايي .  
يارب ت ئي ت ، ت شاهي دوران  
تختي ته ل سر سترو ازمان .  
تختي نه سر افسرين شهانه  
بژنانه ژ چاڻي من نهانه .

ديلي بي بفلتين .

هيه کومروڻ ڙخوه پيرسه ، ماچمان خوه دي  
ملتان يارين هف دکه ؟ جهاباوي پرسیاري  
هيساني به .

لوما کو ڙ قانونين خوه دي يك ڙي شر ، قرين  
وڻچونه . خوه دي دخوازه ئي خورت ئي باقل ،

سر چند شهان ت بويي خنکار  
لورا ند کر نوکس ڙي انکار .  
يارب ت هيبي ت پادشاهي  
ت مرهما هر برين و آهي ،  
بخشنده ت ئي ، لي درد مندم ،  
سر فرشي مام و ڙار و بندم .

دکتور کامران عالي برر خان

ئ زانا ، ئي کير هاتي د دني ده بينه و هفسار اوي بيخه  
دستين خوه .

هر دما ڙينامه ، هر هلهلکامه ، هر کافا  
خباتامه شر که . نه تي ام ، چاروا و گياڙي دشر  
دهفخستني دهنه . ڙبين وما بينامه ، تني ب خبات و  
ب هفخستني به . بي کو خوه ڙ خبات و شري دده  
پاش د کفه چالي د کفه گورن امرني .

زمان ڙي وک هر آشت ل هف دخن ، تقباوان  
نينه . دشري دهنه ، ڙبر کو هر زمان دل دکه  
مزتر پيه ، هاوير دورين خوه فکه ، بکفه ليفين نو ،  
سرين نو . آف يك . ڙوپيه زمان دخوازن ،  
زمانين دن بکڙن و بکڙن شونا وان . ديروکا  
دني ڙمره دده زانين کو حتانهو گلک زمانين دني  
هاته کشتن . ڙوان زمانان ره ( زمانين مري )  
ديڙن .

پڻچون وهفخستا زمانان کره کر وي دنکه .  
بلي آف شر ، بي دنکه بي نوپ و تفنگ ، بي  
بالا فر و مترايو زه . لي بلي حکماوي ڙهر شري يتر  
مزتر و خرابتره .

# هاوار

کوملا کردي

## د دورا هفتستا زمانان ده

بوشبونا بایي ، بارینا بارانی ، هانتا برفی ، حی ب  
قانونین خوه دی دقومن .

ت کس لسر قانونین خوه دی نه خوینی بی  
حکمه . قانونین جفا کی لسر جفات و ملتان  
خوه دان حکمن . أف قانونین هاء د کارن بگهیرن ،  
بکشن شکلکی دن . ژبر کو خوه دی ب گهیرنا  
وان فرمان کر به . ب فی گهیرنی جفات و ملتان  
پشفه دچن ، دکلن .

دیرو کا دنی رابری مه دکه کو گلاک ملت  
کتبون دیلی بی .

ب سدان سالان فه تیده مابون . پپشده ترب خبات ،  
ب جامیری ، ب زایننی اوملتین ها ، خوه ژ دیلی  
فکرن ، ژین نیری بندستی بی رابون ، خوه آزا کرن  
وبون سرخوه .

ماکی هیه کو نزانه ؛ خوه دی حسن چره  
آفراننده ؛ خوه دی او آفراننده ژبونا کو دل نه  
دکر ، توملت ، نه یک ژی ، خلا مییتیا ملتی دن بکه .  
خوه دی حسن آفراند ژبونا کو ملتین دیل ، بی  
قلم ، تفنگ و شور چیکن و خوه ژ بندستی بی نیری

گکفا خوه دی دینی آفراند و او آفا کر ژیره  
انتظام دا . ژلورا کو بی انتظام توتشت نا گه ،  
نامیشه ، ت جار نکاره حتا پاشی بی مینه .

هر تشین دنی د دستین قانونین خوه دی ده  
نه . ت تشت نکاره خوه ژ فرمانین قانونان دور  
یخه ، ژ ی بقلته . هر تشت بندستی وی به .

انتظام ژ نظامی در د کفه و نظام ژ قانونی .  
قانون او تشته کو ، بسمت ، ب ری ، ب  
جه و راسته . خوه هر جار نا گهیره ، لسر سکنی به .  
هر و کی رابو به ، ولیژی پشفه دچه ، هر آشتو  
آواین وی آبادین .

قانون د تخلین . آپیشین ، اوه کو ژ میژفه ،  
ژ بریقه ، ژ بر خوه دی فه هاتیه دانین ؛ یانی دانی بی  
وی خوه دی به . آ دن اوه کو ، زسر و مزی بی  
مروفان ، ژ هس و ژ پینا وان ژ دیروک و ریز کین  
وان تینه بی . أف قانونین ها قانونین جفا کی نه .  
دقی دنیایی ده ، ژ این و مرن ، جوانی و پیری  
رابون و کتن ، هر تشت ب حکما قانونان چیدین .  
بهار و هافین ، پایزو ژستان ، روزو شف ،

زكوة غراف ومطبقة  
**أبو نبيح الخواك (ابن مشوق)**

حفر جميع المعادن والصور الملونة واللوحات الخاوية  
 طبع بطانات وادبيات بحروف نادرة على الطراز الحديث

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب

**أحمد نافذ**

اختصاص في الأمراض الداخلية والزهرية والأطفال

عرنوس

دمشق

الطبيب

**محمد خضيب**

الافتقار في الجراح وأمراضه الكبدية ومرضها

صالحية

دمشق

اشتراكات مجموعة هاوار

|                       |  |
|-----------------------|--|
| وفي غير هذه الأقطار   | في سورية و تركيا والعراق و بلاد العجم و بلاد القفقاس |
| عن سنة واحدة ١٥٠ فرنك | عن سنة واحدة ٥٠٠ غروش سوري - ١٠٠ فرنك                |
| عن ستة شهور ٩٠ فرنك   | عن ستة شهور ٣٠٠ غروش سوري - ٦٠ فرنك                  |
| عن اربعة شهور ٦٠ فرنك | عن اربعة شهور ٢٠٠ غروش سوري - ٤٠ فرنك                |

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد

سال ۱

—\*—\*—

پار شنب

# هاوار

بی

## کوملا کردي

### تیدة خستین کومهلی

هزمار ۳

—\*—\*—

۱۵ هزماران ۱۹۳۲

|                      |                       |
|----------------------|-----------------------|
| دكتور ك . ع . بدرخان | هفخستنا زمانان        |
| دكتور ا . نافذ       | کنجکابژیشکی           |
| حامد فرج             | پیروزنامه             |
| قدری جان             | سلیمان بدرخان         |
| ج . ع . بدرخان       | دبستان                |
| “ “                  | الفاییا کردي          |
| “ “                  | ب هینجتا پیروزنامه کی |
| “ “                  | فرهنگوک               |
| دكتور ك . ع . بدرخان | ماچمان دچی            |
| “ “                  | لاؤه لاف              |
| ج . ع . بدرخان       | شقاوه خویش            |

م ۱۹۳۲

مطبعة الترفی بدمشق

ه ۱۳۵۱

SAY 1  
YEQSEMİR

# HAWAR

HEJMAR 4

3 Temeç 1932

## Qomela Qurdi \* Revue Kurde

### Çedewizliyen Qomela

|                   |                     |
|-------------------|---------------------|
| Per tevna meblûre | C. A. Bedir-Xan     |
| Haci Kadire Qayı  | Herinde Sor         |
| Lawiqe win        | Dr. Q. A. Bedir-Xan |
| Ellabeya Qurdi    | C. A. Bedir-Xan     |
| Ferhengog         | " " "               |
| Yeq bûn û yeqlî   | Dr. Q. A. Bedir-Xan |
| Wisyar bibin      | H. Kadire Qayı      |
| Gotina welat      | Cegerxwîn           |
| Zêri Qubare       | " " "               |

### Bire Frenzi

|                       |                 |
|-----------------------|-----------------|
| Textes et Traductions | D. A. Bedir-Xan |
| L'Alphabet Kurde      | " " "           |
| Folklore Kurde        | " " "           |

çapxana terexî

SAM — 1932



## Qomela Qurdî \* Revue Kurde

Çiroq :

## Ber Teyna Mehfûrê

Rindê û Zizê, xwehên hev û ji bavê xwe sêwî bûn.

Bavê wan Bengî axa, digel brayê wan ê mezin Zinar û bi çend pismamên xwe ve di wextê Şex Seidê rehmetî, di şerê serxwebûna Qurdistanê de ji bona welat û miletê xwe di meydana rûmetê de qetî bû.

Rindê sêzdeh û Zizê panzdeh saltî bû. Brayê wan ê qîçîq Gefo hej nû qetî bû nehên.

Şerê serxwebûnê ji heşt mehan bêtir ajotî bû. Esqerê qurdan bi ser Dîyar-beqrê de girtî bûn, qetî bûn nav Xarpûtê û bajarên Qu distanê ên din.

Ji her qo tifaka wan ne yeq bû, mîrovên wan ên xwenda, qo biqarîn qarên serxwebûnê bigerînin, qem bûn, û ji hêleqe din ji di çend deran de hêbextî hatî bû qirin, serxwebûn ne çû serî û tirqan ji nû ve Qurdîstana haqurî vegirtin. Sereq, Şex û mezinên qurdan bi dar ve qirin, jin û zarowên wan, bi hezaran quştin, malên wan zemtî qirin.

Di vê navê de mal û gundê Bengî axa ji talan qirin û jin û zarowên wî birçî û tazi hîştin.

Xelqê mala Bengî axa êdin niqarî bûn, di cîhê xwê, di gundê pêşiyên xwe de rûnin.

Dêya wâtî, jîhîqege jêhatî, qeçeba-veq, zarowên xwe da bû hev û guhastî bû bajareqî qîçîq, li cîhêqî welê qo tuqes ew nas ne diqirin.

Dê ji sibê heta evarê di mala xelqî de dixebitî, bişev gore diristin û dîsan qara wê bi qoteqî tîra debara wan diqir. Lê diviya bû çend pere ji bidin aliqî û ji bona xwendina Gefo bicivînin.

Ma Bengî axa ne wesandî bû qo bila Gefo bixwîne, mezin bibê, evdîna bav û welatîyên xwe veqê û di rêya felata welatê xwe de bixebite.

Ji xwendinê re dirîhav diviya bû.

Dê xwe dişidand. Hêj zêde dixebitî, lê listeq bi ser de nedixist.

Ji bona aninciha wesiyeta mêrê xwe kerara xwe da û her du qeçên xwe existin xebatê.

Di wî bajari de mehfûran çêdiqirin. Qeçîqan di wextê xwestiyê de bi çêqirina mehfûran mijûl dibûn, pê dileyistin. Ji lewra geleş ne ajot ji her dûwan re xebat hate ditin. Her rûj subehtî xelqê mala Bengî axa qat dibûn û her yeq diçû bi aliqî ve.

Dê mala xelqî, qeçîq fevanê û lawîq dibîstânê.

Geleş ne hortî zivîstana welatê jortî bi ser de hat.

Cilên wan teniq û qevn bûn, li wan sar bû. Zizê çend çaran nexwes qetî.

Lê diviya bû li ber her tiştî rawestî û bixebitî, da qo wesiyeta Bengî axa li erdê mehlîlî û bîniyê cîb.

Qetî bûn çileya zivîstânê. Dîhat bihtîstin, filan duhtî bi şev bi rêve keşîliye.

Qûçe û qolanên bajêr bi berfê dagirtî bûn. Çend bân ji girantiya berfê hilveşîya bûn.

Tevna qo Rindê û Zizê li ser dixebitî di hôleqê de vegirtî bû. Banê holê



## *Yeqlên û Yeqitiya Qurdi*

Ev Lor û Bextiyarî Baban ;  
 Qurdmanç û Hevremen û zazan ;  
 Qurdên . ji welatê Rom û Sorî ,  
 Qurdên Ecem û Irak û Sûrî ,  
 Qurdên ji welatê jor û jêrtin ;  
 Serçav bilind û zexm û nêrin ;  
 Qurdên ji Blûc û Qurdên Efgan ,  
 D' hevî de yeq in û yeq di raman ,  
 Yebbext in hemû , ne bextiyar in ,  
 Ser erd û diwê , liyan û jar in .

\*\*\*

Zerdeşt bû melayê qevnê qurda' ,  
 Kanon bû çiraya zendavesta' ,  
 Ew felsefeya kedim û pir nûr ,  
 Zendi , zmanê qevn û meshûr ;  
 Zerdeşt û çiraya zivê Zerdeşt ;  
 Ruhnî ew e , ser çiyân û ser deşt .  
 Her qat ji qitêba Zendavesta ,  
 Pêteq bû li dil , garî di desta ,

\*\*\*

Ristem ji me ye û şah Nadir ,  
 Siltan selahedinê denggir ,

Xani û Melayê Bate , Teyran ;  
 Gî qurd in hemû , ji xwîna qurda' .  
 Nabt ji me ye , û Şêx Ehmed ;  
 Himê me ye Zend û dewleta Med .  
 Agrî , Sine , Wan û Mûş û Zilan ,  
 Qanî ne , ji wan vejine xortan .  
 Sini , Elewî û Eyzedi çi ???  
 Em bûne xulam û mane birçî !!!  
 Qurd in , ne cuda ji dar û ra ne ,  
 Bin destê Xwedê û yeq xwedan e ,  
 Qurd in hemû em , ji yeq nihad in ,  
 Têv dad û qerem û paq nihad in .  
 Bextên me yeq in , ne sê ne çar in ,  
 Em Qurd in û tev bira û yar in .

\*\*\*

Agrî , Sine , Wan û Mûş û Zilan ,  
 Qanî ne ji wan vejine xortan  
 Sini , Elewî û Eyzedi çi ???  
 Em bûne xulam û mane birçî !!!

Bêrût : 23 Gulam 1929

*Dr. Zamiran Ali Bedir-Xan*

Kulêr û ptoqên quleqên wê şiqestî bûn .

Rûjê her du xweh liber tar û po-  
 wên tevnê rûniştî , hepo lédixistin .  
 Her du jî , ji sermayê direciftin , dranên  
 wan diriqriqîn , gûmîqên Zizê keristî bûn .  
 hepo ji destê wê qet û du bêstîrên germ  
 pêve çûn . Nema diqarî bû ber êşa ser-  
 mayê biseqîne . Bî dengê xwe ê ziz gote  
 Rindê :

— Rindê , xwehê l ma êdin ne bes e ?  
 Tu nabînt qo em her du jî kefilîne . Dê  
 rabe em herin mal , biqevîn nav cihan  
 û canên xwe bigerminin .

Rindê zûda pê hesiya bû , lê xwe  
 berder ne diqir . Disan ji xwe re bû  
 xweyî , ne da ber sistiyê , tinê xweha xwe

da himêza xwe , guvaşt û maç qir .

\* \* \*

Rindê ji Zizê bi du salan mezintir  
 bû . Lê di wê çaxê de ev du sal hing  
 pênc salan heja bûn . Rindê ji dêya xwe  
 bêtir pê mijûl dibû û ew bi xwedî diqir .

Zizê hêdî hêdî digiri lê nedinalî .  
 Rindê destên xweha xwe di nav yên xwe  
 de diguvaştin û dixebitî pê bigermîne .  
 Piştî gaveqê xweha xwe rûnand rex xwe  
 û jê re got :

— Ma Zizê tu uizant qo xebata me  
 ji bona Gefo ye . Ji bona xwendina Gefo ye .

— Belê Rindê çawan nizanîm , wer  
 ne bûwa qengê dêya me em didan xebatê .

— Ne xwe çire digiri ?

— Tu nabînt êdin nagirîm , lê tîstêq

heye, ma dinya tev ne zivistan e, buhar û havina wê ji heye. Bila Gefo li havinê bixwîne û li zivistanê tevda li malê rûnîn, ma nabe?

— Dibe Zîzê, lê bavê me wesandiye qo bila Gefo zana bibe, bizane rêziqa dinyayê bigertne. Ji bona wê ji xwendina havinê têr naqe, divê li zivistanê ji bixwîne. Da qo zana bibe.

— Ma çîre Rindê, ewende bixwîne. Bila kasê qeqê me Zinar bixwîne nebes e? Zana bûn ji, ji bona çî?

— Ji bona welêt Zîzê. Heqe qeqê me Zinar kene xwendî bûwa rûja qo esqerê qurdan bi ser Diyarbeqerê de girti bûn ne dihişt qo esqer bibin çend bir û heria bajarên din û di dora Diyarbeqerê de qem bibin. Lê bi êrişqê Diyarbeqerê distand û mesele safî diqir. Dibêjin qo vê xeberê dijmînan bi xwe gotine. Te niho seh qir.

— Belê. Gefo bixwîne û welêt

— û welêt bifilitîne, welat bi xebata miroven xwenda xelas dibe.

— Qo xelas bû, dê bibe çî?

— Dê bibe bi serê xwe.

— Qo bû bi serê xwe?

\*\*\*

i wê demê de serhoste qo tirqeq bû li wan dabori û gali, dijmînan li wan qir û got: «yinemi lakirdi Kurd piçleri...»

Qeqiqan bi tirqî nizanî bûn. Lê ji awayê gotina wî seh diqirin qo xeberan li wan dide. Qeqiqên din qo di holê de dixebitin bajari û hemî ji qem û zêde bi tirqî dizanî bûn û pê xwe diparastin.

Tinê Rindê û Zîzê, qo bi tirqî nizanî bûn diqetin ber çavên serhoste. Serhoste digot: «Disan galgal ne! pincên qurd...»

Ev ne cara pêşî bû. Lê Rindê û Zîzê niqari bûn hîn bibin. Her car weq cara pêşî berdiqetin. Lê deug nediqirin. Dêya wan ji wan re goti bû, xwe ragirin, deyn meqin, heta qo em bigelîn miraza

xwe. Gefo bidin xwendin.

\* \* \*

Qo serhoste dût qet, Rindê gotina xwe pêş ve ajot:

— Qo Qurdistan bi serê xwe bû, hingi her tiştên we!atê me, ji me dibin. Ev serhoste ji ji qurdan tete bijartin û pirsra qurd ne weq inû pirsra dijûnê lê pirsra pesnê dê bibe. Ne tinê serhoste, lê ji haqiman heta puleyan hemî, ji me, ji miletê me dê bibin. Wê gavê ev zmanê qo em pê daxêvin û ji me re şîrin e di ber derê de hête gotin û bibistin. Inû em di zivariyê de ne, malên me ji destê me hatine standin. Çîre? — Ji ber qo em qurd in û dewleta qurdan nîne.

Bavên me, brayên me, pismamên me bi dar ve qirin. Hemî, ji hêxweyîti. Lê gava qo em bûne serxwe, hingi qurdan ji me re hekê jiyinê dê bide. Ji bona standina wî hekê ji me re brayên xwenda divêt.

Welatê me xweyiye zarowên xwenda bûwa beta niho, bi serê xwe dibû û bav û brayên me nedihatî quştin em ji nediqetin vî half, serhoste ji xeberan li me nedida. Niho qet serê te qo ez û tu em dixebitin, yeqî ji wan mirovan bixweyt biqin. Ew ji brayê me ê qiqiq Gefo ye.

\*\*\*

Zîzê dengê xwe birt bû. Ne digirt, ne ji tiştê digot. Dest avêti bû hepowê xwe û dixebiti. Hepowê xwe wer dişuxiland qo tiliyên wê ji gumiqên xwe key agir vedimistin.

Tinê di vegerê de ji Rindê re kewitt qiri bû qo ji dêya xwe re tiştêqî mebejît.

\*\*\*

Sibetir dinya hej sartir bû, Rindê û Zîzê qû bûn xebata xwe. Heta hingorê ji xebiti bûn.

Gava vegeriyaan hatin mal û rûjanîya xwe dan dêya xwe, dê dit qo Zîzê wê rûjê ji xweha xwe kemertiyeq û niv bêtir ant bû. Berê jê qemtir diani. Dê ecebmayt

## ELfabêya Qurdi

## 4

Di hin deran de ev (w) yên ha bi (y) re xwe diguhêrinin:

Vê parsûyê parsûya stîr  
Vî çiloyî çiloyê ter

Gelo bi çi awayî ev du hêrfên ha pev diguhêrin?

Bireqî qîçiq ji qurdmancan — herweqî xelqê Botan — dengdêra (û) zîav dixwinin, yanî ne weq almanan lê weq Fransîzan bilêv diqîn.

Ev qurdmancên ha dengdêra (o) ji weq (û) wa adetî — qo di Fransîziyê de bi (ou) têt nîşan qirin — dixwinin. Bi vê ferka qo di bilêvqirina wan de hergav meylariyêq ber bi (o) ve heye.

Ev qurdên ha qo van du dengdêran nertî dixwinin ji bona hevghîndina van dengdêran bi dengdêrên din — herweqî bi (ê, î, a) têt çêqirî — li şûna (w) (y) qê ditînin. (dûmattîq heye)

### Ji Zîzê pîrsî. Êwê got:

— Dadê hela niho min rind nîzant bû em çîte dixebîtin. Rindê kenc da min seh qirin û qet serê min, û frû min ji Zîzê (150) girê bêkir girêdan.

— Zîzê ji te re çi got?

— Jê bipirse dadê, ez weq wê nîzanim rind bibêjim.

Rindê û Gelo ji, xwe gîhandî bûn wan. Rindê dest bi gotinê qir lê niqari bû bikedine, çavên wê hêstir diqirin. Dê ji digiri.

Di guheqî mezêlê de piştencera Bengî axa hilavisti bû. Jû pêve di destên wan de tu tîstê wî ne ma bû.

Ji xwe re qîrî bûn adet, di demên tengî û zîziyê de ew ziyaret diqirin.

Her çaran berên xwe dan xencerê û qetin himêzên hev.

Berûn: 5 Çirîya-Berî 1927

ÇelaDet Uli Bedir-Xan

## FERHENGOG

(Zerdeşt)

Berê qurd zerdeştî bûn. Zerdeşt pêxemberê wan bû. Ehmedê-Xanî qo pê dizant bû, di (Zîno-Mem) de bi heyta jêrin ve li zerdestibûna qurdan îşaret diqît û dibêjît

« Malê xwê ji rengê kewmî-Zerdeşt  
Dîr agir û gazîya xwe rahîst. »

*Ehmedê-Xanî*

(Zendavesta)

Weq her pêxember Zerdeşt ji xwedan qitêb bû. Zendavesta navê qitêba wî ye.

(Zendi)

Zmaneqî qevnê e. Zmanê me, zmanê qurdi jê hatiye girtin, yanî eslê zmanê me zendî ye. Zendavesta bi zmanê zendî hatiye nivîsandin.

(Qat)

Di qitêba Zerdeşt de lajê an stranin hene. Ji wan re qat têt gotin. Qatên Zerdeşt.

(Gûmiq)

Seriyên tiliyatt, nermiqên tiliyan.

(Tar û Fo)

Benên tevnê; yên drêjahi û pehnahi.

(Hepo)

Şehê hesintn. Pê girên mehfûran têt şidandin.

(Zivart)

Belengaziya mirovên mezin û dewlemend

(Hingûr)

Pîştê êvarê, destpêqa şevê.

« Şevê tari ji hingûrê qîş e. »

(Med)

Miletêqî qevnê e. Miletêqî arîniyad e. Med medeniyeteqê mezin antne pê. Qurd ji medan dahatine, qurd zarowên medan in.

(Afirandin)

Antnê pê, antnê wicûdê, xulikandin. Xwedê erd û ezman û mirov afirandin.

« Xwedê afirandin ji bo wî feleq  
Ji bo xîdmeta wî şîhandin meleq. »

*Ehmedê-Xanî*

TAXES ET TRADUCTIONS

## Zerî Qubarê

Conformément à notre programme de travail, publié dans notre premier numéro, nous commençons, à partir d'aujourd'hui à donner des textes Kurdes suivis d'une traduction littérale.

Ces textes auront d'une part un caractère instructif pour ceux qui désirent avoir une idée de la langue Kurde. d'autre part ils complètent nos articles publiés dans la rubrique des «Notices sur la littérature, moeurs et coutumes Kurdes».

Nous commençons par un (lawîq) intitulé «Zerî Qubarê».

Cette petite chanson m'a été chantée par un (denghej) de (Pencinan). Je la publie telle qu'elle m'a été chantée sans toucher à un seul mot.

Comme nous l'avons déjà dit toutes nos traductions seront littérales. Mais pour des expressions qui ne sont pas familières à la langue française nous donnerons des explications hors texte. De même que nous reproduirons par fois les lettres qui ont été remplacées par des apostrophes pour des abréviations qui exigent le chant ou le dialecte de certaines régions.

Nous devons rappeler à nos lecteurs que les termes comme (stran, lawîq) qui ont été déjà expliqués dans nos articles traitant du folklore Kurde n'ont pas besoin d'être réexpliqués une seconde fois.

— 1 —

Were lê lêl Zerî Qubarê  
Zerî Qubarê  
Minê Zerî Qubara xwe diti bû  
Li pala Kubê  
Ser qeçiqê xwedan iman û çavreşê  
Sto bî ribê  
Xwedê rebê alemê  
Mirazê' dost u guhdaran biqira  
Ya min û bejra zrav ji  
Li serê sibê

— 2 —

Lê lêl buhar bû , çaxa  
Qonan û vegirtinê  
Zerî Qubara min nesax bu  
Li ber mirinê  
Heqe malê' gundi û cirana ne biya  
Sereqî bidim ê

— 3 —

Lê lêl Zerî Qubar , te ez xapandim  
Te ez qir, me destmaleq  
Ser destê' xortê' Omeriyan, te ez gerandim  
Te ez qir' me teleq, ji telê' tenbûrê  
Dame destên nezanan, te ez şiqandim  
Lê lêl Zerî Qubarê  
Zerî Qubarê

— 4 —

Lê lêl buhar bû , çaxa  
Qonan û vegirtinê  
Zerî Qubara min nesax bû  
Li ber mirinê  
Ezê malê' gundi û ciranan  
Hewes naqim  
Sereqî bidim ê  
Lê lêl Zerî Qubarê  
Zerî Qubarê  
Te ez xapandim, Te ez şiqandim,

## TRADUCTION

— 1 —

O viens gracieuse blonde,  
J'avais vu ma gracieuse blonde,  
Sur le flanc de la coupole[1]  
Pour la fille, plaine de foie[2]  
Aux yeux noirs; collier au cou.  
Dieu souverain du monde,  
Veuille accomplir les vœux des amis  
et des assistants.  
Le mien et celui de la belle à la  
taille fine;  
De bon matin

[1] Les maison de certaines contrées Kurdes sont surmoutées de coupoles, autour des quelles s'assoient, les femmes Kurdes pour tricoter des bas en causant et encontemplant la nature.

(2) Veut dire chaste et pieuse.

Notices sur la littérature  
mœurs et coutumes Kurdes

4

### Le Folklore Kurde

(Dengbêj - Çîroq bêj - Sazbend - Blûrvan)

Les deux premiers forment une classe distincte. Les ( mir ) ( beg ) et ( axa ) ont ou plutôt avaient toujours une suite de chansonniers et narrateurs qui jouissaient de certains privilèges, avaient des maisons données par leurs maîtres et vivaient aux frais de ceux-ci.

Le ( dengbêj ) c'est l'artiste et il se distingue par son art. Au cours des réunions les ( dengbêj ) et «stranvan» de première classe, pour montrer qu'ils possèdent un grand répertoire, ne chantent que les quelques premiers vers d'une chanson et passent aussitôt à une autre. Et quelques fois ces réunions continuent pendant des heures et les «dengbêj» ne cessent pas de chanter.

Les «çîroqbêj» se classent après les «dengbêj». La plupart savent chanter, mais des chansons simples ou quelques passages versifiés des «çîroq» et «çîrçîroq».

Les véritables dengbêj ne chantent que des lawîq et des şer. Ils ne chantent jamais des diloq qu'ils considèrent comme trop légers pour leur dignité.

Parmi les dengbêj on trouve des imp-

—2—

O! C'est le printemps,  
C'est l'époque des tentes et de leur  
dressement (1)  
Ma gracieuse blonde était malade,  
Près de la mort.  
Si la maison des villageois et des voi-  
sins n'y étaient pas, j'y serai allé.

—3—

O gracieuse blonde tu m'as trompé,  
Tu a fais de moi un mouchoir;  
Que tu a fais agiter entre les mains  
des jeunes gens «Omerî» (2)

(1) Veut dire l'époque où se dresse  
les tentes.

(2) Les jeunes gens de la tribu Omerî  
sont connus pour leur agilité dans  
la danse.

rovisateurs qui font des vers à l'improviste  
en les chantant. Les dengbêj de cette classe  
quelquefois chantent en concourant jusqu'à ce  
que l'un se déclare vaincu et se retire.

Mitirb — Les mitirb sont les tzigane  
danseurs et musiciens. Ils dansent des danses  
professionnelles, ils jouent de la musique et  
chantent les dîloq, chansons de danses. Tous  
les mitirb de Kurdistan sont de la même  
tribu. Tous sont de zengene[1]. Ils quittent  
leur pays et ils vont s'installer par groupe  
parmi les différentes tribus Kurdes. Ils sont  
nomades, ils emportent leurs tentes avec eux,  
et ils ont des chevaux et des ânes qu'ils mon-  
tent et qui transportent leurs effets. Les  
mitirb sont une classe spéciale et leur métier  
ne leur procure pas d'honneur.

Sazbend — Les sazband sont les musiciens  
artistes, qui sont spécialisés dans la  
musique instrumentale. Ils accompagnent les  
dengbêj et chantent aussi s'accompagnant  
de leurs instruments.

Blûrvan — Les blûrvan sont les flûtes,  
les musiciens les plus appréciés et les plus  
répandus. En dehors de ceux qui se sont spé-  
cialisés dans le flûtisme, tous les bergers sont

[1] Les mots Kurdes Zengene et Cengene  
et les mots Zigeuner et Tzigane qui ont les  
mêmes significations semblent aussi avoir la  
même origine.

Tu lis de moi une corde de guitare  
Que tu laissas entre les mains des  
maladroits (débutant)  
Tu m'a brisé  
O gracieuse blonde, gracieuse blonde!

—4—

O! c'est le printemps,  
C'est l'époque des tentes et de leur  
dressement  
Ma gracieuse blonde était malade,  
Près de la mort.  
Si je ne prenais pas garde des mais-  
ons des villageois et des voisins;  
J'y, serai allé.  
O! gracieuse blonde, gracieuse blonde!  
Tu m'as trompé, tu m'a brisé.

des Illustres. Quelquefois, parmi eux on trouve des gens doués d'un grand talent musical. On raconte plusieurs anecdotes et légendes sur l'effet magique qu'ils tirent de leurs flûtes. Un d'entre eux qui était au service de l'Emir de Botan pour montrer l'influence de sa flûte, même sur les animaux, fit la chose suivante :

Après avoir conduit son troupeau durant plusieurs jours à travers une région dépourvue d'eau, il lui a donné du sel et le dirigea vers l'eau. A peine le troupeau arrivé auprès de l'eau, le berger commença à chanter une mélodie qui fit arrêter et même revenir vers lui le troupeau (1)

\*\*\*

Après ce petit exposé concernant le folklore Kurde nous nous efforcerons de donner quelques exemples sur les différents genres de la littérature populaire.

Nous commencerons par les légendes et les contes.

Il y a des légendes et des contes communes à tous les Kurdes et des légendes régionales.

Parmi les légendes et contes communs on peut citer ceux-ci: Memê-Alan, Rostomê-Qurd, Siyabend, Benevşa - Narîn, Dêrsim, Delal, Bêmal, Xezal.

Nous choisissons, parmi ceux-ci le Memê-Alan qui est le plus intéressant et dont nous donnons une traduction résumée.

### MEMÊ-ALAN

C'est la légende la plus célèbre et la plus répandue chez les Kurdes. Elle compte différentes variantes, soit dans le dialecte du nord, soit dans celui du sud. Elle existe aussi chez les Kurdes parlant le dialecte du Nord-

(1) Le métier de berger au Kurdistan n'est pas celui d'un domestique.

Il est considéré comme un métier d'arme et le métier de l'homme libre. Et le berger est fier de son métier. Le berger de Kurdistan se trouve nuit et jour dans les montagnes seul n'ayant que son fusil et son chien pour se défendre; il risque d'être attaqué à chaque instant, par des bêtes féroces et des bandits, et cela arrive souvent. Ainsi que le démontre les chansons des aventures des bergers.

Ouest, Dumilî. Mais comme toutes les chansons et légendes de ces derniers sont en Qurdmançî et les dumilî sont très mêlés avec les Qurdmançî, parmi eux on ne trouve aucune variante spéciale.

Comme la légende a son origine dans le nord la plupart de ses variantes sont du dialecte de cette région.

Dans le cours de la légende on trouve beaucoup de moeurs et coutumes Kurdes qui ont presque disparu aujourd'hui.

En outre on y trouve, des règles de la vie sociale, quelques données sur la réglementation du droit de la propriété et différentes autres choses.

Le sujet de la légende est une aventure d'amour à la cour de l'Emir de Botan. (1)

Presque tous les dengbêj connaissent quelques épisodes de Memê-Alan.

De nos jours ceux qui la connaissent en entier deviennent rares, surtout depuis que la république turque a interdit de parler et de chanter en Kurde. Au nord les dengbêj ont commencé à disparaître pour assurer leurs existences par d'autres moyens.

D'ordinaire on fait le récit de la légende en la chantant, sur une mélodie qui varie suivant les passages.

Quoique chantée Memê-Alan n'est pas entièrement en vers, mais en grande partie en prose rimée.

Cependant les parties les plus caractéristiques sont en vers et ce sont elles qui sont connues et chantées par tous les dengbêj.

Depuis longtemps je me suis attaché à étudier Memê-Alan.

A ce que je connaissais comme simple auditeur j'ai ajouté de nouveaux éléments que j'ai recueillis des sources suivantes:

1.— Différentes chansons de la légende chantées par les dengbêj ne la connaissant qu'en partie.

2.— Récits abrégés du sujet, entier ou

(1) Ehedê-Xanî poète national Kurde, a emprunté à cette légende le sujet son oeuvre intitulée Memo-Zîn noms du héros et de l'héroïne. Xanî pour différentes raisons n'a pas voulu rester fidèle à la narration populaire et a introduit plusieurs modifications au sujet original.

# L'ALPHABET KURDE

## 4

### LES VOYELLES

Comme nous l'avons déjà mentionné, la durée du son des voyelles Kurdes est stable (invariable) elles sont très distinctement brèves ou longues, comme dans l'ancien grec (makra) et (braxéa), mais il n'existe pas de (dixrona).

Les voyelles brèves sont: e, i, u.

Les voyelles longues sont: a, é, î, o, û.

A, O. — Ces deux voyelles se prononcent dans la langue Kurde comme en français, mais elles sont toujours longues. En effet elles ne se prononcent jamais brèves comme les (a) et les (o) des mots français (lanfaron, tapis, mobile.)

Voici quelques exemples de mots Kurdes contenant des (a) et des (o):

A. — çaq, dar, paq, bar.

O. — zor, sor, gol, lor.

Il faut noter que, dans le dialecte du sud le(o) est quelquefois surmonté d'un tréma, ce qui lui donne le son du (œu) ou du (eu) français.

Ceci est dû au fait que dans une contrée limitée du Kurdistan d'Irak, quelques citadins prononcent dans certains mots le (o) comme les Turcs et non comme la majorité des Kurdes. Par exemple, ils prononcent les mots (qor) et (gol) comme les mots français (cœur) et (greufe). Par conséquent si c'est nécessaire ils peuvent les écrire comme les Turcs: (qôr) et (gól).

È. — Au cours de notre analyse de la phonétique Kurde nous avons trouvé un son de voyelle qui ressemble à ce que les arabes appellent ( عجمه نبيه ) .

Ce son de voyelle qui au premier abord ressemble à un (a) bref ne l'est pas en réalité, et ne pouvait l'être, puisque dans la langue le (a) est invariablement long. Il a été constaté et prouvé que ce son n'est qu'un (e) Kurde dont la prononciation est un peu plus dure et plus pos-

partiel, racontés par des compatriotes de différentes contrées.

3. — Quelques narrations complètes, in extenso, de la légende faites par des dengbêj la connaissant en entier.

Ces chansons, récits abrégés et narrations complètes de la légende représentent une certaine unité. Mais ils se diffèrent dans les détails, dans les tableaux représentant les événements, dans la manière d'expression, et dans l'imagination.

L'étude de tous ces détails et variantes qui se complètent entre eux en se modifiant m'ont donné un texte unifié de la légende.

Je crois avoir obtenu dans ce texte la forme de la légende qui s'approche le plus de l'originale que les moeurs et coutumes islamiques ont selon les régions partiellement détruite ou modifiée.

Ce texte unifié, après une classification conforme à l'esprit de celle des dengbêj a

pris la forme suivante:

1. — Un prologue.
2. — Neuf épisodes, chacune comptant plusieurs chansons.
3. — Un épilogue I

Après ce petit avant-propos nous donnons la traduction de la légende.

Cette traduction aura différentes formes: Certains passages se sont résumés, d'autres seront racontés en abrégé, d'autres enfin seront traduits intégralement.

(à suivre)

(1) Eshundé-Xani malgré son esprit large se laissa influencer par les doctrines morales de l'Islam et dans son Memo Zîn nous donne un épiqqe tout à fait inconnu au peuple. Il tire la moralité de son récit d'une scène de paradis d'après les descriptions du Coran. Bien entendu pendant la classification de la légende nous n'avons laissé aucune place à cette invention du poète.

térieure que la prononciation ordinaire, et qui durcit les consonnes qu'il régit.

Ce son de voyelle n'est d'ailleurs pas général, mais régional et propre à une contrée déterminée.

On pourrait noter ce son au moyen du (ë), comme dans les mots (pez <sup>پەز</sup>;) )

et (sed <sup>سەد</sup>) qui, sauf chez les Kurdes de la région mentionnée ci-dessus, sont prononcés (pëz) et (sëd); avec la dictée arabe, on pourrait peut-être rendre ces sons en durcissant les consonnes et en écrivant: (سَد، پَظْ)

Nous avons constaté, d'autre part, la même variante de prononciation dans des mots empruntés à l'arabe.

|       |      |     |
|-------|------|-----|
| esqer | ereb | eli |
| ësqer | ëreb | ëli |

Evidemment la prononciation en (pez, sed, esqer, ereb, eli) est plus conforme à la phonétique Kurde, et plus exacte.

Néanmoins, le rédacteur de ces lignes, en tant qu'originnaire de Botan, à l'habitude de prononcer les (e) des mots mentionnés ci-dessus comme (ë)

Cette prononciation, n'étant que régionale, ne pouvait être notée, puisque nous établissons un alphabet pour une langue, non pour des dialectes et des patois. J'ai cependant dicté les mots cités ci-dessus à quelques jeunes gens de mon propre pays et des régions environnantes, qui prononcent le (e) un peu dur et auxquels j'avais enseigné l'alphabet Kurde. Ils les ont écrit sans la moindre hésitation avec un (e). Je leur ai alors parlé du (ë). Ils m'ont répondu très logiquement: «Parmi les lettres que vous nous avez données avons trouvé la lettre nécessaire pour noter ce son, ce son ne peut être noté que par cette lettre et non par une autre.»

e, i, u, è, î, û.

Nous avons maintenant les six lettres e, i, u, è, î, û, qui forment deux groupes correspondants.

Examinons les quatre premières le-

ttres; e, i, è, î, deux sont brèves, les deux autres longues.

Mais, comme nous l'avons dit au préalable, dans la phonétique Kurde, un son de voyelle émis d'un même point de l'organe d'articulation ne peut pas être tantôt bref et tantôt long; les lettres du second groupe ne sont donc jamais les longues des premières. De même que l'on aura beau allonger le (e) on n'obtiendra jamais le son de (è), le (i) allongé ne donnera jamais un (î) et vice versa. Il s'agit en effet de sons différents, émis de différents points de l'organe d'articulation.

N'ayant plus de lettres latines disponibles, et ne pouvant faire usage de lettres composées, nous avons utilisé le (ä) qu'on trouve dans beaucoup d'autres langues, avec cette différence que dans ces langues, il rend la lettre sur laquelle il est posé ouverte, c'est-à-dire longue, tout en lui laissant le son originel. Nous lui avons au contraire donné une double fonction: changer le son de la lettre et, de plus, la faire lire toujours longue.

D'après les principes que nous avons adoptés pour fixer notre alphabet, on peut faire une objection au sujet du (i-î). Eu vu de se conformer autant que possible à l'alphabet turc, n'aurait-il pas été plus exacte de noter le (i) Kurde comme celui des Turcs par un (ı) sans point et le (î) par un (i) ordinaire.

Cependant la difficulté de distinguer un (i) sans point parmi les lettres (m, n, u) est évidente. Les Turcs ayant aperçu cet inconvénient furent forcés d'annoncer dans l'écriture le (i) sans point par un signe placé sur la lettre précédente.

Il est évident qu'on ne pouvait adopter un errement déjà signalé comme tel par son auteur; et, comme nous venons de l'exposer, les phonétiques des deux langues se trouvant très différentes, le système des voyelles Kurdes s'est trouvé être tout autre que celui des voyelles turques. (à suivre)



## هاجی قادر کوی

حاجی قادر کوی شاعری قومی، به رز و به  
 قیمتی کورده . له سالی ۱۲۳۲ هـ . له گوندی  
 (گور قرچ) ی نيزیک کویسنجق هاتوه  
 نه دنیا، له پاشان چوه ته استامول و له وی میوانی  
 کورانی بدرخان پاشا بوه و له سالی ۱۳۱۲ له وی  
 وفاتی کیرد وه . حاجی قادر به که مین شاعره  
 که هه لبه سنی قومی و مللی داناوه و به وه خریکی  
 ووشیار کیردنه وهی کوردان بوه ، و لاپه ده ی  
 هه لبه سنی غرامی پیوه داوه .

هشمی سوری

برک هبون . دلین ترسییا و رجفی من ژنه ره ب  
 دنگکی لزی دگوت :

— گرگین . . . دیسان چه هیه ؟ نه لمن ب  
 هیئینا چافان و بکسرا دلان میزه کر ؟ پاشی  
 ب دنگکی خرت ل من فگراند .

— داوت دست پید که

\*\*\*

دولاتی ده شش مه شره کی زور چیبو ، ژن  
 بی بون ، زاروسویو مان . کرد دستپسکی ده دژمن  
 شکاندن . لی ، پاشی ب بی بختی هاتنه شکستن .  
 گاقت دشرده بو بی من ژنه ره کر کک  
 آتی . ایفاره کی ، آزل بردری بی مالی سکنی بوم ،  
 چافین من ل ری بون . من دبت ت هاتی . هرد  
 دستین ته ب خوین بون . دد سر سینگاته ده برینکه

کور و فکری هبو . نه ، ازهمیز کرم ونه گوت  
 عسکرین دژمن دسر شوپا من ده نه ؟ باور که نهو  
 اوی پین و من بگرن ، مگري !!!

نتی فی دمی ژیرا مکه . پاشی ت ب گافین  
 لز چوپی سر در گوشا کری خوه فی پینج مهي تاجین ،  
 ونه او هلائی و ژیرا گوت :

— تاجین !!! دلی نه ژبوننا آریکارپا کر دستانی به .  
 خوبانته ژبوننا شر و رژاندنی به . نه کری خوه  
 دکر ناق درگوشی و عسکرین دژمنان دکن  
 هندری مالی . . . .

\* \* \*

لاو کیمن ! ایروپینج سال قدیانه کو أم ،  
 ژهف دوره هاتنه نخستن ت نهو . د کورتال کی ده رب  
 چار صد جامیرن کرد راد کفی .

خوه ده دزانه . . . چرمی رو و سینگاته  
 پرچفی ولاشی نه رز بیایه .

لی ، گرگین . بزانه کو هرشف بری هره  
 را کفه کری نه تاجین زند و دستین خوه ئین  
 نرم دافیژه سرستوی من و ب چافین خوه فی زلول و  
 ب کسرل من میزه د که ، من ماجد که و ژمن ره دبیژه :

— دایی ! . . . دایکامن باقیمن ره بنفیسینه کو  
 مزن بومه . دلین ژبو هژ کرنا کردستانی به خرنییا  
 من ژبوننا آریکارپا کردستانی به ، خوبنا من ژبو  
 شر و رژاندنی به !!!

دوکتور لمران عالی بره زمان

صاحب الامتياز والمدير المسئول

الامير جلالت عالي بره زمان

جز پرو شهرزورو قطع ایران  
 همی قیزی منن پیری بقربان  
 جوانن سورپرینه سر بلندن  
 گلک خوب وزریف گورو رندن  
 عقیغن پردلانن برزواجن  
 گلک پاکن ولاکن بی رواجن  
 رجا کارم ژنه آی لای کردی  
 توخوشکه خونہخی برایش ودردی  
 بده هر یک جهانگیرک زمانی  
 وکی یوسف ، صلاح الدین ثانی  
 ولی بیژہ ژبوویره عیسانه  
 افه خوشکه منه رنده جوانه  
 ژهرسیکان تو کیشانی دخوازی  
 توناس ناک ژبل نافی مجازی  
 صداقا وان تفاق واتحاده  
 توکی بگری ژبوته او مراده

عاموده ۱۱ حزیران ۱۹۳۲

بکر فون

## کوننا ولات

ولانی من دگوتی من برازی  
 لفظی گوہ بدیره گر دخوازی  
 جگر خوبی کوری من توژ دردا  
 سلافان زوژمن بگپنسه کوردا  
 بیژہ از کچک بوم تا کو بوم پیر  
 نه دی من خوہوکی فی سالی اسیر  
 سری من بو سپی پوش و پلاخه  
 لژیری من چینہ غیری آخه  
 ژ چاقیمن دچن صداآف و صدجو  
 ژ من ایدی دکن گازنده زارو  
 خراب بویه ژمن صدخان وقوناخ  
 نه مایه بویتیمان غیریک ماخ  
 نه کاری بی نه نک من مر در بوی  
 حچی نک من همی زاروک و سیوی  
 گرانی من ژ خوشک خوری پاکن  
 ولی پرسی لدایپرا خوناکن

لنگی و زبوی بی ده اوزیارت د کزن .

هر چاران برین خوہ دان خنجری و کتن

همیزین هف .

شام : ۲۸ چریا بری ۱۹۲۳

بهدت عالی برخان

## لاوکی من

گافا کو فرمانا کردان رابو أم هیژ نو  
 زوجی بون . شفکی نو پر درنک مایی و گافا نو  
 هاتی مال ، دستین ته ده تفنگکه نو و چند صد

هدلپتې فوري

## اي کور دښه ووستيسار بېن

فرقي نه بي شوان جوتيار و ميرو گلاوان  
 گر هيچ نه بي به اوين تابع به دولتي بن  
 يگانه چا که دوژمن نه ک دوژمني له خومان  
 رومي و کوبني مون کس پشتيان پي نه بستي  
 که وتونه داوي خويان پژمرده ماون حيران  
 کوا! والي ( سنندوج) بگزاده که ي ( رهواندز)  
 کوا! حاکمي ( بابان) ميري ( جزير و بوتان)  
 کوا! او دمه ي که کوردان آزادو سه رنجوبون  
 سلطاني مولک و ملت صاحبي جیش و عرفان  
 جوشيک بدهن و کوهنگ تدبير بکن به بي دهنگ  
 اسبابي شر پيدا کن طوب و تنفک و هاوان  
 حاجي کسيکه بي کس بوايوه فور دپوي  
 گوي لي ده کي ظريفه نايکه ن به لاله خوتان  
 حاجي فادر کوي

خاكي جزير و بوتان يعني ولاقي کوردان  
 صد حيف و صد مخاين ده يکن به ارمنستان  
 وار يگاتان ده بسري عيلات جاف و بلباس  
 گهر مردوون له گرميان ممنوعه بچنه گوستان  
 کامي کچ و هتيوي شيرين بي راي ده کبشين  
 (هاوار) دښه به رکي پشمه دخيل و آمان  
 سهرتان له فور هيلين ورن حاملان بينين  
 چونين له دهستی ظلمي بي ديني دوور له ايمان  
 أم قيسه به که کيردم ناگاتا چند سالی تر  
 أم حالته دزينين يك يك به چاوي خوتان  
 هرچی وه کو بيا نم بو کردون به تحقيق  
 پيدا ده بن سگانه کام فور بگين به سه رمان  
 له م بکنه اتفاقي پيدا بکن به مرديه

سري من ، و ايزو من ژ زيزي ۱۰۰ گري پتر  
 کريدان .

— رندي ژتره چه گوت ؟

— ژي بيرسه دادي ، ازوك وي تزام رندي بيم  
 رندي و گفوزي ، خوه گهاندبون وان . رندي  
 دست ب گوتني کړ لي نکار بو بقدينه ، چافين  
 وي هيستر د کړن دي ژي دگري .

دگهي مزی ده پشتخجرا بنگي آغا هلا  
 فستبو . ژويشه د دستين وان ده ت تشي وي  
 نه ما بو . ژ خوه ره کربون عادت . د دمين

صبر دنيا هيژ سار تر بو .

رندي وزيزي چو بون خباتا خوه . حتا بري  
 هنگوري ژي خبتي بون .

گافا فگر يان هاتن مال و روژانیا خوه دان  
 دبا خوه ، دي ديت کو وي روژي زيزي . ژ خوه  
 هاخوه قريک و نيف . پتر آني بو . بري کيم دآني  
 دي عجببايي ما . ژ زيزي پرسي ، اوي  
 گوت !

— دادي حتا نهو ، من رند نژاي بو أم چره  
 دخبتن . رندي فتح دامن سح کړن و کت

بخوه گوتن . ت نهو مسح کر .

- بلی ، گفو بخوبنه وولیت

- وولیت بغلینه ، ولات ب خباتا مروین

خوه ندا خلاص دبه .

- کو خلاص بو دی به چی ؟ :

- دی به ب سری خوه

- کو بو ب سری خوه

دی دی ده سرهوسته کو ترکک بول

وان دابوری وگالی ، دژوانان ل وان کر وگوت

« بنه می لقردی کرد پیچلری ... »

گچکان ب ترکی تزانی بون . لی ژ آوایی گوتنا

وی مسح دکرن کو خبران ل وان دده .

کچکین دن گو دی هولی ده دخبتین بازاری

وحی ژی کیم وزبده ب ترکی دژانی بون وپی

خوه دپارستن .

تئی رندی وزیزی کوب بترکی تزانی بون دکتان

برچاقین سرهوسته . سرهوسته دگوت : « دیسان

کالگال نه ! پینجین کرد »

آف نه جاراپیشین بو . لی رندی وزیزی نکار بون

هین بین ، هر جار وک جاراپیشین برد کتن . لی

دنکک ندکرن . دیوان ژوان ره گوتبو ، خوه

رااگرن ، دین مکن ، حتا گوام بگهن میرازخوه ،

گفو بدن خوه ندن .

کو سرهوسته دورکت ، رندی گوتنا <sup>۱۱</sup>خوه

پیشه آژوت :

- کو ردستان ب سری خوه به ، هنگی

هرتشتین ولاتی مه ژمه دین آف سرهوسته ژپی

ژ کردان نینه بژارتن وپرسا کرد نه وک ایرو

پرسا دژونی لی پرسا پسنی دی به . نه تئی سرهوسته ،

لی ژ حاکمان حتی پالیسان حی ژمه ژملتی مه دی

بین . وی گکافی آف زمانی کوام پی داخیفن

وژمه ره شیرینه دهردری ده بینه گوتن وپهستن .

ایروام د زیقاری ده نه ، ماین مه ژ دستی

مه هاتنه ستاندن . چره ؟ - ژ برکوام کردن و

دولتا کردان نینه .

باقین مه ، برابین مه ، پسماین مه ب دار فه

کرن . حی ژ بی خوه پیتی . لی گکافا کوام

بونه سرخوه ، هنگی کردانی ژ بره حتی ژ پیتی

دی بده . ژ بونا ستاندنا وی حتی ژ مره برابین خوه

ندا دقیش .

ولاتی مه ، خوه بی بی زاروون خوه ندا بو آ

حتا نهو ، ب سری خوه دیو و باق و برابین مه

ندهاتن کشتن امژی نه دکتن فی حالی ، سرهوسته

ژی خبران ل مه نه ددانهو کت سری نه کو

از وت ام دخبتن ، یکی ژوان مروقان ب خوه بی

بکن . اوزی برانی مه فی گچک گفو به .

زیزی دنگی خوه بری بو ، نه دگری نه

ژی نشتک دگوت . دست آفتابو هپووی خوه و

دخبتی لی هپووی خوه ور دشغلاند کو نلیین

وی ژ کومگین خوه فی آگر قدمستن .

تئی د فگوری ده ژ رندی ره قوبتی کر بو

کو ژ دیا خوه ره نشتی میبژت .

زیزی هیدی هیدی دگری ، لی ندنالی . رندی  
دستین خوه ها خوه دناؤف مین خوه ده دگفاشتن  
و دختی پی بگر مینه . پشتی گگافکی خوه ها خوه  
روناندرخ خوه وژیره گوت :

— ما زیزی ت' نرانی کو خباتامه ژر بونا  
گفویه ، ژر بونا خوه ندنا کفویه

— بلی رندی چاوان نرازم ، ورنه بووا کنگی  
دیامه أم ددان خباتی

— نه خوه چره دگری ؟

— ت' نایینی ئیدن ناگرم ، لی تشک هیه ، ما  
دنیا تئف نه زفستانه ، بهار وها فیناوی ژی هیه .  
بلا گفول ها فینی بخوینه ول زفستانی ئقدال  
مالی رونن ، مانابه ؟

— دبه زیزی ، لی بائی مه وساندبه کو بلا  
گفوزانابه ، بزانه ریزکا دنیایی بگرینه . ژر بونا  
وی ژی خوه ندنا هاقینی تیرناکه ، دغی ل زفستانی  
ژی بخوینه ، دا کوزانابه .

— ماچره رندی ، آونده بخوینه ، بلا قاسی  
ککی مه ززار بخوینه نه بسه . زانا بون ژی  
ژر بوناچی ؟

— ژر بونا ولت زیزی . هکه ککی مه ززار  
قنج خوه ندابووا وی روزا کو عسکری کردان  
ب سر دیار بگری ده گرتبون نه دهشت کو  
عسکر بین چندبر وهرن بازار بین دن و د دورا  
دیار بگری ده کیم بین . لی ب. میریشکی دیار  
بگر دستاند و مسئله صافی دکر . فی خبری دژنمان

دا کو وصیتابنگی آغال اردی مهیلن وینن جه .  
کتبون چلیا زفستانی . دهات بهیستن ؛ فلان  
د'هی ب شف ب ری فه قفلیه .  
کوچه و کولانین باژیرب بر فی داگرتبون .  
چند بان ژر گرانیا بر فی هلقشیا بون .

تفنا کو رندی وزیزی ل سر دخنن  
دهولکی ده فکرتبو . بائی هولی قلیروپیو کین  
کلکین وی شکستی بون .  
روژکی هر د'خوه ل بر نارو پووین تئفی  
ده رونشتی ، هپولید خستن .

هر دژی ژسر مایی در جفین ، درانین وان  
در کر کین ، گومکین زیزی فریسی بون ،  
هپوژ دستی وی کت و دهیسترین گرم پیقه  
چون . نماد کار بول بر آشا سرمای بسکته .  
ب دنگی خوه ئی زیز گوتنه رندی :

— رندی ، خوه هی ، ما ئیدن نه بسه ؟ ت' نایینی  
کو أم هر دوژی قفلینه ، دی رابه أم هر ن مال ،  
بکفن ناؤ جهان وجانین خوه بگر مین .

رندی زودا پی حسیابو ، لی خوه بر در نه دکر .  
دیسان ژخوه ره بو خوری ، نه دا برسستی بی ،  
تئی خوه ها خوه دا همیزا خوه ، گفاشت  
وماچ کر .

رندی ژر زیزی ب دسالان مزنتربو . لی د  
وی چاخنی ده اؤ دسال هنگ پینج سالان هیژا  
بون . رندی ژر دیاخوه بیتر پی مژول دبوو اوب  
خوه دی دکر .

میروک :

## بر تفتنا مافوری

رندی وزیزی خوه هین هف وژ باقی  
خوه سیوی بون .

باقی وان بنگی آغا ، دکل برای وانئی مزن زنار  
و ب چند پسا مین خوه فه د وقتی شیخ سعیدی

رحمتی ، د شری سرخوه بونا کردستانی ده ژ بونا  
ولات وملت خوه د میدانا رومتی ده کتبو .

رندی سیزده وزیزی پانزده سالی بو . برای  
وان ئی کچک گفو هیژ نو کتبو نهان .

شری سرخوه بونی ژ هشت مهان بتر آژوتبو .  
عسکری کردان ب سردیار بگری ده گرتبون ،

کتبون ناف خاربوقی و بازارین کردستانی ئین دن .  
ژ بر کو تفاقا وان نه یک بو ، مروئین وان ئین

خوه ندا ، کو بکارن کارین سرخوه رابونی  
بگریئن کیم بون ، وژ هیلکه دن ژی د چند

دران ده بی بختی هاتبو گرن ، سرخوه رابون نه  
چومری وتر کان ژ نوفه کردستانا بگری ونگرتن .

سرك ، شیخ مزنین کردان ب دارفه گرن ،  
ژن و زاروون وان ، ب هزاران کشتن ، مالین

وان ضمط کرن .  
د فی نافی ده مال وگندی بنگی آغازی تالان

کرن وژن و زاروون وی برچی وتازی هشتن .  
خلکی مالا بنگی آغا ئیدن نکار بون دجهی خوه ده

دیگندی پشین خوه ده رومن .  
دیوان ژنککه ژ بهاتی ، کچه بافک ،

زاروون خوه دابوهف و گهاستیو بازارکی کچک  
ل جهسکی ولی آوت کس اونس ند کرن .

دی ژ صبی حتا آفاری د مالا خلکی ده دختی ،  
ب شف گوره درستن و دیسان کاراوی ب کوتکی

تیرا دبارا وان دکر .  
لی دیشابو چندپره ژی بدن آلیکی وژ بونا گفو

بیچفین .  
ما بنگی آغانه و صاندبو کو بلا گفو بخوینه ، مزن

بیه آفدیناباف و ولاتین خوه فکه ودریا فلاتا ولاتی  
خوه ده بچخته .

ژ خوه ندنی ره درهاف دثیابو .  
دی خوه دشداند ، هیژ زبده دختی ، لی نشتك

ب سرده ندخت .  
ژ بونا آئینجه و صیتا میری خوه قرارا خوه

داو هر د کچین خوه ئیخستن خباتی .  
د وی بازاری ده مافوران چید کرن . کچچکان

دوختی خوه شی بی ده ب چیکر نامافوران مژول  
دبون ، بی دلیستن .

ژ لورا گلک نه آژوت ژ هر دو ان ره خبات هاته  
دیتن . هر روز صبی خلکی مالا بنگی آغا کار دبون

وهر بک دچوب آلیکی فه .  
دی مالا خلکی ، کچک تفتنی و لاوک دبستانی .

گلک نه بوری زفستانا ولاتی ژورین  
ب سرده هات .

جلین وان تنک و کفن بون . ل وان ساربو .  
زیزی چند جارن نخوش کت .

لی دثیبا بول بر هر تشتی راوستن و بچین ؛

## کوملا کردی

## یکسون و یکتینیا کردی

خانی و ملایی باته ، طهران ؟  
 گئی کردین جوژ خوینا کردان .  
 نابی ژمه به و شیخ أحمد ؟  
 هیسی مه یه زند و دولتا مد .  
 آگری سینه ، وان و موش و زیلان ،  
 کائینه ، ژوان فژینه خورتان !!  
 سنی ، علوی و آیزدی چی ؟؟؟  
 أم بونه خلام و مانه برچی !!!  
 کردن ، نه جداژ دار و رانه ،  
 بن دستی خوهدی و یک خدانه ،  
 کردن جوأم ، ژیک ژادن ،  
 تفت داد و کرم و پاک نهادن .  
 بختین مه بکن ، نه سی نه چارن  
 أم کردن و تفت برا و یارن  
 آگری سینه ، وان و موش و زیلان ؟  
 کائینه ژ وان فژینه خورتان .  
 سنی ، علوی و آیزده دی چی ؟؟؟  
 أم بونه خلام و مانه برچی !!!  
 و کور . کاروان عالی بدرخان

أف لور و بختیاری بابان ؟  
 کردمانج و هقرمان و زازان ؟  
 کردین ، ژولاتی روم و سوری ،  
 کردین عجم و عراق و سوری ،  
 کردین ژولاتی زور و ژیرین ،  
 سرچاف بلند و زخم و نیرین ؟  
 یک بختن جو نه بختیارن ،  
 سر آرد و دنی ، لیان و ژارن .  
 \* \* \*  
 زردشت بو ملایی کفتی کردا ،  
 قانون بو چرایا زندا فستا .  
 أف فلسفه یا قدیم و پرنور ،  
 زندی ، زمانی کفن و مشهور ؟  
 زردشت و چریا زبئی زردشت ؟  
 رهنی آوه ، سرچیان و سردشت .  
 هر کات ژ کتیا زندا فستا ،  
 پیتک بول دل ، گری د دستا ،  
 رستم ژ مه به و شاه نادر ،  
 سلطان صلاح الدینی دنگگیر ،

زنگنه و مطبعة  
اليونانية  
حضر جميع المعارض والصور الملونة واللوحات الخشبية  
طبع بطانات دار بيان بمرفق نازرة على الطراز الحديث

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب

احمد نافذ

اختصاص بالامراض الداخلية والزهرية والأطفال

عرفوس

دمشق

الطبيب

محمد حبيب

الاختصاص بالامراض والزهرية والعين وجرامها

صالح

دمشق

## اشتراقات مجموعة هاوار

|                       |  |
|-----------------------|--|
| وفي غير هذه الأقطار   | في سورية و تركيا والعراق و بلاد العجم و بلاد القفقاس |
| عن سنة واحدة ١٥٠ فرنك | عن سنة واحدة ٥٠٠ غروش سوري - ١٠٠ فرنك                |
| عن ستة شهور ٩٠ فرنك   | عن ستة شهور ٣٠٠ غروش سوري - ٦٠ فرنك                  |
| عن اربعة شهور ٦٠ فرنك | عن اربعة شهور ٢٠٠ غروش سوري - ٤٠ فرنك                |

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد



سال ۱

شماره ۳

بانی

# هه‌وآر

شماره ۳ ۱۹۳۲

کۆمەڵا کەردی

تێسڵە خەستییان کۆمەڵی

پرێشمانا مافوری

چ. ە. بەدرخان

حاجی قادری کۆبی

هەنیدی سوری

لاوکی من

دکتور ک. ە. بەدرخان

الفاییا کۆدی

چ. ە. بەدرخان

فرهنگک

یکبۆن و یکبیتی

دکتور ک. ە. بەدرخان

و شیار بین


حاجی قادر کۆبی

گۆتتا و لات

جگەرە خۆبۆن

زری کباری

SAL 1



ÇARŞEMB

# HAWAR

HEJMAR 5



20 Tirmeh 1932

## Qovara Qurdî \* Revue Kurde

### Çedewisiyên Qovarê

|                  |                     |
|------------------|---------------------|
| Edebiyatî Qurdî  | Hevindê Sorî        |
| Loriya Bedir-Xan | C. A. Bedir-Xan     |
| Pêrûziya Hawarê  | Seyîd Hiznî         |
| Besreqa Zêrîn    | Kedrican            |
Surê pozê pîrê bir,  
Pozê pîrê werimî;

Gurûn bizina pîrê xwar;

Pîrê li ser digirî

Way! way! . . . . . Li ser digirî.

Ji bona trû me hevkas got, pêşdetir  
em disan ji Rêya — Teze behs biqin.

Em ji hevala xwe re rûyeqê xweş  
û dawîyeqê geş hevî diqin. Divêt qo her  
gav me hey ji hev hebit û gerez e qo  
em hevdu ser xebata hev serwest biqin.

*Herçeqol Axiran*

## EDEBIYATI QURDÎ

—3—

Lewaney serewe be tewawetî der-deqewêt qe edebiyatî qurdi edebiyatêqî ari ye, we bilinde, we berze, we herweqû edebiyatî zimanani ari kabila bo herz-bûnewe we serqewtin. We her çende medeniyet le qurdistanda bilaw bibêtewe ewende edebiyatî qurdi serdeqewêt we herz debêt.

Ba nextê binorin lew hezaran çiroqane qe qurdeqan helyan bestwe, we dayan nawe, be tewawetî biyan xwêninewe, lew deme dezanî qe hiç ferkêq niye le heynt edebiyatî ême, we edebiyatî zimanêqî rojawa we lew de me bilindayî edebiyatman deselmênin.

Aya helbestî çiroqî (Mem û Zîn) çî ferkêkî heye legel helbestî çiroqî (Jlyada)!!...

Aya ew helbestanî çiroqîye qe imro le ewropa deyinî çî ferkêqî heye legel helbestî çiroqîyî imro qe le qurdistanda bilaw bûwatewe!!...

Ewendeq pê nawî, her nextê binorin lem çiroqey xwarewe we sirincî lê bideyn ew deme bilindayî edebiyatî xoman lèdegeyn.

Em helbestî çiroqîyey xwarewe le destî herirî rojhelatî (Hewlêr)—qe beşî nawerastîye le soran bilaw bûwetewe. We lew nawe be [ sirî leşqîrî ] benaw bangê. Çunqê danereqey nawî [ leşqîrî ] bûwe. Lem çiroqê da basî (Mir Suleyman begî herir) deqat qe axremîn paşay emaretî herir bûwe. Em karemane çend salêq beramber turqan radewestê, we hera deqat, le paşay deşqê u degîrret u debêr bo Estemûl legel leşqîrîyî piyawî. Mir Suleyman beg xuşqêqî zor ciwanî debêt qe nawî (Xanzade Xatûn) debêt. Leşqîrî hezî lê deqat. Hicî şewkî serbexoyî le layêqewe we girpey hez lê qirdin le layêqî diqewe agir le dili ber

dedat. We dest deqate dananî em helbest'e ciwan u şiriney xwarewe :

« Le wî dewrim denorî hela ewî zemanê, le wî zemanîm denorî hela dewrî kubad Xanê, le dewrî Kubad xanim denorî hela dewrî Xan Suleyman, le dewrî Xan Suleymanîm denorî hela dewrî Cum Cume sultanê, le dewrî Cum Cume sultanîm denorî hela dewrî şahî Newsîrewanê. Eqîm ne dif weqû mirî herîr u herîr begîyan, le diwanî hîze romyan, helbîstê be giranê. Ewroqê dadesubhaynê, çî model nîne lo ewî axay, ewetanê be tenê maytewe le wilatî xerîbîyan hebê Xudanê.

Ewroqê serê min dehêşe, dilê min ked hadî nabê leber giryan, eger emîn rojîm lê helatîbû le hemû kedem u heft şaran, dedatîm le geliy Amedî le geli Sûlakê, dedatîm le serî herîr u herîr begîyan, dedatîm le çemî Saredê. le min xemliye be qulunçî sêwî we henarî we ewan mirate dar hermeyan, hemû ales seherî, beyanî qomelêqî bulbulan, êqe şaloran, be çiriqe çiriqe le naw da deqîn dad û fişanê. Eger le hiqewe beser bêne xwarê qomelîqî mehbûb û zerdîyan deyan gût: leşqîrî!!., Eger elu hezdeqey le xoşîyan kebûl naqey taliyan, bigere raweqî tûlan digel xêzanêqî tajiyan, herewe serî herîr û herîr begîyan biqe zewk û sefay ewan zerdîyan. Dênewe le qolî kesarê, besiq berdanê, xîne lénanê çawres qirdinê degel qaniyan arekêqî tinoqe be tinoqe deqorêtwe le gahî şare qezyan.

Ewroqê şayî yeqî degerê le serî meydanê, têdaye aysî Suleyman begî degel mire medyan, eger şireqî biqîrî be pênc sed zêrî lê pêşra bidey le singî ewan zerdîyan. Le ber dilê min cezme çî nuqar naqê leber îlûd û meqîdî ewan take şayîyan, emîn le paşaxê xom swar nabim leqî muanneqan deber piştî xom ranaqem çî xerceran helnagirîm çî nasiraniyan heldigîrim

## Hawareq

Ji xweyîyê Hawarê, apê min ê dal  
Celadet Ali Bedir-Xan re :

✽✽✽ :

Min çend xeber ji bona Hawarê ni-  
visandine. Ji apê xwe hêvi diqim bi çar-  
veqî kenclî wan mîze biçe.

Ez yeq ji wan qurdên piçûq im qo  
bi şev rûjan, bi rûj şevan dijmêrim û di  
dilê xwe de dibêjim : gelo Hawara me  
qûjan rûjê ê bê ?

Rûjên postê bi me nas in. Di wan  
rûjan de em çavêriya wê diqim.

Rûja qo Hawarê ji postê distimin,  
diqim bin paşla xwe û newêrim zû zû  
veqim. Ji ber qo çêfa ditina wê ji xwe  
ji didexisim. Hêdi, hêdi piştawê vediqim  
li çermê wê dinêrim li tîdextiyên wê  
agah dibim û paşê diqevim nav rûpelên wê.

Hawar qaniyeqê zelal, ez meriveqî  
tihu im ; piyan piyan jê vedixum, agirê  
dilê xwe pê vediqûjenim.

Apo, tu nizani Hawar bi me çikas  
xweş e, çikas delal û beha ye. Tu zani  
çira apo ? Ji lewra qo ev sê çar sal in  
ez di dibistana biyanîyan de dixwînim,  
hin ez bi xwe ne hesiya bûm lê ev  
Hawara dişewal ez din girim. Şev û rûj  
dixwînim, bendên wê ji ber diqim, û  
dîsan jê tîr nabim.

Ez û hevalên xwe em nav hev da  
şewirin. Belê herçî qo bi zmanê me hate  
nivisandin ji me ra hêsani ye, xwendina  
wê biqêf e. Qo me ew carqê xwendî  
ji bira me naqê. Ma ji bona herqesî ji

qesî jolêqî derwêşan, postalêqî hacîya'û  
depeimewe leberî estîryan, depeimewe  
naw kewme gelêqî lewan dasîyan. Ew-  
roqê dade subhîyê çî modet nîne, lo  
ewîaxay, ewetanê be tenê maytewe le wul-  
atî kerîbîyan, we nayêtewe ser ew mûlq  
û dewletan, heta ebed û ebel ebedîyan.

*Hevîndê Serî*

ne wîsan e. Herê zmanê herqesî jê re  
şêrin û hêsani ye. Ji lewra her qes bi  
zmanê xwe dixwîne û dinivîstine. Tinê  
em qurd di bîstanê xelqî bi zmanê xelqî  
dixwînin. Ma çira ji bona çêlîyên qur-  
dan ji dibîstanên cihê çênaqim qo em  
têde bi zmanê xwe bixwînin.

Tu zani apo min çî qir. Ser vê ye-  
qê ez rabûm û çûm cem bavê xwe û min  
jê ra got :

— Bavo tu çira min dişini dibîstana  
biyanîyan. Di wan dibîstanan da zmanê  
Hawarê nîne. Ew zmanê qo zmanê min e,  
zmanê qurdmanê ye.

Bavê min hîniq seqîni serê xwe  
qir ber xwe, madê wî gubêri, bi dengê  
giran, lê ziz, li min veqerand û got :

— Lawo xebera te ye. Divêt qo tu di  
dibîstanên qurdan da bixwîni. Lê sed  
heyt û mixabin dibîstanên qurdan hêj  
ne hatine pê. Belê, di çavên te dixwînim,  
tu dixwazi ji min bipirsi : « Ma çira heta  
niho dibîstanê me çêneqirine ? » Çêne-  
qirine, ji ber qo herçî xwenda û zana  
rabûne şûna qo xidmeta mîletê xwe biqin,  
xidmeta mîletên din qirine. Zmanê mi-  
letên din pêş ve birine û yê xwe şûn  
ve hiştine.

Gava ji bavê xwe veketiyam, dilê  
min dişewitî ez geleq ber xwe diqetim.  
Ji xwe ra, ji mîlet û zmanê xwe ra, heyfa  
min dilat. Herê gotinên bavê min rast  
bûn, pêşiyên me ji mîlet û zmanê xwe  
ra gub ne dan. Ma trê, trê ji gub nadin.

Herê ez balî xwe didim, ji çend  
mezînan û zanayan pêve, tuqes di Hawarê  
de hawar naqê, naye hawara Hawarê.  
Ez dibînim qo li wê meydana qo Ha-  
war ji meletê qurd ra veqirîye tu qes hespê  
xwe najo ê. Belê tuqes naqewe tirad û  
meydanê.

Fz ji mezînan xwe dipirsim, we  
çira em anîne dinyayê. Ji bona qo em  
bibin dil û xulamên xelqî ? an em ji weq

## Bêriya Welat

Ax . . . dilê min çikas bêriya wê duriyê diqe, II Wê duriya qo di nav wê de ezman bi rengeqî din heşin e, stêr weq çavên delalan dibirikin, û çiya rawestiyane.

\*\*\*

Bêdengiya rêlan, min diqîştine bin siha xwe. Dixwazim di bin çikilên berû, kizwan û qenêran de rûnim.

\*\*\*

Çikas bi dileqî şewiti, ez dixwazim gulê bidim gûsgûşa pelên daran. Dixwazim herim ronahiya hêvê, li ser zinar û ser serê çiyên de bibezim.

\*\*\*

Tinê li wê derê, di wê spehiti û delalîyê de, diqarim bîdil biqenim,

*Dr. Zamiran Ali Bedir-Xan*

xelqî xudan rûmet û bişewef, û bi serê xwe bijîn. Heqe wan em ji bona xulîmiyê anîne, xwezî ne antiyana u warên xwe qor bihiştina.

Apo ez ji te hêvî diqim bila ew mezinên ha li min megirîn. Ma Hawar ne ji bona hawar û gazîyê ye. Ez ji di rûpelên Hawarê de hawar diqim.

Apo, te curqê di bendeqê de digot: «Qurd ji hev cuda dilopên baranê ne, cihê cihê tên dakurtandin. Qo gilane hev dibin lehi, lehiqê bos. Tuqes, tu tîst li her wan niqare biseqîne. Felata welatê me di rabûna wê lehiyê de ye.»

Belê apo, ew dilopên baranê em in, em qurdên piçûq. Divêt mezinên me, me bi dil û hişê qurdmancê bixwedî biqin, da qo em bigehin hev û bibin ew lehiya qo me bifilitine û bigehîne mirazê me.

Paşî ez tîm destên te apê min î delal.

*Weedî Cemil Lasa*

## Qurdeqî qîçiq

Hêvîyeqe Mezin

Di vê hejmara Hawarê de bendeqê heye: «Hawarêq». Nivîsevanê wê Weedî, ji mala Cemil paşa, qurê Mihemed begî ye. Weedî lawîqeşî sêzdehsalî ye.

Weedî berî sê salan bi bav û mamên xwe ve hatiye Sûriyê û trû digel pîsmantên xwe di dibistanên Hestêqê de dixwîne. Weqê ez li Hestêqê bîm, Weedî dihat niq min, me bi hev re xêber dida, ji min re çiroqa Rostemê-Qurd digot. Hej min diqir û weq mameqî xwê li min dinihêl.

Weedî heta trû ji xwendevanên Hawarê bû, bi vê bendê hûye yeq ji nivîsevanên wê.

Belê Weedî bi salan qurdeqî qîçiq e lê ji bona dîwîyê hêvîyeqe mezin e.

Çavê min Weedî!

Eve, herweqî te dil qir, min ji wê lê, benda te existê Hawarê û belav qir. Ji benda te re geleq qela min hat. Tu pê xeberdoşîya hemî hevsa û hogirên xwe diqî. Belê hevsa û hogirên te ji weq te dilqirîn, êdin ew ji dixwazî her tîştî bi zînanê xwe hin bibin û di dibistanên qurdan de bixwînin.

Ewle be qurê min, hêdî hêdî, bi-rêve, ew ji dê çêbibin.

Heta hingî divêt hon bi xwendina Hawarê rind hînt zmanê xwe bibin.

Belê, xebra te ye; xwenda, zana û dewlemendên qurdan, herweqî diwîya bû, wêlê ne hatine hawar û gazîya Hawarê. Lê me hêvî heye, ew mirovên cangîran ji hêdî hêdî ji çêrandin û mezinqirîna zîqên xwe bigerîn û herqes gora halê xwe, hin bi kelem, hin bi dîrbavên xwe bîne hawara me. Lê em li hêviya wan ne seqînin û naseqînin ji. Ji her qo ji hezaran pêrewî re pêşrewêq divêt.

Paşî, ez çavên te maq diqim, Xwedê te ji bav û miletê te re bihêle, qurê min î delal.

*CelaDET Ali Bedir - Xan*

## Ala Qurdan

Ronahiya dil û çav ;  
Diyariya dê û bav ;  
Pêşira wî roj û tav ,  
Spêhitiya ax û av .

Ala qurdan ser be ser  
Sor û gewr e qesq û zer .

Kehremanê ceng û ser ;  
Kiblegahê mî û ner ;  
Çayegahê can û ser  
Alitaba dar û ber

Ala qurdan ser be ser  
Sor û gewr e qesq û zer .

Îlviya xortan û mîr ,  
Mihreba mizgeft û dêr  
Şahê evd û şahê sêr  
B'reng û bihn e ziv û zer .

Ala qurdan ser be ser  
Sor û gewr e qesq û zer .

*D. Zamiran A. Bedir-Xan*

## FERHENGQ

( Mèvanxane )

Xaniyê qo m'van û r'wiyân bi pere di hewitîn. Weq odayên gundên qurd-mancî. Lê bi vê ferka qo odayên me herwe ne, mèvanxane bi pere ne. bi frensîzî ( Otêl ) dibêjin.

( Vêsilmandin )

Rahet qirin. Xwe vêsilandin, xwe rahet qirin e.

( Belg )

Ji belgên daran pêve ji cil û girêdanê re ji têt gotin.

( Quta-qirin )

Xelas qirin, Kedandin. Me dersa xwe quta qir. Dersa ma quta bû.

( Agah )

Xeberdar, serwest. Ez agah bûm, ez xeberdar bûm.

( Xeberdox )

Ewê qo bi nav û navê çendegên din, ber hemiyân ve dibêje. Xeberdoxî : xeberdox-bûm e.

## ELFABêYA QURDÎ

8

Ji sebebên bingehî pêve qo yeq bi yeq halîne raveqirin , ber vê yeqê ji me nişan-qirina (s) ê bi (K) û ya (s) ê bi (Q) çê tir û rastir dîtin .

C , Ç — Di destê me de (C) û (Ç) mane . Me ev ji bona nişanqirina dengên (c) û (ç) hilanî bûn .

Gora eslê van herfan dengê (ç) ji (c) bêtir bi (c) dihat nişanqirin . Herweqî di latîniya qevn , di lal elîsqa şesâ de , qo diqet pêşiya (e , i , y , æ , œ) dengê (ç) a me dîda , matna dengê (z) ya elmanî , weqî niho di pirsên jêrin de : (Ceres, Cicero, centum, circus, Cyrus, Caesar, caeter, caremonia)

Digel vê hindê me ev herf ji pêşiya xwe vê jir , dengê wê ê qevn da ali û em di warê kebalayê de man . Ji her qo kebalê li destûra me a pêşin çêtir dihat û ji bona feda qirina wê destûrê çî fêde çî qoteqî hebû .

Di zmên de nîşfeta wan ji hemû yeq e .

C  $\frac{102}{33789}$  Ç  $\frac{103}{33798}$  .

Di encamê de me dengê (ç) bi (c) û ye (ç) bi (ç) nişan qirin

Li hire dixwazim tîşteqî di çavên xwendevanan re biqim .

Ew dengê qo di elfabêya erebî de bi (ç) tete nişan qirin di hin dewerên Qurdistanê û di pirsinan de ne weq dengê xwe ê nas lê bi awaqî din têt bilêv qirin. Bi awaqî welê qo ser dengê (z) ya elmanî diçe .

## DENGÛÊR

Herweqî me berê ji goli bû dengdêrên qurdî di drêj an qin bûna degên xwe de serseqîni ne. Yanî dengdêre çê drêj tucaran qin nabe û ya qin drêj .

Di yûnanîya qevn de ji dengdêr holê bûn, dengdêre çê geh qin geh drêj ne dihat xwendin. Ti nê di yûnanîya qevn de dengdêrinen navîn ji hebûn qo di zmanê me de nînin. (dûmahîq heyê)

*Citadet Ali Bedir-Xan*

Notices sur la littérature  
moque et coutumes Kurdes

8

## MEMÉ-ALAN

Le roi a eu encore une fois recours à son grand père ( Neriman ) qui entra et sans hésiter chez le monstre et commença à le caresser. Celni-ci se laissa faire et tout d'un coup devint un cheval domestique.

On le nomma ( Bozê-rewan ) et ( Neriman ) raconta à son petit fils ce qu'il avait vu dans les livres à son sujet. (Bozê-Bewan) était le cheval destiné à parcourir les plus grandes distances dans le plus court laps de temps. Il pouvait faire le tour du monde dans quelques jours.

( Mémé-Alan ) le monta et parcourut la ville parmi les applaudissements de ses sujets.

Le roi des (Alan) lit venir tous les célèbres selliers du pays, il mit à leur disposition tout le trésor royal, et leur ordonna de faire une selle modèle pour ( Bozê-rewan ) et lui firent une selle que pendant le jour éclipsait le soleil et pendant la nuit la lune »

## DEUXIÈME EPISODE

La rencontre de ( Zin ) avec ( Nem )

Les trois filles du roi des fées survolèrent le fleuve de ( Cizir ) et se perchèrent sur les murs de (Burca-Beleq) de là elles glissèrent au boudoir de ( Zin ) où la jeune princesse dormait tranquillement.

Elles prononcèrent le nom de ( Singav ) soufflèrent sur ( Zin ) et lui jetèrent un mouchoir sur les yeux. Tout d'un coup la respiration cessa ( Zin ), elle devint immobile comme une morte.

La soeur aînée appela une suite de fées qui se chargèrent du lit de ( Zin ) et l'enlevèrent

A l'arrivée au palais de ( Mem ) on le trouva dans le même état d'immobilité que (Zin). On posa le lit de ( Zin ) à côté de celui de ( Mem ). On découvrit le visage de ( Zin ) et les trois soeurs se perchèrent sur les bords des fenêtres et contemplèrent les deux beautés.

Elles attendirent un peu, voyant qu'ils ne bougeaient pas, elles leurs soufflèrent de nouveau (Mem) fut le premier à ouvrir ses yeux,

il se dressa dans son lit sur ses genoux, ne savait comment expliquer la présence d'un autre lit auprès du sien. Il se leva, examina, porte et fenêtres, tout était bien clos, rien à soupçonner de ce côté. Il se mit de nouveau dans son lit, il tira la couverture sur sa tête et essaya de dormir, puisque ce qu'il voyait ne pouvait être qu'une vision. Mais le sommeil ne venait pas.

Il se leva de nouveau et s'approcha du lit et enleva un bout de la couverture. Sa surprise fut plus grande qu'auparavant. Une jeune fille qu'on pouvait prendre pour morte reposait dans le lit.

( Mem ) retourna à son lit et pria le bon Dieu en disant : «O tout puissant ! mes années n'ont commencé de marcher vers le chiffre quatorze que depuis quelques jours. Même les mouches mâles et femelles n'ont pas encore choisi les pans de mon manteau pour se rencontrer. Aie pitié de moi et comme tu as amené ce lit auprès de moi ramène le d'où il vient».

(Zin) restait toujours immobile. Les trois colombes soufflèrent de nouveau.

(Zin) ouvrit les yeux et constata la présence du lit de (Mem). Elle aussi ne savait comment expliquer la présence d'un lit dans sa propre chambre. Elle aussi, comme (Mem) examina porte et fenêtres. Tout étaient bien fermés et intacts. Elle remarqua aussi que les lanternes étaient doublées, au lieu de deux il y en avait quatre avec celle de (Mem).

( Zin ) pensa à une trahison. Le même jour elle était allée faire une excursion, un jeune homme épris d'elle en soudoyant les gardes s'était faulilé jusque dans son intérieur.

(Zin) prise d'effroi et de colère se dressa dans son lit et d'une voix énergique s'adressa à l'étranger : «Lo lo....qui es-tu ? que cherches tu ici, dans mon intérieur, je ne me rappelle pas de t'avoir parlé, et invité. Si j'appelle ( Tacin, Çeqo, Gurgin ) viendront, te donneront à la bouche dévorante des épées ciselées. Ne sais-tu pas qui je suis et où tu es ? (à suivre)

Textes et Traductions :

*Yeli Delal*

— 1 —

Yeli delal, delal . . . . .  
 Delal . . . . .  
 De rabe emrê dilê min bi gori  
 Sebra dilê min bê te naye delalo !

— 2 —

Yeli delal ! suwarê me suwar bûne  
 Berên xwe dane w'aliyê rojhîle da  
 Pêşiya selefê suwaran danî bû qûna  
 [ çiyayê Evdîleziz  
 Paşiya selefê suwaran danî bû qûna  
 [ girê di Qewqeb'da  
 Dê xwezi ji xêra Xwedê ra  
 Wezê bibînia bakeqî gulan û rêhanan  
 Wezê biqetama destê lawiqê xwe da  
 De w'ezê rûjê sê caran banê  
 [ min biketa ber simbelê reş da

— 3 —

Delalo destê min berde  
 Zîqayê qolanê 'gundê me teng û tari ne  
 Şeytan û avanê 'gundê me gelec in.  
 Şeytan û avanê 'gundê me gelec in  
 Dîlê hîueq ji wan bi hênceta agirî  
 Sibê bènê bi ser halê min û te  
 [ de delalo !

Delal . . . . .  
 De rabe emrê dilê min bi gori  
 Sebra dilê min bê te naye delalo !

— 4 —

Yeli delal, delalê mala bavê min di xewa  
 [ şêrin de  
 W'ezê dil naqim ji xewa şêrin raqim  
 De w'ezê herim sûqa Diyarbeqra sewiti  
 Ebaqî ji sorê besrawî ji qenarê delalê  
 [ bavê xwe de binim delalo !  
 Serê sibehê pê daqim.

— 5 —

Yeli delal . . . . .  
 Yeli delal, heçî cuhabeq ya xêrê  
 Ji qenarê delalê mala bavê min de ji  
 [ min re binê

« — Sehet xweşo

« — Ya te ji »

W'ezê bidim ê ciwanîqa her mehtnê  
 We heqe pê kail ne be  
 W'ezê bidin ê sed û bist qîs û zinetê  
 [ malê dinê

De heqe bi wan ji Kail nebê  
 Sed û bist aşên mala bavê min hene  
 W'ezê bidim ê, li binê soniqê, Nisêbinê  
 Delal . . . . .  
 Emrê dilê min bi gori  
 Sebra dilê min bê te naye delalo !

**TIRSİM EZ BIMIRIM**

Tirsim ez bimirim dilo heyran  
 Li vê patzê delalo  
 Li vê patzê.

Tirba min çeqin dilo heyran  
 Li bintya gûzê delalo  
 Li bintya gûzê.

W'ezê ramûsim dilo heyran  
 Sê bisqê' di Kîzê hoyo  
 Sê bisqê' di Kîzê delalo  
 Sê bisqê' di Kîzê.

Tirsim ez bimirim dilo heyran  
 Li vê buharê hoyo !  
 Li vê buharê.

Tirba min çeqin dilo heyran  
 Li bintya darê hoyo  
 Li bintya darê delalo  
 Li bintya darê.

Ezê ramûsim dilo heyran  
 Sê bisqê' yarê hoyo  
 Sê bisqê' yarê delalo !  
 Sê bisqê' yarê.

*Mon Beau :*

— 1 —

Yeli delal . . . . .  
 Delal . . . . .  
 O lève toi, que la vie de mon cœur te soit  
 [ un tombeau  
 Mon cœur n'a pas de patience sans toi . . .



— 2 —

Yeli delal! Nos cavaliers sont en selle  
 Ils se dirigèrent vers l'est  
 Les détachements de l'avant bivouaquèrent  
 [ au pied du mont Abdoul—Aziz  
 L'arrière des détachements avaient bivou-  
 [ aqués au pied de la crête de Kawkab  
 Ah par la grâce de Dieu  
 Que je fusse un bouquet de roses et de basilics  
 Et que je tombe entre les mains de mou  
 [ garçon ( amoureux )  
 O que ma poitrine se brise, trois fois par  
 [ jour devant les moustaches noirs

— 3 —

Mon amour l laisse moi la main  
 Les mechauts et les malins de notre village  
 [ sont nombreux  
 Oui, les méchants et les malins de notre  
 [ village sont nombreux  
 Il est bien possible que quelques uns d'en-  
 [ tre eux, sous prétexte de feu  
 Viennent le matin de bonne heure nous  
 [ surprendre

Delal . . . . .  
 O lève toi, que la vie de mon cœur te soit  
 [ un tombeau

— 4 —

Yeli delal, le beau de la maison de mon père  
 [ est dans un doux sommeil  
 Mon cœur ne consent pas que je l'éveille de  
 [ ce doux sommeil  
 Que j'aïlle au marché du Diyarbekir, l'ardent  
 Pour que je lui apporte un aba' semblable  
 [ aux abas rouges de basrawi  
 Pour que je l'en couvre vers le matin.

— 5 —

Yeli delal . . . . .  
 Yeli delal, à tout personne qui apportera une  
 [ bonne nouvelle  
 De la part du beau de la maison de mon père  
 Je lui donnerai la jument et au plus la pouliche  
 S'il n'est pas satisfait avec cela  
 Je lui donnerai les 120 bourses, les plus beaux  
 [ bijoux de ce monde  
 Si encore il ne se contente pas de ceux-ci  
 Il y a les 120 moulins de la maison de mon père  
 Je les lui donnerai, ceux-ci son en aval des  
 [ alluvions, à Noussebine

Delal . . . . .  
 Que la vie de mon cœur te soit un tombeau  
 Mon cœur n'a pas de patience sans toi.

### J'AI PEUR QUE JE MOURRAI

J'ai peur que je mourrai, o cœur en extase !  
 Cet automne, delalo  
 Cet automne.

Qu'on prépare ma tombe, o cœur en extase!  
 Sous le noyer, delalo  
 Sous le noyer.

Oh, que j'embrasse, o cœur en extase  
 Les trois boucles de la fille hoyo  
 Les trois boucles de la fille, delalo  
 Les trois boucles de la fille.

J'ai peur que je mourrai, o cœur en extase !  
 Ce printemps, hoyo  
 Ce printemps delalo !  
 Ce printemps.

Qu'on prépare ma tombe, o cœur en extase!  
 Sous l'arbre, hoyo  
 Sous l'arbre, delalo  
 Sous l'arbre.

Oh, que j'embrasse, o cœur en extase  
 Les trois boucles de la bien-aimée, hoyo  
 Les trois boucles, delalo  
 Les trois boucles de la bien-aimée.

Il y a là haut deux chansons l'une, un chant d'amour et l'autre un chant de danse. Pour celui-ci, il n'y a besoin d'aucune explication; quant au chant d'amour, c'est un passage de (Delalé—Beriyê) dont nous avons déjà parlé dans le troisième numéro de notre revue; page : 11. Cette chanson qui a beaucoup d'expressions et d'images tout à fait propres à la langue Kurde et étrangères à la langue Française, n'a pu être traduite que d'une manière à exprimer le sens général. Par conséquent il importe de donner quelques explications pour le lecteur étranger.

Le mot (delal) que l'on peut à la rigueur traduire par le mot (beau) n'a pas d'équivalent exacte en français.

Il signifie à la fois, beau, gentil, amoureux etc . . . aussi avons nous préféré le laisser sous sa forme Kurde dans la traduction.

( Que la vie de mon cœur te soit un tombeau ) c'est une expression surtout usitée par les femmes Kurdes envers leurs maris ou

leurs bien-aimés. Elle veut dire que je me sacrifie à toi et à chaque instant de la conversation elles leurs adressent la parole en disant ( ez gori ), textuellement ( moi ton tombeau ) En somme c'est un terme de politesse comme le ( Kuss die Hand ) de Vienne. On trouve cette expression dans quelques chansons sous la forme ( ez gorija seré te me ), ( je suis le tombeau de ta tête ).

( Que ma poitrine se brise, trois fois par jour. . . ) veut dire, si je le voyais trois fois par jour pour souffrir devant la splendeur de sa beauté.

( Sous prétexte de chercher du feu ). Dans les villages on a la coutume d'aller le chercher chez les voisins, là où se trouve encore un reste de feu dans la cheminée.

Elle fait des cadeaux à celui qui lui apporterait la boune nouvelle, parceque le jeune cavalier est parti pour la guerre.

L'expression qui se répète au cours de la chanson ( la maison de mon père ) veut dire plutôt le foyer de mon père et le mot ( mal ) que nous traduisons par maison correspond plutôt au mot anglais ( home )

Ces chansons ont été chantées par la cantatrice Kurde ( Meryem Hanım ) de la tribu ( peçinçaran ) enregistrées par la compagnie ( Odeon ) sous numéro ( 35483 - 35484 )

Nous avons choisi ces chansons et indiqué le numéro du disque pour cette raison que la cantatrice Meryem hanım est parmi les cantatrices celle qui chante et prononce le plus nettement de façon que chaque mot soit bien saisi et entendu. Ceux des lecteurs qui s'y intéressent peuvent bien chercher le dit disque et comparer la chanson chantée avec les paroles dont le texte et la traduction viennent d'être présentées là dessus.

A propos, nous croyons devoir ajouter, à titre d'éclaircissement, que dans la chanson enregistrée par la plaque, il y a deux mots, en dehors du texte de la chanson, prononcés par la chanteuse et par un auditeur. Le premier est prononcé par un auditeur, ( Sehat xweş ) et signifie : « Bonne Santé », et le second mot est la réponse de la chanteuse ( ya te ji ) « Pareillement. » Chez les Kurdes, lorsque dans une réunion, il est chanté, il est d'habitude d'encourager la personne qui chante par ces mots.

*Herçel Axizan*

هرچی خوه ندا وزانا رابونه شو نا کو خه دتا مانی خوه بکن ،  
خه دتا ملتین دن کر نه . زمانی ملتین دن بیشقه بر نه وی  
خوه شوتفه هشته .

گاڤا ژر باقی خوه فقیتم ، دل من دشوتی ، از گدگ  
برخوه دکتم . ژخوه را ، ژهات وزانی خوه را حیفام دهات .  
هری گوتین باقی من راست بون ، پیشین مه ژهات  
وزمانی خوه را که ندان ، ما ایرو ، ایرو ژی که نادن .

هری از بالاخوه ددم ، ژچند مزن وزانا بان بیسه ، ت  
کس د هاداری دا هادار نا که ، زبه هادار ا هاداری . از  
دینم کول وی میدا نا کو هادار ژملتی کردرا ژکر یه  
ت کس هسپی خوه نازوئی . بلی ت کس نا کفه  
تراد و میدانی .

از ژ مزنین خوه دهرسم ، وه چرا ام آئینه دنیایی ؟  
ژبونا گو ام بین دیل و خلا مین خلکی آن ام ژی وک خلکی  
خندان رومت و ب شرف و ب مری خوه بژین . هکه وان  
ام ژبونا خلا می بی آئینه ، خوه زی نه آئینا و وارین خوه  
کو د بهشتانا .

آپو از ژه . هیشی دکم بلا او مزنین هال من مگرن . ما  
هادار نه ژبونا هادار و گازی بی به . از ژی درو پلین  
هاداری دا هادار دکم .

آپو ، ته جار کی د بند کی داد گوت : « کرد ژهفت  
جدا دلو بین بارانی نه . جهی جهی تین دافر تاندن . کو  
گهانه هفت دین لهی ، لهیکه بوش ، ت کس ، ت نشتل  
بروان نکاره بسکته ، فلانا و لاتی مه درابونا فی لهی دی یه . »  
بلی آپو ، او دلو بین بارانی امن ، ام کرد دین چوک . دثیت  
مزنین مه ، مه ب دل وهشی کرد مانجی ب خوه دی بکن دا کو  
ام بگن هفتو بین اوله بیا کو . هه بنایه و بگه بنه مرازی مه .  
پاشی از تهم دستین ته آپو من نی دلال .

حسجه : ۲۸ بناخ ۱۹۳۲

و جبری جمیل داسا

صاحب الامتياز والمدير المسئول

الدبر جلودت عالی بدر مان

## هاوارک

رخوبی بی هاواری ، آپی من ئی دلال  
جلادت عالی بدرخان را

آپو! ...

من چند خبر ژبونا هاواری نفیساندنه . ژ آپی خوه  
هیئی دکم ب چاڭکی فتح لوان میزه بکه .  
از بان ژوان کردین پچوکم کوب بشف روژان ،  
ب روژ شقان دژمیرن و د دلین خوه ده دیژن : گلو هاوارا  
مه کوژان روژی ئی بی .

روژین پوستی ب مه ناسن . دیوان روژان دا ام

ده کن دادو فغانی . اگر له هیکه وه به سه ریته خواری  
کومه لیکی مه محبوب زهردا بان ده بان گوت : له شکری !!  
اگر اتوجه زده که ی لهغو شیان قه بول نا که ی نالیان ، بگره  
روه کی نولان ده گه له خیزانیکی تاژ بان ، هه روه سه ری هه  
ریر وه ره ریر به گیان ، بکه زهوق و صفای او ان زردیان .  
دینه وه له کولی قه ساری ، بسک به ردانی ، مخه نه لی نانی ،  
چاواره ش کیردنی ، ده گه ل کانیات ، عاره قه کی  
توکو که به متنو که ده چور بته وه له گاهی شاه که زبان . . . .

او رو که شایک ده که ری له سه ری میدانی . تیدابه  
عیشی سلیمان بگی ده گه له میره مه دیانی ، اگر شیریه کی  
بکری به پنج سه دزیری ، له پیش را بده ی له سنگی  
اوان زه ردیان . له بهر دلیمن جه زمه چی نون کار نا کاله  
بهر علودو مه چیدی او ان طساقه شایبان ، امن له پاش آغی  
خوم سوز نا مه له چی هوعه ننه کان ، ده بهر پشتی خوم رانا  
که م چی خه نیجه رات ، هه ل ناگرم چی ناصرانیان ،  
هه ل ده گرم که شکولیکی دهر ویشان ، پوستالیکی  
حاجیان ، ده په ریبه وه له بهری استریان ، ده چه هوه ناو  
قومه که لیکی له وان داسنیان . اذ رو که داده صبحینی  
چی مودت نینه لو اوی آغای ، اوه تانی به تنی مایته وه له  
وولاتی غر بیبان ، ونایبته وه سدر او مولک و ده وه تان ،  
هه تا ابدو ابل ابدیان . . . .

هفتیری صوری

چاڭنیر بازی دکن .

روژا کو هاواری ژ پوستی دستینم ، دکم بن پاشیلا خوه  
ونویرم زوزو فکم . ژیر کو کیفا دبناوی ژخوه زی  
ددهخم . هیدی هیدی پشایو فکم ل چرم وی دنیرم ،  
ل تیده خستین وی آگاه دیم وپاشی دکشم ناف  
روپلین وی .

هاوار کانی بکه زلاله ، از مر فکی تهتم ، بیان بیان  
ژی فدهخم ، آگری دلی خوه بی فکد کژبتم .

آپوت ژوانی هاوار ب مه چقاس خوشه ، چقاس دلال  
وهپایه . ت زانی چرا آپو ؟ ژلورا کو آف می چارسان  
از د دبستانا ییا نیبان ده دخوینم ، هین از ب خوه نه حسیا  
بوم ، لی آف هاوارا دلشوات از دین کرم . شف وروژ  
دخوینم ، بندین وی ژیر دکم و دیسان ژی تیر نام .

از وهقالین خوه ام ناف هفدا سیورن . بلی هرچی کو  
ب زمانی مه هاته نفیساندن ژمه راهسانی به ، خوندناوی  
ب کیفه . کومه اوجرا کی خورند ئیدی ژیرامه ناچه .  
ما ژبونا هر کسی ژی نه وسانه . هری زهانی هر کسی  
ژیرا شهرین وهسانی به . ژلورا هر کس ب زمانی خوه  
دخوینه ودفیسینه . تنی ام کرد د دبستانین خلکی ب  
زمانی خلکی دخوینم . ما چرا ژبونا چیلی بین کردان  
ژی دبستانین جهی چینا کن کوام تیداب زمانی خوه بخوینم .  
ت زانی آپو من چه کرم . مرثی یکی از را بوم ، چوم  
جم بائی خوه و من ژیرا گوت :

— بافوت چرامن دشتینی دبستانا ییانیان . دیوان دبستانان  
دا زمانی هاواری نینه . او زمانی کو زمانی منه ، زهانی  
کردمانجی به .

بافی من هنگ سکنی ، سه ری خوه کر برخوه ، مادی  
وی گهبری ، ب دنگکی گران لی زیز ، ل من  
فکر اندو گوت :

— لاوو خبراته به . دثیت کوت د بستانین کردان دا  
بخوینی . لی مد حیف ومخاین دبستانین کردان هرژ نه هاتنه  
بی . بلی ، د چافین ته دخوینم ت دخوازی ژمن بهرمی ،  
( « ما چرا حتانوه دبستانین مه چینکرته » چینکرته ، ژیر کو

### ادبياتي ڪوردي ۳

له وانہی سہ رہہ بہ تہ واوہ تی دہردہ کہہ ویت کہ ادبیاتی ڪوردي ادبیاتیکی آری بہ و بلندہ و بہ رزہ و ہر و کو ادبیاتی زمانانی آری قابلہ بو بہرزبو نہ وہ و سہ رکہ و تن . و ہر چہ ندہ مدنیت لہ ڪوردستاندا بلاو بیتہ وہ آوہ ندہ ادبیاتی ڪوردي سہردہ کہہ ویت و بہ رز دہ بیت . بانہ حتی بنورین لہرہ ہہ زاران چیروکانہ کہہ ڪورده کان ہہ لیان بہ ستوہ ودایان ناوہ ، بہ تہ واوہ تی بیان خونینہ وہ ، لہ و دہ . دہ زمانہن کہہ ہیچ فریق نیہ لہ ؛ . بی ادبیاتی اہمہ و ادبیاتی زینایکی روزاوا و لہو دہ مہ بلندای ادبیاتمان دہ سہ لینین .

آیاہہ لبستی چیروکی (مہم و زین) چسی فریقی ہہ بہ لہ گہ لہ لبستی چیروکی یونانی کون (ایلیادا) ۰۰۱۱  
آیا اوہہ لبستانی چیروکی یہ کہہ ابرو لہ آور پا دیبشین چسی فریقی ہہ بہ لہ گہ لہ لبستی چیروکی ی ایرو کہہ لہ ڪوردستاندا بلاو بوہ تہ وہ ۰۰۱۱

آوہ ندہی ہی ناو بیت ، ہہر نہختی بنورین لہم چیرو کی خواوہ وہ و سرنجی لی بدہن آو دہ مہ بلندای ادبیاتی خومان تی دہ گہ بن .

آم ہہ لبستی چیروکی بہی خواوہ وہ لہ دہشتی حریری روژہ لاتی (ہہ ولیر) — کہہ بہ شی ناوہ رستی یہ لہ سوران — بلاو بوہ تہ وہ . ولہ و ناوہ بہ (شعری لہشکری) یہ ناو بانگہ . چونکہ دانہ رہ کہی ناوی (لہشکری) بوہ . لہم چیرو کہہ دا باسی (میر سلیمان بگی حریر) دہ کات کہ آخرہ مین پاشای امارتی حریر بوہ . آم قارمانہ چہند سالیگ بہ رامبر تور کان رادہ و ستیت و ہار دہ کات ، لہ پاشان دہ شکیت و دہ گیریت و دہ بر بت بو (استامول) لہ گہ لہ (لہشکری) ی پزای . میر سلیمان بگ خوشیکی زور جوانی دہ بیت کہہ ناوی (خانزادہ خاتون) دہ بیت . لہشکری سہ زی لی دہ کات . انجاشوقی سہ رہہ خوبی لہ لاییکہ وہ و گیر ہی سہ زلو کیردین لہ لاییکی دہنگہ وہ اگر لہ دہلی بہر دہادت

### از ڪورديا بانگی تہ مہ

هاوار هاواری ڪورده ده نڪو وگازی ولانه  
مژگی تی فی خوناسی نه هاتین به دهنگی هاوار  
کی ژو ڪور پیر وچووان

هاوار هانه چنی یایان دہشت وگوندپی لہرزان  
بانگی آزادی ڪوردان يك بوونی خوشی دلان  
کہ وتہ ناو مال وخیزان

ہر دہم بہ دہمی هاوار بیک دہ ڪوششو هاوار  
ہوشیر دہ بنا ڪوردان لادہ بان شینسا ولات

از ڪورپا بانگی تہ مہ

آکرہ : ۲۸ جزیران ۱۹۳۲

ماموسنا

و دست دکاتہ دانانی آم ہہ لبستہ جوانو شیرینہی خواوہ وہ :

«لہ وی دہ ورم دہ نوری ہہ تا آوی زمانہی ، لہ وی زمانہ دہ نوری ہہ تا دہ وری قباد خان ، لہ دہ وری قباد خام دہ نوری دہ نوری ہہ تا دہ وری خان سلیمانی ، لہ دہ وری خان سلیمان دہ نوری ہہ تا دہ وری چہ جہ سلطانی ، لہ دہ وری چہ جہ سلطانم دہ نوری ہہ تا دہ وری شاہی نوشروانی . ایکم نہ دیت و کو میری ہریر و ہر بر بہ گیان ، لہ دہوانی حیزہ رومیان ہہ لبستی بہ گرانی . آو رو کہہ دادہ صبحہ بی ، چسی ہودت نینہ لو آوی آغای ، آوہ تانی بہ تہ نی ما یستہ وہ لہ وولاتی غر بیسان بہ بی خواہدانی آو رو کہہ سہری من دہ ہیشی ، دلی من قہد ہادی نابی لہ بہ رگر گیان ، اگر آمن روزم لی ہہ لاتو لہ ہہ و قہ دہ وہ ہہ فت شاران ، دہ داتن لہ گہ لی آمیدی لہ گہ لی سولاتی ، دہ داتن لہ سہ ری ہریر و ہریر بہ گیان ، دہ داتن لہ چہمی سورہ دی . لہ من خلیہ بہ کولونکی سیوی و ہناری و اوان میرانہ دارہ رہ بیان ہمو عہ لہ سہ حری ، بہ یانی ڪومہ ایکی بلبلان ، ایکہ شالوران ، بہ چریکی لہ ناودا

داوته

ژ زوزانان هات قلنگ  
خبرآنی ژ خوہ بینگ  
دبی ورن داوته

\*  
داوته خوہش داوته  
ژ کردان ره رومته  
داوت شمره ۶ شاہینت

\*  
بی خوہ بی مان گندکلات  
گازی دکہ اثب ولات  
دبی ورن هاوارہ

\*  
بی کزی مان کچ و بوک  
د ربلان ده باو پوک  
بی بلگ مانہ دار دثی

\*  
ناقنو دکن کردانی  
نه هاشتن میرانی  
کردنون رابن داوته

\*  
هری لاوو داوته  
داوته خوہش داوته  
بوکاته ژی کردستان

\*  
کزی بین وی دلان  
چه نرہوک وشپارن  
برمقی مدہ وان

\*  
دنگی آئی چه زیزه  
نوال ژیره عزیزه  
ولات! ولات! ولاتو

\*  
ژ زوزانان هات قلنگ  
خبرآنی ژ خوہ بینگ  
دبی ورن هاوارہ

مہرود عالی بررغان

ژ خانی را

مہر خبرگی کردوارہ  
دکل رومی احمد خانی

خانی تو بسہ بکھ ہواری  
راہہ تو بلکہ ژوی مزاری  
بفکر تو بین دیاری زبئی  
صورہ وکی کل همی ژخوبئی  
دومان وگری ژخانانان  
چاوان درگیتہ آسمانان  
فریاد و فنی دخت و بوکان  
زاری و هواری فان پچوکان  
جورا ولد حرامی جنکیز  
نہ رزہ شنبہ نہ باغ نہ پاریز  
ویران کر نہ کلات و باژار  
تالان کر نہ مزارو بازار  
جیکسی زری و دلال ورنندان  
لی عر عرہ ہرچ و بوم و کندان

لی

بی ہیفی مہہ بشیر توجارک  
کردین بشفاق بین مبارک  
أبروقہ نمابہ وان تفافک  
پیکفہ همی بونہ أتفافک  
طاومی و عیسوی مسلمان  
ژسیواس حتا بکیتہ لوران  
یک جان و دل و یک ہوارن  
بالجلہ لگازی بی بکارن  
شکل سالہ همی پچوین دبازن  
آزادی و خوہ پچوہ بی دخوازن  
یادی ہرین و یاژین ہیر  
قت لائقہ کرد بیندہ اسیر

بایزید ۱۵: ہزیران ۱۹۳۲

ہرمن زردشت

ہشہ ہزارنامہ

هاوار کردنو! نکن نکن  
رفغانیار ژبیر نکن  
شفت وروژی ہون خونکن  
میرانیا خوہون زبدہ کن

هاوار کردنو نکن نکن  
بکیتیاخو وندا نکن  
ناموساخو پایمال نکن

هاوار کردنو آمہ پرن  
چاؤین مہ کسی ناپرن  
ناخبین پرخزانن  
أم ب قانونان نزانن

هاوار کردنو بر لڑین  
زاروکی خو پچو بینین  
ب قانونان بزاینن  
بلگی دوزامہ ہلینن

هاوار کردنو نکن نکن  
بزمانی نیار گال گال نکن  
زمانی کردان ہون فرہ کن  
کچ و بوکان پایمال نکن

\*\*\*

هری لی ہری لی ہری لی زری بی  
ازی نچوہ شہم نچوہ شہل تابی یو  
براجیگی کن می دا بنن ل زوزانی مہر گہ مہری  
ل یر بلکیا یوفی یو  
بلکی کچو بوکی ابلارنگین بین ہرن  
سیرانگاہو

چلنگ گورا من دست خوبدہ  
بندسری من عشدالی خدی یو  
دوایی دوا بی فلک کمال شو بی خایینی مرانایہ

دشتا سرہ چپی : ۱۴ : تبایخ ۱۹۳۲

لاوی فندی

د پي ره ازو خودی بی دکانی ام کتن  
 بازارا کاغذا هاواری . ژ خوه ژبونا  
 کر پنا کاغذا هاواری هاتبوم بیرونی .  
 من شفلی خوه کتا کر بو . کاغذ ب ریسنی  
 بهاتار یکرن . ننی کاغذا چرمی من بچوه ره بیرا .  
 خورتنی من چرمی هاواری کر پشتاخوه ومه داری .  
 ام چو بون دکا ککه دن . من بی خوینی بی  
 دکانی ره خبر ددا . کردمانجی من د کر چککی  
 ده ل سر لشکان رونشتی ل من دنیرت ود کنی .  
 من ژ بی دفکنکی ژیره گوت :

— خورنو ، ته خیره ، چره دکی ؟  
 — خیره ازخلام ، ژ کیفا خوه دکنم ، ژ کیفا  
 کردمانجی به ، ژ کیفا کردمانجیانه دکنم . بلی  
 ل بیرونی کردمانج زهنن . ژ صبی حتا ایقاری ام  
 ب کردمانجی خبر ددن . لی گاغاژ دخی نه دبهزم  
 هیژ بیتر کیفا من ژیره تی . آخ ازخلام ت ترانی  
 کردمانجی چقاس شپرینه .

— ناهری ، کردمانجی کنگی بو به شیرین ؟  
 — ب سری ته ئی عزیز ، ت زمان وک  
 کردمانجی نه شیرینه . از ب ترکی رند ترانم ، لی  
 من او گلکی بهستیبه . ل عراقی من عربی وانگلیری کلک  
 بهستنه . ل سوری بی هر ورعربی وفرنسی دبهزم ،  
 ازوان دانیم برهف و دینم کوشیرانیا زمانی کردمانجی  
 د . توان ددینه ، لی چه فیده او ب کردمانجی ترانن  
 — مایزانیانا چه دبو ؟

— هنگی ژ کردمانجی بی پیشه ب ت زمانان  
 خبر نه ددان . . . . . مهورت عالی بدرخان

هلاکوه ، بیه میفانخانی . من دگک ل بیکی کر :  
 — خورنو ، هککه فالایی ب من ره وره . خورتنی  
 کومن دنگلی کر بو ژ هفاین خوه دفتیا دایی من  
 . حتا کو ام گهشتن . کانکی من دیند کر ل دکانی  
 من جغار یک داوی . مه دست ب آخفتنی کر .  
 — خورنو ، ت خلکی کر دری بی ؟  
 — از خلام ، از بدلیسی مه

لی زمانی ری نه زاری خلکی بدلیسی بو ، من گوت :  
 — ما چره دپیژی کو بدلیسی بی ، ژ زمانی ته  
 کفشه کوت ژ درامیردینی بی

— بلی ، خبرانه راسته ، لی از اصلی خوه دپیژم ،  
 از بدلیسی مه لی د مهاجری بی ده در کتسه و در  
 دورا میردینی ده بی خوه دی بومه ، برقی بیکی . . . .  
 — کنگی هاتی بیرونی ؟

— اف . بوسالک وهن ، ما ازخلام ت ژ کوی ؟  
 — دفت ت ژ ، ژانی من بزانی  
 — گورا زمانی ته ، ت ژ و لاتی بو طانی ،  
 لی د ش بازاری ده ، ت بو طلی ناین

پیلکی . کنی ، کفش بو کو دفکری ودر بیرا  
 خوه ده ل تشکی دگرها . د پی ره رابوسرخوه ،  
 هات دستی من وگوت :

— ازخلام ، ل سوچی من منیره ، من آنها  
 ت ناس کری . ژ خوه من بهستیو کو یک ژوه  
 ل بیرونی به ، من دل دکر از هرم زیارتاوی لی  
 من فدی دکر ، خدی ژمن ره ل هف آئی

— بلی یک ژمه لی بیرونی به ، لی اونه ازم ،  
 او برای منه ، از ل شای رودنم

# هاوار

کوفارا کردی \* مجله کردیه

## سیرانی یا زماننی کردمانجی

ره دهر که ، حتا پستی سیرانی ، پاشی ، دلو پین لمی بی ،  
 بر ب بجرمی فه ، ژر هف د کفن و بلاف دین .  
 خلك دبرمن ره دهورین ، پیدو جوان ، ژن  
 ومیر ، دولند و بانگاز ؛ ژر هر ریری ، ژر هر  
 رای ، ژهر نژادو ملتی من او ژر بلگ ، دیم و  
 سرچوین وان ناس د کزن .  
 جارنان شفقه کی گور و پجن ب شاشکه  
 کی کسک د کزن هف ، مککی صور د سر  
 چار کی ره دقلتی . ژنککه ز کزن ، وک دنکی ،  
 گگردبو و دکت پشنا کچککه نارین و بژنراف .  
 آفه ، پیخوامک ، کاشو بی حمدی خوه دستین  
 خوه د مرهیت و ناکسین فان پیرک و کچسکن ره  
 دگرینه . من جانی خوه فیسهاندبو . رابوم ، کتم  
 ناث وی لمی بی . ژر اشکی فه ، ژر کولانکی چند  
 سری پین ب کم و دستمال ل من در بون .  
 — نه لو ۱۰۰ هی زویه ۱۰۰۰ ماچان ۱۰۰۰ دق  
 ژی برده ، حسو دگوت ، ناهری ۱۰۰ گمهده ۱۰۰۰  
 قت نه دهات پیروان کو ازژی ب زماننی وان  
 دزانم ، کو ازژی بک ژر وانم .  
 ژخوه ژمن ره زلامک د قیابو کو هومور بن من

وکی از گشتم بیروتی روز چو بو آقاوسی  
 ساعت ژر شفی در بلس بو بون .  
 صبه تر ، بری نیفر ، ژر میغانخان در کتم ، من  
 دا کوچه و کولانان و گشتم میدانان برجی . دنیا  
 گرم ، باشل ، پینا مروفت تنگ دبو دچکها . من  
 خوه دا برسها قهو کی ، جانی خوه د قیسها ند .  
 برج میدانکه فره و در بژکی به . د ناناوای ده  
 پار یزکی کچک لی سپهی هه به . ب گیان ،  
 پهنون و داران خملاندی به . نیره آفکه کچک  
 دهوره و د کفه ناث بیرمه تنگ . اردا بیرمی ژر  
 کفرین شهکری و بنفشگون راخستی به . رنگی آفی  
 نیده و نداد به . بیرم وک ز فییکه بنفشین خویا دکه .  
 ل سری میدانی ، سی کوچه بین مزین — ژر  
 باکر ، ژر روز هلات و روز آقا — خلکی باژیر  
 دینن ولی در ژینن .  
 خلك د ناث کوچه بان ده مینا رو باران دهر  
 کن . آف سی رو بارین کو د میدانانی ده دگن  
 هف ، دین لهیکه بوش و خوه ددن بر پار یزی .  
 د بر جاین پار یزی ده پلین لمی بی دشکین و لمی  
 دبه د بر بک د بر راستی و بری دن د بر چیبی پار یزی

# کتبخانا هاواری

ریزانا الفابی با کردی

هزار  
۱

غروش سوری

۱۲۶۰

ب جرمی خملاندی

۱۰

ب جرمی عادتی

ژ بونا درفه دقیت حق پستی ب سر بیت خستن

زنگراف ومطبعة

الیوبییر خوالک اب مشوق

حفر جمیع المعادن والصور الملونة واللوحات النحاسية  
طبع وبنانات ودریات بحروف نازرة علی الطراز الخریب

ملك الظاهر

دمشق

الطبيب

احمد نافذ

اختصاصی بالأمراض الباطنیة والرهنیة والأطفال

عرنوس

دمشق

الطبيب

محمد خضیب

الارضة صامی بطراصة وامراضه المعین ومرامتها

صالحیه

دمشق

## اشتراکات مجموعه هاوار

وفي غير هذه الأقطار

عن سنة واحدة ۱۰۰ فرنك  
عن ستة شهور ۹۰ فرنك  
عن اربعة شهور ۶۰ فرنك

في سورية وتركيا والعراق وبلاد العجم وبلاد القفقاس

عن سنة واحدة ۵۰ غروش سوري - ۱۰۰ فرنك  
عن ستة شهور ۳۰۰ غروش سوري - ۶۰ فرنك  
عن اربعة شهور ۲۰۰ غروش سوري - ۴۰ فرنك

المراسلات يجب ان تكون باسم صاحب الجريدة : دمشق - حارة الأكراد



السنة ١

العدد ٨



اللائحة

١٢ ايلول ١٩٣٢

# هاوار

سال ١

هزمار ٨



دشبه

١٢ ايلول ١٩٣٢

کوفارا کردی \* مجله کردیة

## تیدة خستیین کوقاری

|                 |                          |
|-----------------|--------------------------|
| ج ٤٠ بدرخان     | شیرانی یا زمانی کردمانجی |
| هفتدی صوری      | أدیاتی کردی              |
| دکتوک ٤٠ بدرخان | ییری یا ولات             |
| وجدی جمیل پاشا  | هاوارک                   |
| هر کول آذیران   | ری یا تیزه               |
| ج ٤٠ بدرخان     | کردکی کچک                |
| ج ٤٠ بدرخان     | القابی یا کردی           |
| هر کول آذیران   | فرهنگکوک                 |

|                 |                      |
|-----------------|----------------------|
| بهمن زردشت      | ژخانی را             |
| دکتوک ٤٠ بدرخان | ستراتا دلان          |
| ماموسته         | ازگور بیابانگی ته مه |
| دکتوک ٤٠ بدرخان | آلا کردان            |
| لاوی فندی       | هشیار نامه           |
| ج ٤٠ بدرخان     | داوته                |
| ستراتان         | بلی دلال             |
| دیلو کفان       | ترسم از بزم          |

SAL 1  
HEJMAR 9  
in  
30 Ilon 1932

# HAWAR

ANNÉE 1  
NUMÉRO 9  
VENDREDI  
30 Septembre 1932

Qoyara Qurdî \* Revue Kurde



TOFEQ JI QURDMANCÊN DESTA HESINAN

çapxana terekî

SAM — 1932

# QITÊBXANA HAWARÊ

HEJMAR

## Rêzana Elfabêya Qurdî

Note sur l'alphabet Kurde

Bi germê xemilandi 12,50 K. S.

Bi germê adeti 10 K. S.

Ji bona derve divêt hekê postê bi ser bêt xistin.

*Dr. A. Hafiz*

SPÉCIALISTE DES MALADIES INTERNES  
VENERIENNES ET INFANTILES

Damas

Arrou

*Dr. M. Khidir*

*Opérateur et Occuliste*

Damas

Salki

## PHOTOGRAVURE

### Eyoubiye Frères

Inscription sur tous les métaux. Gravure coloriée, pancartes et tableaux en cuivre. Impression de cartes et autres en relief, suivant les procédés les plus modernes.

Damas

Malek Daher

## Abonnements

Pour la Syrie, la Turquie, la Perse  
Irak et les pays du Caucase:

1 an 100 fr.

6 mois 60 fr.

4 mois 40 fr.

Pour tous autres pays:

1 an 150 fr.

6 mois 90 fr.

4 mois 60 fr.

Adresser toute demande au directeur  
propriétaire: Emir D. A. Bedir-Khan

Damas: Quartier Kurde

## Qirîyarîya Qomelê

Ji bona Sûriya, Tirqîya, Ecemistan,  
Irak û welatên kevkasê:

Salqî 500 kirûs-sûrî — 100 frenq

ŞesmeHQî 300 kirûs-sûrî — 60 frenq

Çarmehqî 200 kirûs-sûrî — 40 frenq

Ji bona welatên din:

Salqî 150 Frenq

ŞesmeHQî 90 Frenq

Çarmehqî 60 Frenq

Her tist bi navê xweyî tene sandin:

Şam: Taxa Qurdan

SAL 1  
HEJMAR 9

in  
30 Iton 1932

# HAWAR

Qoyara Qurdi \* Revue Kurde

ANNÉE 1  
NUMÉRO 9

VENDREDI  
30 Septembre 1932

## Welat, Welatîni û Al

Welat erdê bav û qalîqên me ye.

Welat ew der e qo, pêşiyên me li wê rabûne, ji bona avahiya wê xebitîne û li wê mirîne.

Welat ew diyar e qo, em têde seqirîne û rûjeqê di nav axên wî de bêne veşartin.

Xelqê welateqî, welatîyên hev in. Borî, hal û dawîya wan bi hev re girêdane. Zmanê wan, girêdana wan, her hal û lebtên wan mîna hev in. Pêşiyên wan li rex hevdu rabûn, rûnîstîni û mirîne.

Welatî bi Kenciya hev şa dibin, her xirabîya hev diqevînin. Şin û şahînetê wan yeq in.

Xelqê welateqî brayên hev, pisinamên hev in.

Hergav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşî, avahî û azahiya welatê xwe dixebitînin.

Qam û armanca wan yeq in.

Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwînen xwe bêperwa dirijênin. Herê dixebitînin qo welatê wan meqevit bin destên mîletên din.

Lê mîletîni hene qo welatê wan, bi awaqî, qeliye bin destên neyar û dijminan. Weq welatê mîletê me, Welatê Qurdistanê

Ev mîletên ha ji bona rizgarîya welatê xwe dixebitînin.

Xebata wan ev e: Rûjeqê berê biyanîyan ji welatê xwe derînin û mîna mîletên din biserxwe bibin, di nav hev de bi xweşî, û bi Kenci bijîtin.

Herqes hej welatê xwe, hej welatîyên xwe diqe.

Hejqirîna welatê di dilê me de hevi-

neqe mezîni û bilind e. Em pê xurt, zexm û canfêda ne. Jê re welatîni dibêjin.

Welatîni di hundirê me de agirêqî mikedes e. Pêta wî agirî ji me re her fiştên welatê dide hez qirin. Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya dest, dar û qevirên welatê me ji yên welatên din speltîr, xweştir û şerîntîr in.

\*\*\*

Her mîlet xweyîyê aleqê ye. Al nîsana mîletê û welatê e.

Tevayîya heyûna mîletan di alawan de civiyaye.

Al namûs, rûmetê û bextê mîletan e.

Zarowên her mîletî ji bona bilîndî û bikedrûna ala xwe, bêperwa xwe didin quştin.

Ala her mîletî jê re beha ye. Di cejn û şahînetan de kesr, seray, xanî û qûçeyan pê dixemilînin, di ber wê re dihorin, slavan lê diqîn, wê maç diqîn, dattînin ser serê xwe.

Alên mîletên biserxwe, di ser qelatê û bajarên wan re li pêl dibin, di rêveçûna leşqerî de diveqîn pêşiyê.

Lê alên mîletên dil, weq ya mîletê me, ji her derê biderqirî, lihevtewandî li ser dilê zarowên wan de hilandî ne.

Mîletên dil dixebitînin, xwînen xwî dirijênin qo biyanîyan ji welatên xwe bikewirînin û alên xwe li ser qelatê û bajarên xwe ji nû ve daçîqînin.

Ala her mîletî bi çend rengan û bi şiqleqî din e.

Ala qurdan, ji jor ber bijêr ve, ser hev, sor, sipî û qesq e, di nava wê de roj diçirise.

## Melayê Gulê

Wexteqi li bajarê Hesênqêfê belengazeq hebî. Jineqe wî jî hebû. Navê jîneqê Gulê bû.

Belengaz herûj mileq êzing diani bajar û difirof, dida bi Kirûseqi, dudawan û rûja xwe pê derbas diqir.

Rûjeqê jî rûjan jîna Kêzî û miftî çûne ser avê, qo cilên xwe bîson. Jîna belengaz jî çû û ser wan re cilên xwe şuştin. Gava jîna Kêzî û ya miftî çav li jîna belengaz qirin qo ewê cilên xwe di ser wan re dişo, hema rabûn dest bi jîneqê û dijanan qirin. Drêj bûne, pora wê vedirûn, jî her qo ava cilên wê a bikrêj bi ser wan de dibat.

Gula belengaz jî li wan teksir neqir, û pasê pol posman cilqên xwe tev qirin û dest bi girî qir, çû mala xwe hal hewalê xwe jî mêrê xwe re got.

Mêriq jî got:

— Hermet ez belengaz im û ew Kazî û miftiyê bajar in, ma ezê ci biqim, sixel û lédana te jî wan re ma.

— Nabî, ez li tu cilan rûnanim, yan tu ê bibî mela, yan tu ê min berdi, yeqî jî her duw nî jî xwe re bigre.

— Hermet, ez ne bi xwendinê dizanin, ne diqarin li pêşya du camêran nîneq biqim, ez dê çawan bibim mela. Ez hevî jî te diqim tu hela xwe jî min veqe, ez qerî vî îşî bayim.

Qir ne qir hela jîneqê jî xwe veniqir. Reben mêriq rabû ser xwe, çû sîqê şaşeqe xwe peyda qir û çû ser pira bajar seqinî. Deffera xwe bi destê xwe re girt.

P reqeq hat serê pirê, qo belengaz dit jî pirsî:

— Mela tu çî îşî li vir diqî ?

— Ez nivîstî çêdîqim, pîreqî qo mêrê wê hej wê neqe ez diqarin biqim qo jê hez biqe.

Divê zarawan Qurdistanê bixebitin û rûjeqe berê vî rojê hilinin, ber bi ezmanê Qurdistanê ve bilind biqin, li wê bibrûsqinin, welatê xwe ser avahiya xwe a pêşin veqerînin û di bin tava wê re biserxwe û bi qamirani bijin.

*CelaDet Ali Bedir - Xan*

Jîneqê got: Mela ez di bestê te me, mêrê min hej min naqe, qo tu careqe min biqî hema tu çî bixwazi, ez jî te re seqinî me.

Sitileq mast jî bi jîneqê re heye. Melê got jîneqê:

— Vê sitila mêt û mêt idîqî bide min ezê nivîsteqe te çêqim qo mêriq hej te biqe.

Jîneqê rabû, mast û mecidîq, da melê. Jî xwe rebenê melê nizane tîsteqî binivîsin, piçeç qaxez reş qir û li hev tewand da jîneqê û jê re got:

— Di nav qeziyê xwe de girêde

Jîneqê jî mîna melê jê re got wi-sa qir.

Jî ba Xwedê mêriq hej jîneqê qir, hej qîneqe zor. Xwedê jî melê re lihev anî, heqî qo tê niq melê jê re nivîsteqe çêdîqe, miraza wî tete çih.

Nav li melê qet, Melayê Gulê holê, Melayê Gulê halo.

Teyreqî haqimê bajar jî heye, li niq hêqim pir delal e. Rûjeqê teyrê wî winda bû. Çikas pîrs qir ne qir pejna teyrê xwe ne qir.

Rûjeqê hineqan gotin:

— Ya haqim qo ne Melayê Gulê teyrê te derêne, êdin tu nema teyr dibîni, lê qo Melayê Gulê li qitêba xwe binihêre, ewê tîvil derîne, heçqo xwendaqî pir xurt e.

Hêqim du xulam rêqirine pey melê. Bi rê de mela çav li teyrê hêqim diqevê, di nav çavê dareqê de. Mela jî deng naqe hea gilîşt niq hêqim. Slav da hêqim, ewî jî slava wî veqerand, mela rûnişt, hêqim get:

— Mela xelqî pir pesnê te dide qo tu xwendaqî pir xurt î, gelo rast e ?

— Belê ezbenî

— Mela teyreqî min pir delal hebû, ev cend rûj in winda bûye, min divê tu teyrê min derênî

— Bi saya Xwedê û ilmê ezê teyrê te derênim.

Careqê mela qitêba xwe veqir, pa Xwedê bide mela ne bê zane nê pê. Ma berê teyr ne diti bû. Li qitibê nihêrt û jî hêqim re got qo teyrê te li filan derê ye.

Xulam çûn, di wê derê de qo melê gotiye teyr ditin û anin.

Haqim ecebmayî ma, rabû ji melê re pênc zêr dan.

Melê perê xwe hilandin, çû mal, gote pîreqa xwe :

—Îlhermet te ez qirim belaqê qo ez xelas nehim, îrû hal hewalê min ev bû li ba hêqim, lê hema Xwedê ji min re lihev ani. Êdin hela xwe ji min veqe, ezê ji vê melatiyê bigerim, melatiya bi derewan naçe serî.

